# MÎRNAME

Roman

Jan Dost

Hibr e
Bi hêsran û xwînê
Têkel dibe
Bi jehrê jî
Dibe mirin
Dibe jiyan

## Sibehek bi baran bû

Mirovê rûnuxamtî, axa ku bi cilên wî ve girtibû û li ber çipikên baranê bûbû peşkin ji herîyê û li rûpoşa wî jî ketibûn, bi destê xwe yê rastê daweşand û ji binê gorê de bi dengekî jinane bang kir:

- evçende bese.

Dema ku bi destê wî girtin û ew derxistin, pişikên xwe tijî bayê şil kirin û got:

- eeeeeeeh. Elhemdulillah em li tehtan rast nehatin, gora wî pir bi nermî hate kolan.

Û bi awireke ji xwe razî li binê gorê nihêrî.

Xirecira xeyalên kesên ku wê sibeha barandar li dora gorê kombûbûn, bi bêdengîyeke sezayî mirinê, mîna rûpoşa wî mêrê ku gor kola bû, hatibû nuxumandin. Lê di rûyê her kesî de xemgînî bê rûpoş bû. hinekan rûyên xwe di kefên destên xwe de veşartibûn û hêsrên xwe bêyî ku kes hay jê hebe didane alî. Li hev nedinêrîn û hêsrên xwe ji hev vedişartin. Hinekan jî pişta xwe dabûne darên çinarê û ji wê jorê de bêdeng li wan kaşên kevirî û rût yên li dora wan bêdengî kûrtir dikirin, dinêrîn. Tenê ewê rûnuxamtî bi çavên xwe yên xweşik û zuwa dikarîbû xemgînîya her rûyî di wê xirtolê de bixwîne. Her carê xwe dida rex yekî ji wan û vinevin pê diket û digot:

- Xwezîya me bi dilê wî. Ji vê dunyaya fanî bar kir.

Dema ku darbesta termê şêx Ehmedê Xanî li ser, xuyabû. Mêrê rûnuxamtî bi alî wê de lezand. Çar mirovên ku her yekî ji wan bi alîyekî darbestê girtibûn hêdî hêdî dimeşîyan. Wî xwe gihande wan û xwe xwarî bin darbestê kir. Kefenê spî yê li term pêçayî weke ku baran nabare zuwa bû, lê hayê wan kesên ku cenaze hilgirtibûn ser milên xwe jê nebû. Mele Ismaîlê Bazîdî yê li hêla rastê di pêşîyê de ji hoste Selaheddînê sehhaf re yê ku destikê çardarê yê çepê li ser milê wî bû re got:

- tu jî bala xwe nadê!!

Hoste Selaheddîn peşkên baranê yên ku tev li firmêskên wî bûbûn ji ser rûyê xwe yê zirav û henûn maliştin û pirsî:

- Bala xwe bidim çi heyran?

Mele Ismaîl dengê xwe hinekî nizim kir û got:

- Min termên weha sivik hîn nedîtine.

Mirovê rûnuxamtî yê ku ayeta ( kullû men e`leyha fan) bi dengekî xinanî û bilind dixwend, devê xwe nêzîkî guhê mele Ismaîl kir û bi dengekî ji yê wî nizimtir got:

- ev şêxekî nûranîye, loma jî termê wî sivik e. Giranîyan terman girêdayî gemara rûhê mirovan e, ev şêx zatekî tahir bû, rûhê wî paqij e dê ji xwe sivik be seyda. Ew ronahî ye ronahî. Ma çi giranîya ronahîyê heye Mele Ismaîl!!!!

Mele Ismaîlê ku alîyê wî yê çepê ji şaşikê heta şimikê şil bûbû, li pişt xwe zîvirî. Devê wî ji hev bû û pirseke zuwa bi rûpoşa wî kesê rûnuxamtî werkir:

- min tu li ku dîtibû?!!

***

Bêdengîya bi baranê şûştî ya mêrên rûxemgîn yên li dora gora Xanî ya nûkolayî, û bêdengîya wan her çar mêrên di bin darbesta wî û baranê de dimeşîyan, li mala kevin ya birayê wî yê mezin mele Qasim weke cawekî hevrîşim hatibû çirandin û hawara jinan heta berfa Gilîdaxê diçû.

Jinên reşgirêdayî desmalkên xwe yên rengareng ji ber hûçikên xwe derdixistin û barana ku ji çavên wan dihate xwarê zuwa dikirin. Hêsrên hinek jinên ku ji bîr kiribûn kilê ji çavên xwe bibin weke çipikên hibrê bi ser hinarkên rûyên wan yên çilmisî de diherikîn.

Xûşka xanî ya mezin Perî , cotecot hêsir diherikandin û her bêhnekê lawjyek davête ser birayê xwe heta ku
kêra girî li gewrîya wê dida û berxika nehwirandina wê digurand.
***

## Lawjeyeke ketanê:

*Haware li min haware*
*haware*
*Îro kekê min Ehmed*
*Xwediyê qelema zêrîn*
*Kaxezên berfîn*
*mêvanê axa sar e*
*haware li min*
*haware*
*gundîno*
*cîranno*
*malîno*
*çira Bazîdê îro vemirîye*
*di tarîyê de mane koşk û sera û qub û minare*
*haware li min hawar e*
*haware*
*ji ewran baran dibare*
*ji çavan hêsir têne xware*
*Ehmedê min biraye*
*Debîr û katibê mîraye*
*xwediyê mem û zîn e*
*ezmanê xwedê îro li ser kekê min Ehmed*
*hêsiran dibarîne*
*agir bi dilê çiyan ketî*
*berfa Gilîdaxê ji kerban tê xware*
*way li minê*
*li min bê xwedîyê*
*dilê min jar e*
*dilê min sar e*
*haware haware haware*

*de mi go ezê bendika xwe ya Kesrewanî*
*ji pêş enîka xwe hilînim*
*keziyên xwe yê spî bi ser birakê xwe de biqusînim*
*ezê li ber dara biyê rûnim çuqlîkan bihejînim*
*heta li darê dinê bim ezê bêjim bibilînim*
*haware li min haware*
*hogirno*
*cîranno*
*gundîno*
*haware*

*li min haware*
*wîîîîîîîî.*

Bi wê wî ya wê ya dirêj re jinan hemûyan tep li xwe dixistin û ji girî dihejiyan û digotin wî.
***
Di nava koma jinên ku li ser Ehmedê Xanî digrîyan de, Şenga Celalî jî digirîya. Di nav wî girîyê jinan yê mîna qêrînê de girirîyê wê tenê nedihate bihîstin. Weke ku ew fedî bike bi dengê bilind bigirî. Di gel wê jî ji hemûyan bêtir girîyê wê ji dil bû. Girîyekî ku ji koka dilê wê derdiket û ew weke agirê serê mûmeke li ber bayekî har dihejand bêyî ku hêsir werin xwarê. serê kurê xwe Ehmed yê çar pênc salî li ser kaboka xwe danîbû û serê xwe çep û rast dibir û carê bi du tilîyên xwe pozê xwe dimalişt. Hêsrên wê di rehengên hêsran re ji çavan dawerivîbûn poz û fişefişeke nerm pê xistibûn. Çend jinên ku ew nas dikirin di bin çavan re lê dinêrîn û rûyê xwe tirş dikirin mîna ku jê re bibêjin: malmîratê, de tu jî hema du hêsran li ser rehmetî bibarîne ha!! ma dilê te kevir e!
Wan giriyê dilê wê nedidît.
***
## Lê kefen zuwa mabû
mirovê rûnuxamtî, piştî pirsa mele Ismaîl ya zuha tavilê xwe ji bin darbestê derxist û weke ku li yekî bigere çû û hat û dîsa berê xwe da gorê û li ber kevîyê wê sekinî.
Yekî ji herduyên ku bi destikên darbestê yên paşî girtibûn got:

- bilezînin da ku termê seyda şil nebe.

Mîrza Sebrî, yê ku bi alîyê darbestê yê çepê girtibû, destê xwe yê rastê bilind kir û da kefenê Xanî. Gava ku dît zuwa ye lerzeke nenas kete hinavê wî û bi dizî di guhê mele Ferîdê li hêla rastê de got:

- heyran ev demeke em di bin baranê de dimeşin û kefenê Seyda hêj zuwa ye!!!

Mele Ferîdê ku doza lezandinê kiribû, keserek dirêj ku bi kefenê reş yê poşmanîyê hatibû pêçandin, hilanî û got:

- Seyda agirekî dadayî bû dê çawa kefenê wî şil bibe!!

***
çawa ku ew mirovê rûnuxamtî li ber kevîyê gora ku wî kola bû careke din sekinî, şêx Seyfeddînê Cubbeşîn yê ku bi eslê xwe ji Wanê bû bi hêdî jê re got:

- te gora wî baş kola ye, destên te sax bin

mirovê rûnuxamtî bi payebûneke bêsînor awirek li binê gorê xist û bi dengekî nazik lê bêtir ji poz derdiket got:

- ezbenî divê kûrtir bûya lê ev ji min hat.

Şêx Seyfeddîn destê xwe li pişta wî da û gotê:

- te kêla serê wî jî bi xetên xwe birewêjta dê gelekî baş bûya. Xetên te pirr çelengin.

Mirovê rûnuxamtî çavên xwe li keviran gerandin û bi awirên xwe yên bi mijeke tîr perdekirî, xêzin nedîtî di kevirê xeyalê xwe de rewajtin.
Dengbêj Dostoyê Ormewî û sofî Heyderê Qersî jî li nêzîkî hev rawestîyabûn û bi xemgînî li axa ku hêdî hêdî di binê gorê de şil dibû dinêrîn. Wan axaftina şêx û mirovê rûnuxamtî nebihîstin, lê wan jî ji hev re gotin ku ev gor baş hatîye kolandin.
Buhariyê şair jî li dûr pala xwe da bû kevirekî bilind û kitêbek di destê wî de bû, gava ku çav li mele Salihê Cizîrî ket kitêba xwe dada, lê mele Salih xwe gihandê û got:

- ha Buharî efendî!! Ma qey baran bi ser kitêba te de nayê!! Niha hibra wê li ser kaxezan herikiye.

Wî şairê ku texellusa xwe kiribû Buharî kenîya û got:

- netirse, ev kitêba min ne bi hibrê hatiye nivîsandin.

piştre weke ku li kenê xwe poşman bibe û tê bigihîje ku ken ne layiqî wê dem û wî cih û meqamî ye got:

- welleh mele Salih ez xembarim, heyfa wî. Çi hatê lo! Welleh berî heftiyekê du heftiyan min ew dît wek çiyakî b!!

mele Salih ew bêbersiv hişt û berê xwe jê guherî û çû bi lez xwe gihande darbestê û destê xwe avête kevîkekî wê û meşîya.

Ji dûr siwarek xuyabû, çelpeçelpa simên hespa wî di nava şilopeyê de ew bêdengîya wê sibehê şêlû dikir. Yekî çavê xwe hûrik kirin, birihên xwe bi ser wan de anîne xwarê û destekî xwe da ber enîya xwe û li wî siwarî nihêrî û got:

- bi xwedê ew hecî Zuhdî ye. Wa ye ew û xulamê xwe tên.

Siwar( Hecî Zuhdî yê Celalî yê bazirgan) gihişt û peya bû, xulamê wî yê ku di pêşiya wî d edimeşiya, alî wî kir ew ji ser hespê peya kir. Hecî Zuhdîyê ku kurkê wî nikarîbû zikê wî yê girover veşêre, rasterast berê xwe da wan kesên li dora gorê vehewîyayî û got:

- gelî cemaetê bibuhurin, ez taze bi karwanê ku ji Urmiye tê re gihiştim, min hinek şalên nû ji wir anîne. Dema daketim min nizanîbû çi mesele ye, ji ber ku kesekî bar deyne li bajêr nema bû min berê xwe da vir. rast ew çi hawar bû ji mala mele Qasim rehmetî kete guhê min!!.

Hecî Zuhdî, yê ku qutikê wî yê spî di bin kurk de xuya dikir bi çîlkên wê baranê re xal xalî bûbû. Axaftiana xwe li dû hev kir, peyv weke wê baranê ji devê wî dibarîyan û fersenda bersivê neda tu kesî, lê dengê korekî ji nav koma feqeyan hat, darê xwe du sê caran li erda şil xist û got:

- Xanî çûye rehmetê Xanî!!

Hecî Zuhdî qutikê xwe di bin kurk de hinekî rast kir , destê xwe danî ser zikê xwe û got:

- Wax wax wax!! Û we limêja cenaze kir?

Wî kesê kor, mîna ku qerfên xwe bike, peyvên xwe dirêj kirin û got:

- erê bavooooooooo, me nizanîbû tu li virî haaaaaaaaa, tu ji xêra nimêjê mehrûm bûyî hecîîîîî, lê başe te xwe gihande telqînê tacir beeeeeeeeeg.

Mirovê kor, bi wê bersiva xwe xwest zikê xwe bi hecî Zuhdîyê bazirgan bişo. Hinekan xwest bikenin lê dîtin ku va ye darbesta ku çend kesên naskirî xwe dane bin, gihişt nêzîka devê gorê.

Kesên ku li dora gorê xelek gerandibûn, neqebek di nav xwe de vekirin da ku termê Xanî yê bi kefenekî spî û zuwa pêçayî daxînin binê gorê. Hemû li wî kefenî ecêb man û barana pirsê, sêlav û lehî di xaçirêkên xeyalê hemûyan de herikandin. Mirovê rûnuxamtî pirsên di çavên wan de diherikîn xwendin, xwe avête binê gorê û got:

- heyran ecêb nemînin, ev welîyê xwedê ne ha!

Mîrza Sebrî yê ku hêla wî ya çepê di baranê de mabû jî dakete binê gorê, û herduyan bi hev re bangî kesên ku li jor bûn kirin:

- de ka cemaet ka. Termê rehmetî bidin me, sunneta pêximbere ku mirî bi lez werin definandin.

Çend mirovên li jor, term xistin ber hemêza xwe û daqûlî jêr bûn. Mîrza Sebrî û mirovê rûnuxamtî ew girtin û xistin wê çalika ku di dîwarê quble yê gorê de bi qasî du buhustan hatibû kolandin. Pişt re rêzeke ji keviran li dirêjîya term danîn û êdî Xanî bi kefenê xwe yê zuwa û hesretên xwe yên vêketî ji ber çavan winda bû.

Mîrza Sebrî yê ku bîna wî li jêra gorê teng bûbû xwest berî mirovê rûnuxamtî derkeve. Ji mele Ferîdê li qeraxa gorê re got:

- ka ezbenî destê te. Va me selîna seyda jî rast kir .

Mele Ferîd berê xwe guherî, hêsrên ku tev li çipikên baranê bûbûn dane alî û çend gavan dûr ket. Du mirovan bi destê herduyên di gorê de girtin û ew derxistin. Rûyê herduyan jî weke ku ji rêwîtiyeke pir dûr vegerîyabin nav heval û hogirên xwe, geş bûbû. Bêhemdî xwe, mirovê rûnuxamtî destên xwe di hev dan mîna ku ji tozekê daweşîne û got:

- elhemdulillah, qediya.

Û bi lez berê xwe da du kesên li dûr di taldeya dareke çinarê de rawestiyayî. Ew herdu kes xuyabûn ku ne ji wan memlektan in, qiyafeta wan ne mîna ya kesê li dora gora nûkolayî bû. yekî ji wan kurkekî simûran wergirtibû xwe û bi rûyê xwe yê kose li ezmanê ewravî dinêrî. Yê din sixmeyekî qedîfe û reş û kumekî lûleyî dirêj li serî, bi ken pêşwazîya mirovê rûnuxamtî dikirin.
Mîrza Sebrî awira razîbûnê di mirovê rûnuxamtî veda û hat xwe da tengala Bengînê dergevanê Mîr û jê pirsî:

- ma Mîr nehat!!
- Na, ew ne vala bû, wî ez di şûna xwe da hinartim.

Û bû xiştexihsta bêran û axa şil bi ser termê Xanî yê bi kefenekî spî û zuwa pêçayî de anîne xwarê.

***

**peşkên hibrê weke hêsrên jineke çav bi kil bûn**

Peyvên kesên ku li dora gorê kombûyî, tev li wê xiştexiştê dibûn û hev nedigirtin. Weke ku ew her yek ji xwe re dipeyive, guhê kesî ne li ser axaftina kesî bû. Wan jî niaznîbûn çi dibêjin, hema kî li kê rast diaht hevîrê pirseke şkeva li tenûra guhê wî dixist û dimeşîya. Di wê bêdengîya şil de, Bengînê dergevan yê ku taze gihiştibû, çavên xwe li mele Ismaîlê Bazîdî digerandin û li kê rast dihat pirsa wî dikir.
Ew li xwe hay nebûbû heta yekî bi dengekî hinekî bilind got:

- malava nizanim çi bi me hatiye!! Hişê me hemûyan gewşek bûye û em tevde îro gêjin û li dora hev dizîvirin. Ha vaye mele Ismaîl li pişt te ye û tu lê digerî Bengîn efendî!!

Bengîn li pişt xwe zîvirî, silavek da mele Ismaîl û bi lez çend kaxezên pêçayî xistin berîka wî û di guhê wî de kire pistepist. Mirovê rûnuxamtî yê ku bi lez ji hinda wan herdu mirovên biyanî vegerîya û mîrza Sebrî, herduyan jî dixwestin li axaftina wan guhdarî bikin, lê ji nişkê ve dengê melayekî ji wê navê hat û got:

- gelî cemaetê, de ka werin em dê telqîna seyda bidin.

Şêx Seyfeddîn cubbeyê xwe yê şîn hilmişt û heta ber newqa xwe ya qalind û stûr anî û li ber kêla serê Xanî rûnişt da ku dest bi telqînê bike.
Baranê jî axaftina xwe ya avî nizim kir, weke ku dixwest guhdarîya gotinên dawî yên ku dê zindî ji kesekî mirî re bibêjin, bike. Çipikên wê hêdî hêdî tarî dibûn, lê bala kesî nekişandin heta ku di nav vingevinga şêx Seyfeddînê Cubbeşîn re dengê Teymûrê meyxur, yê ku bi navê Teymûrê fasiq dihate naskirin, hat. Ew bi hêrs û tirs qêrîya:

- Wey bavo ev çi ye !! hibr dibare hibr!!

***

# Teymûrê fasiq

**Xanî name dinivîsand**

Gava ez qêrîyam û min got: hibr dibare! Ez ne serxweş bûm. Hefsarê hişê min di destê min de bû û min bîna hibrê jî, ji bîna xwêdana paxilên yarika xwe ya ermen bêtir nas dikir.

Kesên ku li dora gora Xanî kombûbûn û li telqîna şêx Seyfeddînê xwediyê cubbeyê şîn û dilê reş guhdarî dikirin, bi qêrîna min re li min nihêrîn û pişt re qijikên awirên xwe ber bi jor de firandin û kefên destên xwe mîna kewan dane ber çipikên ku di rengê hêsrên bi kila çavên jinên di şînekê de, têkelbûyî bûn.

Baran êdî hûr hûr û aram dibarîya. Pir bi nazikî dibarîya, weke ku ezman fatiheyê li ser ruhê seyda dixwîne, barana xunavî bi nermî û xemgîn dibarîya.

Lê hêj serxweşiyê celew ji dest min nerevandibû. Min dît ku rengê baranê reş e eynî weke hibrê ye, hibra ku di şûşeyekê de li ba Xanî gelek şevan min li ber ronîya çiraxan didît.

Seyda ji hibrê gelekî hez dikir. Pirrê caran şûşe dida ber kepûya min û digot: ka hela bîn bike!! Ma ji bîna wê meya ku tu dinoşî ne xweştir e!!

yek caran jî ku ez diçûme şevbuhêrka wî, min didît ew çawa xameyê di diwêta ku wî jê re digot: murekkebdank, dadike. Wî bi hemû hêza di pişikên xwe de hibra xwe bîn dikir û digot:

- ev ne hibr e Temo. Ev hêsrên dilekî suhtî û aware ye.

Şevekê ji destpêka şevên wê jana wî ya nenas ez li hucreyê li ba wî bûm. Ez nû ji dêra bakurî Bazîdê hatibûm û serê min ji vexwarinê bûbû sîtil. Wisa giran bûbû weke ku min çiyayê Qaf li ser serê xwe danîbe.

Mûmeke spî û stûr hucre ronî dikir û ew jî bi ser pelên xwe de xwar bûbû û tiştek dinivisî. Hibra şil ya ku li ser kaxetan diherikî û dibû gotin, di ronahiya mûmê de dibiriqî. Dema çav li min ket rûyê wî geş bû, xameya xwe ya ji zilê û serreş li kêleka xwe bi dilovanî ramedand û got:

- Tu bi xêr hatî Temo, kerem bike rûne.

Ez li rex wî rûniştim û min meya awirên xwe bi ser pelên wî yên weke giyanê wî spî de herikand. Diyar bû ku tiştekî pirr girîng dinivîse, lê min nizanîbû çi ye. Min pirsî:

- ezbenî dîsa tu xezelekê dinivîsînî?!

Kesereke kûr kişand û pişt re bêhna xwe berda. Zimanokê mûma vêketî bi henasa wî ya ku berda re dîlan kir, lê mûm venemirî. Sîya wî ya ku li ser dîwêr resim bûbû hinekî hejîya û bi xemgînî got:

- Teymûr ez nameyekê ji Mîr re dinivîsim.

Min hîn ew wisa xemgîn nedîtibû. Erê çawa ku derbasî ba wî bûm rûyê wî geş bû, min jî got qey ji ber wê mûmê ye, min tu carî mûm li hucreya wî nedîtibûn, wî her li ber ronîya çirayê dinivîsî û digot:

- Mûm para mîr û begleran e.

Erê, rûyê wî bêhneke kurt geş bû lê tavilê pêlên xemgînîyê ew rûyê zer dane ber xwe û min di wê ronîya wê mûma nû de karîbû çavên wî yên şil jî bibînim.

Wî pela xwe ya bi nêvî kiribû pêça, berê xwe da min û got:

- Temo, di ferhenaga we meyxuran de mirin çi ye!!

Vê pirsa weke aveke berfê, hefsarê hiş ji dest min berdan û min jî bêyî ku bifikirim got:

- mirin şiyarîya mezin e!
- û jiyan?
- Serxweşîyeke dirêj e.

Piçekî geşîya rûyê wî vegerîya û got:

- naxwe ez li ber kevîyên hişyarîyê me?!

Ez tê negihiştim ew çê li çi dike. Min, bi serê xwe yê ku giran bûbû girt û herdu cênîkên xwe firkandin. Wî dîsa bi xemgînî got:

- hinek bîna mirina xwe dikin, hinek jî bi tam û çêja wê dihesin. Hin jî mirinê bi çavan dibînin. Dengê mirinê diçe hinekên din û hin jî destê xwe dipelînin û zivrîya mirina xwe yan jî şayikî û hilûtiya mirinê hest dikin. Lê ez ………

bi qasî ku taseke ferfûrî tijî mey bibe bêdeng ma. Pişt re pela ku berî kêlîkekê pêça bû dîsa vekir û got:

- ez jî mirina xwe dinivîsim!

***

dostanîya min û seyda ji berî neh deh salan de dest pê kiribû. Nizanim di dema sultan Ehmed de bû yan jî destpêka serdema sultan Mistefa de bû. lê ez dizanim hîn wî Mem û Zîna xwe dinivîsand û carê dişande pey min û ez li ba xwe heta destê sibê dihiştim.

Berovajî xelqên Bazîdê û meşayix û sofî û mirîdên wê, wî guh dida min û yek caran jî dirav dixistin destê min û digot:

- xwedê te bibexşîne, ez dizanim meyxwerî ne muft û belaş e.

pirsên ku ji min dikirin, destpêkê ez şaş dihiştim. Pişt re dema min nas kir ew çi dinivîse, êdî kêfa min gelekî hat û her ku wî ez dawetî ba xwe dikirim min çend qedeh mey difirrandin hinavê xwe û diçûme nik wî.

Carekê pirsî û got:

- ka bêje min, mey çi tîne serê te.

Min texmîn kir ku ew dê şîret û pendan li min bike da ku dev ji meyê berdim, min jî nedixwest tiştekî wisa bibihîzim. Lê min dît ku ew ji dilê dil pirsa xwe dike, min gotê:

- Seyda! mey kilîta ziman e. ew dihêle ziman bêperwa bide cirîdê.
- Hîn bêtir zelal bike.
- Ku ez meyê dinoşim, qapax ji ser agirê di dilê min de radibe, perde diqetin û çi min dixwest bibêjim û nikarîbû, bê tirs dibêjim. Eger razeke veşarî jî li ba min hebe û dixwazim wê derbidim, mey çare ye..

Kêfa wî gelekî hat û got:

- a ez li vê digerîyam.

Mey bi xwe nayê famkirin ku mirov wê neçêje. Ew ne weke her tiştî ye. Dîsa jî min dixwest serxweşîyê jê re nêzîk bikim, min misalek anî û gotê:

- yek navê deryayê dibihîze, pişt re tê li ber peravan radiweste û deryayê dibîne, bi dû de dikeve nava avê û bi ava şor û bîna wê dihese, û dawî pêl wî didin ber xwe û ji hiş diçe. Meyxwerî û serxweşî jî wisa ye ezbenî.
- ev we ji tesewwufê birîye!!
- Na ezbenî na. Tesewwufê ev ji me birîye.

Berî ku ez ji ba wî derkevim, bi destê min girt û bi dizî got:

- Temo eger tu karibî çend qurt mey ji min re bîne.
- Seyda!!
- Na na, ne weke ku tu xeyal dikî! Lê ez dixwazim meyê tev li hibra ku pê Mem û Zînê dinivîsim bikim. Ez dixwazim derdê dilê xwe bi xeyaleke hişyar û hibreke serxweş binivîsim.

***

**Hibr jan e, lê tîr bûye**

Zivistaneke sar bû, berfa ku sal dwanzde meh li serê Gilîdaxê xuyadibû êdî Bazîd jî spî kiribû. Wî mêvanê spî di her malê de ciyê xwe xweş kiribû û karê xwe û mana çend mehan kiribû. Min jî di dawîya şevekê de ciyê xwe di hucreya seyda de xweş kir.

Dema ez derbasî nik wî bûm, weke hercarê bi rûyekî geş hate pêrgîna min û ez li rex xwe dame rûniştandin. Bîna hibrê ji bayê ku ji ber zendika wî ya rastê radibû dihat. Tilîyên wî reş bûbûn û diyar bû ku xweş bi Mem û Zîna xwe de çû bû.

Çend malikên ku tê de behsa Meyê kiribû xwendin. Gelekî xweşik hûnandibûn û weke yekî meyxur behsa meyê kiribû. Wî nivîsîbû ku divê Saqî bêdeng meyê pêşkêşî wî bike, bêyî dengê defê û sedayê qanûnê!! Ez kenîyam û min gotê:

- Seyda! meya bi dizî weke…

Ken û axaftina min, bi kenekî sivik rawestand û got:

- ez dizanim tu yê çi bibêjî!! Ez diazanim. Lê ev meya ku ez behsa wê dikim meya tesewwufê ye Teymûr. Meya rûhanî ye ne ji tirî ye! Ew mey ji libên dilan ku di destên xwedê de têne guvaştin peyda dibe.

Paşê murekkebdanka xwe vekir, bîn kir û nêzîkî pozê min jî kir û got:

- ka tu zanî bîna çi jê tê?

bîneke xweş bû, lê min nizanîbû bîna çi ye, wî mey û hibr tev li hev kiribû û çend malikên dîbaceyê pê nivîsîbûn, lê ew bîna çi bû, çi yê din jî tev li hibra xwe kiribû û dixwest çi pê binivîse min nizanîbû! Min li çavên wî yên ku di ronîya mûmê de kenokî xuyadikirin nihêrî. Wî matmayîna min fêm kir û got:

- min jan û hesretên xwe tev li vê hibrê kirine, ma te bîna şewatekê jê nekir?

Pişt re çend take mû ji murekkebdankê kişandin û bîn kir û bi keser got:

- hîn bîna miska wan salan jê tê, min ew li şûna tayên hevirmêşê ku xettat wan di murekkebdankên xwe de datînin da ku hibr nefeside, di nava hibrê de hiştine daku karibim evîna Mem û Zînê bijantir û rewantir birêsim.

***

wî bi xwe murekkeba xwe amade dikir û digot ku, hibra li çarşiyê tê firotin sexte ye. Bi demê re bêreng dibe û nivîs têk diçin. Û ji refika li ber serê xwe çend kitêbên bi çermê xezalên ku nêrgiz êmê wan bû qabkirî, dikişandin û yek ji wan şanî min dikir:

- binêre, ev Şêrîn û Xusrewa Nizamî ye, min ji bajarê Makuyê berî panzdeh salan kirrîbû. Niha çi jê xuyaye? Ji gotina: Ez penc genci Nizamî Gencewî pê ve nemaye. Nasix bi hibreke sexte dinivîsin da ku kitêbê bifiroşin, ne ji bo ku kitêb bimîne.

Û kevçiyek ariya sîsikên zeytûnan, yên ku di laliyeke sergirtî de hatibûn şewitandin, ji tûrikekî qedîfe derdixist û tev li hinek şîrêz dikir û tev dida, hinek av jî berdida navê da ku ron bibe û bi hêsanî were tevdan. Di ber re li min dinêrî û digot:

- yek caran li şûna avê ez hêsrên xwe jî tev lê dikim.

Hinekî radiwestiya , şûşeyek nêzîkî mûmê dikir heta ku tenîyê ew reş dikir. Bi kêreke biçûk ew tenî jî dixeritand û tev li wê murekkebê dikir û digot:

- ha wisa jî dê hibra min bêtir biçirisîne.

Bêhna xwe berdida, bêdeng dima, perwaneyên awirên wî di mûma geş de dişewitîn, pişt re serê xwe radikir û digot:

- Hibr jan e, lê tîr bûye.

***

## mirin jî nivîseke

şeva ku ez ji dêra bakurî Bazîdê hatibûm û serxweş çûbûm ba wî, min dikarîbû mirina ku bi murekkebeke nepenî li ser rûyê wî hatibû nivîsandin bixwenda. Di awirên wî de mirinê dîlan dikir.Wî bi xwe jî qala mirina xwe dikir û digot:

- ez mirina xwe dinivîsim.

Di gel serxweşîyê, min tê derxist ku tiştek heye seyda ji min vedişêre, min dizanîbû ku hinekan ew êşandine û rûhê wî yê mubarek azirandine, lê kî ne, û çima!! Min serê ta ji wê gaja tevlihev bi dest nedixist.

Min dikarîbû li ber wê ronîya xemgîn a mûma stûr rondikên wî jî bibînim bê çawa bi aramî diherikin û li ser tayên mûyên riya wî ya belek û sivik dişemitin.

Pela ku nameyek ji bo mîr tê de dinivîsand, dîsa pêça û bi kerb avête pişt xwe û got:

- hîç e!

gelo wî çê li wê nameyê dikir dema digot: ez mirina xwe dinivîsînim? Û çima wî nameya ji bo Mîr weke nivîsandina mirina xwe dihesiband? Dîwana mîr ji wî re vekirî bû bi gumana min, ma çi hewceyî nameyê bû? wî dikarîbû rasterast berê xwe bide dîwanê û li gel mîr rûne û bi kêfa xwe, ya dilê xwe jê re bibêje. Vê pirsê weke saqîyên meyxaneyê camên xeyalana di serê minî giran de digerandin. Niha jî piştî ku ew bi wî awayî mir, dîsa ev pirs di serê min de mîna meya di kûpekî de were çelqandin, difûre.

***

wê şevê Seyda çend caran rabû ser xwe û rûnişt, hinekî çû û hat û ji nişkêve bi dengekî gurandî got:

- murekkeba min dizîne.

Serxweşîya minî mabû jî bi dengê wî yê gurandî re hate gurandin û Emerê nuqsan ji nişkêve xwe li derî qeliband.

# Emerê xiznedar

Bi qêrîna Teymûrê gurcî re, min texmîn kir ku her kesî berê xwe da jor. Hinekan kire birebir û gotin: vî serxweşê han dîsa hiş winda kirîye û hatiye. Min jî weke ku korbûna xwe ji bîr kiribe serê xwe bi jor de bir. Min tiştek seh nekir, ez ji berê de bi salane ku di reşayîyeke weke hibrê de me, ma min dê çi bidîta? Koranî bi xwe reştirîn hibre ku xêzikên bi wê hatine nivîsîn tenê kor dikarin bixwînin.
Min nikarîbû wê rojê xêzên barana hibrê bidîtana, lê min kefa destê xwe da ber wê xunavîya ku hûrik hûrik dihate xwarê û çipikên ku bi ser de barîyan, bîn kirin. Rastî jî bîna hibrê ji wan dihat.
Min piştî korbûna xwe tenê du caran xwest ku bênahîya çavên min li wan vegere. Cara yekem roja ku ez ji Bedlîsê derketim. Piştî ez texnekî meşiyam, bêhemdî xwe li pişt xwe zîvirîm da awira dawî li bajarê xwe yê wêran û xopan bixînim. Dilê min hat ku felqe bibe û min mîna cewrikekî ku zarokin qedaker terîya wî jêbikin kire kûzekûz. Cara duyem jî roja binaxkirina Ehmedê Xanî bû. Min xwest çavên min vebûna û ew barana hibrê bidîta.
***

## dil, ku dibin çav

Sala ku ez hatim korkirin, mele Ilyasê bavê Ehmedê xanî nû wefat kiribû. Hîn rehmetîyê Mîr Muhemmedê Pûrbilalî mîrê Bazîdê û derdorên wê bû. Ez jî nû ji Bedlîsa şewitî hatibûm û min xwe gihandibû şîna wî. Dengê zarokekî tim li wan deran dihat, min carekê ji yekî pirsî ev dengê kê ye? Got: ev Ehmedê kurê mele Ilyas e. ji wê rojê de min Ehmed nas kir. Ji ber ku ez hafizquran bûm, birayê wî mele Qasim xwendina wî ya quranê û jiberkirina wê siparte min. Ew gelekî zîrek bû û di heftiyekê de dikarîbû sûretên dirêj ezber bikirana. Ew ne weke hemsalên xwe bû. Bêdeng , aram û alîkar bû. Her dawîya derseke quranê bi destê min digirt û ez ber bi derîyê camîyê de dibirim û ez digihandim devera ku min dixwest. Min gelekî jê hez dikir, û her carê Aqçeyek yan jî misteke nokên şorkirî û biraştî dixiste kulma destên wî yên weke behîvterkan.

Xuyabû wî gelekî bala xwe dabû tevgera min ya ku ne weke tevgera korekî ji zikmakî de bû, rojekê piştî ku min sûretê Tebarek çend carî jê re xwendibû û wî jî ji ber dikir, pirsî:

- Apê Emer tu çima kor bûyî!

Wê pirsa wî bi şewateke kambaxtir ji ya sîxên sincirî yên ku di çavên min ra kirin, dilê min kewand. Min nedixwst ez bersiva wî bidim, korbûna min û hoyên wê ji têgihiştina wî mezintir bûn, yan jî min wisa texmîn dikir. Lê li ber rika wî ez bêgav bûm ku çîrokê jê re bibêjim.

***

## sotina şaberrûyên Bedlîsê

Payîz bû, weke niha sar û serma bû. şaberrûyên ku ji darên xwe diweşîyan, mîna jûjiyên serî di çermê bi stirî de li binê daran bela wela bûbûn. Dûyê ku bi ser kela Bedlîsê ketibû, êdî roja ku li alî Mutkîyê diçû ava veşartibû. Wê êvarê ez di mal de bûm û min ji xwe re çend şaberrû li ser menqelekê dibiraştin û di pencereyê re li pelên zer yên dara şaberrûyan ya di nîvê hewşa me de dinêrî.

Mîr Evdalxan û malbata xwe ji bajêr bazdabûn û kemera tirsê li newqa her kesî gerîya bû.

Ez bi xwe ne ji tirsan re li mal mabûm, lê min nema dizanîbû berê xwe bidim ku? Melik Ehmed paşa walîyê Bexdê hawîrdora bajêr dorpêç kiribû û Qesra Evdalxan talan dikir. Dilê min ji şaberrûyan bêtir dihate biraştin wê êvara rû bitenî û dû û xayintîya mîrekên kurmancan. Kitêbên mîr hemû ji refikan derxistibûn û li pişta qantiran bar kiribûn û biribûn. Lê min Şerefnameya ku Şerefxan Bi xetta destê xwe navê bavê Evdalxan li ser pela pêşîn danîbû, berî du sê rojan anîbû malê. Di qesrê de tiştek li ser tiştekî nemabû lê dîsa jî dilê melik Ehmed paşa hênik nebûbû û hêrsa wî daneketibû. Ew li xezîneya Evdalxan ya herî mezin digerîya.

Ê min fersenda bazdana ji Bedlîsê bi dest min neketibû. Min jî wisa texmîn dikir ku dê kesek nêzîkî min nebe, erê ez jî Rojikî me lê ne ji malbata mîr im û wezîfeya min tenê Xiznedarî bû. ez xiznedarê mîr bûm û kilîtên defîneyên wî di destên min de bûn. Lê mîr ne ew dîn bû ku defîne û zêr û gewherên xwe li pey xwe bihêle. Gelek caran mal ji rih şêrîntir e.

Min dest avête şaberrûyekê ku êdî teqîya bû û hatim ku biqeşêrim. Min hîn pif dikirê da ku hinekî sar bibe qerebalixek kete hewşê û dîtina min dît çend mêrên bi kumên hesinî û zirx û şûr weke bahozekê xwe li hundir dan. Yekî ji wan ku kumê wî bi perekî sor bû bi kerb pirsî:

- tu Emerê Xiznedarî?
- Erê, xêr e?
- Paşa te dixwaze!

Min şaberrûya ku dikira biqeşarta dîsa avête nava menqelê û rabûme ser xwe ku cilên xwe biguherim. Eskerekî bi çeplê min girt û bi zirzî got:

- na, ne hewce ye.

û ji xafil de du kesan bi milên min girtin û ez kişkişandim û birim koşka ku Melik Ehmed tê de rûniştî bû.

xulamê wî Nezmîyê Çerkez, ku berê xulamê mîr Evdal jî bû, jê re şaberrûyên biraştî diqeşartin û dixistin sênîyeke zîvîn ya li ber wî. Min ew sênî jî berê li ber mîr Evdalxan dîtibû. Mewîjên ku ji hêla Mêrdînê dihatin tev li qinnên gwîzan dikirin û di şevbuhêrkên zivistanî de dixwarin. Çavên min di sênîkê de man û xeyalê min çû wan rojên xweş yên ku tê de xiznedarê mîr bûm.

Mîr gelekî bi min ewle bû. Tevî ku ez bîst û du sê salî bûm jî kilîtên sendoqa gewherên xwe yên herî nirxdar da bû destê min. Weke ku ew bi min bawer bû, bi kurê xwe Diyadîn ne bawer bû. Di civatên xwe yên xas de her pesnê min dida û digot:

- di Rojikîyên belbasî de sê kes mîna Emer nînin, çavên wî çavên bazên çiyayên Şerefdînê ne! dikare dizekî di tewafa li dora keebeyê de nas bike.

Bedlîs di dewrana wî de bûbû bihişta dunyayê, destê mirov jê nedibû. Heta yekî ku ji bo du rojan bi mêvandarî bihata wir, heftiyekê bêtir dima. Xanên wê erzan bûn, ji xwe piranîya xelqê yên ku hesp bi wan re nebûn nediçûn xanan, ew diçûne xanqah û camîyên ku ji dikana jî bêtir bûn. Şev nediçû ku deh kes hema li camîya Şerefîye bi tenê nebûna mêvan. Ji xwe feqeyên ku ji Melazgirê heta Xinûsê û heta Mûş û Diyarbekrê dihatin xwendinê, medreseyên Xetîbiye û Idrîsiye û Ixalsîye dagirtibûn, xwarin vexwarin û razana wan jî hemû li ser hesabê mîr Evdalxan bû. li nêzîka Gokmeydanî jî tekyexaneyek bi navê Şemsîye hebû dewrêşên wan welatan hemû tê de bi cih dibûn.

Hemamên Bedlîsê jî di temamê dunyayê de deng dabûn: heta rojekê, kalkê min digot, sultanekî osmanyian hate Bedlîs û xwe di hemameke wê de şûşt û bi keser got:

- ma dê dunya xerabûba ku hemameke wisa li Stenbola min jî hebûya!

***

## çav mîna du lib tirî têne perçiqandin

Melik Ehmed paşa bala xwe da min ku awirên min di sênîkê de ne, bi alîyekî devê xwe kenîya û got:

- ev sênîya mîr bû ne!!
- Erê.
- Hîn jî gelek firaxên wî yên bi qîmet hebûn ne!!
- Erê.
- Li ku ne?

Min bi wê pirsa wî re nas kir çima wî şandiye dû min. Ew hîn têr talan nebûbû, kitêbaxaneya mîr hemû li qantiran bar kir, û berê malê talankirî da Bexdayê. Tiştê ku destê wî gihayê ji mal û milkê mîr hemû xiste sendoqan û zêrê ku Evdalxan li pê xwe hiştibû hemû hiland û xiste qutîkin biçûk. Û çavên wî hîn jî têr nebûbûn. Dema min gote wî ez nizanim, hêrs bû, ji ser kursîya xwe, ne kursiya wî bêbavî bû lê wisa tê gotin, rabû û bi dengekî ji pêtîyên di bin şaberrûyan de sincirîtir got:

- bibêje li ku ne berî termê te bi sêpîyekê ve li ber derê Kelê were daliqandin yan serê te li ser rimekê deynim yan jî ku ji te re xweştir be xazoqeke baş li gel me heye!!.

Ez neditirsiyam, lê bi rastî jî min nizanîbû xizneyên mîr li ku ne. Wî gelek bi xwe re biribûn, hinek jî li deverin nenas de binerd kiribûn ku haya wî tenê jê hebû.

Hîn min devê xwe tijî dikir ku sond bixum ez nizanim xizne di ku de ne, Paşe çav da leşkerekî ji yên ku bi milê min girtibûn, hema min dît milê min berda û kulmek di devê min de lêxist û pê re diranên min yên pêşîyê şikandin û xwîna sor ji pidûyên min û lêva nîvçiriyayî herikî.

- û niha jî tu nizanî?!

Melik Ehmed dîsa bi xişim pirsî û berdewam kir:

- ne hûn herçî Rojikî ne dibêjin ku, her kevirekî kela Bedlîsê serê mêrekî we tê de çûye!! îşev ez kevirekî din li sûrên kelê zêde dikim!

Ez gerîyam û negerîyam min tiştek peyda nekir, min dixwest hema şerbikekekî tijî zêr bibînim da ku ruhê xwe pê bikirim lê min nedît. Paşe jî bêhêvî bû û ji xulamekî xwe re got:

- zû du bistan li ser êgir sor bike.

Ku behsa bistan kir, ez tê gihiştim ku niyeteke xerab li ber wî heye, min bi niyaz got:

- Gunehê min çi ye!!

Di çavên wî de birçîbûna zêran ji zêrên ber ronîya agirekî dadayî bêtir çirisîn û got:

- Ma tu yê çi bikî ji herdu çavên xwe yên ku nikarin xizneyên Evdalxan bibînin? Bênahî ji wan re heram e.

Û yekî zendbadayî herdu bistên sorbûyî rakirin û ber bi min ve hat, keftelefta min hîç bû, û carewara minî ku şeva Bedlîsê ya ku weke şaberrûyeke jibîrkirî li ser êgir dişewitî diçirand jî hîç bû.

Dema ku herdu bist nêzîkî çavên min bûn, min êdî carewara xwe rawestand û bi bêdengîyeke layiqî mêrekî Rojikîyan pêşwazîya wê qederê kir.

Çavên min her vekirî man û min hey li şaberrûyên ku diahtin biraştin dinêrî, lê ji nişkê ve herdu bistên sor di bîbîkên çavên min de kirin çizînî û min nema ber xwe dît, weke ku ez têkevim goleke ji hibra reş her tişt winda bû. Bi jana çavrijandinê re ez pê hesiyam ku çavên min weke du libên tirî yên perçiqî bi ser rûyê min de herikîn.

Çiqasî bi min zor bû ku rûyê dawî yên ku min dîtin, rûyê wan zaliman bû.

***

**Şerefname di dawa Ehmedê Xanî de**

ku min serpêhatiya korbûna xwe ji suxteyê xwe Ehmed re got bêdeng ma, piştî kêlîkekê ez hembêz kirim û şûna herdu çavên min yên rijiyayî ramûsandin. Min destê xwe di ser serê wî re bir û gotê:

- Xeman nexwe birazê, tu çavê minî!

Ew rastî bûbû çavê min, misînê min li ber min datanî, sicadeya min radixist û berê min dida quble û ku siwak yan tizbiya min ji destê min biketana dixiste destê min.

Her ku berê min dikete quble, Bedlîs diahte bîra min û ez bêdeng digiriyam. Hemamên wê, sûka wê, çiyayê Nemrûd, çem û baxên wê, camî û medreseyên wê û kela wê ya bilind û asê dihatin ber çavên min û min xwe winda dikir û nema zanîbû çend riket nimêj kirine.

Heta Ehmed bû feqeyekî deh dwazde salî, wî quran ji ber kiribû. Êdî min dest bi fêrkirina wî ya zimanê farisî kir. Me bi Gulistana Seedî dest pêkir. Wî dixwend û min jê re mane dikir. Dema pê hesiyam ku ew êdî hinekî mezin bûye û dê ji tevgera dunyayê fam bike, min serpêhatiyên kurmancan jî jê re gotin. Min jê re behsa Bedlîs û tarîxa wê kir, behsa rojikîyan û şerên wan yên navxweyî dikir, parçebûna wan û nakokîyên qewalîsî û belbasîyan, xayintîya mîr û mezinên kurmancan, nelihevkirina wan, min jê re behsa rojên berê kirin ku, çawa rojikî û kurmancên din li ber pêlên Aqqoyunlu û Qereqoyunluyan li bin guhên hev diketin. Min behsa Şukrî, şairê bedlîsî jî kir, ku çawa bi kurmancî dinivîsî û kesî guh nedayê, pişt re bi farisî û tirkî nivîsî heta bû yek ji kesên hindik ku di civata sultan Selîm de cihekî wî yê taybet hebû û bi qasî giranîya kitêba xwe Selîmname, zêr ji sultan wergirt.

Şerê eceman û romîyan ku her car li Kurdistanê diqewimî û sinceqbegî û beglerbegî mecbûr bûn ku her carê êzingan bihavêjin nava agirê şerê wan yê ku bi zeyta mezheban geş dibû û bi pifa zêrên ku ji rebenan dicivandin gurgur dikir, gelekî bala wî dikişand. Carekê, berî ku here feqetiya xwe li Cizîra Botan bike û icazeyê wergire, ji min pirsî:

- ma qey kesek di nav kurmancan de nebû ku mîna sultanekî romîyan, yan jî şahekî eceman van eşîr û êlan bide ser hev û dewleteke mezin ava bike?

Pirsa wî giran bû, lê min nexwest wî bê bersiv bihêlim. Min hedîsa pêximber ya ku dibêje: xwedê vî milletî negihîne hev, jê re got û beyan kir ku ev qedera kurmancan e. lê bi bersiva min razî nebû, dengê wî yê ter lerizî û got:

- ne romîyên henefî, ne jî ecemên Qizilbaş û Rafizî ji me misilman tirin, çima nifir li wan nebûye!! Na na , pêximber tiştekî wisa negotîye, ne di sehîhan de , ne jî di

hedîsên ku bawerî bi wan nabe de ev yek heye. Derdekî din heye ku me nagihîne hev.

Wê çaxê min rabû kitêba şerefnameyê, ji qewlikekî hevrêşim û zerkeş derxist, û da destê wî û gotê:

- Ehmed! Ev kitêba li mala mîr Evdal bû, binêre çermê wê jî çermê xezalê ye, xezaleke ku mîr bi xwe ew li nêzîkî çiyayê Nemrûdê xistibû fetraka xwe, bixwîne tu yê hin cewaban tê de bibînî.

Berî ku Melik Ehmed paşa û leşkerên xwe têkevin kelê, mîr Evdal kilîta kitêbaxaneya xwe jî dabû min û gotibû:

- Emer efendî! Ez nikarim kitêban jî bi xwe re bibim, bawer nakim kurê min Diyadîn jî guh bide wan, hema tu karibî wana bibe camîya Hacîbegîyê û li wir veşêre, eger cî têrê nekir her hinek kitêb li camîyekê deyne, yan jî li suxte û feqî û melayên bajêr belav bike, hema bila nekevin destên wî kînewer û nemerdî..

Min nikarîbû wan sedê kitêban bi cih bikim, min hema kitêbên ku destên min gihanê birin û yek ji wan Şerfnameya apê mîr Evdal bû. Şerefxanê apê Evdalxan bi xwe mora xwe li quncikê jêrîn di sehîfeya pêşîyê de danîbû û bi erebî ew weke hediye ji birayê xwe bavê Evdalxan re nivîsî bû: *ila exî elecell.*

Di şevên dirêj yên zivistanên Bazîdê de, Xanî şerefname dixwend û min jê re deverên ku ew tê nedigihişt zelal dikirin. Farisîya wî êdî xurt bûbû, lê navên gelek kes û cihên ku di kitêba Şerefxan de derbas dibûn nas nedikir û pirsa wan ji min dikir. Tiştê ku bala wî kişandibû perçebûna kurmancan û nelihevkirina serekên wan bû, dubendî û hevrikîya wan bû, xwe avêtina wan ya bin sîya romî û eceman bû. Bêdewletîya wan bû.

Pirsên ku wî û hevalê wî feqe Ismayîl ku bi çend salan ji wî biçûktir bû ji min dikirin, di tirafa hişê min de jî berrûyên pirsan diteqandin, ez jî li wan tiştan hay dibûm weke ku ez hîç di wan de nefikirîbim. Ku wî ji min nepirsîbûya: çima Şerfename bi farisî ye? Ez qet lê hay nedibûm û min dê ev pirs tu carî ji xwe nekiribûya.

***

## Dibim dengbêj

Dema wî destana Mem û Zînê dinivîsî ez ne li Bazîdê bûm. Axayekî celalîyan li Diyadînê ez dawetî ba xwe kiribûm û ji bo çend salan li wir mêvan bûm. Di dîwana wî de bûbûm dengbêjê ewwil ku bêyî min çiraxên civata xwe geş nedikirin.

Min destana Memê Alan û kilamên pêlewan û dilawerên şerê qizilbaş û romîyan, husênî û êzdiyan, aqqoyunlu û qereqoyunluyan, û evîndarî û işqên têkçûyî yên ereb û eceman heta destê sibê digotin. Koranîyê tenûra hafizeya min dadabû û min jî di wî agirê nepenî de her şev zengeloka xwe û guhên vexwendîyên axayê celalî sîqal dikirin. Dengê minî xweş ez kiribûm dengbêj. Erê min li Bedlîsê tu dengbêjî nekir û tenê min di nava malbata xwe de yek kilam digotin, lê korbûnê bi emrê xwedê dengê min zelaltir kir weke ku xwedê teala li şûna wan çavên rijandî bi wî dengî ez xelat kirim. Kesî êdî di dengbêjiyê de ji bilî Mîrxanê Ormewî rehmetiyê bavê Dostoyê dengbêj zora min nedibir.

Min bi xwe bêtir dixwest dersên quranê bidim, him xêr û sewaba min tê de hebû, û him jî dilê min pê rihettir dibû. Lê wî axayê Celalî zor li min kir û got:

- ev dengê te yê xweş ji bo beytên kurmancan bi qabiliyyettire!!

Salên min yên wir zû derbas bûn. Dawîya buharekê, koçer çûbûn zozanan û bîna toraqê heta Îdirê diçû û piştî ku min dît êdî sûka min li cem wî axayî şikest û êdî Mîrxanê dengbêj cilikê ji bin nigê min dikişîne, xasma carekê di civatê de dengê yekî hate min digot: ev Emerê kor jî kodika xwe ya vala li ya Mîrxan a tijî dide, min kutekê xwe rakir û xatir ji navê Emerê dengbêj û xelqên Diyadînê xwest û dîsa li Bazîdê û li navê Emerê hafizquran vegerîyam.

Wê salê hîn sofî Mehdîyê bavê Selahhedînê sehhaf neçûbû rehmetê. Dema rêberê min ez gihandim bajêr, ji min re got:

- xalê Emer va em li Bazîdê ne, de îca bêje ez te bibim mala kê?!

Min jî nizanîbû ez berê xwe bidim kê. Xanî di bala min de bû, êdî ew bûbû xwedî camî û medreseya wî ûfeqeyên wî jî hebû. Hîn gotina min di devê min de û dikim bibêjim min bibe ba Ehmedê Xanî, dengekî nerm û henûn di nav hîrehîra hespekî ku dihate nalkirin re kete guhê min:

- waaaaaa, ev Emer e lo!!
- Sofî Mehdî tu yî!!
- Ka wî bîne, ka wî bîne, bi quran min bêrîya wî kiriye.

Çawa rêberê min bi destê min girt û ez derbasî dikana wî kirim, bîna hibrê û şîrêzê fûrîya, bîneke xweş bû ku sûka li nêzîkî Gökmeydanî dema hîn ez feqe bûm û min li tekiyeya Şemsiye dixwend anî bîra min. Her rojên pêncşeman piştî nîvro bi hevalên xwe re diçûme dikanên sehhafan li bakurî meydanê û me li wir kitêbên ku wan sehhafan ew bi qab û cild dikirin û kaxezên wan sîqal û şîrêz dikirin didîtin. Yekcaran dilê sehhafên bedlîsî bi me dişewitî, dizanîbûn ku em feqe ne û dilê me dibije kitêban lê nikarin bikirin, her yekî ji me kitêbeke neqabkirî didane me û ji me re digotin: hema pelên wan rêz bikin û li dû hev deynin, bi hev ve biçespînin û di ber re jî ji xwe re bixwînin û paşê li me vegerînin.

***

sofî Mehdîyê sehhaf bala xwe dabû min ku çawa noqî behra xeyalan bûme û dikna wî bêhn dikim, bi destê min girt û dame rûniştandin. Min bêhna xwe berda û got:

- sofî Mehdî ser xêrê be, tu kitabeke nû cild dikî?

Ew kenîya, aveke sar da destê min û got:

- mirovên kor bi nûra xwedê dibînin, ma te çawa zanîbû ez sofî Mehdî me, û te çawa zanîbû ku kitabeke nû cild dikim Emer?.
- Ma ne te bi xwe got malava! Ez bi nûra xwedê teala dibînim û pozê min jî bîna hibrê û kaxezên şîrêzkirî di nav hezarê bînan de nas dike.

Piştî demeke kurt ji ken û axaftinê, min jê rica kir ku min bişîne ba Ehmedê Xanî, lê wî bi destê min girt û got:

- tu bîna kitêbên nû nesixkirî û nû qabkirî jî nas dikî?
- Erê çawa, eger kaxez semerqendî bin bîna gecê ji wan tê, lê ku bexdadî bin bîna xurman jê tê.

Kenîya û got:

- rast e.

pişt re bang kir:

- Selaheddîn kurê min, ka wê kitêba han bîne hela.
- Wey!! selaheddîn jî li vir e.
- erê bavo, ma wê li ku be , ew jî şopa min û kalkê xwe diajo, dê ew jî bibe sehhaf weke me.

Û kitêbeke stûr xiste nav destê min û pirsî:

- de ka vê bîn bike.

Ji bîna kitêbê, ji çermê wê yê nerm û sehîfeyên wê yên hîn bîna qûmê û hibrê ji wan dihat, min zanîbû ku ew nû nesix bûye. Min pişikên xwe ji hilma wê ya xweş dagirtin û got:

- bîna du dilên şewitî jê tê!!
- weylaaaaaaa! Bi serê kurê min raste tu bi nûra xwedê teala dibînî. Ev dîwana Ehmedê Xanî ye, Mem û Zîn e!! min duhî nesixkirina wê qedand. Pirr baş nivîsîye.

Pişt re hinekî dengê xwe daxist û mîna yekî ku razekê kifş dike got:

- lê tê de teeruzî mîr bûye Emer.

Û dîsa bû hîrehîra hespê ku dihate nalkirin

***

**şeva ku murekkeba Xanî dizîn**

êvara ku min bêhna Teymûrê gurcî yê ku bazîdîyan jê re Teymûrê fasiq digotin, li ba Ehmedê xanî kir. Min pêjna janeke nenas jî di dilê Xanî de kir. Xemên dilê wî dihatin bihîstin û ji awayê axaftina wî xuyabû ku êdî erd gelekî lê teng bûye.

Min bîna meya ku Teymûr vexwaribû jî kir, lê min xwe ji wî alî nekir û li devera ku ji min re gotin rûne, li ser postê berxekî rûniştim.

Teymûrê fasiq weke dînan pirseke bêhûde ji min kir û got: apê Emer ma te hibra seyda nedîtiye!!!

Xanî kenîya, kenekî ku min digot niha dê gola Bûlaniqa Xinûsê ji ber biçelqe, kir. Lê dema min got:

- erê min dîtiye.

Kenê xwe rawestand û mîna yekî ku li ber xwe bikeve bi dengekî xemgîn got:

- şûşeyeke mina hibrê hebû ….

Lê min nehişt ew cumleya xwe bibe dawîyê, min gotê:

- ê ku kulîlkên xeyalê te dizîne!! Hibra ku te pê ew kulîlk xwe avdidan jî dizîye.

***

## divê vegerim, bese

niha dîsa li Bedlîsê şaberrû ji daran diweşin. Mîna jûjiyan li binî kom dibin û zarok tên û wan qalikên bi stirî radikin û şaberrûyên cêwî jê derdixin û dibirêjin û kakilan dixun. Ez jî divê êdî vegerim. Bese. Divê li Bedlîsê vegerim û careke din hewa ku ji hêla çiyayê Nemrûdê tê, bîn bikim. Ku ez bi qîm û reza xwe neçim, wê ev tacirê destdirêj û bêîman heccî Zuhdî min bi zorê biqewirîne. Rehmê li kalbûna min nake. Ez vegerim û di gazek axa Bedlîsê de werim definandin, qenctire ku li vir bimirim, kurmî bibim û kes bi min nehese.

# Şengê

Roja ku bavê min ji Makuyê vegeriya û got: Min tu dayî mêr! Rojeke reş bû. Ji hibra ku şopa xwe di sertilî û binê neynûkên min de hiştibû reştir bû. Lê min rebena xwedê dê çi bikira? Her tişt safî kiribû û qelenê min jî stendibû. Wî ez bi eyarên pez yê debaxkirî re firotibûm û kenê wî heta ber guhên wî yên refikî diçû.
Ji wî we bû ku tilî û serenguştên min ji tenîya binê sêlê reş bûne. Wî hîç nizanîbû ku min murekkeb ji delalîyê dilê xwe Ehmed re amade dikir.
Rehmetî nameyek bi suxteyekî xwe re şandibû û xwestibû ku ez bi destê xwe hinek murekkeb jê re saz bikim. Ew mektûba wî tim di ber benda heyderî ya ku li serê min gerandî de bû. Wî tê de gotibû ku dê kitêbeke evîndarîyê binivîsîne û dilê wî heye bi hibra ku henasên min tev lê bûbe, çîroka evînê rêz bike. Min jî yeka wî nekir du û dest pê kir arîya sîsikên zeytûnan, ku min ew di kûpikekî devgirtî de li ser agirekî aram şewitandibûn, tev li şîrêza erebî kir. Çend rojan di hawinê sifir de kutand. Berî ku murekkebê berdim şûşeyê, min ew rojekê tewaw li ber tavika rojê danî. Hin tayên hevirmêş û çend mû ji biskên xwe xistin binê şûşeyê û murekkeba reş berda ser û serpoş kir. Digotin ku hevirmêş nahêle murekkeb zû bi zû zuwa bibe. Ez vê yekê ji keçikên Bazîdê fêr bûbûm. Hin ji wan dil diketin feqeyên xort û ji wan re murekkeb hazir dikirin da ku dersên xwe pê binivîsin. Wan digot ku meşqên bi hibra keçikan werin nivîsandin, tu carî ji bîra feqeyan naçin. Feqeyan jî her yekî xwe bi murekkeba xwe paye dikir û dida ber pozê hevalê xwe û weha ji hev re digotin:

- hmmmm. Bîna buhuştê ye.
- Aax. Bîna memikan jê tê.

- Oox çi xweşe. Tev li miska porê yarê bûye.

***

## Stirîyên di dil de

Ku bavê min ew mizgîna reş da min, min destên xwe şûştin û berê xwe da odeya ku şûşeya hibrê tê de bû û girîyam. Min careke din serpoş rakir û rondikên çavên xwe jî tev lê kirin. Êdî dê ew tucarî zuwa nebûya û ji bilî çîrokeke xemgîn dê pê nehatibûya nivîsandin.
Min bi eynî wî suxteyî re şûşeya murekkebê şand û ji suxte re got ku ji seydayê xwe re bibêje: Şengê dane mêr.
Li alîyê wî çi bû , çi qewimî ez nizanim. Lê li alîyê min mirina min hate ber çavê min. bavê minî bazirgan qet tiştek li ser wî kesê ku dê bibûya mêrê min nedigot. Tenê behsa karwansera û xan û mal û debaxxane û milkên wî dikir. Behsa sê jinên wî û şêstsalîya wî ji min re nedikir wî nedigot ku Xoce Ellahqulî ji nav eyaran û bîna genî dernakeve.
Heftiya ku diviyabû ez tê de xwe ji bûkaniyê re amade bikim û hinek rihel û cihêz ji wê bûkanîya xwe ya bi zorê û ji nişkê ve re bikirim, heftiyek di cehennemê de bû. ez dimeşîyam lê mîna ku pê li derzîyên sincirî û pêtîyan bikim. Min nan dixwar, parî di ber min re nediçûn. Ez li sûka Bazîdê li cihazê bûkanîyê digerîyam, kil û kildan û kilçîv. Henne ya erebî û hibrîyên Mûsilê, mirêkên Helebê, solên Mûşê û qumaşê esfehanî. Û bazin û gerdenî û netrik û guharên zêr. Ku min destê xwe diavête kîjan qumaşî, li ber çavên min dibû kefen! Sendoqa bûkanîyê bû darbest û gulava ku min ji etar û hekîmê ermenî Zuhrab kirrîbû, bûbû bîna ku berî definandinê bi ser termê mirîyan de direşînin.
Min dixwest ku ev tiştên dicirin xewn û kabûs bin, xeyalên betal bin. Min hêvî dikir ku weke di efsane û çîrok û beytên me kurmancan de , delalîyê dilê min Ehmed li ser hespa boz were, bi çeplê min bigre û min li pişt xwe siwar bike û bi du zixtan re hespa wî xwe bigihîne welatekî dûr, ku ne destê bavê min, ne yên Xoce Ellahqulî û ne jî destê çi bazirganî negihin wir.
Lê rastî bû, rastîyeke ji tenîyê reştir û ji zilindarê tehltir û ji derzîyan tûjtir bû. Peyalek jehremar bû min vexwar. Çalek ji rêxê bû bavê min ez gêr kirimê û tê werkirim. Tenûreke sincirî bû ez tê de rûniştim û birijîm.

***

## Daweta min

Berf bû. bi qasî ku wê zivistanê berf spî bû, bextê min rebena xwedê jî reş bû. Li ser mehîneke qemer, berê min bi berbûk û xêlê ku hatibû min ji mala bavê min biguhezin re, li mala mêrê min Xoce Ellahqulîyê Makuyî bû. Bavê min jî heta nîvê rê bi me re rawestiya . Wî gotibû ku ew dê min bi xwe re bibe Makuyê, lê dema ku bihîst xelq çêrî vê meselê dibin û dibêjin ku ev ne ji adetên kurmancane wî raya xwe guherî. Ew bi xwe wî dixwest here ticareta xwe bike lê firotina min bi pûl û tûmen û diravên ku ji wê bazara cesedê min qezenc kirin têra wî ya du salan dikir.
Jinên ku li ber çavên min mîna pîrebokan dixewinîn, stranên mirina minî di kirasê toy û dawet û şahîyê de distiran.
Wan bi azerî û farisî distiran û ez jî bi kurmancî digirîyam!!
Sorika ku rûyê minî zerhimî poşandibû, perf jî li ber çavên min sor dikir. Te digot qey ew berfa spî û sar bi xwînê hatiye stran!! Ez ditirsîyam. Min dizanîbû berê min li qulegurê ye. Min dizanîbû dê min weke berxeke şîr bihavêjin ber qîlên tûjkirî yên wî gurê ku navê wî Xoce Ellahqulî ye, ew gurê ku dê sêzdeh salên girover bibe mêrê min û mêvanê sing û berê min. Min dizanîbû ku êdî delalîyê dilê min Ehmed dê bi ser pelikên xwe de di zikê şevan de xwar bibe û bi hêsrên dilê xwe agirê dûrîya min vemirîne. Min dizanîbû ku êdî dilê min jî ji qurm de tê hilkişandin û weke parîyek goşt dihavêjin ber segekî har.

Lê li min por kurrê, li min çirakuştiyê û li min rebena xwedê, dê min çi bikira wê demê!! Tenê min dikarîbû hêsir bibarandana. Ji ber derê malê ku ez li wê mehîna qemer siwarkirim û heta ber derê mala mêrê min Xoce Ellahqulî ku ez ji mehînê peya kirim herikîna hêsirên min nerawestîya!
Stranên ku ji wê berfa li erdê paldayî sartir bûn, mîna dîlokên mirina min bûn. Xwezî rastî jî wê rojê darbesta min ji ber derê mala bavê min derketibûya û ne sendoqa bûkanîya min ya ku li ser pişta hêstirekê kirin û bi dû mehîna min de bi wî kerwanî re meşandin.
***

## Ez jina Xoce Ellahqulîyê debbaxker im

toy û daweta ku ji min re li dar ketibû, weke qiaymetê bû. kesek li Makuyê û derdora wê nema bû û nehatibû. Şemateyek nayê pesindan ku hişt bi rastî jî ez hinekî derdên xwe ji bîr bikim û bi wan kesên ku lotik didan bibilim. Şev hêdî hêdî tarî dibû û rûyê spî yê berfê vedişart. Êdî dawetî belav bûn û her yek çû mala xwe.
Mehra min û Xoce Ellahqulîyê nebxêr hatibû birrîn, ez êdî di şerîeta xwedê û pêximber de bûbûm jina wî û diviyabû ku çi ji min were xwestin bikim. Lê tiştê ji min hate xwestin wê şevê ………..
Zimanê min nagere bibêjim, ji wê şevê de ne tenê bedena min lewitî, rûhê min, giyanê min û jîyê minî mayî jî hemî lewitî.
Dema ew hat û got: Jinê derpiyê xwe deyne, min xurt bi doxîna xwe girtibû û xwe li ser nivîna ku ji min re amade bûbû weke marekî kokel kiribû. Wî ew yeka min weke şerma bûkan hesibandibû û nizanîbû ku ez ji wî nefret dikim û mirina xwe ji nêzîkbûna wî ya ji laşê xwe re, çêtir dibînim û naxwazim qitika qîzanîya xwe li ser berfa şerşefa wî ya spî bigurêm.
Ber bi min ve hat û diarnên wî yên zer di bin simêlên wî yên spî û rûnkirî de qîç bûbûn mîna qîlên gurekî xuya kirin. Bîna wî berî wî dihat. Min her xwe bi şûn ve dida û ew jî bi pêş de dihat. Her ku nêzîkî min dibû bîna debaxxane û eyaran û qaşilê hinaran û simaqê û gecê û pezên gurandî bêtir difûrîya û kef bi devê wî diket. Carekê min dît ku li ser serê min rawestiyaye û derpiyê min ji min dikişîne. Benda min a Heyderî ji serê min ketibû û netrik û zergoyên pêve dirûtî ketibûn bin stûyê min. Wî bi hovîtî ez dişelandim. Qêrîn û hawara min dê wê şeva guh bi berfê hatibûn siwaxkirin bigihişta kîjan guhî? Her yek çûbû mala xwe û guhên bavê min jî bi eyarên Xoce Ellahqulîyê nebxêr hatibûn şimakirin û ji çingeçinga floriyan pê ve tu dengê dî nedibihîstin.
Min, ne kire qêrîn û ne jî girîyam, min weke ku çawa ji bûkekê dihate xwestin kir û devê xwe dirût.. Min xwe û giyanê xwe û bedena xwe û jîyê xwe di wê şeva sar de teslîmî wî û bîna eyaran kir.
Wî bi devê xwe yê kefgirtî pif kire şemala li ber serê min û lingên min ji hev vekirin û ber bi jor de hildan, li ser milên xwe danîn û derbasî min bû. ez ji qîzanî xistim. Devê min tijî tama axeke şil û çermekî nedabaxkirî bû û ez hatim ku verîşim.
Uftekufta wî bû û girêza devê wî bi ser rûyê min de diniqutî. Wê kişmekişê dirêj nekir û min dît orînîyek pê ket û bi lez ji ser zikê min rabû û berê xwe da devê derî. Desmalka spî ya ku li bin min danî bû û xwîna keçînîya min ya firotî bi ser de niqutîbû, da destê birazavayê xwe yê li ber derî û li pey wî derket û nema wê şevê vegerîya hicleya min ya ku bûbû cihokek genî ji girêz û xwîn û avika nêranîya wî keftarê şêstsalî. Cihokek ku barîna hêsrên min û ava heft kanîyan jî nedişî wê gemarê bide alî.
***
Sêzde salên min bi wî gurî re bi vî rengî domandin. Her şeva ku dora min bûya, ji ba hewîyeke min dihate nav nivîna min û mîna kundekî li ser sînga min vedinişt û piştî kêlîkekê ji uftekuftê û girêza ku bi ser sînga min de diherikî, radibû ser xwe, doxîna xwe dişidand û pişta xwe dida min.
min jî di wan sêzde salan de rojekê tenê delaliyê dilê xwe Ehmed ji bîr nekir. Rojekê tenê xeyalê wî yê şêrîn û rûyê wî yê kerbokî û zerhimî û hingivîn ji ber çavên min neçû. Rojekê tenê bîna hibra ku min jê re amade kiribû û darçîna hûr rijandibû navê, ji ber pozê min neçû. Ne bîna eyaran û ne jî

bîna  miska tetarî ya ku Xoce Ellahqulîyê nebxêr sibehên înan bi xwe da dikir, ew bîna  hibrê ya muqeddes ji ber pozê min dibirin.
Salên min weke ser û pêyên  berxan  li ser agirê dûrbûna ji Bazîdê dikizirîn. Her du sê salan carekê dihatime malbava  û kurekî nû di ber pêsîra min de bû! di wan salan de weke ku çemekî ji qîrê di navbera min û delalîyê dilê min de biherike! Ne wî xwe digihande min û ne min diwêrîbû xwe bigihînim wî. Carekê tenê min ew di rêya medreseyê de dît. Çend suxte li dora wî bûn û ew jî bi lez diçû. Haya wî ji min nebû  û çavên xwe jî ranekirin. Lê bayê ku ji ber cubbeyê wî yê spî rabû, bîna hibra wan salan bi xwe re rakir û dema keçkanîya min anî bîra min û ez bêhemdî xwe girîyam.
***

## Evîn roje, lê naçe ava

Ez hivdehsalî bûm. Berbext bûm. Bavê min  taze ji heccê  hatibû  û giregir û mezinên Bazîdê hemî dawetî  malê kiribûn.
Ê min ji wê qerebalixê  bala min li ser delalîyê dilê min  Ehmedê Xanî bû.  Ew  di zarotîya min de seydayê min bû. Min li ber destên wî çend sûretên quranê ji ber kiribûn.  Heta niha, heta vê rojê û vê gavê jî  hîn bîna  ku ji ber  hûçikê ebaya wî  radibû di pozê min de ye.  Dengê wî ewqasî nerm bû te digot  di rûnê mîhan da kiriye.  Û rûyê wî ewqasî li ken bû te digot qey li keskesoran dinêre e.
 Wî çend caran ez dîtibûm  û bi xûşka xwe ya biçûk Ketan re çend nameyek  ji min re li ser pelên dareke çinarê şandibûn. Hezkirina me jî ew bû. Nameyên li ser pelên çinarê û yek dîtinên  weke birûskê  bi lez û bi tirs û gupegupên du dilan.
Wî ji min hezkiribû  min jî ji wî. Me digot qey tenê pelên çinaran dê bi  razên dilê me zanibin. Lê êdî  evîna me  hêdî hêdî  digihişte pelên kinêrê jî û dikete devê fesad û ewanan jî û  her yekî  bi kêfa xwe gaja hiriya evîna me bi teşîya xeyalê xwe dirist. Digotin  ku hemî  xezelên Xanî li ser Şengê ne. Digotin ew wê bi nav nake lê ma ji wê pê ve kî heye ku dilê wî xistiye govenda êgir!! Ma kî heye ji bilî Şengê ku hişê  seyda biriye û ew  di bîra windabûnê wer kiriye!! Ma çi digotin û çi nedigotin!! Yek caran ez dibêjim heqê bavê min hebû  ku wisa ecele kir û ez dame mêr. Xelqê em hetikandibûn.
Lê bi wê evînê re ji dil kêfa min dihat. Ez li bende wê rojê bûm ku ew were destê min ji bavê minî bazirgan bixwaze. Çavên min li xezelên wî bûn û çavên bavê min li çerm û eyarên Xoce Ellahqulî bûn!!
Aaaax dê çi bibêjim?! bîna eyaran  zora bîna murekkebê bir û ez jî  ketim bin  siya gunnê wî qedapêketiyê ji Makuyê.
Niha jî  bavê min  dixwaze  min bide mêrekî!! Çawa  qîzanîya min tehmûl nekir, bîbûna min jî nake.
Ez çi bikim? Berê xwe bidim kê û ku!! Ez rebena xwedê! Winda me mîna çipikek hibra pekiyayî, li ser dawa feqiyekî.

## Hecî Zuhdîyê bazirgan

Ez nizanim çi baran bû wê rojê dibarîya? Çipikên reş weke ku tev li tenîya binê sêlê bûbin cilên minî nû lewitandin. Min ew cilên xwe ji Tebrîzê bi pênc tûmenan kirrîbûn. Hema qutik tenê bi sê tûmenan bû. Te digot qey ew baran li min hatiye xezebê û bi ser min tenê de dibare. Ji xwe dema hinekan ji min re got: kefenê şêx Ehmed şil jî nebû. Ez bêtir qeherîm. Ew kefen dê piştî demekê di bin axê de birizîya. Lê ev cilên min!! welleh nû bûn. Bi sî cuzwên quranê ez gelekî li ber wan ketim. Ma hela ew çû rehmetê û çû. Ev çi barana reş bû bi dû wî de barîya lo!
***

## Korê bedlîsî

Dema ku dengê wî korê lanet lê barî yê bedlîsî kete guhê min, ez teng bûm û hatim ku wan cilên xwe yên nû biqetînim. Lê ne layiq bû min ew şînî li hev bixista. Ew kor û tefarîkê bedlîsî bi dehê

salan e li Bazîdê ye û bi xêra vî û wî dijî. Lê hîn jî qurre maye tu dibêjî qey nevîyê Evdalxan bi xwe ye!!
Dema ez û xulamê xwe gihane ser cenaze û wî got: baş e tu gihayî telqînê. Min zanîbû ew tinaziyên xwe bi min dike û zikê xwe bi min dişo. Min dengê xwe nekir. Min dikarîbû wê demê kulmekê di nav çavên wî yên rijiyayî bidim û wî di Gökmeydanî re yan di serê Nemrûd re derxînim. Lê dîsa jî min xwe girt û di dilê xwe de got: ku çav kor dibin, mirov bêcirr dibe. Xwedê alîkarê wî be.
Ew mirovekî bê nan û xwê ye, yan na dê qedr û qîmetê min girtibûya. Min bi xwe mehekê sax ucret û erbeliqa wî pêncî aqçeyên girover danê. Aqçeyek di qûna aqçeyekî de kire çingînî. Wî li medreseya Muradiye yê dersên quranê didane zarokên me. Korên ku dersên quranê didane zaroakn gelek bûn, lê deng mîna dengê wî xweş di tevaya welatê Kurmancan de nebûn û quran bi tecwîdekê dixwend ku giriyê mirîyan jî dianî. Ji xwe di mûlidan de desmalkek jî zuha nedima. Ji alîyekî de dilê min pê dişewitî û min digot: ev xerîbekî bêçar e û dûrî welatê xwe ketiye, divê mirov rehmê lê bike. Xwezî cirra wî jî weke dengê wî xweş bûya.
Ez wî ji zû de nas dikim. Hîn rehmetîyê mele Xanî efendî keça min Şengê berî hivde hijde salan dixwest min ew nas dikir. Ji wê demê de jî dest pê kir û cirra xwe bi min re nexweş kir. Te digot qey wî qîza min xwestiye û min nedayê. Xwe li erdê dixist û diçû kîjan civatê digot: ma wê hecî Zuhdî kesekî ji Xanî efendî çêtir bibîne?! Çima Şengê nade wî!!
Rojeke înê min ew li ber derê camîya mezin dît û min bi milê wî girt û bire koşeyekî û jê re got:

- kuro Emer ev ne karê te ye, dev ji xwe û van teşqeleyan berde ji bo te qenctir e!

lê ew li kerê şeytên siwar bûbû û li civatan hey behsa keça min û Xanî efendî dikir. Min çare nedît û berê xwe da dîwana mîr da ku giliyê wî bikim.
Min hîn du gotin negotibûn mîrza Sebrîyê berdevkê mîr bi ser guhê min de xawr bû û bi dengekê nizim gote min:

- hecî Zuhdî! Emer li ba mîrê me yê alîcenab delalî ye, dev jê berde.

Eger min zanîbûya ku mîr ewqasî ji Emerê kor hez dike, min ava rûyê xwe wisa bi erzanî nedirijand. Lê heta niha jî ez nizanim mîr ji çiyê wî hez dikir?? deng!! Welle dengbêj gelekin!!hema vaye Dostoyê Ormewî ew li pey xwe hiştiye. Cirr!! Yên ji wî cirrxweştri hene! De nizanim welle!.
Min hew pê karîbû. Îcar ez bi siyasetê çûmê û min her jê re digot:

- Emer! Binêre çiqas teyr û tiyûr û heywanên xwedê hene hemû li wargeh û hêlînên xwe vedigerin. Tu jî ev serê çil salî ye li van deran bêkes û bê xwedî yî. Bi ya min bike em te vegerînin Bedlîsê. Ma kî çi zane!! Mirin heye mayin heye. Tu jî êdî kal dibî , taqeta te kêm dibe, ma kî dê li te xwedî derkeve ji xwediyên te bêtir??

Min kir û nekir nikaribû çûna Bedlîsê bixim serê wî. Rojekê dîsa min di guhê wî de ew ayetên berê xwendin. Ji nişkê ve dest bi girî kir û min nema zanîbû çawa agirê vêketî di bin dîza giriyê wî de vemirînim. Heta ku pêleke hinekî dirêj ji demê çû bi xwe kela hinavê wî sar bû, êdî got:

- hecî Zuhdî ma te çi ji min divê heyran? Ez korim. Ha lêre bim ha li wê bim!! Herder reş e. Ku vegerim Bedlîsê û kela wê nebînim, meydana şîn nebînim, dûyê ku bi ser banên hemamên wê dikeve nebînim, berfa ku zivistanan xwe li şaxên daran dipêçe nebînim, netrik û xizêm û guhar û bazin û xilxalên ku dikin çingeçing di ser û poz û guh û dest û pêyên karxezalan de nebînim, û roja ku ji hêla behra Wanê hiltê nebînim dê çima li Bedlîsê vegerim? Korbûna min her der kiriye taristan, ferq nake li ku bim. Lê Bedlîsa min her di dilê min de ye, di dilê min de kedî dibe û roj bi roj ciwantir dibe. Li ku bim di neynika xeyalê de wê dibînim. Korbûn li Bedlîsê hemtayê mirinê ye hecî Zuhdî. Ha tu kor bî ha tu mirî bî weke hev e. Bajarekî weke Bedlîsê çav jê re divên çaaaaaaaav.

Û dîsa kete ber pêla girî.
***

## mele Ehmed ne mêrekî layiq bû

Ehmed efendî keça min Şengê dixwest. Lê min nedayê. Min baş kir ku min nedayê. Tiştekî wî nebû. Mal û milkên wî nebûn. Pişk û para xwe ya ji erdên rehmetîyê bavê xwe mele Ilyas nêvî dabûn birayê xwe mele Qasim û nêvîyê mayî jî pê camî û medrese ava dikirin û feqî bi cih û xwarin dikirin. Ew mirovekî dijminê rizqê xwe bû û heta wexta ku bûbû katibê mîr jî guh nedida mal û milkan û tiştek neda ser hev. Ma çawa dê min keça xwe bida bêhiş û rûtekî mîna wî? Ku perê yekî nebin ew ne hêja ye tiştekî. Bila ilmê dunyayê hemî di sînga wî de be jî. Ma kî keça xwe dide kesekî bêdirav? Xwedê bi xwe jî dibêje : mal zîneta heyatê ye. Em jî ji xwedê çêtir nizanin ha. Ehmed jî mirovekî bê zînet bû. şev û roj di binê wê hucreya xwe ya mîna şikeftekê yan qulegurekê tarî de bû û di nav wan kitêb mitêban de weke mişkan(estexfirellah ya rebî) heta destê sibê dima. Ma yekî mîna wî dibe mêr ji keça tacirekî mîna min re!! Diya Şengê ku jina min a navîn bû, digot û dibiland ku Ehmed mêrekî qenc e! de li vê bêhişa han ha! Qenc e!! ma dê ji qencîya wî çi bigihişta min ku min Şenga xwe bi jinîtî bidayê? Qencî ew e ku di berîkan de xuya bike. Qencî ya rast çingîniya Florî û Aqçeyan û dînar û diravan e ne xiştexişta kaxezan û sîrkesîrka qeleman li ser wan e.

Wî gelek xezel li ser keça min nivîsîn, lê xwedê kir ku ew bi nav ne kirirbû. Yan na dê min tiştekî nedîtî û nebênayî bianîya serê wî. Dibû ku min ew mîna Mecnûnê Serhedî di nav berfa Gilîdaxê de definandibûya. Yan jî min ew ji van welatan dûr bixista û ew di çola hicazê re derxistibûya.

Şevekê ez çûme hucreya wî û min gotê: mele Ehmed efendî tu mirovekî êdî nîvê tayên rîya te spî bûne, dev ji van şiirên xwe berde û namûsa xelqê erzan neke.

Min wê demê hîn keça xwe nedabû Xoce Ellahqulîyê Makuyî. Loma jî wî hurmeta min zanîbû û qedrê min girt. Ew hîn timadarê Şengê bû. Mûmeke zêde ku bi nêvî bûbû ji bo qedrê min vêxist û bi nermî got: hecî Zuhdî ez rica dikim dilê xwe negre û guhên xwe ji gotinên xelqê re bigre. Ez ne ew kesê ku namûsa xelqê erzan bikim yan haşa lekkeyan li şerefa kesî bixim. Ez şairim û şair jî her tişt li ser zimanê wan digere. Keça ku di qesîdeyên min de ye, ne keçeke naskirî ye lê ya xeyal e. hin caran jî ew keç dibe…

Û ji min re da nava gotinên derwêşan ên ku ne ew û ne kesekî din jê fam dikin. Ellah wekîl gotinên wî û yên dînekî Bazîdî ku êvarên eydan bi cezbê dikeve mîna hev bûn.

Axir min dît ku ez bidim pey meseleyê dê bîn pê bikeve û ji bo min xirab be. Her ku çîroka wî û Şengê tev bidim, dê bibe teşî û pak û nepakên bajêr hirîya derewan pê birêsin û tevaya Bazîdîyan pê bihesin û ji bo ticareta min nebaş dibû.

Min derîyê çîrokê bi heft kilîtan asê kir û ew heft kilît jî avêtin binê behra Ormiyê. Û êdî di dîtina çareyekê de xebitîm.

***

## Durr durran nas dikin

Min xoce Ellahqulîyê Makuyî ji zû de nas dikir. Li Maku yê debaxîya çerman dikir û ew difirotin. Ticareta wî fireh bûbû û heta li bazarên Tebrîz û Rewanê jî, nav û dengê çermên ku wî debax dikirin vedabû. Tu diçûyî kîjan memleketê nav û dengê wî li wir hebû.

Dema min ew dît kêfa min gelekî ji zîrekîya wî re hat. Ez zûnas im û di wê kêlîkê de min nas kir ku ew gewhereke. Hema bêje deh ziman di devê wî de bûn. Erebî, farisî, azerî, ermenî, kurmancî, heta bi ûrisî û zimanê filleyan jî zanîbû. Malê wî pirr bû, du karwanserayên wî li Makuyê û Ormiyê hebûn û çarên din li ser rêyên Rewan û Tebrîzê, û Mûsil û Esfehanê jî hebûn. Debaxxaneya wî ya herî mezin li Makuyê bû. Lê xwedê du kur tenê dabûne wî. Êvarekê ez li koşaka wî mêvan bûm û me şev dibuhurand. Herdu kurên wî bêdeng li quncikekî rûniştibûn û li me guhdarî dikirin. Min dît ji nişkêve xoce Ellahqulî bi dengekî tehl gote min:

- Ji sê jinan du kur!! hecî Zuhdî ev çi qismet e? welleh hinek feqîr hene deh kurên wan hene lo!

Min xwest ez ber dilê wî bidim, kenîyam û bi ser guhê wî de xwar bûm û min got:

- hikmeta xwedê ye! Vaye ê min ji çar jinan kurek jî nîne

pişt re ez fikirîm û min ji xwe re got, niha çima ez Şengê nadim wî!! Ma ezê yekî ji wî çêtir bibînim!! Ez dê xwe ji mele Ehmed efendî û gotinên xelqê jî xelas bikim û êdî keça min wê bisitire. Xoce Ellahqulî yekî maldar û dewlemend e û eger keça min bibe jina wî dê peşkên wî li dawa min jî bikevin. Tew ku kuran jê re bîne!! Malê wî bi min û nevîyên min dimîne. Rabû min di ber re avêt û gotê:

- were em bibin xezûr û zava.

Weke ku bawer nekiribe, çavên wî fireh bûn û got:

- raaaaast?.

***

Dema ez ji Makuyê vegeriyam, min yekser ji Şengê re got:

- keça min, min tu dayî mêr!

Serê tilîyên wê reş bûbûn. Min got qey ew henne kirine, lê gava min baş bala xwe dayê min dît ku şopa tenîyê ye. ez kenîyam û min pirsî:

- Şengê ev çi ye! Nebêje ku te binê sêlê bi tilîyan pak kiriye? Ma qerwaş û xizmetkar bi ku de çûne??

Bersiva min neda. Ew di gotina min ya pêşî de difikirî û rûyê wê di nav herdu kefên wê de xerq bûbû. Wê texmîn dikir ku ez dê mehra wê û mele Ehmed efendî li hev bibirim. Lê min gemîya xeyalên wê ji nav pêlên pirsan kişand û gotê:

- heftiyeke din te bi xwe re dibime Makuyê. Min tu dayî tacirekî mezin. Merdekî heta ber stûnên erşa xwedê teala têr e.

rûyê wê çilmisî û hat ku tiştekî bibêje, lê negot û bi lez berê xwe da misînekî avê û tilîyên xwe şûştin.

***

## çerm li ku, kaxez li ku!!

Barê sixtiyan û çerman, çermên debaxkirî yên ku Xoce Ellahqulî ew weke kabîn û qelenê Şengê dabû min, di du rojan de hate firotin. Tacirekî Xinûslî ew hemî ji min kirrîn û çil Florîyên zêr kirin çingînî di kefa destê min de. Min ew her çil Florî birin li ba serrafekî ku lê binêre ka qelp û dexelin yan na. yek bi yek dane ber gezan. Hawar, te digot dilê min digeze lê dawî her çil jî polên saf û bêxeş derketin û min jî ew anîne mal û berdane şerbikekî û birin di cihê şerbikên xwe yên veşartî de danîn. Şazde şerbikên min çêbûn. Şerbikek di qûna şerbikekî de. Ku hîn jî veşartî ne û bûne bîst û ji min pê ve kes cihê wan nizan e. xwedê bibêje erê çend salekî din dê wan bigihînim bîst û pênc şerbikan.

Ma wê mele Ehmed efendî çi bida min!! barek kitêb!! Yan şaşik û cubbeyê xwe!! Yan jî murekkebdankên xwe yên reş û gemarî!! Ew mirovekî terkedunya bû û bi ser de jî zarokên Bazîdê li dora xwe dicivandin û dersên fiqih û nehw û nizanim çi dida wan. Li şûna ku berê wan bida karekî yan pîşeyeke sûdewer ji wan û malbata wan re, guhên wan bi wan ilmên bêfêde qul dikir.

Niha jî ez ne poşmanim ku min Şengê neda wî. Çi li pey xwe hişt? Ji bilî van çend feqeyan û çend kitêbên ku hebûn û nebûna wan weke hev e.

Bi serê şêxê Cubbeşîn min keça xwe dabûya Xalidê çolaq min nedida Ehmedê Xanî! Hema çawabûya meaşê Xalid mehê çend Qurişin û dê qelenkî baş dabûya min.

Dibêjin wî mal nediheband. Û di kitêba xwa de jî dev avêtî ye mal û maldaran. Dibêje ku mehebbeta mal û diravan mirov bednam û pîs dike. Ma ku ne malê min bûya ez kî bûm!! Ku ne ev mal bûna dê bednam û bêqîmet bûma. Her kes li Bazîdê û derdora wê min nas dike û qedrê min dizane. Qedrê min bi qasî hebûna min e. Ne tenê li Bazîdê, lê li Makuyê, li Xoyê, li Mûşê, li Bedlîsê, li Eleşgir û Wanê û heta li Rewanê jî bazirgan min nas dikin û qedrê min digrin. Ku weke wî min jî dabûya pey ilmê kitêban niha dê di quncikê camîyekê de vingevinga min bûya bi ser guhê wan çirax û şagirdên ser bi kum de. Dê çavê min jî her li destê dewlemendan bûya.
A va ye me dît di cenazeyê wî de sî çil kes tenê hatibûn ew jî hemû naskiriyê wî bûn û suxte û feqîyên wî bûn. Dibêjin bi sedan hatibûn. Dibêjin Bazîd vala bûbû lê ma ne ez jî li wir bûm!! Pir pir bila sed yan jî sed û pêncî kes hatibin. Lê wexta Xoce Ellahqulî çû rehmetê xelqên Makuyê û derdora wê hemû derketibûn pêşiya cenaze û pê re jî heta devê gorê rawestiyan. Heta xanatên Ecema jî ji Tebrîzê hatibûn. Sed feqeyî quran bi dorê li ser ruhê wî xwendin û heta înekê di camîyan de her piştî nimêjekê fatiheya wî diahte xwendin. Malekî pirr jî li dû xwe hişt û xêra wî jî çil rojî dihate belavkirin.
Hema ji wî barê eyaran yê ku min firote bazirganê xinûslî, bi dehan nusxeyên kitêban û qurana şerîf bûne bi qab. Bi sedan pêlav jê saz bûn. Dibêjin qabên Mem û Zînan jî ji çermên zavayê min rehmetiyê Xoce Ellahqulîyê Makuî ne. Ji xwe daholên Serhedê yên ku keç û xort li ber gurmegurma wan dîlan û govendan digerînin hemî ji wan çermên Makuyê ne. Defên dewrêşên qadiriyan jî ku zikrê xwedê heta nîvê şevê li ber dibe, ew jî ji wan çermanin.
Lê mele Ehmed efendî tiştek ji jiyana xwe fêm nekir û çû. Ne mal, ne jin, ne weled. Tiştek li dû wî nema. Nav û dengê wî jî wê di du rojan de ji dinê rabe. Ma ku bimîne jî wê çi faydê lê bike!! Hee! Ew dê bibe hestî û di binê axê de birize. Îca kitêbên wê li pey wî bimînin wê çi jê re bikin?! Ew kordunde çû û kaxez û reşpelikên li pişt xwe hêlan jî jê re nabin law û dê werin şewitandin yan jî di hemêza melayekî yan feqiyekî de dê birizin û kifikî bibin. Dostên wî jî kesên mîna Teymûrê fasiq û Şemsoyê Qewalê êzdiyan û vî korê lanet lêbarî yê bedlîsî bûn. Ji xwe koro û Şemso her kesek maceraya wan dizane, lê Teymûr!! Ew kurê Meyrema gurcî ye. Hîn ew çar pênc salî bû, turkmenekî qereqoyunlu diya wî ji bajarê Ezaqê li hêla behra reş ya bakurî me revandibû û anîbû firotibû axayekî mehmûdiyan. Wî axayî jî di bin xwe re piştî ku goştê wê têra xwe cût, firot. Û bi dehna car wisa hate kirrîn û firotin. Min jî dikira ew bikirîya lê wê dev ji vî Teymûrê xwe, ku navê wî Şûta bû, bernedida.
Teymûrê fasiq ku meyxurekî virtoqî û sakûl û sûtarekî bênemaz û serqot bû û bîna meyê ya genî ji dûrîya hezar gazî jê difûrîya, gav û seet diçû hucreya rehmetî û heta don di binê çiraxê de xelas nebûya suhbeta wan jî nediqedîya. De îca wê çawa keça min jina mele Ehmed bûya. He?

# Buharî

Dema ku min bihîst mele Ehmed miriye, berê min li dikana Selaheddînê sehhaf bû. Kitêba min Şêtê Bazîdî di destê min de bû û min dixwest ku Selaheddîn wê ji min re nesix bike da ku ez ji xwe re belav bikim û bifiroşim. Xelqê ew kitêba min ji destên hev revandibûn û êdî daneyek jî ji bo dermanan nedihate dîtin.
Di gel ku min dilezand jî Selîmê Nalbend ez rawestandim û got:

- xêre Buharî efendî? Tu wisa dilezînî mîna ku kerekî filitî pê li gunê te kiribe!ma te nebihîst şêx Ehmedê Xanî miriye!!

Fenanî hespê ku simê wî tê nalkirin ez sekinîm. Bi rastî ez gelekî şabûm û di rûyê nalbendê ku bi xemgînî xeber dabû min û berê xwe dabû qantiran ku dîsa wan nal bike de tebessum bûm, lê tavilê pê hesîyam ku şabûna bi mirina kesekî li ba tu kesî nayê qebûlkirin. Min jî rabû rûyê xwe tehl û xemgîn kir û bû waxwaxa min û li bayê bezê min berê xwe da Bazîda jorîn cihê ku Xanî lê defin dibû. Fenanî ku ezman jî xemgîn bûbe, ewrin reş weke qedîfeyekî ew rapêçabû. Heta ku min xwe gihande mezelan ez şil û pil bûm. Qutikekî şîrazî yê spî li min bû, lê dema ez gihame nêzîkî devera ku ew tê de dê binax bibûya min dît ku qutikê min mîna kêzika heccê deqdeqî bûye. Erê welle! Baraneke reş dibarîya û xelqê digot ew yek ji kerametên şêx e. Wan digotin ku hibr dibare, ez him dilteng dibûm û him jî bi aqilê xelqê dikenîyam. Ma kesî dîtiye di zemanan de hibir dibare!! Roja Firdewsî mir jî hibr nebariya bavo!
Ji xwe wê rojê rojeke sar bû û her kesî agir dadabû û dûyekî reş bi ser her malê ketibû. Min wisa texmîn kir ku ew dûyê reş hilkişiyaye ezmanan û ewr hemî lewitandine, loma jî rengê çipikên baranê reş bûbû, lê ma wê kê ji min bawer bikira di wê hay û hoyê de!!
***

**çîroka min û Xanî**
bi salan bû min bi zimanê romîyan dinivîsî, lê kesî ji Bazîdê û der û dorên wê guh neda min. Min nedixwest ku bi kurmancî qesîdeyan bihûnim. Hela ku kes iltifatê bi tirkî neke wê kî bala xwe bide eş`arên kurmancî? Min jî texmîn dikir ku ez dê bibim şairekî mîna Şukrîyê Bedlîsî xwediyê Selîmnameyê û dê di sînga meclîsên Asitanê de, di serayên sadrîazam û şeyxulislam û heta di şevbuhêrkên sultanê muezzem de jî rûnim. Lê çerxa felekê bi min re vajî zîvirî. Dema min dît ku Xanî bi kurmancî eş´aran dihûne, min di dilê xwe de qerfên xwe pê kirin û got: hela li vî dînî!! Kî dê kirîdarê vî qumaşê wî yê riziyayî be!! Kî wê di vê tasika wî ya sifir de ava şêlû vexwe!!
Roj bi roj min dît ku li dora wî dicivin û feqî û suxte û peyrew û çiraxên wî zêde dibin!! Min nas kir ku razek heye ji bilî kurmancînivîsîna wî û ez gihame rastîya wê razê jî!!
Xelqên Bazîdê êdî ji hat û çûna eskerên ecem û romîyan bêzar bûbûn. Ji dana bac û xerac û xûkîyan û xwîna rijiyayî ya ji bo herdu terefên şer nefret dikirin. Mele Ehmed jî ji bo kurmancan li dora xwe kom bike, têla janê naskiribû û ji wan re ahenga mezlûmiyet û bedbextiyê distrand.
Min ji mêj ew naskiribû. Min dizanîbû ku mirovekî têra xwe jîr û zana û xwedan aqil û ferheng e. Min hêdî hêdî xwe nêzîkî wî kir û qesîdeyên xwe yên di medhê sultan û paşayan de jê re xwendin. Carê ji min re li ser luxeta wan diaxivî û digot ku divê li vir wisa be, li wir wisa be. Pişt re êdî te´erruzî şêweyê qesîdeyan bû û got ku medhîye çiqas payedar û astbilind bin, dîsa jî bêçêjin û dûrî wan biçe baştir e! Dawîya dawî rojekê berêvarê em bi hev re diçûn medreseya wî, gote min: Buharî, ma heta kengî tê bi zimanê romîyan binivîsî!! Tu ji kê re dinivîsî keko!! Sifrê xwe qilê bike ji zêrê xelqê çêtire. Welleh billeh dengê te naghîje Asitanê!! Eger gihişt jî dê guhdarî nekin. Bi kurmancî du beytan yan qesîdeyekê bihûne qenctir e ji kitabeke weke Selîmname yan Heştbihişt yan jî Şehname ya Firdewesî!
Min jî bi sarî got: Tirkî zimanekî xweş e û qesîde pê rewan têne herikandin, ma te qesîdeyên Yunus Emre û Fizûlî nexwendine qey!!
Wî mîna ku hinekî hêrs bûbe, bi dengekî bilind got:

- Kuro min yên Baqî û Zatî jî xwendine. Lê ji kurmancîya xwe bawer be û bi dayika xwe re wefadar be! Lorîkên wê di guhên te yên ter de dema te şîrê wê dimêt, ne bi kurmancî bûn!! Şabûna bavê te bi te re ne bi kurmancî bû!! lîstikên te yên di tava heyvê de û li ber sîka daran û di payîz û buharan de li kuçe û kolanên bazîdê ne bi kurmancî bûn? Te hîç keçek nehebandîye!! Ma te çend gotinên nazik bi kurmancî jê re nekirine qey? Kuro ji xwedê gunehe em li vî zimanî wisa bi çavekî kêm binêrin!! Sêwîtîya wî bese!

Ji wê êvarê de fenanî ku ilhamek bi ser min de nazil bibe, min gotinên wî di dilê xwe de bi cih kirin û pişta xwe da zêrê romîyan û berê xwe da sifrê kurmancî!
Bi rastî ew kurmancî bi min zor dihat, lê bi qasî ku zor bû xweş bû jî. min êdî hemû hêz û tewan û şiyana xwe xistin rêya pêşxistina zimanê xwe yê kurmancî. Nivîsên minî pêşîn ne ewqasî baş bûn. Weke nanê pato bûn lê dîsa jî Xanî nav di min dida û ez ji bo dewamkirinê dihêvotim û digot :

- Binivîse!! Ji vê rêyê danegere!! Rojek dê bê tuyê li ser qesîdeyên xwe yên tirkî poşman bibî. Hema bes tu çêja hingivê kurmancîyê di bin zimanê xwe de hest bikî tuyê zanibî çima ewqasî israr dikim.

***
dema ku wî dawî li Mem û Zîna xwe anî ez dawetî ba xwe kirim û ji min re hin fesl û bab jê xwendin. Devê min ji hev mabû û wî jî carê li çavê min dinêrî!! Ez bawer dikim wî destana dexsokîya ku di çavên min de diçirisî jî dixwend!! Min nikarîbû ez pirîskên hesûdîyê yên di tirafa herdu çavên xwe de veşêrim û her carê ku çend beyt diqedandin min xweziya xwe dadiqurtand û bêdeng dimam. Dema ku dawî li xwendina Mem û Zînê anî û pirsî: Ma te çawa dît??

Bîna min gelekî teng bûbû. Henasên min kurt û bi lez diçûn û dihatin. Lê min kir ku haya min ji tiştekî nîne, min gotê: Heyran tu ne kêmî Sultanuşşuera Baqî yî, lê….
Û min peyva xwe bi kuxukeke qut û sexte birrî.
Wê şevê agirê hesûdiyê ji hundir de ez dixwarim. Ez diherifîm mîna kavilekî baran bi ser de bariyayî yan zelzele di bin de qewimî be. Mîna berfa tavikê lêdayî ez dibişifîm û weke rûnê li ser sêleke sincirî dibuhatim û min xwe weke zerreyeke biçûk li ber ronahîya bejna wî û xurtiya kelimeyên wî dît.
Hîn wî destan negihandibû kutahîyê, û feslên dawî neqedandibûn ew li civata mîr dixwend. Evîna Memo û perîşanîya Zînê di meclisa mîrê Serhedan rehmetî Mîrza beg de, di şevên zivistana Bazîdê yên dirêj de weke xalîçeyeke esfehanî radixist û xeyalên guhdaran li ser dihatin gindirandin. Lê min bihîst ku mîr di nîvê şevbuhêrkan de radibû û dev ji Xanî û destanê berdida û berê xwe dida koşka xwe ya xewê. Bi dehê caran wisa kiribû heta Xanî dev ji xwendina destanê li meclisa mîr berdabû û tenê ji hin suxte û kesên nêzîkî xwe tenê re dixwend.
Mîrza beg rehmetî guh nedabû Mem û Zînê û dilê Xanî şikiyabû û heta heftiyekê ji hucreya xwe derneketibû. Neçûbû pêşiya xelqê nimêj jî nekiribû û xutbe jî nexwednibûn. Lê ne xema mîr bû, ji xwe mîr nekiribû ku bi du gotinan dilê wî xweş bike. Ma mîrekî di meqamê Mîrza begê Pisyanî de dê çi bikira ji destaneke mîna Mem û Zînê!!
Lê çawa agir bi hermel û sipind û bantofê dikeve, feqe û melayan kitêba wî li nav hev digerandin û dixwendin. Qesîdeyên wî jî bi qasî destanê dihatin xwendin. Hesûdiya min dehta dibû. Min nikarîbû xwe bigihînim toza qafiyeyên wî yên şîrîn. Min nikaribû bi selaset û rewaniya zimanê wî binivîsim û dihatim ku herim destê xwe bixim zengeloka wî û wî di şeveke tarî de bêyî ku çu kes haydar bibe bixeniqînim. Ez li ber nav û nîşana wî ji desthilanîn ketibûm, bêqidûm û balşikestî bûbûm.
Carekê ji caran wî dîsa weke her demê ez dawetî ba xwe kirim û ji min re çend rûpelên destana xwe ya nû Mecnûnê Bazîdî xwendin.
***

Êvareke havînê bû. Heyva li çarde porê xwe yê zîvîn ta bi ta bi ser Gilîdaxê û derdorê de belav kiribû. Berê min di wê taveheyvê de li hucreya Xanî bû û dilê min weke hercar sar bû. Erê diçûme nik wî, lê fenanî ku pariyekî zilindarê bihavêjim devê xwe. Şuhreta Mem û Zîna wî ez li birreka newalên dînbûnê yên kûr rawestandibûm. Dihatim ku biteqim. Dihatim ku neftê bi şev bihavêjim ser mûma ber serê wî û wî û kitêbên wî yên di hucreyê de bi ser hev de bişewitînim.
Min dizanîbû ku ne mirin be, tu kes dê nikaribe kanîyên şiirê di dilê wî de biçikîne û kor bike. Her ku ew bi jîyê xwe mezintir dibû, qesîdeyên kûrtir û şîrîntir li hev dianîn. Êdî keç û xortên Bazîdê dihatin ku destana wî bikin bazbend û bi stûyên xwe ve daliqînîn. Sofiyan qesîdeyên wî dixwendin heta mest dibûn û bi cizbeyê diketin.
Min taze xezelîyek nivîsî bû û bi niyeta ku ew wê raçav bike û bihêjîne çûme civana wî di wê hucreya wî ya ku hilma darçîn û hibrê tim jê difûrîya.
Ku ez derbasî ba wî bûm, min dît çira wî melûl e. Zeyta wê kêm bûbû û fitîl jî reş bûbû û diviyabû bête guhertin. Min dizanîbû ku dê dîsa bibêje: Ez dema dinivîsim ne bi hewceyî çira me.
Wî gelek caran gotibû min ku ew li ber tava peyvê ne ya heyvê dinivîse.
Dema pêjna min li ber derî kir, hinekî fitîl bilind kir û ronahîyeke gewşekî hucre tijî kir û rûyê wî yê bi riya belek xemilandî xuya kir.
Min jî bi edeb silav dayê û çûm li tenişta wî û kaxezên di nav destên wî de rûniştim. Berî ku xezelîya xwe jê re bixwînim çavên min li xêz û qeydikên li ser pelikên wî ketin. Wî jî bala xwe da bû awirên min ku mîna qijikan li ser berfa wan pelikan vediniştin û peyvên ku xeyalê wî ew weke daneyan li ser wan reşandibûn, dinikilandin.

Bi kenekî sivik re ku werzên xemgînîyê di rûyê wî de avdan got:

- Bêhna te fereh be dê ji te re çend rêzikan ji vê destana xwe ya nû bixwînim!!

Bîya xemgînîyê ya di rûyê wî de, li rûyê min û giyanê min jî sî kir û pel daweşandin û min got:

- Bixwîne. Ez dibihîzim.

Û dest pê kir rêzikên ku nivîsîbûn ji destana xwe Mecnûnê Serhedî xwendin.

Beyt û misra´ên destanê, mîna baraneke hûrik dadiwerivîn erda xeyalê minê tî. Şev weke şîrêzeke reş hêdî hêdî çirr dibû û kaxetên xeyalê min bi hev ve dizeliqanidin. Kaniyek di mejiyê min de pijiqî û min ji xwe pirsî: Ka çima ez vê destanê nanivîsînim??

Nizanim çawa min xatir jê xwest? Dîtina min dît ez li odeya xwe me û pişta min bi ser pelikên sar û spî de xûz bûye û ez bi xameya ji zileke esmerê tarî sehîfeyan reş dikim. Wê şevê min nêzîka sed malikî nivîsî. Min dixwest ez hêz û taqeta xwe hemûyî bidim wê destanê û rojekê berî ya din dawîyê lê bînim. Bi rastî jî ez roj bi roj pê de diçûm û carekê piştî du sê mehan min dît destan li dawî ye!! Min beyta dawî weha nivîsî:

*Sed şukri xwedawend ku Buharî*
*Ev name qedand bê alîkarî.*

***

## xulaseya dastana Mecnûnê Serhedî û raza barana hibrê

Xulaseya Mecnûnê Serhedî ku min navê wê wergerande Şêtê Bazîdê, dibêje ku xortekî ji xelqên Bazîdê, navê wî Brahîmê Zîlanî bû, ji malbata axayên Zîlan bû. Bi eşîreta xwe re her sal ku diçûne zozanan, koça xwe ji bo çend mehekî dibirin Rewanê jî. Li wir keça tacirekî mezinî Ermenan dihebîne. Navê keçikê Meryemê bû. Ji ber ku bavê wê bazirganekî mezin bû û kirîn û firotina qirmizê dikir û barên qirmiza wî heta bi Lehistan û Firingistanê diçûn, keça wî jî tim qirmiz tev li hinneya xwe dikir û porê xwe pê sor dikir. Loma jî jê re digotin Meryema kezîsor. Birahîm û Meryema kezîsor bi salan hevdu hebandibûn. Lê çi heyf bavê wê ew nedida. Dawî ji tirsa revandinê re ew hinarte ba rahibên dêra Eşmiyazînê û şopa wê nebedî bû.
Brahîmê Zîlanî tu dever nehiştin û lê negeriya. Bajar bi bajar, gelî bi gelî, zome bi zome, deşt bi deşt û heta diçû pêşiya karwanan jî û dikete pey evîna xwe. Heta rojekê xeber ji wî jî qut bûn û xelqên Bazîdê êdî digotin ku ew bêguman li çolan mirîye. Lê dawî rojekê di dirûvê evdalekî de tê Bazîdê û ji wê rojê de bi navê Mecnûnê Serhedî tê naskirin. Lê dîsa jî her carê nebedî dibû, av li ser xwe zelal dikir û êla wî destên xwe jê dişûştin. Lê ji nişkê ve diahte şar. Dema jê dipirsîn li ku bûyî Biro? Digot: ez li nav berfa Gilîdaxê bûm. jê dipirsîn ma te çi dikir? Digot: min agirê di hinavê xwe de sar dikir. Û diqêrîya :

- lê sar nabe, sar nabe hahooooooo. Ne berfa Gilîdaxê tenê lê berfa çiyayê Qaf û hezar çiyayên din jî tev li ava Erezê bibe agirê işqa Meyremê sar nakin. Hahoooo.

û kincên xwe didirrandin.
Dawîya dawî, şivanekî ji êla Dilxêrîyan termê wî di dawa Gilîdaxê de li ser berfê de dît ku qevdek porê bi sorekî qirmizî hinnekirî di destê wî de bû. Wî şivanê Dilxêrî û çend hevalên xwe termê wî li pişta kerekê kirin û anîne bajêr. Dema meleyê camîya mezin ew şûşt, kir û nekir nikarîbû wê qevda por ji destê wî derîne. Bêçare man û ew tev li porê qirmizî veşratin. Bazîdîyan digotin ku cinnan qevdek porê Meyrema kezîsor anîne xistine destê wî. Hinan digotin: Na! Lê Meyremê bi xwe bûye mêvana wî û xwediyên wê ew û Biro di xew de xeniqandine, termê Meyrema xwe birine û yê Biroyê me ji gurên çiyê re hiştine.
***
Carekê feqiyekî gote min:

- Welle te baş ristîye, bes ma ne berê ew çîrok li nava xelqê meşhûr e??

Kesên weha dilê min dixelandin, lê min bersiva wan nedida û ne jî dilê wan rihet dikir ku bibêjim: Erê ew berê hebû.
Min her digot ev çêlîka xeyalê min e. Afrîdeya dilê min e. Min bi firmêskan û xwîna dil ew nivîsîye ne bi hibrê.
Ma Xanî bi xwe Mem û Zîna xwe ji ku anîye?? Ne ew her dibêje: Rawî wehe gote min!! yanî yekî jê re hikayet neqil û riwayet kiriye û wî jî bi tevna xeyalê xwe rêsaye!! Ya min jî ne eynî wisa ye!! Herçendî ew dibêje ku ji rezê kesî nedizîye, lê ne ji xweber nivîsiye. Mem û Zîn ne wî xuluqandiye. Ew hikayeteke ku li welatê Buhtiyan qewimî bû û wî ji devê dengbêjan ew riwayet kiribû.
***

## sirrê barana hibrê

min êvarekê berê xwe da hucreya Xanî û min dilê xwe bi çavlêketina destanekê ku digotin ew dinivîse xweş kir.
Ew tenha û xemgîn bû û çawa ez dîtim pelên xwe pêçan û xistin bin postê beranan yê ku li ser rûniştî bû. çavên min bi murekkebdanka wî ya xweşik ketin. Ji zû de dilê min dibijîya wê murekkebdanka şûşe û tijî hibra ku wî bi xwe amade dikir. Ew hostayê sazkirina hibra reş bû. Min jî wisa texmîn dikir ku xweşiya nivîsên wî ji rindîya hibra wî tê. min digot ku hibra wî efsûnkirîye yan na dê çawa ew qesîdeyên xweşik binivîsandina!! Îca wê êvarê min fersenda xwe dît û keysa xwe li wê şûşeya xweşik, xweş kir. Çawa ku wî pişta xwe da min û di refika kitêban de li kitêbekê geriya, min bi sivikiya neşterçiyekî koçeran destê xwe avête murekkebdankê û ew xiste paşila xwe.

Wî Gulistana Se`dîyê Şîrazî derdixist. Li dizîya min haydar nebû lê çawa ku zîvirî hibra pirseke tirsnak pijiqande rûyê min:

- dibe hibra ku Se`dî ev Gulistana xwe pê nivîsî be ne rind be, lê heta tu bibêjî bes, wî baş hûnaye ne wisa?.

Min got qey wî ez dîtime, min devê xwe bir û anî ku tiştekî bibêjim, lê fersenda cewabdanê neda min û got:

- ê min jan hibra min e.

Û hat li tenişta min rûnişt û got ka ez ji te re hinde pend ji vê kitêba Se`dî bixwînim! Lê min bi behaneya karekî ecele destûra xwe xwest û bêyî ku zanibim ka ew bi nivîsandina çi destanê meşxûle, ji ba wî derketim.

***

## Hibir di xewnên min de jî dibariya

Dema ku Xanî defin kirin û şêx Seyfeddînê cubbeşîn dest pê kir telqîna wî xwend, ez hinekî li dûr sekinî bûm û min li kitêba xwe dinêrî da ku ji xelqê we be ez quranê li ser ruhê rehmetî dixwînim!!

Lê bi qêrîna Teymûrê fasiq re ku hibr dibare, tirsa heft dizan bi hev re dawerivî dilê min û ez ziravqetî bûm.

Ji xwe berî wê, mele Salihê Cizîrî jî hatibû nik min û ez ji baranê tirsandibûm û di pey re bi rûyekî tehl ji ba min çûbû. Ez ditirsiyam ku Xanî berî mirina xwe jê re yan ji kesekî din re behsa hibra xwe ya windayî kiribe.

Dema min gotê : kitêba min ne bi hibrê hatiye nivîsandin.

Awireke xeşimgîn di min veda û berê xwe da darbesta ku di bin baranê de berî li gorê bû.

Ji roja ku min murekkebdank dizîbû , min xewnên tarî û reş didîtin. Te digot qey ew hibr hemû bi ser mejiyê min de rijiyaye û xewnên min reş kiriye. Bi rojan aveke reş bi devê min diket. Herçendî min av di devê xwe werdida û dişûşt jî, çare nebû. Min çi kir bêhavil bû. Min ji bêgavî berê xwe da zinarekî bilind li jora medreseya Muradiye û ew şûşe di kevirekî de lêxist. Hibra ku jê pekîya bû peşkên enberê û li ser wan zinar û beran herikî. Di gel ku bîna miskê jê difûrîya jî, dilê min xeliya û ez vereşiyam û hibr ji hinavê min derket. Min nediwêrîbû ji kesî re jî vê macerayê bibêjim. Ma wê kê ji min bawer bikira!! Ku bawer bikirana jî dê ji bo min hetîketî bûya. Min dixwest herim hinda hekîm Zuhrabê ermenî, lê ditirsiyam ku dawî kifş bibim, hema min xwe ragirt û bi wê hibra ku her çendakî ji devê min nola verîşandineke reş derdiket xursend û razî bûm.

Heta vê gavê jî ez ji tama hibrê ya di bin zimanê xwe de reha nebûme. Ew hibreke ku li min bûye bela. Tama wê di bin zimanê min de fenanî tama ziravê fêrîkekê ku bi ser kezebê de herikî be tehl û tirş û tev li hev bû. Hibreke efsûnger û cadûkar bû, ne min tiştekî hêja pê nivîsî û ne jî karim xwe jê bişom.

# Mele Ferîd

**Hibra poşmanîyê zuwa nabe!**

Barana reş ya ku bi ser kefenê Ehmedê Xanî de dibarîya, dibû kelebox û kefen her zuwa dima. Hîn nû me ew ji camîyê derxistibû min bala xwe dabûyê lê min nedigot. Wisa jî min, berî ku Teymûrê fasiq biqîre û bibêje: hey bavo hibr dibare, bala xwe dabû rengê wê baranê yê tarî. Min zanîbû ku ev ne tenê barane û di temamê jîyê xwe de min tiştekî wisa nedîtibû.

Dema ku Mîrza Sebrîyê berdevkê Mîr di guhê min de got: kefen şil nabe!! Min xwest ez tif li rûyê wî bikim, lê şewata girîyê ku di gewrîya min de weke perengên di nav sêkuçikan de dihate tevdan nehişt.

Berî mirina Xanî bi panzde bîst rojan, belkî bêtir jî nizanim, ez û Mîrza Sebrî û wî mirovê ku gora Xanî kola, ewê ku min hîn rûyê wî nedîtiye û mîrza Sebrî digot kev xizmekî minî ji Eleşgirê ye, hatiye ilaca diranên xwe bike! Me rêya hucreya Xanî girt û çûne nik wî. Min nedixwest ez biçim lê fermana mîr bû û em jî şandekên wî bûn. Mîrza Sebrî jî ew çûn bi min xweş kir û got: emê bêhnekê herin ba wî, em li wir dirêj nakin, çend pirsin û em vedigerin.

Lê xwezî ez miribûma û neçûbama. Ez bûme şirîkê wan herduyan di vê tawanbarîya giran de. Eger min zanîbûya ew dê çi jê re bibêjin û li ser zimanê mîr neqil bikin, ez bi tu awayî nediçûm, lê min ew xwelî li serê xwe kir û çûm.

Hîn em di rê de bûn, Mîrza Sebrî gote min:

- Ma niha di şerîetê de yekî ku Iblîsê lanetlêbarî, ji gunehan bêrî bike çawaye?

Min bê ku bifikirim got:

- Ew kafire bêşek. Ne kêmî Êzdiyane.

Kêfa Mîrza Sebrî hat û bi lez pirseke din bi guhê min ve zeliqand:

- Û yê ku di heqê pêximberê ummetê de bêedbîyan bike!!

Min dîsa bêyî ku bifikirim got:

- Kuro malava ev kî ye?? Kesê wisa li ba me nînin. Rafizî û Qizlibaş û File û Êzdî jî vê yekê nakin.

Dîsa kenîya û bi salûsîya nêçîrvanekî ku dixwaze kewê bikişîne rikoyekê got:

- Û ku ev yek zinyaê helal bike?

Mirovê rûnuxamtî bêdeng bû, lê di çavên wî de dêwekî nepenî diaxivî ku tirseke nenas dawerivand hinavên min. Min jî dîsa bêyî ku di gotina Mîrza Sebrî de bifikirim got :

- Ew kes bêguman zinêkareke, yan jî ji dîn derketîye.

Ku wî dît lingên min yên kor hêdî hêdî ber bi tora tepreşîya wî de dişemitin, pirsa xwe ya dawî nola xwêya yek bi ser sêleke sincirî de bihavêje, avête ber guhên min û got:

- Û ku bi ser van xirabîyan de jî dev bihavêje Mîrê me û taneyan bide wî??

Îca ez fikirîm û bû qiçeqiça xwêya pirsa wî li ser sêla gumanên minî ku mîna agirekî bi xeyalê min ketibûn.
Min di wê hingamê de tê derxist ku niyeteke xirab li ber wan heye, min tê derxist ku pirsên wî hemû li ser Xanî bi xwe ne lê çawa ji bala min çû ez nizanim. Berê xebera min ji van meseleyan hebû. Îca min bêyî ku çerxa mejîyê xwe bizîvirînim cewabên ku Mîrza Sebrî li hêvîya wan bû, dan. lê yeqînen min nizanîbû ku ez jî dê bibim hemdestê wan di vê tawanbarîya kirêt de. Min nizanîbû ku mirin di navê de heye. Ez zenn dikim ku wan ew jehrkirine, lê zenn û guman nabin yeqîn ku delîlekî bi dest nexînim. Hema delîl hebe jî kî dê li min guhdarî bike? Ew xizmê mîrza Sebrî yê rûnuxamtî nema xuyaye, ewê ku zenna min tim bi alî wî de diçe. Awirên wî yên di Xanî vedidan wê şevê ji xencerên heşaşên berê yên keleha Elemotê jî tûjtir û xedartir bûn. Min rûyê wî nedît, lê ji awirên wî û kenê mîrza Sebrî yê bi aliyekî dev, nas kir ku ew li qetla Xanî digerin. Lê ez jî şerîkê wanim. Bi bêdengiya xwe ez şerîkê wanim.
***

## Beyana ´Isyana Iblîsê mel`ûn û misteheqîya wî ya le`netê

Ez tavilê li cewabên xwe poşman bûm! Lê dema poşamnîyê buhurî bû û êdî kenê Mîrza Sebrî di devê wî yê lêvzirav û şeytanokî de diçirisî.
Ma ku ez bibêjim sûcê rehmetîyê Seydayê mele Ehmed e, ez şaşim?! Na welleh sûc sûcê wî bû!! xwedê jê razî kesek weke wî nake ha! Ummeta Muhemmed tevde dibêjin ku Iblîsê mel`ûn li ber xwedê rabûye û isyan kirîye! Ew misteheqqî lanetê û agirê cehennema ebedî bûye. Çawa rehmetî di kitêba xwe de wî bêguneh û bêrî dike û behsa taet û ibadeta wî dike? Ma duruste kesekî baqil li ser Iblîsê rûreş bibêje:
Iblîsê feqîrê bêcinayet.?
Welleh billeh min ji Xanî hez dikir, û ez di behra ulûmê wî de jî ne qetreyek bûm. Lê nessê kitaba xwedê te`ala ,Qurana ezîmuşan, derheqê Iblîsê mel`ûn de dibêje: û le`neta xwedê heta roja qiyametê lê be.
Em melayên Bazîdê û feqîyên wê, me bala xwe dabû van gotinên wî yên li ser Iblîs. Lê welleh meqamê wî yê bilind û heybeta wî û qedrê wî li nava şênîyên van wilayetan nedihişt em li ber rabin. Hinan ji me çûn jê re jî gotin, lê wî raya xwe bi wan jî qebûlkirin dida, yanî ew ji rê derdixistin. Rehma xwedê lê bibare û xwedê wî bi efû û mexfireta xwe şa bike alimekî deh ilmî bû û kesî pê nikarîbû.
Min bi xwe icazeya xwe ji destê wî girt. Û dersên min ên fiqhê wî dabûn, ji çar mezheban çi pirs jê bihatana kirin dizanîbû. Lê nizanim çawa wî Iblîs weke kesekî bêcinayet didît?
***

## Miiraca Peyxemberê ummetê, ku berî zemanê hicreta wî ya şerîf qewimîye û de`waya Xanî

Berîya çend salan, berê min li Erzerûmê bû. Li xanekê ji xanên di rê de, li melayekî qersî rast hatim. Ku wî melayî nas kir ez ji Bazîdê me hate ba min û pirsa Xanî kir. Min jî bi çêyî qala wî kir û got: ew alimekî zemanê xwe ye. Melayê qersî çavên xwe nîv girtinekê girtin û riha xwe ya dirêj bi pêçîyên destê xwe yê rastê şeh kir û got:

- Qey ilim li Bazîdê bi zimandirêjîyê ye?

Û bêyî ku rêya cewabê li ber min veke got :

- Ev Xanî yê ku bi qewlê te alim e, eger herfek ji ilim di singa wî de hebûya, wê di hizûra navê pêximber eleyhisselam de bi edeb û tore bûya!

Gotina wî ez felc kirim. Devê min jihevbûyî min lê dinêrî û intizara beyankirina sebebê wê itiraza wî dikir. Wî jî ku dît ez weke mişkê li ber pisîkekê behetî û qidûmşikestî mame, hat nêzîkî min bû heta ku min şopa miskê di bin şaşika wî ya girover û spî de dît. Di nav ronahîya melûl ya çiraxê de çavên wî yên kilkirî jî diçirisîn. Destê xwe bi bavîtî avête ser milê min û got:

- Ma te kitêba wî nexwendiye?!

Min texmîn kir ku ew behsa Nûbiharê yan jî Eqîdeya îmanê dike, min got :

- Erê min herdu jî xwedine.

Wî jî tê derxist ku min xelet ji wî fêm kirîye. Destê xwe ji ser milê min hilanî û dîsa riha xwe şeh kir û sîwakek ji berîka sixmeyê xwe yê xetxetî derxist, çend caran di ser diranên xwe re bir û anî û got:

- ez behsa Mem û Zînê dikim, te xwendiye?

Heta wê demê min nexwendibû, tenê çend fesl û bab derbarê işqa Memê ji xweha mîrê Cizîra Botan re û hinek xezelên wî yên li ser dota Hecî Zuhdiyê bazirgan dema ez feqe bûm ketibûn guhên min. Lê piştî wê guftûgoya bi melayê qersî re , li wê xana di navbera Erzerûm û Bazîdê de, wê şeva qetranî, ez bi ser dîbaceya Mem û Zîna Xanî ve bûm.

Melayê qersî hêdî hêdî bi sikura xeyalê min digirt û ez ber bi xwe ve dikişandim. Dema dît êdî ez li ber wî serçog bûme, tizbîya xwe ya kehremana seddaneyî di kefa destê xwe de kokel kir û got:

- Ev hemşehrîyê te Xanîyê Bazîdî, haşa rê dide ber pêxemberê ummetê, jê dixwaze ku here miiracê û bi xwedê re biaxive û ceng û cidalê pê re bike, yanî miiraca wî naecibîne. Wey bavo li vê cesaretê û vê bêedbîyê!! Kuro ma tu kîyî tu ji Muhemmed eleyhîsselatûwesselam re bibêjî: rabe bi lez her ezmanan û di gel xwedê teala biaxive û bêjê: te çira wa kir û çira wa nekir!! Kuro di îşê xwedê de xeber dide! Ma qey kesek li ba we nîne ku kevirekî bixe devê wî!

Û tizbîya xwe bi kerb di dawa min werkir.

Min wê şeva reş nizanibû xalîçeya kîjan cewabê li ber lingê hêrs û êrîşa wî ya dijî Xanî raxînim. Ewî tiştên ecêb digotin û bi ya wî, Xanî ji dîn derketibû û kafir û murtedd bûbû û misteheq û sezayê serbirîna bi şûrê şerîetê jî bûbû. Min jî ku qewlên Xanî li nessê kitaba ezîz û hedîsên sehîh qiyas kirin, wisa dît! Ma dibe ku yek li pêximberê ummetê ferman bike û bibêjê: here bi xwedê re têkeve cidalê û munaqeşeya wî bike?! Wey! Ma ne Miiraca şerîf çû û qedîya û xwedê çi emr û fermanên xwestî di wê şeva muqeddes de li resûlê xwe yê ekrem kirin?!

Erê ilmê wî fereh bû, lê şerîet bi zahirê xwe ye û kifş e, derûn û batinê wê kesek hîn ne gihiştiyê.

Ku ez vegeriyame Bazîdê, ewwil min berê xwe da Selaheddînê sehhaf û bêbazar nusxeyeke kitêba Mem û Zînê kirrî. Dema ku min dîbace xwend, rastî jî ez mat û şaş mam! Ewqasî di medhê pêximber û di wesfê ezemeta xwedê de Xanî ebyat rêz kirine, lê derbarî Iblîsê mel`ûn de gotinin gotine ku wî rasterast ji dîn derdixin û dergehên cehennemê li ber wî vedikin. Ma kesek ji misilmanan ( hela tu aliman deyne aliyekî) heye ku piştgirîya wî dike!! Ellah ellah ji wî re çawa devê wî geriya û ew kufrî kirin!! Ji xwe miirac jî weke wî melayê qersî gotibû qissetek bû û di wexta pêximber de cirîya bû, ma hewce heye ku Xanî were ji pêximberê ummetê re bibêje: rabe bi lez here ezmanan û di gel xwedê xeber bide û pirsan ji cenabê wî bike û lome û itaban lê bike!! Haşa ku mexlûqek karibe itaban li xwedê te`ala bike!

Min dêhna xwe da feslê ku li ser zewaca Tacdîn û Sitîyê jî nivîsîbû!! Ê de welleh hema eynî fuhûşê ye!! Bêexlaqîye ku yekî di meqamê wî de behsa cima`ê û razana jin û mêran ya di gel hev bike!

Hîn bi ser de  wesfê haşa kuttanê jî bike û ...welleh zimanê min nagere ez bibêjim bê wî çi nivîsandiye!
 Ji xwe çaxa ku ew behsa evîndarîyê û civana Memo û Zînê dike, wan hema hema bera ser hev jî dide! Ji navikê û berjor de destdan û misdan helal kiriye!! Ma ne bi vê qebahetê exalqên keç û xortên me  difesidîne û xera dike û perdeya şermê ji nava cima`etê radike! Yanî ji wan re dibêje herin yek û du bibînin û bikevin paxila hevdu û ...lahewlewelaaaaa!
Ji wê çaxê de dilê min jê sar bû, lê dîsa jî min qedrê wî zanîbû. Ew yekî bêhempa û bêmisal bû û di nav kurmancan de  hindik alim mîna wî hebûn ku dilê wî bi ser xelqê ve bû û ilmê xwe  hemû xistibû xizmeta rewal û ciwanan. Wî bi malê xwe medrese ava kir û ji her derê feqe anîn.
***

## civana me li hucreya Xanî

Bayekî sar li derve dihat. Me hersêyan, min û mîrza Sebrî û wî mirovê wî yêrûnuxamtî ku min berê ew li Bazîdê nedîtibû ku mîrza Sebrî ew bi min dabû naskirin, me kurkên xwe li xwe pêçabûn û em derbasî hucreyê bûn. Xanîyê ku hîn qûmdanka wî di destê wî de bû û dixwest hibra şil ya li ser kaxezan dibiriqî zuwa bike, ji ber me rabû û xêrhatinî bi me kir. Min bi xwe silav dayê, lê hevalên min  rûtirş derbas bûn û hema bêyî ku Xanî bibêje wan kerem bikin rûnin, rûniştin. Wî têderxist ku ziyareta me ne ziyareta xêrê ye, rûyê wî yê zer hinekî lihev ket û got:

- xêre?! Dibêjî qey hûn hatine deynekî xwe ji min dixwazin.

Û hêdî rûnişt û qûmdanka xwe ya çîngo li ber kaboka xwe danî. Carekê du caran pif kire qûma li ser kaxezan, çend çipisk bi tilîya nêvî li pirtikên mayî ji wê qûma hûr a ku bi ser hibra ku nû pê hatibû nivîsîn û li ber ronahiyê diçirisî xistin û bêdeng li me nihêrî. Min gelekî şerm dikir. Erê min zanibû ku wî di Mem û Zînê de gelek hedd û hidûd derbas kirine  û curmê wî giran e, lê bavo welle mesele  ji zû de ye,  û di şerîetê de jî hin guneh bi teqadumê saqit dibin û dibe ku wî tobe jî kiribe!!Ma kê sînga wî qelaştiye û li dilê wî nihêriye? Ev çi hatyie bîra van ku niha wê meselê tev didin!! Eger ne fermana mîr Evdilfettah bûya  ez hîç bi wan re nediçûm wê civanê.  Min wê kêlîkê xwest ku erd veqelişe û ez tê de winda bibim. Min fedî dikir çavên xwe rakim û li Xanî binêrim.
Ewê rûnuxamtî  ku bîna jehrê êdî ji rûpoşa wî difûriya, Mîrza Sebrî jî mîna ku bixwaze dengê xwe zelal bike, çend caran kuxikeke sivik û sexte kuxîya û bi wêrîneke bêşerm berê xwe da Xanî û got:

- Mîr ji te û hinerên te tengijîye!

Xanî behetî. Pêlekê bêdeng ma pişt re mûmeke nû bi mûma ku li ber vemirandinê bû vêxist û got:

- çima? Çi qewimîye!! Ma min kevokên Mekkeya mukerrem kuştine?

Û rabû pelikên xwe  li rex qûmdanka çîngo danîn û vegeriya meclisa xwe.
***

**Mûm li mala min jî vemirî**

Bi zatê xwedayê mezin. Li mala min jî mûm sê caran vemirî. Xelqê digot çiraxa ber serê Xanî sê caran vemirî bû berî ku wefat bike. Li her maleke Bazîdê jî wisa bûbû. Qendîl û mûmên li camiyan jî geşkirî bûn ji bo pêrgîna remezanê ew jî sê caran vemirîbûn. Ma ku ew ne zatekî mezin bûya xwedê ev keramet didayê?

**Mîrza Sebrî**

**Xaniyê nemekheram**

Qûmdanka ku wê êvarê me di destê Xanî de dît, diyarîyeke hakimê me yê rehmetî Mîrza begê Pisyanî bû. ji Kaşana Ecemistanê ji wî re hatibû wî jî neda  kesekî ji bilî Xanî. Mîrên me yên destbela û dilvekirî û bi rehm, kesî ji xêr û kerema xwe mehrûm nakin. Lê kesên bênan û xwê û nemekheram jî hene ku bi tu wechî ne layiqê comerdî û sexaweta Mîranin. Xanî yek ji wan kesan bû. Her çendî ku Mîrekên Bazîdê hemûyan qencî pê kiribûn jî, û heta  li ba hinan jî munşî û katib û debîrê dîwanê bû , wî di kitêba xwe de  dev avêtibû Mîrê berê Mîrza beg û gotibû:

*Lewra ku ewî nekir pesende*
*B`esl û neseba xwe ew Rewend e!!*

Îca de werin vê bêbextiyê û vê neheqiyê!! Mîrza beg  rewendê kîjan newalê ye nizanim? Çawa qelema wî geriya û tiştekî weha bêkok nivîsî!! Ewqas qencî û xêra ku Mîrên me  pê kiribûn hemû badihewa çûn. Mîrê me yê niha Mîr Evdilfetahê qedirbilind û yên berê jî, ji bav û kalên xwe de hakim û xundkarin li Bazîdê û ewin stûna konê edalet û dadê, ewin koka kerem û bexşîn û ciwanmêrîyê, ewin hebûna me û bêyî wan nebûna me  muheqqeqe. Çawa zimanê Xanî bi wan neheqiyan gerîya, çawa cesaret kir û li şûna medhiye û pesnan ew tehqîrên belasebeb li Mîr kirin? Yanî wî kitabek  nivîsî bû!! ê mala te ava be  ma te  dunya hejand û kela Viyanayê fetih kir!! Dawa qedrê xwe li mîran dikir! Ma minneta wî û wê kitabê li kê hebû? Ew kitaba tijî fahişe û kufrî  dê bi kîjan aliyê xwe bihata pesinandin ji hêla mîrên me ve?
Ne ev tenê lê ev bûne şeş heft meh di xutbeyên camîyan de, ne navê mîr ne jî navê Sultanê muezzem dibêje! Ji xwe karê wî li ser menberan fikra xelqên reben difesidîne û  dawa dijmintîya birayê me yên romî dike!
Ew diqehere çima ku nema katib û debîrvanê dîwana Mîre. Ê heyran ma tu tenê bi farisî dizanî? Yên ji te zanatir jî mîna Buharîyê ku inşellah dê bibe katibê mîr hene û yên ji te bikêrtir û bitedbîrtir jî hene! Tu ji xwe re karê xwe bike û macerayan binivîse û tê de behsa (meazellah) fisq û ficûrê bike! Çi yê te û bargehên beg û mîran lo!
***

Çend nusxeyên ewwil ji Mem û Zînê bêyî wê tehqîrê bûn, lê vê dawiyê me dît ku hin nusxe di nava destên xelqê de belav dibin û ew beyta ku bêwefayî ya Xanî kifş dike di nav de bû. Ma mîrên Bazîdê rewendê ku bûn! Ew ji bavê bav de, hîn ji dema Şasiwar de Pisyanîyên xwecihin û konan û koçerîyê nas jî nakin.
Mîr ku bihîst di kitêbên Xanî de tehqîr li birayê wî mîr Mîrza beg bûye, çavên xwe jê girtin û nexwest meseleyê tev bide û bînê pê bixe, qedrê Xanî hîn li ba wî hebû lê dema ku li ser zimanê xelqê ew beyt belav bûn û di civatan de cûtin û rêsan, û êdî kî li kê rast dihat digot: Xanî nema di xutbeyê de navê mîr û sultan dixûne! Mîrê me yê bêmisal qewî narahet bû û engirî. Heta sibe xew nehate çavan. Serî di ber de û çen di sîngê de û rûtirş û bêdeng bûbû. Heqê wî ye û ez di meqam û şûna wî de bûma min dê serê Xanî jî li ser çermê gayekî gindirandibûya. Lê wî, hingî ku himmetbilind û dilarame, gote min bêyî ku çavên xwe veke:

- Mîrza Sebrî ka ev çi ye? Em çi ji vî nemekheramî re bibêjin? Em çi ji wî bikin?

Min mîna şêwirmendekî gotê:

- ezxulam ka em ewwil ji wî bipirsin, eger li xwe mukur hat û iqrar kir li û got ku erê min weha nivîsiye, û mayî musirr li ser nexwendina navê cenabê te û cenabê sultanê muezzem, em dê weke tu ferman bikî, bikin.

Û me carekê şêx Seyfeddînê Cubbeşîn hinarte ba wî. Wî inkar nekir. Ne bes inkar nekir, bi ser Şêx de rabû û gotinên tund û tûj jî derheqê Mîrê me yê qedirbilind de kirin. Jê re gotibû ku ez bi tu rûyî neşim duayan ji sultanan re bikim. Îca min ji Mîr re got:

- Mîrê min. ezxulam. Xanî bêedebî di heqqê te de kiriye, ji xwe nexwedina duayê ji sultan re cinayeteke mezin e. Ez dibînim ku jiyan êdî li wî heram e. eger ev ji wî re bimîne, dê tuxyanê bike û ne dûre bibêje ku haşa Mîr ne layiqî hukumdariya Bazîdê ye. Tu zanî Mîrê min, mirîd û heval û peyrewên wî gelekin. Dikarin qelqeleyekê li Bazîdê rakin û xelqê li dijî cenabê te rakin ser tapanan û eleyhê cenabê te bihêvojin. Û kurê rehmetiyê mîr Mihemmed vegerînin textê Bazîdê û gola aramîya mîrnuşîniyê biçelqînin.

Mîrê me yê serefraz ponijî, mitale kir û serê xwe hilda, simêlên xwe yên bi ser devê wî d ehatibûn xwarê mis dan û dîsa bêyî ku çavên xwe veke û li min binêre got:

- Mîrza Sebrî tu zanî berî demekê du mêvanên min hebûn? Yek ji Qersê hatibû û yê din ji nik paşayê Wanê, herduyan jî digotin ev Ehmedê Xanî çi ye ku di xutbeyên xwe de dua ji xelîfe re nake? Şerîetê diguhere û li şûna ku bibêje gelî misilmanan, dibêje: gelî Kurmancan! Ev derketina ji dîne û tehrîka ´amiyane li dijî weliyyulemrê misilmanan! Ji xwe wan herduyan jî kitêba wî xwendibûn û te´essuba wî ya ´eşîrî ku li himber te´essuba dînî ye naskiribûn. Wan ji min xwestin ku divê ez zimanê wî bibirim û çareyekê jê re bibînim. Bilmuxteser lazime ew yan ji Bazîdê bidûr bikeve, û yan jî……

Min nehişt Mîrê me yê dilnewaz gotina xwe bibe serî, weke mizîgînîya xêrê min gote cenabê wî:

- Mîrim. Muhletê bide min, du sê hefteyan ezê vî şolî serrast bikim.

Rûyê Mîrê me yê ku Xanî û hinerên wî ew dilgiran û derdgîn kiribûn, hinekî geş bû û weke gulşenekê vebû. Bi bavîtî destê xwe yê mubarek li pişta min da û çavgirtî got:

- de here tu û zanîna xwe.

***

## Xanî ji dîn derketibû

bi rastî jî, kiryarên Xanî ji heddê xwe çûbûn der. Ma çi hatibû wî ku bibêje: bila kurmanc bibin yek, da ku Rom û Ecem xulamîya wan bikin!! Wey li vê ecêbê ha! Em xulamên Romê ne û şewket û naz, serbilindî û i`zaza me ji wan tê, ewin yên ku em di siya ´adilîya wan de dijîn. Piştgirê dîn û

dewletê ne û ne leşkerê sultanê Ali Osman be, dê em li ber nigên qizilbaşan biçin. Hela wî tane li eceman da ne xeme, dijminên mezhebê me ne, bes çima Rom!! Ma ne bi fermana şahanî ya ku ji Asitanê tê, me´aşên axund û mela û meşayixan tayîn dibe? Ma ne bi wê fermana şerîf û humayonî mîr tayîn dibin? Ma ne em stûyên çiviyayî û xwarin li ber şûrê ´edaleta sultanan!? Ma ne em bi nessê kitaba ´ezîz û hedîsên pêximberê ummetê memûrê qebûlkirina hukmê weliyyulemr in?
Yanî welleh wî zêde kir!! Îca du´aya ji xelîfê islamê re di xutbeyên xwe de jî nake! Ma zendîqî û kufr û nifaq çi ne ku ne ev kiryarên wî bin!
Kitêba wî ketibû destê paşayê Wanê û xanê Tebrîzê jî hay jê hebû. Herdûyan jî çavsorî li Mîrê me yê dilzindî dikirin. Wan peykên xwe hinartibûn ba wî û gotibûn ku ev şêxê bi navê Xanî mirovekî xeternake, kitaba wî reşemareke di nav destê xelqê de û ji bo aramîya dewleta osmanî ya ´eliyye û memlekta sefewîyan bidome divê çareyek jê re were peydakirin. Ji xwe paşayê Wanê gotibû ku hûn dermanê wî nedin, dê mîrîtiya Bazîdê ji holê rakim.
Nizanim wî ew fikrên şeytanî ji ku anîbûn? Xas û ´amên Kurmancan bi halê xwe razî ne û bi qismeta xwe xursend û qani`in. Îca çi hacet bi wan qal û qîlên bêsûd û vala hebû?!
***

## Xanî û mîrîtî

Ew yekî terkedunya bû û dixwest her kes mîna wî be. Bela xwe di mîrên me dida. Di kitaba xwe de dev avêtiye mîran û mîrîtiyê. Her dibêje ku mîr nezanin, kesên li dora wan pîs û ewanin. Heta gotiye ku hakim weke agir û jehrê ne!! Yanî ku li ku keys bi destê wî ketiye wî zimandirêjî derheqê mîran de kiriye.
Di civatên xwe de jî behsa zilm û zorê dikir. weke ku mîrên me yê dadwer zalim û serbirr bin wî di her civatê de digot ku zilm û sitem dewletan hildiweşîne. Me dizanîbû ku ew destnîşanî kê dike. Me gelekî bîna xwe lê fere kir. Lê dawiya bînferekirinê jî heye.
Min ku dît Mîrê me yê alîneseb dilteng bûye. Qehra ji Xanîyê bêhuzûr û bêselîqe di dilê min de pêl û mewc da. Min xwest di wê şevê de xencerekê di dilê wî de biçikînim û serê wî li ser tebsiyeke zîvîn ji cenabê Mîr Evdilfetah beg re werînim.
Lê min zanîbû ku ew Mîrê dilzîz û rehmanî, dê qebûl neke. Lewra jî min xwest bi tedbîrekê, şolê Xanî xelas bikim. Min mirovekî ku him xettat û kîmyager bû, him jî di tedbîrên kuştina xesm û dijminan de bi xef û nihanî meşhûr bû, anî nik xwe malê û jê re hikayeta Xanî û nerazîbûna Mîrê me yê ´adil ji kiryar û nivîsîna wî, teqrîr kir. Wî terkîba her cûre jehr zanîbû û ji bo Xanî xwest jehra silêmanî terkîb bike, ji bo wê jî deh Florî xwestin, min deh û sê dane wî û got:

- Eger ev şol bi serî bû, dê bibin bîst Florî temam.

Ji bo ku bala kesî nekişîne min ew mîna xizmekî xwe dabû naskirin û li deveran jê re digot
pismam û rûyê wî yê ku bi derbên xenceran xêzxêzî bûbû xiste bin rûpoşekê û gotê:

- Ku xelqê pirsîn ev çi rûpoş e? bibêje ez bi êşê me .

***

## Tedbîra kîmyagerê bi rûpoş

Xanîyê nemekheram, gelekî zana bû. Ew ne ku cahil bû tane li mîr û Ecem û Romê dabûn. Na, lê ew hişmendekî têra xwe hebû û di ser xwe re bû. Ji xwe xeternakiya wî ji wir dihat û lazim bû ku êdî dengê wî bihata birrîn.
Wê şevê jî wextî em ji rê bixistana hingî hucceta wî qewîn û mentiqê wî selîm bû, me hersêyan jî , min û mirovê rûgirtî û mele Ferîd, pê nikarîbû û me zora wî nedibir.
Me ku qala meseleya Iblîsê lanetlêbarî dikir, wî bi ayet û hedîsan û qewlên mutesewif û alimên mezin em disekinandin. Ku me jê re behsa mesela Miiraca pêximber eleyhisselam dikir, wî li ber

me derîyên alemeke ecîb û xerîb vedikirin û deriyên devê me dadayî dihiştin. Ku me behsa duaya ji xelîfe re kir, ji xwe di cih de got:

- ne hedîs ne jî ayetên quranê vê yekê dibêjin, du`aya ji xelîfe re ne ji erkanên xutbeyê ne! Ma di zemanê xelîfeyên raşid de Ebûbekr û Umer û Osman û Elî, kê di xutbeyan de dua ji wan re dikir? ma ne ew bi xwe xetîbên cumeyê bûn?

Ku me behsa çi dikir wî ilmek ji tûrikê xwe derdixist û mecala cewaban nedida me.
Ji xwe ilmê min kême, loma jî mîrê me yê dilgulî mele Ferîd bi me re kire hevrê û heval. Ew mela Ferîdê demdemî û dudilî zû bi zû nedihat û digot:

- welleh ez ji seydayê Xanî şerm dikim.

Hela were vê ecêbê! Çima ew şerm nake û taneyan bi vî alî û wî alî de dibarîne çep û rastê xwe? Çima ew şerm nake ´itaban li zatê xwedê te`ala dike? Çima ew şerm nake ittisala jin û mêrî di Mem û Zîna xwe de teswîr dike? Hasil me bi fermana Mîrê muhteşem ew mîna marekî bi zorê ji qulê derxist û bir. Lê wî jî tu ilm raberî Xanî nekir. Ji xwe devê wî , te digot qey Recebê terzî ew bi tayekî stûr dirûtiye yan jî Selîmê nalbend nalek pê ve kuttaye ketibû hev û nizanibû çi bibêje. Gotinek ji xerb yek jî ji şerq dianî û weke serxweş û meyxuran lê hatibû wê şevê.
Min dît ku mele Ferîd newêre Xanî di heddê wî de rawestîne, gotê ku cenabê Mîr ji van kiryarên te yên vajî dînê islamê û sunneta pêximber, dilgiran û bînteng bûye. Min gotê jî :
- divê tu, yan werî dîwana Mîrê alîmeqam û beraeta xwe beyan bikî û bi milxwarî efûya mîr bixwazî yan jî Mîrê dilsoz dê li te were xezebê û fermanekê derheqê te de belav bike! Dibe ku te sirgûnî Anadolê jî bike. Ji xwe heta tu van herdu fermanan qebûl bikî, divê tu nema ders û xutbeyan bidî. Yan jî eger destê te ji xutbeyan nabe divê tu navê xelîfe û mîr tê de bibêjî.
Min ku wa got, dizanîbû ew dê qebûl neke li meclisa Mîrê me yê dilxweş û hişmend beraeta xwe beyan bike. Ji xwe goya ku wî nigê xwe hinne kirine, nema diçû hizûra mîr. Êdî min dixwest Xanî pirr dilteng û sergerm bibe. Meqseda min ew bû ku ez wî bêtir bihêvojim û niyetên wî yên nihênî û veşartî derînim. Ma ku yek xweliyê tev nede pertewan dibîne?? Lê wî her bi nermî cewaba min da û derûnê xwe yê reş bo me di wê şeva reş de kifş nekir.
Tenê carekê derket ku avdasê bigre, hema mirovê rûveşartî bi lez rabû û zeyta çiraya wî bi zeyteke di paşila xwe de guherî û hat weke berê rûnişt. Mele Ferîd bala xwe nedayê,ew bi ser kitêbekê de xwar bûbû. Lê min dizanîbû ku êdî jehr kete hucreya Xanî.
Di riya vegerê de, kîmyagerê rûpoşîde gote min:

- Jehr jî zeyteke qenc e ha!.

Mele Ferîd fam nekir ji xwe ponijî bû bawer dikim wî guhdarî jî nekir. Pişt re mirovê rûgirtî hinekî bi ser min de xwar bû, devê xwe xiste guhê min û bêyî ku mele Ferîdê rû ji tirsan zer bûyî bibihîze got:

- Hefteyeke din, yan heta deh panzde rojê din, pirr bi derengiyê bikeve heyveke din şolê Xanîyê we yê serkeş temam dibe. Inşaellah dê fatiheya wî were xwendin bêyî ku ew jî zanibe çi bûye. Ku mewta wî ne bi zeytê be dê bi hibrê be. Ew nagihêje ku hîva remezanê bibîne.

***

**Mûmên vemirî**

Hela werin vê ecêbê!! Tu devê kê li bazîdê vedikî dibêje ku şeva ew rehmetî bûye di her malê de sê caran mûm vemirîne! kuro lawo ew êvareke bi ba û baran bû hema ku derî vedibûn mûm vedimirîn. Ma mûm çi ne ku xwe li ber bayê dawiya payîzê bigrin? Bi zatê xwedê teala ez wê êvarê li dîwana

mîr bûm. Wî karê xwe û çûna nêçîrê dikir. deh caran jî mûm vemirîn. Êdî xulam di ber re nedigihan ku mûman bi mûman geş bikin. Heta mîrê me yê nijadpak keniya û got: ev  çi êvar e! dibêjî weke ku vî bayî girr ji mûman girtiye.

# Dengbêj Dostoyê Ormewî

Ez li ser rêya Girê kesk bûm dema neviyê min Şêrbeg, bêhnçikiyayî xwe gihande min û bi lîwanê hespa min girt û got:

- Kalo, şêx Ehmedê Xanî çû rehmetê.

Min zanîbû ku ew nexweşe. Lê min qet bîra mirina wî nedibir. Ew hîn li ser xwe bû û hêz û qeweta wî di kemalê de bû. çi hatê wa ji nişkêve bi wê nexweşiya xedar ket!
Di wê êşa zalim de ez çend caran çûme serdana wî. Min dixwest jê re bidim kilaman, lê êdî dilê wî û guhdarîkirinê nema bû. Her kêlîk radibû bi zikê xwe digirt û diçû avrêjê. Di rojên dawî de jî êdî şikayeta kêmxewîyê dikir, dilê wî nema dibijiya tiştekî. Yekcaran jî xwêdanek pê diket ku êdî şaşika wî şil dikir û şopa xwêdanê li ser enîya wî mîna xunava seherê li ser bergê gulan bû. Naçare şaşik datanî û serê wî yê ku bûbû çend roj gwîzan pê nebûbû mîna zadê li pey barana ewwil dixewinî.
Min nizanîbû ku ew dê here diyarê rehmetê, yan na ez dê hema wê rojê jî li ber serê wî bûma. Ez dê li ber serê wî bimama û min dê gotinên wî yên dawî jî bibihîstana. Ez nizanim ka wî beyta Dimdimê nivîsî bû yan na. Wî, piştî ku bi dehan car li serpêhatiya kelê û Mîrxanê lepzêrîn guhdarî kiribû, soz dabû min ku ew dê wê beyta diltezîn û xemnak bike dastaneke mîna Mem û Zînê û binivîse.
***

Ez û bavê xwe û diya mina celalî Menîje û pîrka min, havîna ku tê de li Stenbolê sultan Ibrahîmxan bi destê Qere Elî hatibû xeniqandin, hatin li Bazîdê bi cih bûn. Ez wê çaxê du sê salî bûm û hîn rehmetiyê Xanî ji diya xwe re nebûbû.
Bavê min Mîrxan, ku bi xwe jî dengbêjekî dengzengil bû, serpêhatiyên berê, beytên şeran û evîndariyê li odeyên axayên Celalîyên ku xalanê min bûn, digotin. Tê bîra min ez hîn neh deh salî bûm, buhar û havînan hema ku roj diçû ava bavê min cihê xwe li odeyê xweş dikir û destê xwe dida ber guhê xwe û beyta Dimdimê digot. Erd û ezman dihejandin. Civat bêdeng bû weke ku li nêçîra kewan bin, eger yekî perîka qitikekê bihavêta erdê wê deng bihata.
Di dengbêjîyê de Emerê Rojikî yê kor jî nedigiha riba wî. Şevekê axayekî bajarê Diyadînê xwest dengê herduyan bide berhev. Rabû Emer beyta Memê Alan got. Civatê gelekî pesnê wî da, wî jî ji kêfan re serê xwe bir û anî û guhê xwe çend carî xurand. Bavê min di cihê xwe de bûbû sûlavek û hedara wî nedihat. Nema bawer dikir ku Axa jê re bibêje dest pê bike. Hema ku destûr girt, weke taveke nîsanê deng pê ket û beyta Dimdimê got. Civat li bin guhê hev ket û min wê şevê cara yekem hêsrên mêran dîtin ku çawa li ber şewqa çirayan diçirisînin. Hemû jî çavrêyî biryara axayê Diyadînê bûn.
Bavê min weke ku ne xema wî be, qelûna xwe tijî tûtin dikir. Çavên me hemûyan li wî û Emerê nuqsan û axê bûn. Lê axe nehişt em gelekî bendewar bimînin, hema rabû ser xwe pirtikek agirê di bin qaweyê de rakir û li ser qelûna bavê min danî û got:

- te cegera me kewand, mîna ku çawa tu vê tûtinê bişewitînî. Malavayo ku ne şerm bûya ez jî dê niha bigiriyama.

Pişt re zîvirî Emer jî û gotê:

- Emer welle dengê te pirr xweş e, hema meqamên Mîrxan gelekî xweşin.

Ji wê rojê de Emer nema di hizûra bavê min de dida kilaman. Hema ku li civatekê jê bixwestana ku ka ji me re dengekî bibêje, serê xwe nizim dikir û bi tirs digot:

- ma Mîrxan li vir e?

***

## Kela Dimdimê

Pir kesan ku nas dikirin navê min Dosto ye, dipirsîn: goya ku navê te, navê Ecemane!! Te ji ku anîye ev nav? Heta carekê rehmetîyê Xanî jî êvarekê pirsî: mamê Dosto! ma ev navê te bav û dêya te li te kirine?
***
Navê min Dostoy e. Ne diya min û ne jî bavê min ev nav li min kirine. Pîrka mina kezebşewitî ev nav li min kir. Ew navê kurê wê bû, yanî navê apê min bû. Li gor ku min ji devê wê bihîst, ew xortekî felît û nûhatî, ciwan û wêrek û xweşmêrekî kela Dimdimê bû. Bi gotina wê, ew weke gurê yekane bû. Hîn beriya ku sipahê Şah Ebbas kelê biruxînin û dest bi qetliama Mukriyan bikin, apê min Dosto keçek ji kelê ku navê wê Sînem bû, hebandibû û bi pismamên wê re ketibû şer û kişmekişê. Serencama şerê wî û pismaman kuştina sê heban ji wan bû. Pismamê mezin Şêrkoyê ku di rêya Sînemê de bû, sond xwaribû ku dê ew Dosto li ku bibîne bikuje. Heta ku xwe bi perdeyên Kabeyê ve girtibe û di ser nimêjê de be jî ewê sonda xwe li erdê nexîne!
Pîrka min digot: ku ew û kalkê min ê nexweş, piştî kuştina hersê pismaman û windabûna kurê wê yê bi tenê Dosto, ji tirsa tolhilanînê bi şev ji kelê revîyan û berê xwe dane bakur heta ku pêrgî kurê xwe bûn.
Ji serma kalkê min mir û zarokek di zikê pîrka min a ku nêzîka çil û pênc salan kiribû de hişt.
Pîrka min hercarê ku têr girîyê xwe dikir, bi hûçikên xwe firmêskên xwe dimaliştin, dikenîya û digot: berxikê min! te dît bê bapîrê te çi mêr bû!! di zikê pîreke weke min de zaroka xwe çand û çû.
***
Dema ku eceman êrîşî kelê kirin, apê min Dosto xatir ji diya xwe xwest û berê xwe da hêşetê û tev li siwarên xanê Lepzêrîn şerê eceman kir.
Di nava agirê şer de apê min û pismamê Sînemê yê mezin Şêrkoyê birayê hersê kuştiyan di halekî xirab de çav li Dosto dikeve. Rimbazekî eceman erd li apê min teng kiribû û dixwest wî bikuje, lê Şêrko ji xîret û te`essuba ´eşîrî dibe piştevanê apê min û di ber wî de tê kuştin. Apê min jî li rex wî bi rima wî rimbazê eceman ji ser hespa xwe tê xwarê û ew jî tê kuştin.
Dema pîrka min ev serpêhatî digot, bi dengekî şewat û giriyekî tehl weke ku herdu li ber çavên wê hatibin kuştin, digot.
Pîrka min piştî demekê ku bihîstibû kes ji kelê nemaye berê xwe dabû wir û termê kurê xwe, yanî apê min Dosto û termê Şêrko di hembêza hev de dîtibûn.
Ew tirsiyabû ku wan hevdu kuştibin, lê kalemêrekî Biradostî ji bermayên şûr ku ji qetliamê filitîbû, jê re gotibû ku herdu jî bi rima yekî ji eceman hatine kuştin.
***

Piştî şikestina Mîrxanê Lepzêrîn ê ku qizilbaşên sitemkar navê wî kiribûn Emîrxanê Çolaq û kuştina bi hezaran şênî û çekdarên kelavanî, şah dest bi qetliameke mezin kir. Xan û mîr û mezinên mukriyan dawetî ba xwe li nêzîkî kela Gawdolê kirin û ew dane ber şûrê kîna xwe û hemî di seraperdeya xwe de bi destê Qizilbaşên kînewer kuştin. Di wan heyaman de bavê min çêbû û diya min navê Mîrxan lê kir. Wê dixwest navê kurê xwe Dosto lê bike, lê ji tirsa ku qedera wî jî weke ya birayê wî be navê wî Mîrxan danî û di nava Mukrîyan de bi navê Mîrxanê pîrê hate naskirin.
Pîrka mina kezebşewitî û dilperitî vegeriyabû nêzîkî kelê, gora kurê xwe nîşan kiribû û sûretê xencerekê li ser kêlegora wî û ya Şêrko rewêjtibû.
Ew digirîya û wê dibiland: berxê min, ez çendî li gora Sînemê jî geriyam min şopa wê nedît. Nizanim bi ku de çûbû! Min dixwest şehekî û kildankekê li ser kêla serê wê bi rewîjekê bineqişînim lê ax ji wan qizilbaşên dirrinde û dilreş re, heta afretên me yên kuştî jî ji wan û bênamûsiya wan xelas nebûbûn. Ma wê ahên me ji wan re bimînin qey?
Şah Ebbas zalim bû lawo. Sitemkarekî zemanê xwe bû, heta zarokên wî jî ji zulm û zora wî nefilitîn. Kurekî xwe kuşt û çavên du kurên xwe jî rijandin. Heramazade û bêîmanek bû, Esfehan

kiribû kerxaneyeke mezin û bi hezaran rûspêyên gurcî û ermenî servekirî di kolanan re diçûn û dihatin, lê keç û bûkên me xwe bi saxî nedane dest wan bêbav û rezîlan. Hemiyan ji ser dîwarên kelê xwe avêtin gelîyên kûr, hinan jehr xwarin û hinan jî bi xencer û şûrên mêr û birayên xwe yên kuştî, xwe jî kuştin. Çi ji te re bibêjim û çi nebêjim berxê min. tiştê ku hate serê mukrîyan, neyê serê gurê çiyan.
Ji nav wan serpêhatiyên ku pîrka min di şevên zivistanên Bazîdê yên sar de ji min re digotin, serpêhatiyekê dilê min hêra! Min gelek caran, ku bi tenê di hucreyê de dimam, ew mîna stran ji rehmetiyê Ehmedê Xanî re digot. Min çavên xwe digirt û dinehwirand. Ku strana min diqediya, min çavên xwe vedikirin û li riya Xanî ya ji hêsran şilbûyî dinêrî. Wî ji girî nedişî xeber bide, hema rûyê xwe yê zerhimî dixiste nava destên xwe û weke çiloyên çinara payîzê dihejîya.
***

## jinbîya ku keça xwe ya biçûk kuşt

Kesî mîna eceman jinên êsîr riswa nedikirin. Sipahîyê ku jinek dibû para wî, yan di mala xwe de dikire qerwaş û cêrî, yan jî difirote qewwad û zenberên esfehanî ku di şer û cengan de xwe didane kêleka leşkeran û jinên dîl dikirîn û ew dibirin di qehpexaneyên bajarê Şah Ebbas de didane xebitandin. Ji xwe ku jin sunnî bûya riswakirina wê duqatî bû, hîn di meydana şer de, serbazekî ew dida yekî din û haşa zina pê dikirin.
Piştî qetliama xanatên mukrîyan li kela Gawdolê nêzîkî bajarê Meraxê, jineke kurd hamile û diya keçeke şeş heft salî dîl ketibû. Wê, tevî ku bi farisî nizanîbû jî lê ji tevgera dîlkerê xwe nas kiribû ku dê wê û keça wê û zaroka di zikê wê de jî bifiroşe qewwadan. Ew jin fikirîbû ku xwe bihavêje dest û nigê dîlkerê xwe, lê zanîbû karekî bêhavil e! wê jina bixîret rabûbû xencerek bi dest xistibû û di serî de keça xwe kuştibû û pişt re zikê xwe qelaştibû, zaroka xwe di malzarokê de kuştibû û xwe jî bi ser de.
Çîroka vê jinê bi nav û deng e di nav êlên mukrîyan de û ew serê xwe bi wê jinê bilind dikin û dibêjin: ma ku jinên me wisa bi xîret bin, îca wê mêr çawa bin!!
Heta ku şah Ebbas hebû pîrka min nehişt bavê min şû bike. Ew ji şeran ditirsiya, şah jî welat dabûne ber xwe û kela fetih dikirin, heta Wanê çû! Sala ku ew mir pîrka min şêranî li nav êlê gerand û ji kurê xwe re jineke celalî xwest, ewa ku bû diya min û me jî bi celalîyên ku vegeriyan Bazîdê re, koça xwe bar kir û ez li Bazîdê çêbûm. Pîrka min êdî heştê sal derbaskiribûn, lê şewata di kezeba wê de pîr nebûbû, kurê xwe ji bîr nekiribû, navê wî li min kir.
Li ber sekeratê, bi nefesên xwe yên dawî re digot: Min bibin kelê, min bibin kelê. Min bigihînin Dostoyê min.
***
berî ku Xanî wefat bike bi çend mehan, ez vexwendibûm hucreya xwe ya di camiyê de û ji min xwestibû ku ez wan kilamên şer, beyta Dimdimê û kilama qetliama xanatên mukrîyan dîsa jê re bibêjim. Wî di pelikên xwe de tiştin dinivîsandin, keserin kûr vedidan û digot: de li qedera me kurmancan binêre! Li wir ecem çi tîne serê me, li vir jî rom wisa dikin. Ku herdu têne beraber yek û du jî, dîsa me di bin simên hespên xwe de dipelixînin. Ma ne xebera min e ku dibêjim bila sultanekî me jî yan şahekî me jî hebe û me ji destê leîman derîne?! Ji min fam nakin mamê Dosto! Dibêjin em û seltenet çiyê hevin! Kurmancan layiqê dewletekê nabînin mamê Dosto. Kerin ker. Kerên ji keranin haşa ji huzûra te.
Wî dixwest beyta Dimdimê binivîse, lê mirina wî ya ji nişkê ve rê nedayê. Ez jî nizanim ka wî tiştek nivîsiye yan na. Mele Ismaîlê Bazîdî hemrazê wî bû, dibe ku ew zanibe.

# Recebê terzî

## Berê min li Stenbol e

Havîn bû. Yara minî ku min û wê bi dehê caran di kadînan de hevdu diguvaşt, dabûne mêr. Dabûne dereke dûr ku min nema karîbû di xewnan de jî biçimê. Dilê min şewitî bû, şikestîbû, û weke rûnê li ber tavika wê havînê heliyabû û bi ser zinarên sebr û aramiya min de herikî bû. Êdî dilê minî heliyayî ji Bazîdê sar bûbû, min dixwest biçim deverekê ku dilê min lê weke teyrikê ji avê derketibe xwe ji işqê daweşîne.

Di kelkela germê de min berê xwe da hucreya hekîmê dilên şikestî Xanîyê rehmetî. Min cubbeyê wî yê ku hinekî jê re kin kiribû dayê û got:

- Ezxulam dilê min û çûna Stenbolê heye.

Bi çavên min de nihêrî û mîna yekî ku bawer neke got:

- kuro bi carekê re Stenbol!!Bêje Wan, Erzerûm, Qers, Sêrt. Bêje Rewan û Xoy, bêje Tebrîz. Ma Stenbol li vire li dera hane? Tu dizanî heta wê derê qonaxa çend rojane û çend fersengin!! ji Bexdadê jî dûrtire ha

Minê ku bûbûn çend meh niyeta çûnê xistibû dilê xwe yê şikestî û şewitî, gotê:

- ezbenî welleh ez jî dizanim ew dûre, ji Esfehanê jî dûrtir e, dibe ku qonaxa du sê mehan dûr be. Ji xwe ez newêrim bi gemiyan herim û ji qorsanên behrê yên ûris bêtir ji pêl û bahozên wê ditirsim, loma jî dê bi karwanan re biçim û dibêjin ku rê pirr dirêj û pirr dirav jî jê re divên. Lê çawa be ji rêya behrê êmintir e. Dê biçim seyda! Êdî debara min li vî bajarî nabe. Cenabê te dizanî ez mirovekî bi serê xwe me, xizanim û berzewacim, kesekî min jî nîne ji bilî van ta û derzîyan!! Ji bextê reş ew jî nema bi kêrî min û meîşeta min tên. Xwedê gotiye di erda mina fireh de li rizqê xwe bigerin.

Hinekî rûyê wî çilmisî, xemgîn bû û gote min:

- kuro Receb binêre! Ev Stenbol e ha!! Gelekî mezin e û mirovan dadiqurtîne, ên ji te zîrektir û ji te bêtir bi xwe bawer û ewle li wir windabûn. Îca hay ji xwe hebe birazê.

Min xwe hinekî nepixand û got:

- qurban welle ez jî dizanim ew mezine, ji xwe ez xwe li mezinbûna wê digrim, lê bêçare me ezqurban.

Xanî cubbeyê xwe rakir û li rex xwe danî, hinekî bêdeng ma paşê got:

- kuro Receb! Em li vê dûra hanê ji Roma reş û finasên wan xelas nebûne, tu berê xwe didî memleketa wan!! Ma tu nizanî ku hindî mirov dûrî Romê be nêzîkî xwedê ye!!

Lê ku wî ku derz û kêlên israrê yên di çavên min de xuya dikirin, veresandin, destê xwe da ser milê min û got :

- de tu zanî. Lê çi hate serê te xwe winda neke. Vê deştê û wî çiyayî bîne ber çavê xwe. Zanibe ku tu kurê vê axê yî.

Hin pereyên ku min ji dirûtina wê havînê qezenc kiribûn û çend heb aqçeyên ku rehmetîyê Xanî ji nasên xwe ji bo min berhev kiribûn, min dane serhev û hin ji wan weke kirêya rê xistin destê karwansalarê ku dê ez bi karwanê xwe re bibirama Stenbolê.

Rêwîtiya mina Stenbolê bi xwe serpêhatiyeke ecêb bû. Xan bi xan em diçûn. Kêçan em dixwarin, xew heta destê sibê bi dest min nediket. Çend caran ez ji karwanê xwe dimam. Sibehan di xanê de razayî dimam û karwan bêyî min diçû. Deşt û çiya û newal û cobar û bajar û gund bêjimar bûn û me hemî qut kirin. Bavo dunya çiqas mezine wî! Heta ku em gihane Stenbolê êdî pereyek jî di berîkên min de nemabû! Cilên min êdî qepalî bûbûn, riya min dirêj û solên min qetiyayî ez gihame Stenbola sultanan û qesr û qonax û seryaên mezin û behra kûr.

Min dilê xwe xweş dikir û digot: ez dê li vir bibim terziyekî meşhûr. Ku nebim terziyê sultan û giregiran , dê li taxekê bi cih bibim û cilên efendiyan bidirûm. Wê malê min pirr bibe û ez dê li Bazîdê vegerim û serayekê li koka çiyayê Gilîdaxê ava bikim, dê bizewicim û bibim xwedî milk û erd. Û xewnên ji van mezintir jî min didîtin û dilê xwe bi wan xweş dikir.

Min nizanîbû Stenbol ewçende mezine. Min digot hema bila ducarî li Bazîdê be, lê derket Bazîda me nabe taxek ji taxên wê. Her camiyeke wê mîna Bazîdê ye û gemiyên di behra wê re diçûn û dihatin ji camiyên me mezintir bûn. Bajarekî ku her xelq û millet tê de hebû, heta qûlên reş yên rûyên wan mîna kodikên tijî ji qetranê jî di caddeyan de dimeşiyan. Qelender û axa û begzade û serbaz û sofî û mela û serbazên ser bi kum û per û dest bi rim û mertal di wan zikak û kolanên mezin û bi daran xemilandî de li bin guhên hev diketin. Serayên Humayonî ku li ser kenarê behrê avakiribûn weke goşiyên ronahiyê bi şev xuyadikirin. Xwedê dizane bê çend cariyeyên goşt spî û çav şîn li ser doşeka xundkarê me bûn û ew mis didan. Ez jî şev û roj di taxên wê de li karekî digeriyam, aqilê minî kurmancî gotibû min; here xwe li Qîzleraxasî bigre û pîşekariya xwe şanî wî

bike, ewê te bigihîne enderûnê û dirûtina cilên heremlikê hemî wê para te be. Îca diçûm kû min dipirsî kanî Qizleraxasî li ku ye, dê çawa xwe bigihînim wî? Ku ji min dipirsîn: xêre çima lê dipirsî?Min digot ezê wî bibînim û ji cêrî û qerwaşên seraya sultan Mustefa re cil û kincan bidrûm. Û min sertilîyên xwe yên hişk, yên ku rastînî jî sertiliyên terziyan bûn raberî wan dikirin.. Wisa ji terzîtiya xwe bawer bûm ku min digot êdî dê bibim terziyê sultan Mustefa bi xwe. Heta rojekê şihnegiyan bi şev ez li serê cadeyekê girtim û teslîmî muhtesibekî kirim û wî jî bê çon û çira ez avêtime zindanekê ji zindanên Topxaneyê. Çend şevan rezîl û riswa li wir mam, dilê zindanîyan bi min şewitî û çîroka min ji hebisxanebaşî re gotin. Wî jî ji bo ku min berde kincên xwe anîn û got: eger tu rast terzî bî û van cilan xweşik bidirû ezê te berdim. Minê ku dixwest rojekê berî rojekê derkevim hemû hinera xwe di cilên wî hebisxanebaşiyî de derxist. Wisa xweşik dirûtin weke ku ji sultan bi xwe re bin ew cil. Û dîsa daketim kolan û taxên Stenbolê. Lê vê carê min nema diwêrîbû pirsa Qizleraxasî bikira.
***

## Êmaya Boşnaqî

Li bajarên mezin, belayên ku têne serê mirovan jî mezinin. Min, piştî deh mehan ku li taxekê ji mehella Qasim paşa li ba terziyekî navdar bûme destek û pere bi ser min de barîyan, keçikeke Boşnaqî nas kir. Ew çend carî hatibû dikana min û cilên zarokên xwediyê xwe li ba min didirûtin. Min tenê çavên wê yên keskî mîna du kevirên zeberced didîtin. Wê, tevî ku cariye bû jî, rûyê xwe vedişart. Keçikeke çav kesk û spehî bû. Horiyek bû û tim bîna enber û cennetê jê difûriya. Min hîn ên wisa xweşik û çavkesk li Bazîdê nedîtibûn. Ew durdaneyek ji agir bû û ez jî xortekî nûhatî ji berfa Gilîdaxê bûm. Dilê min ku ew didît dihelîya. Bêhna jinên weke wê hêj neketibû pozê min. dilbera minî Bazîdê li ber ronahî û şewq û şemala wê bûbû siyeke tarî di xewnên min de. Min carekê dît ku bi dev û rûyan di xwelîya evîna wê werbûme û dilê min mîna kerekî di herîya li ser rêya Xelatê di zivistanê de teqinîye. Êdî roja ku nehatibûya dikanê destên min derzî nedigirtin. Derzên min nebaş diçûn û kêlên min ji hev dûr diketin û tayê min diqetîya. Mîna serxweşan li min dihat. Wê jî muhbeta xwe ji min re izhar kiribû û her cara ku dihat, kela girî di qirika wê de bû û digot: ez êdî ne ji bo dirûtina cilan tême ba te, lê ji bo dirûtina vî dilê riziyayî têm.
Carekê weke bayekî xuşiya hundirê dikanê. Berêvar bû, êdî li caddeyê xelq nemabûn û esnafan dikanên xwe girtibûn. Xwedê kirî xwediyê dikanê ji bo rêwîtîyeke dirêj ji Stenbolê çûbû Edirneyê û her tişt di destê min de hiştibû. Bîna wê ya xweş ya ku dikan û pozê min dagirtibû ez gêj kirim. Nizanim min çawa ta û derziyên xwe avêtin û çûme pêve! Kulikeke biçûk di paşiya dikanê de hebû. Him cihê razana min bû, him jî cihê xwarin û vexwarina min bû. Ku Êmaya Boşnaqî derbasî wir jî bû, kabokên min lerizîn, û nema erdê ez girtim. Te digot horiyeke û vê gavê qapîçiyê cennetê xafil kiriye û reviyaye. Bavgidiyê xweşikî ji kesî re nehiştibû.
Gupegupa dilê min bû û xuşexuşa xwînê bû. wê berçavka xwe avêt û porê xwe yê qesebîn vekir û ez bi alî xwe de kişandim. Ku min li herdu çavên wê nihêrîn gêj û sergerdan bûm. Hişê min bi ser dev û rûyan de kete xwarê. Min jî ew da ber hemêza xwe û pişikên xwe ji bîna wê tijî kirin. Ez xwarî qirika wê ya nerm bû û me hinekî hev vegevizand. Em hinekî axivîn û wê derd û kulên xwe gotin. Lê berî ku reş bikeve erdê gote min:

- ka hela binêre kesek li derve heye an na? divê ez bi lez vegerim. Baş binêre ha!

Weke dînan li min hatibû, min digot xewneke ez dibînim, lê bayê hênik ê ku ji hêla Okmeydanî dihat, weke qumaşekî ji hevirmêşê tenik û zelal li rûyê min da û ez ji wê serxweşiyê şiyar kirim. Şiyariyê jî mîna mîkutekî giran mîxikên hişê min kuttane serê min.ez derketim derve. Min li çep û rastê xwe nihêrî, ji reşayê pêve tu kes li caddeyê nebû. Êdî Stenbolê ebaya xwe ya reş werdigirte xwe û tarî hêdî hêdî dikete erdê. Ez vegeriyam kulikê û min bi awayê dizekî bi hêdîka gote Êmaya Boşnaqî:

- rê eman e Êmûşa min!

Lê bi rastî dilê min hebû ew heta ebedil abidîn di wê kulika min de bimaya û min jî bi tayên xeyalê xwe û derziya evîna wê jiyaneke xweşik ji xwe û wê re bidirûta. Çi bikim ew weke birûskê ji hundir derket, ne giha bibêje min: bi xatirê te. Ez jî bêhemdî xwe bi dû de çûm, çend gavan ji dikanê dûr ketim, awirên min li pê wê mîna mişkê li pey kirtikek penêr bilezîne çûn lê ew di tarîya kolanê de êdî winda bûbû.

Bi şev, min çirayek vêxist û rûyê wê yê nazik û daristanên çavên wê, nermîya memikên wê û germiya wan anîne bîra xwe. Ez mest bûbûm û xewa min dihat. Min hema mûma xwe vemirand çavên xwe dane ser hev.

***

ku roj ji hêla boxaza Qeredenizê hilat, ez jî ji xew rabûm. Pêşiyê min got qey min xewnek dîtiye, lê ku li ber neynikê rawestiyam û çavên min bi şopa mor û şîn ya mijandina Êma, ya ji qirika min re ketin, min nas kir ne xewn bû tiştê ku duh bi min re ciriyabû.

Ji mestbûna xwe ya duh min ji bîr kiribû pereyên ku bi dest min ketibûn li hebanê xwe zêde bikim. Dema ku hate bîra min û min xwest wan qirişan jî bixim nava pereyên berê, min hebanê xwe nedît. Ez ker û gêj bûm û min ew nedît. Kulik biçûk e ma wê bi ku de biçûya ew hebanê tijî dirav!! Nizanim çiqas pere hebûn, lê sê çar Bunduqî û neh deh Florî û bi dehan Aqçe û Quriş tê de bûn. Min dereng nas kir ku Êmaya Boşnaqî dizek bû û ez şelandibûm. Min ji tirsa xwediyê dikanê nema zanîbû çi bikim. Çend rojan mam, pêjna Êma nehat. Ez li wan taxan geriyam û negeriyam min şopa wê jî nedît. Kîjana ku ebayeke reş lêgerandî bûya min dida pey wê û bang dikir: Êma Êma!! Gelek caran jin li min dizîvirîn û tû dikirin rûyê min û digotin: ma tu fedî nakî didî pey jinan!! Êdî bi tepan bi serê xwe ketim. Min çi kir!! Ez dereng pê hesiyam ku ew keçik diz û tepreşek bû, ciwanî û çelengîya wê xefkek bû ji min re vedabû û ez jî qitika kor bûm û tê werbûm. Hatina xwediyê dikanê jî nêzîk bûbû, ku bibêjimê min tu kar ne kiriye, dê bawer neke lewra topên qumaşan kêm bûne, û cilên dirûtî tev gihabûn xwediyên xwe. Ku ez bibêjim pere ji min hatine dizîn dê min bişîne hebisxaneyê. Dibe ku min weke dizekî bide destê muhtesibên Stenbolê û destê min jî weke yê dizan qut bikin. de were vê hetîketiyê!! Çawa dê bi destekî bijîm? Jiyana bi destekî ji bo terziyekî mirin bi xwe ye. Ji neçarî, min kilîta dikanê da cîranekî xwe yê fille û got:

- cîran bila kilît li ba te be ezê herim camiyê nimêja nîvro bikim û vegerim.

Lê ez venegeriyam.

***

## çima navê min bû Delîkurd?

Weke fermanlîyan li min hatibû. Ez mecbûr bûm ji dikana ku min tê de kar dikir baz bidim û berê xwe bidim camîyan. Camî jî li Stenbolê , maşellah, ji derdê dilan bêtirin. Nizanim çi tax bû, çi camî bû, lê hema min xwe lê qeliband û ketim nav wan kesên ku sema gerandibûn. Ew di helqeya zikir de bûn û li dora xwe dizîvirîn. Pişt re min nas kir ku ew mewlewî ne, peyrewên mewlana Celaleddînê Romî ne. Teşiya evîna ku dilê min weke şûşeya çirayekê hûrhûrî kiribû, li wê camiyê dilê min kire gulokek hirî û rêsa û bada. Ez bi xwe jî bûme teşiyek û li dora xwe zîvirîm û min derdên bêrîkirinê hûnandin. Min êdî xwe bi qelender û dewrêşên mewelewîyan re ji bîr kir. Ez ji wan bêtir li dora xwe dizîvirîm û bi cizbeyê diketim. Dûriya Bazîdê, xapandina min a li ser destê keça Boşnaqî, reva min a ji dikanê û tirs û feqîriya min, ez kiribûm dewrêşekî rastînî. Bi saetan li rexê behrê rûdiniştim û min rûyê xwe dida ber çipikên pêlan û li wan qeyik û zenberî û gemiyên mezin û asoyên dûr dinêrî. Li kefa ku min tê de berfa Gilîdaxê didît, dinêrî. Êdî navê min li nêva wan sofiyan bûbû Delîkurd. Nema kesî bi navê Receb bang li min ne dikir. Ji xwe min jî dixwest navê Receb bicehime û venegere da ku xwediyê dikanê xwe lê negire û şopa min nas neke.

***

Wê salê sultan Mustefa taze bûbû xelîfe. Wî xwest mîna bapîrên xwe bi xwe here herba kufaran. Li camîyan xetîb û imaman qala cihada gêwir dikirin. Ez çend carî xutbeya imamê camyia taxa ku lê dimam hazir bûm, wî her qala cihadê dikir, cihada ku eger encama wê şehadet be, ji xwe cenneta xwedayê ezîmuşan û heftê horîyên ku mejîyê hestiyê wan xuya dike û çemên mey û şîr û hingiv e. Û ku zefer be ji xwe cêrî û mal û milk û şan û şeref e. Ez êdî ji jiyana xwe bêzar bûbûm. Tirsiyayî û reviyayî, dilşikesî û yarwinda. Ne pere, ne mal, ne xizm. Dûrî welatê xwe, xerîb û dîn û bêgane. Bi wî halî ger bigotana min were xwe bihavêje ber pêlên Mermereyê, yan xwe ji ser minareya Ayasofyayê bihavêje, dê bê dudilî çûbama.

## Ez dibim spahî, sultan dibînim

Dawîya havînê bû. Nêzîka du salên min li wan waran buhurîbûn. Ji xwe tiştên ku hatibûn serê min Serhedan jî ji bîra min biribûn. Bûbû demek ku min bi kurmancî xeber nedabû. Zimanê min qulipî bû tirkî. Êdî xewnên min jî bi tirkî bûn û ez ji kurmancî ketibûm.

Çaxa ku min bihîst dê sultan Mustefa bi xwe biçe şerê gawiran, min ji imamê camîya taxê re got ez jî dixwazim herim cihadê! Kêfa wî hat, lê ji min pirsî: tu û hespan çawane? Min gotê: hesp di destê min de weke berxikanin. Di siwarîyê de kesek nagihê min. Got baş e lê tifing? Min gotê : na welle ez nizanim! Lê xencerê baş vediweşînim. Kenîya û got: niyeta te tenê bese kurê min, xwezî xortên me hemû mîna te bûna.

Şevekê temam wî ji min re qala xêra cihadê û sewaba wê dikir. Digot: tu bibî spahî him ji dunya him ji axireta te re baş e. Li vê dunyayê dê sultan parçeyek erd bike tîmar û bide te. Gava bû şer tu siwarê hespa xwe yî. Ku şer nema û tu bi selametî hatî ji xwe tu û erdê xwe ne. Ku nebî spahî hema wê te bikin siyahî leşker da ku li rex leşkerên xundkar bimeşî û piraniyê çêbikî ku dijmin bitirse.

Kêfa min gelekî hat û min nema sebir kir ku bibim eskerekî siwarî. Roja din wî ez birim teslîmî serwerê ordîgehekê li wan nêzîkan kirim.

Çend rojan meşqên şer û nîşangirtina bi tivingê bi min û hinek hevalên min kirin û dawî gotin êdî hûn amade bûne ji bo cihadê.

Em tev li sipahê Sultan bûn. Min digot qey ezê jî bibim yek ji wan leşkerên yenîçeriyan ku bi qiyafeta xwe ya xweşik dihatin naskirin û ji her kesî bêtir pol û pere werdigirtin. Lê ez bûme spahî û min tevayî eskerên sultan di dawîya havînê de, berê xwe da Lehistan û Meceristanê.

***

Artêşa me weke topên qumaşan ku werin raxistin dikişiya. Di rêya me de tu artêşan xwe nedigirtin. Tirsa me berî me digihişte kela û şar û gundan. Xasma serleşkerê me sultan bi xwe bû. Îca ku sultan di nava leşker de be ma şikestina wî heye!!

Sadriazam Elmas Mihemed Paşa jî di pêşiya me de bû û ji her wilayetê leşker hebûn. Ji xeyrî yeniçeriyan, bi hezaran leşkerên ji Sîwasê, Erzerûmê, Edirneyê, Anadolyayê, û ji welatên kurmnacan û Erebistanê, Çerkez û Ernaût û Boşnaqan hatibûn cihada gawiran.

Li wir, ji dûr çavên min bi sultan Mustefa ketin. Taca wî mîna şaşikeke spî li serê wî bû û şeş perîkên tawisan di ber de bûn. Ew yekî ciwan, xweşik û netirs bû. Min çiqasî dixwest ez nêzîkî wî bibim û xwarî axa ku ew li ser dimeşe bibim û ramûsim! Lê bi dest min nediket.

Çi şerê ku me di bin alaya wî de kir, em bi izna xwedê tê de muzeffer dibûn. Lê dawîyê tiştê ku hate serê me û sultan û sadriazam, neyê serê seyan.

***

## Sefera Meceristanê û
## Şerê çem

Em bi roj û şev dimeşiyan û me pêjna dijmin nedikir. Eskerên me dilê xwe xweş dikirin û digotin rê heta Viyannayê vekiriye. Tiştê ku sultan Silêmanê qanûnî û sultanên berê û leşkerên wan nikarîbûn bikin, emê bikin. Emê derbasî Viyanna yê bibin û dê her yekî deh cariyeyên porzer ji guliyên wan yên zêrîn de bi dû xwe de bikişînin. Erê me dilê xwe bi keçikên gawiran ku dê bibin kenîzeyên me û tew belkî her deh panzdeh ji wan bibin para me û em hinan bifroşin, xweş dikir. Heta em nêzîkî çemekî bûn. Weke deştekê li wir hebû, fermana serdarên me ew bû ku em wî çemî derbas bikin û bi alî rojava de herin. Îca pirek danîn, li ser wê avê pireke mezin di cî de çêkirin û di berê de Sultan û haşiyeya xwe derbasî wî alî bûn. Ên mayî jî dane pey beyreqa ku li jor sultan li ba dibû. Lê hîn ribê me pir derbas nekiribû me dît leşkerên Prens Ojîn bi ser me de qoriyan. Sultan û xewasên xwe û yenîçeriyan çem derbas kiribûn, lê hêj Sadrîazem û em spahîyên bi wî re li vî rexê çem bûn. Me dît ji nişkêve bi hezaran eskerên gawiran kişiyan û di pêşiya wan de ew prensê yaman. Û bi qêrîna (şîsin şîsin) re gulle û tîr û top avêtin me, te digot barane û dibare, etlayî nedidanê. Birîndar bi heft zimanan dinalîyan. Vizeviza wan tivingan û gurmegurma wan topan bû û hawarhawara me rebenan bû. Îca wey li wî be yê ku xwe berî hevalê xwe xelas neke.
Payîzê dest pê kiribû û serma ketibû erdê. Xuşexuşa daran bû û çem weke bûkekê rengîn bûbû. Baraneke hûrik jî bi ser halan de dibarîya. Ê ku hespa wî hebû xwe zû gihande wî alî çem, lê wey li wî be yê ku peyade bû. Ez bi xwe yek ji siwarîyan bûm, û min dît ji nişkêve şingeşinga şûran li pê min tê. Qêrîn û halan ketibû nêva leşkerê me û dê weledê xwe dihavêt.
Ji nişkêve hawarek kete guhê me û got: sadriazem kuştin, Elmas Paşa kuştin. Me newêrîbû em li pişt xwe bizîvirin. Çemê Tisê yê ku li nêzîkê şaroçkeyê Zenta bû ji xwînê sor bûbû. Topçiyên gawiran nîşana serê pirê girtin û ew hingaftin. Serê pirê şewitî û bi hezaran esker di avê wer bûn û fetisîn. Yê ku avjenî zanîbûya û dikir ku xwe xelas bike, top û tivingan nedihişt. Hespa min binav bûbû û fetisî bû, min jî avjenî nizanîbû! Xwedê di nav wê hirmegurmê de ji min re hespekî qemerî bijîdirêj şand. Min ji şêranîya ruhê xwe her tiştê xwe avêt û xwe li ser pişta hespê zînkirî ediland û da nav avê. Min dît ku pir dişewite û tê xwarê û pê re jî eskerên li ser wê dilezandin û rê nedidan hev da ku bigihin wî rexî, weke kullîyan dihatin xwarê. Ê me jî hîn em li paşî mabûn, ez bi xwe di nav leşkerên waliyê Diyarbekrê de bûm. Diviyabû em li hêvîya dora xwe bin ku pirê bibûrin. Lê ku ew hate xwarê serdarên me bang kirin ku, her yek xwe xelas bikin û zû herin wî alî.
Li vî alî min û wî alî min serbazên reben noqî bin avê dibûn, çelpeçelpa wan bû li ber xwe didan. Her kesî bang li diyên xwe dikirin, bang li ewlîya û enbîya û şêxan dikirin. Lê Ezrayîl û gulleyên tivingên wan bêbavên gawir ji her kesî nêzîktir bûn wê roja giran.

Diya min ji min re dua kiribû û xwedê ew hespê qemer ji min re şand. Te digot qey ew heywanekî behrê ye û jiyana xwe hemî di nav pêl û ava çeman de derbas kirîye, wisa rihet û nerm û xweş di avê de diherikî.
Li wir, di nav vizîniya gulleyan de, gurmîniya topan de, û qêrîn û hawara serbazan de û guşeguşa hespê minî qemer di nava avê de dengê rehmetiyê Ehmedê Xanî hate min: Vê deştê û wî çiyayî bîne ber çavê xwe. Zanibe ku tu kurê vê axê yî.
Sal di ser re derbas bûbûn ku Xanî ew gotin ji min re kirin berî ez Bazîdê bişemirînim. Lê weke ku Xanî hatibe di guhê min de peyivîbe, ew deng zindî û taze bû. Dengê wî bi xwe bû kire zimînî di guhê min de. Erê welle ew zatekî mezin bû û kerametên wî hebûn. Û wê roja giran ew li min eyan bû.
Ez li ser hespê, mirin li hawîrdora min dîlana xwe ya hov dike, ew gotinên Xanî ketin guhên min û ez fikirîm. Gelo ez li ku me? Çi dikim? Çima dûrî Bazîdê me? Şerê kê dikim? Ku niha li vir bême kuştin dê kî fatiheya min bixwîne û kî şîna min bigerîne û xêra min belav bike? Dê kî kêlekê li ber

serê min deyne û navê min li ser bireweêje? Mirina min û mirina kêçekê di nav tilîyên korekî de, dê ne weke hev be gelo?.
***

## Ez ne kêç bûm

ku min dît çawa sultan û giregir qûnên xwe dan wan gawirên afat û li yek haweyî berê xwe dane Temeşvarê, min nas kir ku cihada ez ji bo wê di van çol û kerbelan re derketime, cihada derewîn û sexte ye. Bi xwedê em sed hezar nefer bêtir bûn û gawir nîvê me jî nedihatin. Lê me nîvê leşkerên xwe, kuştî û birîndar li dû xwe hiştin. Tiştên giran weke erebeyan, sendoqên zêran li dû me man, dahol û naqûr û haletên Mehtertaximî tev de li dû me di destê gawiran de man, bi xwedê ku jinên wan jî bi wan re bûna wê ji ber şêrînîya ruh ew li dû xwe bihiştana!
Bêhna Bazîdê di wê rojê de zora bêhna barûdê dibir. Minareyên camîyên wê, qeyserîya wê, kela wê, sûka wê, taxên wê, dar û ber, çem û newal û gul û kulîlk û siya dîwaran di berêvarên havînan de, Gilîdax û buharên wê yên weke perîkên tawisan û zingezinga zengilên beranên di pêşiya kerîyan de. Xirecira zarokan û xingxinga bazin û xilxalên keçikan, teşîrêsên li ber tavika adarê hirîya pez dirêsin, û her kêlîkek biçûk û deverek hatin ber çavên min.
Em direvîyan û min di dilê xwe de biryar stand ku êdî nekevim tu şerî. Min li wir nas kir ku bimrim dê mîna kêçekê bimrim, lê ez kêç bûm.
Piştî ku em li Stenbolê vegerîyan û xwedê jiyaneke nû ji min re nivîsand, min dîsa berê xwe da camîyan û li helqeyên zikrê mewelewîyan vegeriyam. Ji berê bêtir li dora xwe dizîvirîm. Ez dizîvirîm mîna çerxikê lê sûretê Bazîdê ji ber çavên min nediçû. Her bi çerxekê re bêhna buhara wê bîndartir û bitîntir dibû û ez gêj dibûm. Qelenderekî kor ji Bursayê bûbû dostê min. Ez û wî gelek caran diçûn li kenarê Xelîc rûdiniştin û bêdeng me li pêlên avê dinêrî. Wî digote min: ez dixwazim bi çavên te behrê bibînim. Min jî dixwest ez bi dilê wî li nûra xwedê binêrim. Min çîroka xwe û şerê çem yek caran jê re digot. Dikenîya, çavên xwe yên bêronahî dikutkutandin û destê xwe dida ser birûyên xwe û digot: cihada mezin cihada nefsê ye. Vegere hundirê xwe Receb, vegere nefsa xwe û bi tîp û ordîyên kîn û fesadiyê re şer bike, bi leşkerê hesûdî û zikreşiyê re têkeve cengan. Xazî ew e yê ku bi nefsa xwe karibe. Her kes dikare bibe rimbazek yan kemankeşek, yan jî balteçiyek. Her kes dikare tevrê hilgire û serê gawirekî bifirîne. Ew ne mêranîye Receb. Mêranî ew e ku tu di şerê xwe yê derûnî de muzeffer bibî. Û dest pê dikir hinek ji Mesnewîya Mewlana dixwend:
*Sehli şîrî dan ki sefha bişkined*
*Şîri an est, an ki xodra bişkined*
( hêsane şêrek sef û tîpan bişkîne, lê şêr ew e, yê ku zora xwe bibe).
***

jiyana Stenbolê êdî roj bi roj ez winda dikirim. Xanî gotibû min xwe winda neke, lê li bajarekî mîna Stenbolê ku nîvê dunyayê ye êl û eşîr winda dibin, îca rebenekî mîna min!! Min ji wî qelenderê bûrseyî re raza dilê xwe got ku ez dixwazim vegerim, wî jî got:

- Vegere. Nefsa te bi te re ye, li ku be şerê xwe û wê li dar bixe.

Bi halekî xirabtir ji halê ku pê ji Bazîdê derketim, lê vegeriyam. Çend salên min bûbûn ku dûrî wan der û doran bûm. Xelqê ji porê minî spî û rûyê minî qermîçokî ez nas nedikirim û min jî gelek nas nedikirin. Serpêhatiyan serê min di kafûrê da kiribûn. Porspî mîna kalekî saldar bûbûm.
Ku Xanîyê rehmetî çav li min ket bişirî, kêfê di rûyê wî de dîlan kir û hat ez hemêz kirim. Bêhna hibreke xweş û enberîn ji wî dihat. Mehekê sax ez bernedam. Her êvar li ber şewqa çiraxê min ji wî re serpêhatiyên xwe digotin. Qala wî şerê mezin kir ku çawa sultan ji ber mîrekî gawiran bazda. Keser hiltanîn û digot: de binêre ha! Ma mîrekî me vê cesaretê dikare bike!! Ew gawirin lê xwedê

pişteka wan e ku dibin yek. Em Kurmanc misilmanin jî lê xwedê pişta xwe dide me ku em ne yekdil û yekdestin.
Pirsa wan welatan ji min dikir, pirsa mewlewîyan û kitêbxane û camî û serayên Stenbolê, sûk û zikak û cadde û dikanên wê û behra wê ji min dikir. Min jî her tiştê ku min dîtibû jê re teqrîr dikir.
Çi bibêjim!! Min dereng Mem û Zîna wî dît. Eger berî çûna min bûya, hema min xwe nedihavête agirê wî şerê giran. Xanî ez pê hisandim ku madam şer e, divê li dijî Romê be ne ji bo wan be.
Niha ew çûye rehmetê, gora wî bihuşt be û mekanê wî cennet be, heyfa wî. Welleh ji kerban mir. Ew mirovekî gelekî kerbokî bû, jar û zeîf mîna ta û derzîyna bû. Zer û zerhimî û her û her mîna mûmekê dihelîya. Dibêjin ew hatiye jehrkirin. Ez bawer nakim, dijminê wî nebûn, her kesî jê hez dikir û qedrê wî nas dikirin. Mîr bi xwe çiqas qedrê wî zanibû û gelek caran ew vedixwende meclisa xwe.
Dibêjin jî, roja ku wefat kir baraneke ji hibra reş bi ser Bazîdê de barîya! Min bi çavê xwe nedît. Gava ku Teymûrê fasiq wisa qêriya û got: hibr dibare. Min jî weke hemûyan li jor nihêrîn. Hinekî reş bû lê ma hibr dikare bibare! Lê gelek dibêjin û ez jî bawer dikim.
Ew zatekî mezin bû. Xwedê dikare ji bo wî her tiştî bike, kerametan bide wî, ma ew kêmî mewlana ye qey! Helbet kesê ku qedrê wî li ba xelqê mezin be, dê xwedê jî qedirşunasê wî be.

# Xalidê çolaq

Ku çardara rehmetîyê Xanî ji dûr xuyabû, min gopalê xwe rakir û çûm ku xwe bidim binê termê rehmetî . Min xwest destê xweyê çepê bihavêjim destikekî çardarê lê Mîrza Sebrî ez dûr xistim û got: na na apê Xalid berê xwedê destekî te ji te standiye û bi ser de jî tu kalî. Em herçar besin.
Dilê min gelekî şikest û bi rûyekî xemgîn ez dûr ketim û bêdeng mam. Lê çi xema wî teresî bû!! ne ji xwedê ditirse ne jî ji evdan fedî dike. Wî rojekê jî a xêr li ser rehmetîyê Ehmedê Xanî negotibû. Her li civatan henekê xwe pê dikir û digot: de ji xwe re li aqilê wî binêrin!! Kurmancî lo! Kî li şûna wî bûya dê şiirên xwe û kitêbên xwe bi tirkî yan jî bi farisî binivîsandana. Kurmancî!! Ellah wekîl yek ne dîn be bi kurmancî nanivîsîne.
Ez tenê bi kurmancî dizanim, mirovekî bêsewad û nexwenda me, lê ji eş`arên Xanî hez dikim. Her çendî ji bo min zor û zehmetin jî lê çawa bin ji yên bi tirkî û farisî hêsantir û xweştirin û nêzîktirî minin. Nizanim, hema giyanê min pê re diheje û têm ku li ber bihîstina wan, tevî ku guhên min giran bûne jî, bi cizbê bikevim. Ez gelek caran jî li ber wan girîyame.
***

## Ez ne çolaq bûm

Ez berê ne çolaq bûm. Min bi herdu destên xwe bi guhê çewalan digirt û dihavêtin ser pişta xwe û sed gazan û bêtir jî dimeşiyam. Ez hembalekî bi nav û deng bûm li sûka Bazîdê. Ku qafile û kerwan ji Rewanê û Xoy û Makuyê û ji Tebrîzê û Diyarbekrê dihatin, bazirganan berî her kesî bangî min dikirin. Pişta min ji tehtê û zendên min jî ji pola xurttir bûn.
Ez xort bûm, bîst salên min neqediyabûn lê qeweta min a mêrekî mêr bû. Bavê min digot: tu hîn şîrmijek bûyî, te şîrê sê zarokan dimêt. Dayika te ya reben mecbûrî jinên Bazîdê bû û tu birî ba wan. Tu bûyî biraşîrê nîvê zarokên di jiyê te de. Û dema tu pênc salî bûyî te zora hemsalên xwe û mindalên ji xwe mezintir hemûyan dibir. Kevirên herî mezin te radikirin û di deh salîya xwe de te karîbû bi şûr bilîsta û rim bihejanda.
Di malbata me de ev hêza xwedayî wiraset bû. Em bi navê malbata Kohşikenan ji eşîra Marxurana ku berê li derdora Wanê bûn, dihatin naskirin. Lê rizqê me teng bû. Bi qasî ku qeweta me pirr bû wî qasî rizqê me hindik bû. Bavê min cotkarî li ba axayan dikir, û li ber gîsnê cot di jiyê heftê salî de mir. Ez jî bûme hemmal, lê ez berê ne çolaq bûm.
Pîldar û tasnêrên ku di zarotiya min de li qedera min nihêrîbûn, xêzên di enîya min de xwendibûn û gotibûn ev lawik dê di xortanîya xwe de ji qewet bikeve û tiştekî xwe winda bike. Sal buhurîn û ez bûme xortekî hijde nozde salî, me fala tasnêr û pîldaran ji bîr kiribû.

Wê çaxê hîn Rewan di destê Eceman de bû. Ev bajarên li van kenaran bûbûn goyên li ber kaşû û çewkanan, geh lêre bûn geh jî li wê. Îro beyreqa Eceman bilind dibû, siba din ala ya romiyan. Bi roj qizilbaş bûn, bi şev sunnî. Û em jî feqîr û fiqare li ber pêlên ecem û romiyan mîna qeyikeke bi qul bûn.
Wan salan rehmetîyê sultan Muradxan bi xwe hat di welatê me re derbas bû. Berê wî li Rewanê bû. Li camîyan û li xanqah û tekyexaneyan şemateyên ecêb mezin hebûn û bûbû qîreqîra sofî û melayan û dewrêşan banga cihadê dikirin. Digotin ê dixwaze bi leşkerê sultan re here rê vekiriye.

Ew rê rêya cennetê ye jî. Ji xwe ku beyreqa zeferê were hildan, wê were hildan jî, dê her neferek, her peyade û spahîyek komek pere bistîne ji xeyrî extirme û yexmayên cengê ên ku ew bi xwe bidest bixe. Û em timadarê qerwaş û kenîzeyan jî dikirin. Em xort bûn me hê ji dunyaya xwe tiştek nizanibû. Xwîna me germ bû û em çend sed heb li pey begler û axa û serwerên xwe tebayê ordîya sultanê me bûn. Wê hingamê mîrê Bazîdê mîr Evdîyê kurê Qerexanê meşhûr bû. Mîr Evdî xalê rehmetiyê Ehmedê Xanî bû. Ew tim li nêçîr û ravê bû. Geh li gelîyên Gilîdaxê baz û şahîn digirtin û geh li jêra quntara Sîpanê Xelatê pezê kovî nêçîr dikirin û geh jî li dawa Tendûrekê qitik û kew digirtin û geh jî li keviyên gola Wanê bû.
Rojeke înê ez çûme camîya Sinaniye. Mele Ilyasê bavê Xanî , ku herdû bûne rehmetî, xutbe dida. Dengê wî camî dihejand û xelq ji bo cihada eceman dihêvot. Gotinên wî xweş bûn û ilmê wî fereh bû. Ma kê dikarîbû zora wî bibira!! Ewî di baskên barçemokê de av vexwaribû û zimanê tûtiyan xwaribû. Ew bûbû melayekî heft ilmî. Em jî gelek li dû gotina wî çûn û me bawer nekir em bigihên meydanên şer û cihadê bikin.
Piştî çend salan min nas kir ku mezinên êlan em weke pez difirotin serdarên ordîyê. Serê her yekî ji me bi çarsed pêncsed aqçeyî bû. Me nizanîbû ku em koleyên serêlên xwe ne. Me nizanîbû ku em mîna pirtalan li bazar û sûkan têne firotin.
***

## Sefera Rewanê
## ez dibim xazî

Şerê Rewanê şerekî mezin bû. Her ku tê bîra min dilerizim û ta digirim. Ev heftê salin şingeşinga şûran ji guhê min neketiye. Qêrîn û halan, heyheya serbazan û nalîna birîndaran û hîrehîra hespan ji guhên min neketiye.
Wê çaxê sultan Murad xortekî ciwan bû. Ew li ser bedeweke kihêlî erebî ku bi zêr û zîv zînkirî bû û rişma wê ji hevrîşimê çînê bû di pêşiya leşkeran de bû. Çend tewacî di bin sîwana ku li ser wî vedabûn de dimeşiyan. Hinan jî bi baweşînkên ji perîkan ba lê dikirin. Sultan bi xwe hatibû şerê Rewanê û me bawer nedikir ku em siya wî bibînin. Xêla wî tim nêzîka nîv fersengê dûrî me bû. Me pirr dixwest em bi dîtina wî teşerruf bibin lê bi dest me nediket. Em mîna gêrikan bûn û ew jî weke hezretê nebî Silêman bû, ger nezer carekê bida me em dê bê çeng û bal bifirîyana.

Erê bi banga cihadê re em rabûbûn, lê timaya me hemûyan ji horîyên cennetê bêtir, di carîyeyên gurcî û eremnî û zêran de bû. Ji xwe ê ku weke min xizan bûya, roj roja wî bû, yan mirinek ku yekî dibe cenneta xwedê teala û horî û qesr û qonaxên wê par û nesîbê wî bûn. Yan jî cêrî û mal û cahekî mezin li dunyayê dê li hêvîya wî bûna.
Hinek bi şûr û mertal bûn. Hinek bi rim û mizraq û qeseb bûn. Hin bi gurz bûn û hin jî tiving di destê wan de bûn. Hindek jî bi tîr û kevan bûn. Keyber di ber hinan de bûn û ê min û çend hevalan jî em bi tevr û satûr bûn û peyade bûn.
Ji me re digotin satirçî û gelek eskerên din qerf û tinayziyên xwe bi me dikirin û digotin: hûn qessabên berazane!! Hevalên min ji wê henekpêkirinê dilteng dibûn lê min dengê xwe nedikir û di dilê xwe de digot: Ka hela bisekinin ezê di sewaşê de şanî we bikim bê çawa satûrê min ji şûrê we tûjtir û bikêrtir e! ezê li meydanê şnî we kim bê kî qesabê berazan e kî yê mêran e!!
Havîn bû. Di bin roja temmûzê ya ku weke gurzekî ji agir li ser serê me daliqîyayî bû em dimeşîyan. Her yek ji me ji xuhdana hevalê xwe bêzar dibû û pozê xwe digirt. Ku em nêzîkî Îdirê bûn ek ketin nav parêzan û me da nav lemên qitî û zebeşan. Ew bajarekî kana meyweyan bû û xelqên me ji wir bi keran barên zebeş û qitî û zerdleo û cûreyên din yên meyweyan dianîn. Mîrên

me jî li derdora wê nêçîr dikirin. Hasilî me tiştek di wan werz û parêzan de nehişt. Mîna kullî me ew kaf û yekûn kirin û dîsa meşiyan heta em hatin û me nêzîkî li çemê Erezê kir. Li her du rexên çem, esker mîna mêşên di kewarekê de civîya bûn û dixulxulîn. Dû ji agirê ku di bin qazanan de vêketî bû radibû ezmanê heftan. Vingevinga me bû û em her çend nefer li dora sêpîyekê civîyabûn û di intizara xwarinê de bûn. Hinan ji me xwe avêtin nêva avê û sobayî kirin. Kêf kêfa me bû û hayê me ji tiştekî nebû.

## Hevalê min bi mirîtî dibe Tewacî

Ku em çûne rojhilatê çemê Erezê, roj nû hilatibû. Êdî çiyayê Gilîdaxê bi berfa xwe ya spî em hênik dikirin û qewet dida me. Em çiqas dûrî çem diketin û nêzîkî Rewanê dibûn jî, çiya mîna xwe bilind û spî dima. Ji xwe ji ber şewqa rojê te digot qey ew perçeyekî mezine ji gewher û mirarîyekî di taca serê sultanekî mezinî qeba şîn de. Ewran xwe li serî gerandibû. Ê me jî xewn li serê me bûbûn şaşik û ewr.
Bernîvro em gihanê şarê Rewan. Dengê gurmîna dahol û naqûran erd û ezman dihejandin. Her bi gurmînekê re dilên me jî dihatin ku ji sîngên me bipekin. Bi wî awayî em gihane ber çemê ku şar dorpêçkiribû, te digot şarê Rewanê bûkeke û av kemera wê ye. Lê ne av û ne agir karîbûn li ber leşkerê sultanê mensûr rawestiyana. Leşkerên me, peyade û siwarî û yenîçerî û heta siyahîleşkeran jî bi hezaran li hawîrdor rêzbûbûn. Li hêla din jî Qizilbaş û leşkerên eceman ji daberizînê re hazir bûbûn. Bi fermana sultan re pêlên leşkeran bi nav hev ketin. Me hêriş kir û em mîna gulokên agir bi pêş de çûn.
Hevalekî minî Diyarbekrî jî satirçî hebû. Hîn berî ku em bigihên Rewanê min û wî me hevaltî kir. Wî xwezîya xwe bi jiyana li Stenbolê dikir û digot bila ez li wir bim, bila hema bibim tewaciyek. Ez dikenîyam û min digotê: pismam tu bêgunn li Stenbolê bijî, mîna ku tu najî! Wî digot: na pismam na!! ma te ne got ezê li Diyarbekrê çi bikim ji van gunnan! Li vir bi kêrî min nayên dê li wir jî bi kêrî min neyên.
Em di şer de jî li rex hev bûn û ku agirê sewaşê hilbû ew li hêla min a rastê bû, wî ez diparastim û min ew. Lê tiştê ku hate serê min û wî nehate serê tu kesî.
Eceman gelekî li ber xwe didan. Serdarê wan dizanîbû ku ew bişikê dê şahê li Esfehanê Sefî Mirza herdu çavên wî bi sîxên sorkirî derîne û wî di binê bîreke zuwa de birizîne.
Îcar wan ecêb liberxwedidan, gurz dihejandin û di serê leşkerên me werdikirin. Tîr per dikirin û di sîngên me de diçikandin û di piştê re derdixistin. Ê ku binber û zirxê wî hebûya ne xema wî bû, lê rebenên mîna me av û av diçûn. Şûrên misrî, Caferî, Hindî û Lahoran hevdu radimûsandin û jehra mirinê ji ramûsanên wan diwerivî. Aşê ecel hate gerandin û serî mîna daneyan hêran.
Siwarên pehlewan li bin guhên hev diketin. Ji her alî dadiberizîn hevdu û serî difirîyan û dest û pa qut dibûn. Nalîn û efxanên birîndaran, hîrehîra hespan û heyheya serbazan bû. Êdî her kesî digot xwedêyo ez. Hevalê min ê Diyarbekrî dev ji min bernedida. Satûrê xwe li ba dikir û sînga qizilbaşan pê diqelaşt.
Ez jî weke ku satûrê min birûskek be di destê min de, min ew çep û rast vediweşand û dara jîyana serbazan ji kokê de hildikir. Heta carekê du heb bi ser min de hatin. Min bala xwe da wan ku bi zend û binber in, bi cewşen û kumê zirxkirî û teberzînin û her yekî kolosek li serî û reng û rûyên wan mîna hevin. Goya ku bi salane meşqên sewaşê kirine. Weke hev tevdigeriyan. Bi hev re dihatin pêş û bi hev re bi şûn ve diçûn. Goya ku herdu yekmirovin lê bi du laşanin. Ji nava ewqase leşker berê xwe dane min û hemle kirin. Min jî yeka xwe nekire du û satûrê xwe veweşande ê ku pêşiyê hate pêşberî min. Satûrê min di sînga wî de lêket û min dît hinavên wî xuyabûn. Kezeb û

dilê wî xuyabûn û bi derbekê re sist bû û stûyê wî xelîya. Ku min satûrê xwe kişand çavên min li dil û cigerên wî yên rijiyayî ketin. Ulq hatin min û hindik mabû ez verîşim. Hevalê min ê Diyarbekrî xwe da rex min û got: malavayo li birîna vî qizilbaşê nepak û heram nenêre. Hay ji xwe hebe va yê din jî hat. Kuro xwe bide alî va ew seg hat. Bi rastî jî ewê din ku çav li hevalê xwe ket çawa hate xwarê, qêrîna heft jinbîyan pê ket û got:

- Way Heme birakem way Heme birakem!! Jînim le paş mergit heram bê.

Wî jî mîna me bi kurmancî xeber dida, erê hinekî ferq dikir lê min jê fam kir ku ne ecem û qizilbaş e. Ku min ew ne kuştibûya minê ji ku zanîbûya ew jî kurmanc e!! Ancex mirina wî ew bi min da naskirin. Çi bikim? qeder e û şer e û diviyabû yek ji me yê din bikuje.

Wî mîna berazekî berîya Mûşê hêriş kir. Şûrê wî du gazan dirêj bû. min nikarîbû ew bi satûrê ji ser xwe veda. Ew rimbazekî çargurçik bû û xezeb û kîn ji rûyê wî difiriyan. Em hatin rastî hev û çavên me berî me bi hev re şerkirin.

Ku min bi çavên wî de ziq nihêrî, nema dengê tiştekî hate min. Tenê dengê kînê û hewara tolhildanê ku ji herdu çavên wî yên reş bilind dibû dihate guhên min. Kurtekêlîkekê çokên min sist bûn û ez pê hesiyam ku di erda xwe de bûme mîxekî kutayî.

Yên ku berê ketibûn şer û sewaşan hîn em di rê de bûn gotine me ku we dît leşkerê dijmin rawestiya, fersendê nedinê û bi ser de bipijiqin. Min jî nexwest wê fersendê bidim wî şervanê han, xasma ku tenûra kînê di dilê wî de taze hatibû dadan û kuştina min li ba wî bûbû ferza nimêjê.

Ez pijiqîmê û qêrîyam û min got:

- Ey segbav were te jî bikim xwarina devê satûrê xwe.

Ew jî mêrekî ji pişta mêran bû, lehengekî têra xwe hebû loma jî xwe neda alî û hate min û qêrîya :

- Wey xot segî û bawkit seg e. Min Ewlayê Merîwanîm, perwa be mirdin nakem.

Û bû şingeşinga şûrê wî û satûrê min. Carekê min dît wî şûrê xwe veweşand rastî qafê min. ku min xwe nedabûya alî wê ez di nêvî re bikirama du felqe. Lê dîsa jî min xwe baş neda alî û şûrê wî bi ser milê min de hate xwarê. Heval û pişmêrê min ê Diyarbekrî dît ku ez ketime ber derbên wî û destê min ê rastê ji kokê de hatiye birrîn. Bi hewara min ve hat û xwe da aliyê min ê rastê. Birîna min germ bû û hayê min ji tiştekî nebû. Bi wî halî min satûrê xwe hîn dihejand û bi ser wî de diçûm. Min û hevalê xwe me ew da ber satûran û ew parçe kir û termê wî jî bi ser termê birayê wî de ramedand.

Ku birîna min hinekî sar bû, janeke ecêb kete sermilê min û xwîn bû kanî û ez ji ser hişê xwe çûm.

***

Dema ez hatim ser hişê xwe, xwîna min hîn diherikî. Birîna min dijeniya. Du eskeran hişk bi lingên min girtibûn û du eskerên din jî bi ser û destê min. Hekîmekî nisêbînî di ordîyê de li ber serê min bû û ez di binê konekî de bûm. Wî hekîmî satûrê min li ser agirekî sincirandibû. Êdî satûr bûbû pizoteke ji agirê cehennemê û ji nişkê ve bi wî satûrê sincirî birîna min dax kir û kewand. Ku goştê min kire çizînî qêrînîya min giha Gilîdaxê û ez dîsa ji ser hişê xwe çûm.

***

Ez nizanim çiqasî jihişçûyî mam. Lê ku dîsa hişê min hate serê min, min dît ku wî hekîmê Nisêbînî melhemek ji kevza çem û simaqê û kifika nanê kevn hazir kirîye û di şûna milê minî qutbûyî dide. Xwîn sekinî bû lê jana şewatê tev li ya birînê bûbû û erdê ez nedigirtim.

Sultanê me Rewan bi dest xistibû û hêlehêla leşkeran bû kêf dikirin û dîlan digerandin. Gelek ji wan bi talanê daketibûn û çek û cilên kuştiyan dicivandin.

Çend roj bi wî awayî derbas bûn, birîna min êdî sivik bûbû û milê min di nava melheman de mabû. Hekîmê nisêbînî digot ku havînan birîn genî dibin, loma jî divê rojê du sê caran kifika nan û simaq û kevzê di birînê bide. Ez bi wê melhemê baştir dibûm lê êdî destê min, ji qewlî melayekî Eleşgirî ve, berî min çûbû cennetê.

Piştî çend rojan min nema pêjna hevalê xwe yê Diyarbekrî kir. Min pirsa wî ji hin leşkeran kir gotin: Ew şehîd bûye. Ew ketibû bin simên hespan û gunnên wî teqiyabûn. Xwesteka wî ya berî kuştina wî hate bîra min. Wî digot xwezîya ez hema bibim tewaciyek li Stenbolê. Xwedê duaya wî bi mirîtî qebûl kir.
Ji wir sultanê me berê xwe da Tebrîzê û ew jî fetih kir. Ê min ez çend mehekî li Rewanê mam heta ku birîna min hate hev û axuft. Dawîyê bêrîkirina Bazîdê li min zor kir û ez di payîzê de li mal , bêyî ku tiştekî ji talanê bi dest bixim û tenê bi navê Xalidê çolaq, vegeriyam.
***

## Ez birakuj bûm

Ehmedê Xanî hîn elifbê li ba rehmetiyê bavê xwe mele Ilyas dixwend ez bûbûm dostê malbata wî. Min jî hinek dersên qurana kerîm li ba bavê wî xwendin. Êdî ez nema bi kêrî karekî diahtim. Ez ne beg û xanek jî bûm ku sultan ji bo min destekî ji zêr çêbikira. Lê hezar car şukur ku meaşek ji min re girêdan min debara xwe pê dikir.
Rehmetiyê Ehmed çend salî bû nizanim, lê havîn bû û meha remezanê bû. Êvarekê ez çûme camiyê min dît ku mele Ilyas di mihrabê de rûniştiye û her du rexên mihrabê bi du mûmên stûr û vêketî xemilandîne. Xelq ji terawîhan belav bûbûn û ew û kurê xwe Ehmed, rehma xwedê li herduyan be, tenê mabûn. Ez ecêb mam û min gote mele Ilyas: seyda ma xewa vî lawikî nayê? Kenîya. Di ronahîya mûmê de kenê wî weke buhara deşta li binê Gilîdaxê xuyakir û got:

- Wisa li Ehmedê min nenêre Xalid can. Ew kurekî di ser xwe re ye û ji avê bêtir tiyê ilm e. Biçûk e lê tu dibêjî qey wî zimanê tûtîyan xwarîye. Şevên wî bi xwendina qurana kerîm dibuhurin. Niha bi vî jiyê xwe cuzuya ´Emme kuta kirîye û dest bi Tebarekê dike. Deh hedîsên Newewî jî ji ber kirine.

Paşê berê xwe da kurê xwe û gotê: Ehmedê min ka sûretê E´mme ji apê xwe re bixwîne.
***
Min zarotî û xortanîya Xanî tev dît. Mirovekî him bi ta`et û ibadet him jî bi ilm û me`rifet bû. Dilê kesî nedihişt û ziman ji yê wî şêrîntir nebûn. Bi kalên mîna min re pirr bi hurmet bû û li macera û çîrokên me û qisse û şerên eşîrên kurmancan, herba qizilbaş û leşkerên hezretî padişah guhdarî dikir. Bi saetan bêdeng dima, tiştin li ser kaxezên xwe dinivîsîn û diçû hucreya xwe. Carekê min xwest serpêhatiya xwe û şerê Rewanê jê re bibêjim. Wî hîn Mem û Zîna xwe nenivîsî bû û li camîya Muradiyeyê menzûma eqîdeya îmanê ji suxteyan re îzah dikir. De wî jî ku hema çav li min diket, bi çi mijûlbûya diterikand û digot: apê Xalid kerem bike were em şeva xwe bi mûmên macerayên te geş bikin.
Û ez rûdiniştim û min digot.
Wê şeva ku min qala wan herdu birayên di ordiya Şahê eceman de di şerê Rewanê de kir, gelekî bîna wî teng bû. Menzûme ji destê xwe avêt û rabû ser piyan û çend caran li ser hev got: wey li me û qedera me ya reş be. Çi hatiye serê me kurmancan û em pê nizanin. Ew şah û sultanin, em jî serbaz û nefer in. Ew agirê şer geş dikin, em jî mîna qîtikan dişewitin!!
Piştî wê şevê her ku ez didîtim digot: apê Xalid dilê te nemîne tu bûyî birakuj. Lê li ber xwe nekeve sûc ne sûcê te ye û ne jî sûcê wan xortên Merîwanî ye. Sûc sûcê mîrekên me yên ehmeq e.
Ku sal derbas bûn û rehmetî Mem û Zîna xwe nivîsî min fam kir ku çiqasî bi me hatiye kenandin û em bûne amacên tîrê qezayê ku bi destên Tirk û Tacîkan , Rom û Eceman di sîng û dilên me de diçikiyan.
Seqetîya min nahêle ez macerayê ji bîr bikim û hîn dengê wî xortê ku min navê wî jî nizanîbû di guhê min de ye, heta ber devê tirbê jî wê ew deng di guhê min de bizîzike û qêrîna way birakem way birakem dê tucarî neşim ji bîr bikim.

**Sofî Heyderê Qersî**

## Şûştina dilan

- Dil bi çi sîqal dibe sofî Heyder?

Rehmetîyê şêx Ehmedê Xanî quddise sirruhû, piştî nimêjeke fecrê li ber ronîya qendîlekê ku bi ser mihraba wî de geş bû ev pirs ji min kir. Min li ber destê wî Mentiquuteyra Ettarê Nîşabûrî dixwend. Em gihabûn hikayeta Şêxê Sen`anî û me ew mitale dikir. Wî kitaba ku taze jê re ji Tebrîzê hatibû xiste nav tilîya xwe ya şehadetê û ya mezin ku herdu jî ji nivîsandinê û hilgirtina qelemê stûr û zivir bûbûn û pirsa xwe mîna qendîlekê di mihraba dilê min de vêxist.
Bala min çû ser xemra ilahî ku mutesewwif wê mîna aveke ji bo şûştina qerêja qelbê mirovan bi nav dikin û min beyteke melayê Cizîrî got:

*Cama ji destê şahid, jengê ji dil dişotin*
*Pîrê Muxan ji rendan, we we dikir riwayet*

Şêxê min hinekî bêdeng ma. Çavên xwe girtin û hilmeke kûr kişand. Min dizanîbû ew êdî kêra xeyalê xwe yê muqeddes li ser kevirê zanîna xwe disû. Ez jî bêdeng mam û min hey li nûra ku di wechê wî yê zerhimî de dibiriqî temaşe dikir. Ku kêra xeyalê wî bi wê sûtinê tûj bû çavên xwe vekirin. Mentiqutteyr ji nava herdu pêçiyên xwe yên qalind deranî û bi aramî, mîna ku nesîmê seherê bi xwe xeberdanê dike, got:

- Sofî Heyder ku ne agirê işqê be, dil sîqal nabe. Te dît çi bi serê şêxê Sen`anî hat ne!! Ew dil kete keça kufaran û ji bo wê kemer li newqa xwe best û beraz çêrandin û mey jî vexwar. Goya ku işqa keçikê tenûreke dadayî bû û dilê wî jî şîşeke zenggirtî bû. wî xwedê bêtir nas kir û nûra wî di rûyê wê keça gawiran de dît. Rehmetiyê melayê Cizîrî dibêje dil bi meya xwedayî tê şûştin. Erê raste, lê şûştina dilan tenê ne bese!! Ku ne agirê êtûnekê be jeng naçe. Her mirov û insanê ku qelbê xwe nedanîbe ser agirê işqeke heqîqî, ew dê dilgemarî bimîne heta ebedê.

Bayê sibê yê hênik û nerm êdî di hêwana camîyê de digerîya, qendîl dihejand û sîyên me jî pê re dihejîyan. Şêx Ehmed quddise sirruhû el ezîz, Mentiqutteyr da alîyekî û got:

- de binêre ku ne agirê qendîlê bûna niha em dê bê sî bûna. Sî jî hebûne, hebûna sîyê jî ji hebûna ronahîya çirax û qendîlan e. Ne ronahîya agirê işqê be, hebûna aşiqan jî nîne.

## Dersek di işqê de

Ku dunya hinekî zelal bû, şêx Ehmedê Xanî quddiset esraruhû rabû ser xwe û gote min: were sofî Heyder ez dersekê di işqê de bidim te.

Ez li pê wî meşiyam û bi germîya henasên wî yên ku êdî bi lez diçûn û dihatin di nava henasên berbangê yên hênik de hesiyam. Em çûne hucreya wî ya ku ronahîya berbangê li dîwarên wê ayetên işqeke nûranî qelem kiribûn.

Wî destê xwe avête çiraxa vemirî, fitîla serreş hinekî kişand û ew pêxist. Ez bêdeng li ser kabokan rûniştim û min lê nihêrî. Ku çirax geş bû destê xwe yê rastê dirêjî agirê vêketî kir û tilîya xwe ya biçûkî ku gustîleke zîvîn û qaşeke ji kevirê yaqût tê de bû, da ser zimanokê êgir û çavên xwe girtin. Min li tilîya wî seh dikir çawa hêdî hêdî dihat sotin û bîna nenûka wî ya şewitî belav bû. çavên wî girtî man û bû gupînîya dilê min.

Ku goştê tilîya Şêx dest pê kir şewitî û bîn fûrîya, ez qêriyam, hal hate ser min û min xwe avête destê wî, çirax vekuşt û tilîya wî ya şewitî ramûsand. Min bi firmêskên xwe tilîya wî şûşt û hênik kir û got:

- ezbende bim bese min ders fam kir.

Ew jî dihejîya û digirîya. Di nav girîyê xwe re jî her digot:

*Ev narê sîqala dil e*
*Dayim li wî qala dil e*
*Newroz û sersala dil e*
*Weqtê hilîtin ew sirac*

Erê sofî Heyder, hubba heqîqî ev e. Tu di nav agirê işqê de bî lê bê deng û his bimînî. Neku ah û zarîyan manendî aşiqên mecazî bikî. Aşiqê heqîqî perwane ye, yê mecazî bilbil e. Ah û efxan û bêsebriya bilbilan derbulmesel e ji evîndarên xam re. Lê perwane? Ew xwe li agir digre, çu hêz û qewet neşin wê ji ser êgir vedin. Kabeya işqa perwaneyê mûm e û reqsa wê tewaf e. Heta weku can ji dest nede ew her li dora mûmê ye. Heta di nêva agirê evînê de nebe agir debara wê hîç nîne. Lê gava ku dimire jî qet deng jê dernayê. Sî sale ku perwaneya dilê min di tenûra işqê de tê sotin û xwe ji jenga dunyayê pak dike û ez jî bêdeng û hisim sofî Heyder.

Piştî bêhnekê, hinekî aram bû û got:

- De niha rabe çiraxê geş bike. Çirax jî heyateke ji ronahî yê ye.

Şeva ku ew tê de çû rehmetê, çiraxa ber serê wî sê caran vemirî. Min ew nîşaneke nebaş dît. Gotina şêxê min ku çirax heyat e hate bîra min û min nas kir ku êdî çiraxa wî li ber vemirandinê ye.

***

şêxê min xwedê meqamê wî bilindtir bike zatekî nûranî bû. Xema vê dunyaya me ya fanî nedixwar bi qasî ku xema xelqê dixwar. Di xutbeyên xwe de digot: xelqno! Berî hûn cilên xwe bişon, dilên xwe bişon. Bila dilê we pak be bese.

Ku em mirîd li dora wî dibûne xelk di seherên sibê de, riya xwe ya ku bîna cennetê jê dihat mis dida û bi çavên girtî digote me:

Şûştina dilan jî bi hêsran dibe. Kesê ku negirî dê dilê wî her û her stûrtir bibe. Dilên ku divê herin nimêja pakiyê divê bi ava çavan ne ya çaviyan desmêja xwe bigrin. Û di rohniya qendîlên li ber vemirandinê yên li rexên mihrabê me hêsirên wî yên ku di quncikên çavên wî de komdibûn didîtin.

Dilê wî bi xwe gelekî fereh bû. ji civata xwe kesek dûr nedixsit. Heta yek li bazîdê heye navê wî Teymûrê fasiq e bi rihetî dihat meclisa şêx rûdinişt. Hinek ji meşayixan itiraz kirin ku yekî wisa bênemaz û meyxwer çawa tê meclisên zikr û ibadetê?? Şêxê min quddise sirruhû digote wan:

Ku şimika yekî ji we diqete nabe nik koşkar? Ku derdek li bedena yekî ji we peyda dibe berê xwe nade hekîmekî? Ev jî Teymûr e. ku neyê meclisa min û guhdarî neke dê kî ji we here ba wî dêrê û irşada wî bike?

Subhanellah ji vî ilmî re! bi zatê xwedê şêx,rehma xwedê bibe baran û bi ser gora wî ya muqeddes de bibare, gewherek bû li Serhedan lê me qenc buhayê wî nizanîbû.
***

Sibeha defnê baraneke hûrik û xembar dibariya. Çipikên baranê û hêsrên ku di çavên me de dibiriqîn tev li hev bûbûn. Ji nişkê ve Teymûr qêriya û got: hibr dibar e. Ez rabûme ser pian û min li ezmanê ewrgirtî nihêrî. Subhanellah te digot deqên enberê ne li ser kitanekî spî. Her kesî mista destê xwe vegirtibû û peşkên ku bi ser de dibariya bîn dikirin. min çavên xwe ji wî ezmanî nebirrîn. Bîna miskê ji wan peşakn dihat. Min zanîbû ku kerametek şêx e. kêlîkek derbas bû min serê xwe daxist û li cilên xwe nihêrîn. Xwedê wekîl be bîna miskê difûriya. Êdî min nas kir ku misk bi xwe dibare ne hibr e.

# Şêx Seyfeddînê Cubbeşîn

Berî du sê salan bû. Zivistaneke sar bû tê de hakimê Bazîdê Mîr Mihemmed û katibê wî Silêman hatin kuştin. Rehmetiyê mele Ehmedê kurê Mele Ilyas, ku min telqîna wî xwend û ew siparte axa sar, wê demê qewî narahet bû. Wî her digot divê kurê wî Mîrza beg li şûna wî li ser textê mîrnuşînîyê danişe. Ew bi ku de diçû ji xelqê re digot ku warisê şer`î yê Mîr Mihemmed kurê wî bi xwe ye.
Çawa li Bazîdê dunya li bin guhê hev ketibû wisa li Stenbolê jî. Ehmedxan li şûna birayê xwe Mustefaxan bûbû sultanê dewleta e`liyye û xelîfeyê me yê mu`ezzem û di serî de miftîyê mezin Feyzullah efendî bi destê serekên Yenîçerîyan kuştibû.
Tê bîra min wê salê Mele Ismayîlê hevalê rehmetiyê mele Ehmed henekên xwe bi min dikirin û digot: welleh divê tu li şûna Feyzullah efendî bibî miftî, ma çi ji te kêm e? Him destarê li serê te pirr mezine him jî tizbîya te ya kehremanî zêde dirêje û him jî mirîdên te zehfin.
Ew jî û rehmetî jî ji min diqeherîn. Suxte û feqeyên wan ne digihan riba mirîdên min. Ji Eleşgirê heta Erzerûmê, ji Mûşê, Wanê û Xinûsê heta welatê Hekariyan û Buhtiyan mirîdên min hebûn. Ma dê çima ji min neqeheriyana!! Ji xwe ji ber ku ji Wanê bûm ew hîn bêtir ji min diqeherîn. Serhedî ji bavê bav de dijminê wanîyanin , lê kesên baqil di nava serhediyan de hene, qedrê min baş dizanin û gelek ji wan mirîdên minin. Cenabê Mîrê me bi xwe ma ne serhedî ye!! Welleh salê taximek cilê şêxan diyarî min neke xewa wî nayê.
Kêfa min ji Mîrza beg re nedihat, bêtir min mîrê me Evdilfettahê apê wî layiqî mîrîtiyê didît. Ji xwe ew bi fermaneke sultanî bû mîrê Bazîdê û qehra rehmetî û mele Ismaîl zêdetir bû.
Dema ku Mîr Mihemmed çû diyarê rehmetê, rehmetiyê Mele Ehmedê xanî qesîdeyek di şîna wî de nivîsî. Wî tê de ji xwedê teala xwestibû ku kurê wî biparêze. Erê hinek dua ji apê wî mîrê me yê nuha Evdilfettah re kiribû, lê bêtir meyla xwe ji Mîrza beg re izhar kiribû û navê wî kiribû Durra yetîm, yanî gewhera tekane û bêhempa!!
Vê mersiyeya Xanî ji mîr Mihemmed re ku leqeba wî kiribû padişahê Serhedan, û di eynî demê de medhiyeya ji Mîrza re dilê mîrê me Evdilfetah ji Xanî zêde sar kiribû.
Ji wê rojê de êdî Xanî jî sar bû û kêm dihate meclisa mîr. Mîr jî bala xwe dabû sarbûna rehmetî, çend carî ji min re got ku ez naxwazim yekî alim mîna Ehmedê Xanî dûrî dîwana min be. Û ez teklîf dikirim da ku wî dawetî dîwanê bikim lê her carê wî behaneyek ji hûçikê cubbeyê xwe derdixist û nedihat.
Niha jî ku Xanî ji darulfena koçî darulbeqayê kir, mîrê me hate rehmê û mesrefa xusl û kefenkirin û definkirin û nanê matemîyan û mêvanên ku dê ji welatan werin hemî dabû ser milê xwe. Hema deh û du aqçeyên zîvîn ji bo xwendina telqînê dane min tenê.
***

## ez şêxê Serheda me

Min çu kitêb nexwendine. Ne jî min terîqet ji şêxekî wergirtiye û ne jî bav û bapîrên min şêx û ocax bûn. Lê şêxîtiya min şêxîtiyeke rebbanî ye loma jî kesên mîna rehmetî û meşayixên hevalên wî hevrikîya min dikirin. Ew ji min didexisîn ji ber ku xelqên nesax li ser destên min xweş dibûn, dîn baqil dibûn û tawî û bawî rihet dibûn. Min tû dikir çavên kul di cih de baş dibûnn. Mirîdên ku ji ava ji ber desmêja min dimîne vedixwarin tucarî bi êşên giran nediketin. Bi dehan jin bi xêr û saya hicab û bazbend û berbejn û nivişt û misdanên min avis dibûn. Çêlek û gamêş û mih û bizinên stewr bi şîr dibûn. Mirîşkên jê hêkan qutbûyî bi duayên min rojê du hêk dikirin. Bi hicabên min nemêr dibûn ga û sê carî di şevekê de diçûn nivîna jinên xwe. Ji xwe jin û mêrên ku ne lihev bûna min ew bi niviştekê dikirin şîr û hingiv. Welleh eger ez di dema Mecnûnê Serhedî de hebûma min dê ew ji derdê işqê û cinûnî û malxûliya wî reha bikira. Salê bi hezaran mirîdên min ji welatê Hekariyan û Buhtiyan heta bi Behdînan bi beyreqên kesk û gurmegurma defan dihatin tekiyeya min û li ber destên min tobe dikirin. Di helqeyên zikir de dengê Ellahûyên mirîdên ku bi cezbeyê diketin û hal dihate ser wan diçû ber erşa xwedê teala. Li camîya rehmetî ji bo dersan qey sî çil zarok û ciwan hebûn û vingevinga wan bû dewr û dersên xwe ezber dikirin.
Kerametên min êdî bûbûn derbumesel. Xaniyê rehmetî di gel ku xelqê ew mîna şêxekî terîqetê jî didan nasîn nedişî yek kerametê izhar bike. Roja defna wî xelqên Bazîdê gotin baraneke reş ku bîna hibrê jê dihat bariyaye!! Ma ne ez bi xwe li wir bûm û min telqîna wî jî xwend! Min çu barana reş nedît. Yek caran baraneke lewitî dibare qey ew e.
Ew bi xwe şair bû ne şêx. Şair jî hema bibêje hevalên dîn û malxûlîyan e. di Qurana ezîmuşan de ayeta şairan dibêje ku peyrewên wan hemû kesên ji rê derketî ne û ew di her gelî û newalê de windayî ne û tiştên ku nakin dibêjin. Ev xwedê wisa behsa şairan kiriye îca em dê çi bibêjin!
Ew mirovekî, rehma xwedê lê be, bêhed ji tirkan nefret dikir. Tirk jî birayên me yên misilmanin. Sultan û xundkarên me, ekabir û xelîfeyên me bi xwe tirkin çawa dibe ku yek mîna wî rabe ewqas bibe neyarê wan? Bi ya wî bûya dê serhediyan û kurmancên din jî dest bihavêtana şûr û di wechê tirkan û eceman de rabûna. Ma kesekî ku piça mejî di serî de hebe wisa difikire? Em çi ne û kî ne ku qiyaman eleyhê dewleta âli Osman bikin?! Li şûna ku wî dawa cihadê bikira û xort û ciwan teşwîq bikirana daku herin tev li eskerê mensûrê padşah bibin, digote wan serkêşiyê bikin! li Lehistanê û Meceristanê û Bexdan û nizanim ew çi welatin, serbazên me cihada gêwir dikirin û Xanîyê me digot şûr di wechê dewleta Elliye de bikêşin!!
Ma ne ev kufra reş bi xwe ye! Qey wî di kitabên xwe de nexwendibû ku serkeşiya li ber weliyyulemrê misilmanan kufr e?!
Di kitaba wî de, min bi xwe nexwndiye û naxwazim bixwînim jî, dibêjin beraeta Iblîsê lanetî jî heye. Wisa jî gelek fikrên dijî dînê me yê rast û durust. Wellahî billahî ku ne xwesteka mîr Evdilfettah bûya min nimêj jî li ser nedikir û telqîna wî nedida. Lê çi bikim, razîkirina mîran jî ji razîkirina xwedê teala ye.
***

## Xanî nahêle ez wî derman bikim

ku çawa bi ber guhên min ket Xanî nexweşe, min cubbeyê xwe yê şîn yê ku paşayê Wanê weke ermexan bo min berî deh salan hinartibû li xwe kir û çûme nik wî. Ew di halekî xirab de bû, meideya wî xwarin qebûl nedikir û rûyê wî miçiqî bû. Verîşandina wî nedisekinî, nava wî diçû û êvaran nedişî

çavên xwe bide ser hev. Min dixwest ez çend ayetan li ser taseke avê bixwînim û bihêlim ew vexwe. Lê qebûl nekir û got:

- na na!! hacet pê niye!

Ez ecêb mam çawa alimekî mîna wî ayetên Quranê nake dermanê xwe. Lê dîsa jî dilê min jê nema û çend carên din jî çûme serdana wî. Cara dawî min dît vaye sofî Heyder û mele Ismaîl û ew sehhafê ku ji siya wî aciz dibim, ettarê fille anîne ba wî û ew jî jê re dermanekî terkîb dike. Ez gelekî tengijîm, hema min dikira sîwaka xwe di rûyê wan werkira lê dîsa jî min xwe mîna wan bêhawe nekir û bi nermî got:

- Malavano hûn çawa cesaret dikin ayetên xwedê bi van geya û dermanan diguherin.

Ettarê fille, li her bajarî ettarên yehûdî jî hene xwe dikin hekîm , weke ku ew Calînos be yan Buqrat yan jî hekîmê Luqman bi xwe be digot ku Xanî hatiye jehrdayîn.

Ellah li vê ecêbê!! Ma kî dê wî jehr bike û ji bo çi? Ez dibêjim ewî serma girtibû, li ber barana payîzê gelekî mabû û tayeke giran girtibû. Min destê xwe dabû enîya wî, bûbû weke tenûrê û ji henasên wî bêhna agirekî ku bez bi ser de niqutîbe dihat.

Min dixwest ez li ser wî çend ayetan û qul e`ûzan bixwînim. Dê ew baş bibûya lê çi bikim ku bawerîya wî û hevalên dora wî bi finas û deccaliya ettarê ermenî dihat û bi ilmê min ê rebbanî nedihat.

Min jî, piştî ku ew ettarê fille li hucreya wî dît nema çûme nik wî. Gawirekî tînin ji bo hekîmiyê!! Wey!! Ne tirsa ji xwedê ne jî şerma ji evdan nemaye.

***

## Hibra çi malava??

Kuro bi qebra bavê min ne rast e! kî bîra barana hibrê dibe! Ma ne ez jî li wir bûm. Ew Teymûrê fasiq û bêdîn û serqotê zikakan weke kerekî zirriya û got ku hibr dibare. Hemûyan berê xwe dane ezmanan û dilopên ku bi ser destên wan de diketin bîn dikirin. heta xettatê eleşgirî Yavuz jî bawer kir û peşkên baranê yên li ser rûpoşa wî ketî bîn dikirin û bi tirs li ezmanê tarî dinêrî.

Teymûr nehişt ku ez telqîna xwe jî xweşik bixwînim. Lê bi serê Qutbê exlatî ne hibr bû. Reş bû erê, lê dibe ku tev li dûyê pixêrîkan bûbe . Payîzên Bazîdê sarin û wê rojê jî dû ji her pixêrîkê dikişiya ezmanan .

## Hekîmê fille

Selahedînê kitabfiroş berî çendakî hate ba min û got:

- Xoce Zuhrab zû xwe kar bike were, şêx Ehmedê Xanî qewî diêşe.

Dêliya Tirs û lavê ku li rûyê Selaheddîn yê zirav û henûn sî vedabû hişt ku ez li bayê bezê dewadanka xwe ya çermîn rakim û di pey wî re bi kêlîkekê herim mala seyda .
Çawa ku ez çav lê ketim, min di çavên wî de terpeterpa piyên mirineke nêzîk bihîstin. Çavên wî fesadiya jehrdayinê dikirin. Kenarên wan sor bûbûn û nava wan zer û melûl bûbû mîna çiraxeke ku zeyt di binî de nemayî.
Wê çaxê min nizanîbû ewqasî jehra ku ketiye bedena wî zehf e. Min texmîn dikir ku ezê wî bi van geyayên mîna tîtavkê, şîleya tirîyê mor yê payîza dawî ku di rezan de mayî, yan jî bi dendiyên sîran ku min ew tev li hingiv û libên reşreşkê dikirin û dikelandin derman bikim.
Ez her du sê rojan carekê diçûme hucreya wî ya ku bîna murekkebê û darçînê û miskê jê difûriya û min kîsê xwe vala dikir.
Min dixwest ez tiryaqekê ji wî re çêbikim ku hîn tu hekîmî ew terkîb nekiribe. Lê min dizanîbû ku haletê wî qewî xirabe û ên ku ev jehr dayine wî qetla wî ya muheqqeq, lê hêdî hêdî, xwestine.
Carekê ez dîsa çûme serdana wî. Wê şevê sofî Heyder hat ez bi hespê birim ba Seyda. Dîsa baran bû û erd bûbû çirav û meş tê de nedibû.
Min sê misqal beybûn tev li hingiv û şîr kirin û di lalîlkeke tijî av de kelandin. Seyda hîn nîvê wê tiryaqê venexwaribû dest bi verîşandinê kir. Cimaet tirsiya û bi çavên min de nihêrîn. Lê ê min kêfa min hat, min bi rûyekî geş gote haziran:

- Ev elametên şifayê ne. Jehra di hinavan de ancax bi rêya verîşandinê were der. hingiv bi xwe ku dikeve nava Beybûnavkê, dibe tiryaqekî baş û….

Hîn ez ji cimaetê re li ser geya û xisûsiyetên wan diaxivîm, şêx Seyfeddînê Cubbeşîn derbas bû.

***

şêx Seyfeddînê Cubbeşîn li Bazîdê karê wî dijmintîya min dike. Ew nahêle xelq werin li ba min tedawî bibin û dibêje: Ne cayize mirovên misilman li ser destên gawiran werin tedwaî kirin.
Yek caran jî tê guhê min ku ew dibêje: Ev hekîmê fille tiştekî fam nake. Li şûna kil bike kor dike. Eman neçin ba wî ha.
Lê dîsa jî kesên aqilmend yên ku bi hekîmiya min bawer in guh lê nakin.
Wî bi her niviştekê re deh aqçe heqdestê xwe dixwest. Bi deccaliya xwe ilaca çêlekên kêmşîr, mirîşkên ji hêkan qutbûyî, mehînên şemûs, û bazên ku nêçîrê nakin jî dikir. Xelq jî ji ber ku bêsewadin û li finasên wî çavnas nebûne bi qeflan diçine ba wî. Dermanê her illetê li ba wî heye. Jinên ku bi hemil nabin, zarokên ku bi şev digirîyan, mêrên ku nedişîn herin nivîna bûkên xwe, minalên ku ji mîzê qut nabin û heta kerên ku di bin baran de diketin jî, ew ilac dike.
Nezanîya xelqê sermiyanê wî yê herî mezin e. Lê ê min çî min û dijmintiya wî? Xelq çawa dixwaze wisa dike! Min rojekê tenê jî negote kesekî neçin ba Şêx Seyfeddîn. Hela ku bibêjim çend dîn û malxûlî li ser destên wî hatine kuştin kesek bawer nake. Di gel ku ez têkilî îşê wî nedibûm jî, her ji nexweşan re digot:

- Zinhar hûn nerin ba wî ettarê fille ha! Derketina ji dîn e.

Wê şevê jî xwest ez ji ber serê Xanî rabim. Ji cimaetê re got:

- hûn çawa geyayên çolê li şûna ayetên xwedê teala dikin dewa û derman!!

Xanî zivêr bû û bi dengekî ku janeke nepenî ew pêçabû got:

- Wisa nebêje şêx Seyfeddîn, xwedê derd daye û derman jî daye. Dînê me û pêxemberê me emrê dermankirinê dane. Ma ne hedîsa pêximbere dibêje: tedawew!

Şêx Seyfeddîn hema rabû ser piyan, cubbeyê xwe yê şîn li xwe gerand û rûreş ji odeyê derket û nema min ew li wir dît.

***

## Cubbeşîn û şêxîtiya wî

Wî bi xwe, berî ku wî destarê spî li serê xwe bigerîne û vî cubbeyê şîn li xwe bipêçe û riha xwe ya tim hinnekirî nîv gazekê dirêj bike, navê wî Seyfo bû û li ba min li hinek dermandarî çavnas bûbû. Hewesa wî hebû lê sebra wî nebû. Di pê re min carekê dît xelq behsa şêxekî xwedan keramet dikin. Kiye ne kiye? Derket Seyfo yê me bi xwe ye!!

Bi qasî nezanîya xelqê pere û pol bi ser de rijiyan. Ez jê nahesidim na welle. Lê dibêjim gunehe ku ev sihribaz û salûsê han vîqasî xelqê dixapîne û kesek nîne wî rawestîne. Heyata mirovan jî dixe tehlûkê û hin jî bi destê nezanî û rîpên wî mirine.

Carekê yekî malxolî anîbûne ba wî. Nizanim ji Qersê bû an ji gundekî dora wê bû. Kurikê malxolî heftiyekê di çileyê zivistanê de li ber deriyê tekyexaneya xwe girêdabû û rojê du sê caran ew qamçî dikir. Roja heftan lawik teslîm bû.

Crekê jî zarokekî şeş heft salî ji gundan anîbûne ba wî. Zarokê reben bi xulqeta xwe lal bû, nikarîbû xeber bida. Hinan li gund ji bavê wî re gotibûn ku hela wî bibe cem şêx ewê ilacekê ji lalbûna wî re bibîne. Şêxê me jî ji derdekî re nedigot ez nizanim. Hema di cih de bistekê li ser agirê pejikan sor dike û zimanê wî zarokî dax dike. Zimanê wî diperitîne. Xwedê sitirand ku bi lez û bez ew hinartin ba min û min jî lebîxeyek ji tîtavkê û hingiv û bizrê kitanê çêkir û di ziamnê wî da. Yan na xwedê tenê dizane wê çi bi serê zarokê reben bihata.

## hekîmiya min

Min ilmê xwe ji berîka xwe dernexistiye. Bav û kalkên min jî hekîm bûn. Bi salane ku ez jî li pê dermandarîyê me. Li pê naskirina geya û deramnên rengarengim. Çûme Esfehanê, Tebrîzê, li Anadolê geriyame û welatên eceman û romiyan bajar bi bajar min ziyaret kirine. Li ba hekîman min kitab xwendine. Nexweş derman kirine. Heta bi Bexda û Şamê jî çûme. Li ber destê min gelek kes jî ji Xelatê, Rewanê, Ercîşê, Eleşgirê ,Qersê, Wanê û heta Diyarbekrê hekîmî kirine û bi xwe jî li wan bajaran bûne hekîm. Hin ji şagirdên min bêsebir bûn, çend rojan diman û ji wan we bû ku êdî hekîmîya Ebûqrat û Calînos û Ibni Sîna xistine tûrikê xwe û diçûn. Hin jî li ba min diman heta ku min êdî icaze dida wan û digot herin. Şîreta min a ji wan re jî ev bû: dermanekî ku we berê neceribandibe, yan we di kitabên hekîman de xesayisên wî nexwendibin nedin nexweşan. Çawa jehr dibe tiryaq, derman jî mumkine bibe jehr. Ha vaye zîbeqa ferrar, dibe derman lê ku hekîmekî nezan miqdarên wê nizanibe û melhemekê yan macûnekê jê terkîb bike dibe ku nexweş pê hilak bibe.

Di gera xwe ya li welatên ku min qala wan kirî de min kitabeke hekîmê kor Dawudê Antakî yê ku beriya sed salî li welatê Hicazê bi jehrê miribû, bi dest xist. Kitabeke hema bibêje bi xwe maristaneke. Çi cûre nebat û geya û pincarên ku pê tedawî dibin tê de heye. Navê wan xewasên wan, peydabûna wan, reng û resmê terkîbkirina wan. Hasil tu li çi digerî di wê kitabê de heye.

Ji hekîmiya Dawudê Antakî yê kor, kêfa min bêtir ji gotineke wî re tê. Ew di wê kitaba xwe ya min niha behsê kirî ku navê wê Tezkere ye û Mîxayîlê kurê Yûhennayê Şamî bi xeta destê xwe ew nesix kiriye de dibêje:

- Her nexweşek divê bi pincar û geyayên welatê xwe were dermankirin.

Min jî Xanî wisa derman dikir. Geyayên ku li Bazîdê şîn dihatin mîna beybûnan û tîtavk û xerdel û pirpar û tolik û zilindar û tûzik û kulîlkên çolê yên mîna binefş û endeko û qewan û yasemîn û sosinan û heta bi hingivê şikeftan jî, min hemî kirin tiryaq û macûn û dane wî ji bo ku jehra di bedena wî de kombûyî derînim.

Min ew du sê caran hicam jî kir, xûna fesidî jê kişand û lingên wî gwîzan kirin.

Ji bo verîşandina wî ya ku nedisekinî û navçûna wî min simmaq dikeland û tev li hingiv dikir û didayê. Hekîman gelekî pesnê simmaqê dane. Ibnu Sînayê meşhûr di kitaba Qanûn de dibêje: Simmaq dermanê verîşandinê û navçûnê ye, meideya mirovan xurt dike û xuhdanê radiwestîne.

Ibnul Bîtarê hekîm û Dawudê Antakî jî dibêjin ku ew ji bo verîşandin û navçûnê baş e. Lê mixabin ew ji rehmetiyê Ehmedê Xanî re bêfayde bû. Tenê hinekî ew ji êşa verîşandinê û navçûnê rihet dikir, lê jehra ku di xwînê de geriyayî dernediket.

Ez nizanim kiye, lê ew kesê ku Xanî jehir kiriye yan bi xwe hekîmeke yan jî xewasên zîbeqa ferrar û terkîba jehra silêmanî qenc nas kirine. Yan na bi tu wechî ne mumkine mirovekî jehrkirî ewqase roj bimîne û janê bikêşe. Ê ku xwestiye wî bikuje, ne xwestiye mirina wî zû be. Razeke veşartî heye lê ez nizanim ew çiye?

Cara dawî ku ez çûme nik wî. Min dît rûyê wî spîçolkî bûye û qeraxên çavên wî pirr zer bûne. Min di wan de gurmegurma defa mirinê his kir.

Ji xwe tayeke sar diçû yeke germ dihat. Ta jî di ilmê me de qasidê mirinê ye. Min jî ji herdu melayên ku heta ber derî bi min re rawestiyna re got:

- Ku ez bim, ji seyda re bibêjin bila wesiyetên xwe bike. Ew di nefesên dawî de ye.

Û min derî vekir ku derkevim. Bayê ji derve de dihat çiraxa ber serê Xanî vemirand.

**Mele Salihê Cizîrî**

## Xanî li cizîra Botan

Min rehmetîyê Xanî ji salên feqetiya li Cizîrê de nas dikir. Ew di ser Hekarî re daketibû welatê Buhtiyan û hatibû Cizîrê û me bi hev re di Medresa Sor de dixwend. Gelek carn em diçûn li ser sûrê Cizîrê rûdiniştin û me li şetê kûr temaşe dikir. Ava ku mîna hemayilan gerdena bajêr bi işq dipêça di bin şewq û hetava rojê de weke xaliyeke têkel ji feyrûz û zebercedê dibiriqî.

Ew hatibû li Cizîrê ilmê serf û nehw û belaxet û beyana erebî bixwîne. Mele Resûlê farqînî ku bi navê melayê Zimanşûr meşhûr bûbû, li temamê welatê Bejn û Bohtan di luxeta erebî de dahiyeyekî zemanê xwe û Sîbeweyhê duyem bû. Ji çarhawîrê Kurdistanê feqeyan xwe li medreseya sor digirtin da ku ilmên luxeta erebî û tefsîra Qurana kerîm li ber destê wî bixwînin. Het ku me feqiyên kurmanc jê re digot Zemexşeriyê Kurd. Ew bi xwe kitabeke li ser du lingan bû.

Min û rehmetî me bi hev re li bin siya darên zerdelo û hejîr û behîvan ku di hewşa medresê de şîn hatibûn, dersên xwe ji ber dikirin. Yek caran jî ez û wî û feqeyên din em diçûn nêzîkî Rezê Mîran û me li wir him li xezal û tawisên mîr seh dikir û him jî lîstikên feqeyan dilîstin.

Sibehên yekşeman ku dengê çingilinga naqosên Mexînan dihat, rûyê wî geş dibû û digot:

- binêre Salih! Xwedê bi her şêweyî bangî evdên xwe dike.

Ê min ,rastî bibêjim, gelekî ji wî dengî sil dibûm. Min digot ku wekî ev welatê islamê ye çima dengê van naqosan bilind bibe!! Heta carekê wî ji min re hinek kitêbên tesewwufê anîn û ji min re xwendin. Ez jî hatim ser ya wî û min jî ji wan rojan de nas kir ku Laliş jî, dêrên mexînan jî, kiniştên cihûyan jî hemî malên xwedê ne. Heta pûtxane û ateşkede jî malên xwedê têne hesabkirin.

Ew pirr jîr bû jî, agirek bû ku melayê me jê mabû ecêbmayî û her digot: eger wisa dewam bike ev feqe Ehmedê Serhedî dê bibe alimekî pirr mezin.

Bi rastî jî tiştê ku me feqeyan nikarîbû ji melayê xwe fehm bikira wî ji me re digot û em li ber dixistin.

Sala ku ew li Cizîrê ma saleke zehf xweş bû ji bo min. ew insanekî wisa nerm û aram bû te digot melayiketekî xwedê ye û nazilî erdan bûye. Dilê kesekî jê nedima û mîroyek jê nediêşiya. Bi xêra wî girr û kîna min a li dijî Êzîdiyan kêm bû, û paşê bi carekê de nema û ez û hin Êzîdîyên şengalê jî bûn kirîv û destbirakên hev.

***

Rojên înan em diçûn ser merqeda mele Ehmedê Cizîrî û me çend sûretên quranê li ser ruhê wî dixwendin û paşê em bêdeng li ber kêla serê wî diman. Pirê caran rehmetî çav şil ji ber tirba wî

radibû û bi xem diçû hucreyê. Bi ser kaxezan de xwar dibû û qesîdeyek nezim dikir. Wî ji xeberdana buhtîyan hez dikir û tev li xeberdana xwe ya serhedî dikir û pê diaxivî. Zimanê wî hingiv û to û dilê wî deşt û nefsa wî biçûk bû. Dilketiyê tebîeta Cizîrê bû. Deverek nedima û ew nediçûyê. Camî, medrese, bistan û rez, aş, hemam, qeyserî û dikan û herdu rexên şetê bûbûn seyregehên wî yên hezkirî.
Sibehan, berî ku roj ji pişt çiyayê Cûdî xuya bibe û quloçên xwe yên zêrîn di zikê ezmên rabike, ew ji xew radibû. Nimêja xwe ya fecrê dikir û pişt re vedigeriya xewa xwe. Rojekê piştî nimêjê gote min:

- Salih! Kanî em herin li hilatina rojê temaşe bikin.

Em wê sibehê rabûne ser banê medreseyê û me li rojhilat seh kir. Stêrik mîna pêtiyên dawî di agirdankê de vedimirîn û şefeqa serê çiyê weke perdeyeke erxewanî hêdî hêdî xwe ji ber siwarê zêrîn yê ku bêdeng hildikişiya çimê Cûdî, dida alî. Bayê hênik û çîveçîva çûk û tilûran, xiştexişta çilo û bergên daran û dengê keleşêran tev li hev dibû û ji nişkê ve tava rojê li serê Birca Belek ku hin dibêjinê Birca Şeref gerîya û paşê li serê sêsed û şêst û yek minareyên bejinzirav aliya, qubik ramûsan û daket di ava kevanê Dicleyê de mîna toza zêr hate reşandin.
Xanî bêdeng bû. Ronahiyeke zelal di çavên wî de xuyakirin û gote min:

- evîn jî weha ye Salih! Perdeyan qebûl nake û nayête veşartin!

***
Şevên înan em heta destê sibê şiyar diman û me li dengê feqe Xelîlê Sêrtî ku bi eslê xwe ji Hesenkêfê bû guhdarî dikir. Dengê wî eynî zengil bû û bi meqamên botiyan qesîdeyên Melê digotin. Yek caran jî qisseta Memê Alan ku li nav xelqê Cizîrê meşhûr bû digot. Êvarekê qesîdeya Melê:

*Îro ji şehkasa surê, mey hate fincana sedef*
*Minnet ku îro dêmdurê, da min meya husna xwe xef*
*Sef sef me dîn Hindî û Zeng, Cengîzi hat Teymûrileng*
*Xef wan reşandin dil xedeng, teşbîhê tîrên Xan Şeref*

Ji me re got. Destê xwe yê rastê ji ber guhê xwe dananî, xuhdana bi eniya wî ketî jî nemaland û çavên xwe venekirin heta ku qesîde temam kir. Xanîyê ku heta dawî bêdeng mabû berê xwe da min û pirsî: Xan Şerefê ku seydayê mele Ehmedê Cizîrî behsa wî dike, ne mîrê Cizîrê bû?!

## Xan Şeref

Erê Xan Şeref mîrê Cizîrê bû. Ew kurê Xan Evdalê kurê Nasir begê Botî bû.
Di zemanê Sultan Selîmê kurê sultan Silêman de, Xan Evdal berê xwe û sed kesî ji mîrek û maqûlên Botîyan dabû Stenbolê ji bo ku sinceqên jidestçûyî li mîrnuşîniya xwe vegerîne. Sultan wê çaxê li Edirneyê bû loma jî wan mîrekan berê xwe dane wir. Lê li şûna ku sinceqan vegerînin, xwîngermekî botiyan çawîşbaşiyek li ber derê camiya Edirneyê ya ku mîmar Sinanê meşhûr ji sultanê porzer re avakiribû, bi xencera xwe ya serxwar kuştibû û sultan xwîna xan Evdal û mîrekên tebayê wî bûn hemiyan hedir kir û temamê wan girtin û serên wan birrîn û ew hemî gurandin û çermên wan tijî pûş û ka kirin.
Piştî kuştina wî, botiyan xwestin mîr Nasirê birayê wî li textê mîrnuşîniya Cizîrê rûnînin. Xettê humayonî ya sultan Silêmanê qanûnî ku ji bo mîrekên botiyan nivîsîbû digot: herçî xelq û mezinên botiyan wî weke mîrê xwe qebûl bikin ew mîr e.
Lê li welatê kurmancan gelek caran heta xettên şerîf yên sultanan jî tenê kaxez û murekkeb bûn û mîrîtî weke her tiştî bi zêran dihate kirrîn û firotin.

Kê zû xwe bigihanda Mîrmîranê Diyarbekrê yan jî yê Mûsilê yan jî Sedriazemekî û zêr bi ser sendoqên wan de bibaranda, ew dibû xwediyê milk û mal û tac û text. Yê ku hîn destê wî dirêj bûya, berê xwe dida Stenbolê û li bargeha sultanên mezin dibûne mêvan û xettên şerîf yên mîrîtiyê û beratên sultanî bi xwe re dianîn.
***

Sadriazemek bi navê serdar Ferhad paşa hebû mîrîtiya Cizîrê bi sed û dwazde hezar florîyên zêr firotibû mîr Ezîzê kurê Kek Mihemmed û li ber derê konê xwe li kela Qersê serê mîr Nasirê birayê mîr Şeref da ber şûrê celladê xwe. Heta sê rojan serê jêkirî li ser rimekê li ber drê kela Qersê bilindkirî bû û kesî newêrîbû wî daxîne.
Xan Şeref ku dît serên malbata wî di destarê felekê de têne hêrtin, bi heval û hogirên xwe re revîya û xwe li şarekî veşart.
Sal zîvirîn û mîr Şeref û birayên xwe dûrî cih û warê bav û kalan bûn heta ku çerxa felekê careke din ji bo wan geriya û mîr Şeref û birayên xwe mîr Ezdîn û mîr Sêvdîn û mîr Evdal rabûne ser piyan û destên xwe xistin destên hev û bi hezaran leşker kişandin welatê Cizîrê daku eyaleta xwe vegerînin û xwîna birayê xwe mîr Nasir sax bikin. Tevaya xelqên derdorê bi wan re bûn û xelek li mîr Ezîz û kurê wî Hacî beg û biraziyê wî teng kirin û Cizîr careke din ji wan standin. Mal û milkên wan talan kirin , erz û eyalên wan dane leşkeran û cariyeyên reqqas û stranvan yên her yek ji welatekî bû û di qesra mîr Ezîz de bûn ji nivîna xwe re birin.
Wê çaxê mîr Mihemedê birayê mîr Şeref li welatê Boşnaqan bû. Sultan ji kiryarên mîr Şeref nerazî bû û teterekî xwe şande pey mîr Mihemmed û ew bi lez ji wir anî û mîrîtiya Cizîrê sparte wî.
Xan Şeref nexwest dijmintîyê bi birayê xwe re bike çiko pişta wî sultanê muezzem bi xwe bû lewra xwe da alîyekî û kela Cizîrê û eyalet hemû ji wî re hişt.
Salên pir zor bi ser Cizîrê de hatin. Dubendî çêbûbû û her di malekê de bira bûbû dijminê bav û birayê xwe. Mîr Mihemmed hîn li Stenbolê bû eyalet bi sed û pêncî hezar florî kirrîbû lê ji ber ku ew salin dirêj li hêla Romelî û welatê Boşnaqan mabû, nizanîbû zebt û rebta mîrnuşîniya kurmancan bikira. Meyla xelqê jî bi bal mîr Şeref ve diçû. Giregirên botiyan jî dîtin ku dijmintîya wan herdu birayan dê dîsa xerîban li Cizîrê vegerîne, îcar ew herdu li hev anîn û sêva eyaletê di nav wan de par kirin.
Subhanellah, her tiştê ku li Babi alî û bargehê dibû, li alaybegî û sinceqbegîyan jî dibû. Li Stenbolê sultanan birayên xwe dixeniqandin û mîna wan, mîr û xan û paşayên me jî wisa dikirin. Ma ne hedîsa pêximber eleyhîsselam e dibêje: *ennasû ela dînî mulûkiha*!!
Ê ku hikûmet bi dest dixist, bi sî û du diranan hişk pê digirt. Bira birayê xwe dikuşt yan çav dirijand yan jî ku pirr dilovan û bi rehm bûya, ew dihavête binê çalekê û bi salan di wir de dihişt.
Mîr Ezdînê ku birayê mîr Şeref yê biçûk bû, ew jî li ber birayê xwe rabû. Nizanim hin dibêjin ku mîr Mihemmed ew hêvotibû hin jî dibêjin ku Mîrmîranê Diyarbekrê deskîsiya wî dikir, lê çawa be bi hezaran xelqên rût û rewal lê civiybûn û dabûne pey beyreqa serkeşiya wî.
Wî peyapey cerde û şevxûn dibirin ser derdorên Cizîrê û talankerî dikir. Êdî kesî newêrîbû li derveyî kelatê şevder bimîne û ji hêşetê dûr bikeve.
Mîr Şeref dît ku bela wî ji bin çengê wî hat û dê birayê wî textê mîrnuşînîyê ji bin wî bikişîne rabû mektûbek bi peykekî re şihand ji mîr Ezdîn re û gotê:
Birayê min, ma ne ev eyalet ya me ye? Çi ferqe ez hakim bim yan tu!! Xwîna me yeke. Em ji yek zikî derhatine. Me şîr ji yek pêsîrê mêjandiye. Xan Evdal bavê me herduyane. De were koşka birayê xwe bibe mîr û ez jî, bi tirba ciddê me yê ku şûrê xweda ye Xalid ibnul Welîd sondê dixum, dê bibim qaweçîyê te. Were bila sînga dîwanê ya te be û asitan bo min be, tu mîr be ez jî geda.
Birayê wî hat. Mîr Şeref bi tac û tomar li ser textê xwe rûnbiştî bû. Tîr û kevan di dest de. Bazê wî yê nêçîrê li rex wî çav vekirî li hawîr dinêrî û wî jî bi paçebendê ku nigê baz pê ve girêdayî bû dilîst.

Ew di rûyê birayê xwe de dikenîya. Sera ji bîna bixûra di mecmeran de bûbû gulşeneke buharî. Çawa mîr Ezdîn derbas bû birayê wî rabû ser piyan û çav da hinekên di pişt perdeyan de veşartî. Mîr Ezdîn nas kir ku ketiye kemînê. Xencera xwe ya qevdik ji diranê fîl bû kişand û bi ser birayê xwe de çû. Şeş kes ji pişt perdeyan derketin û bûne xelekek ji mirinê li dora mîr Ezdîn. Mîr Şeref jî tîra xwe ya perkirî li kevan da û jihê ji mûyê teriya hespan kişand û avête birayê xwe. Tîr di zengeloka wî de çikand. Mîr Ezdînê birîndar xwest tiştekî bibêje lê dengê wî çûbû û ew her şeş kes lê werhatin û ew dane ber xenceran û termê wî li erdê sar kirin.
Mîr Şeref ji cihê xwe jî neleqîya, destê xwe di ser serê bazê xwe re bir, iskofa sor ji ser çavên wî rakir û kewekî kuştî avête ber û gote wan her şeş mêran:
Termê wî ji ber çavê min rakin. Bibin zû veşêrin û tîra min jî di zengeloka wî de bihêlin bila bibe ibret.
***

## şair û mîr

- Ev tîrên Xan Şeref bûn?!

Xanî, dema min serpêhatiya mîrekên Cizîrê jê re got, bi kela girînê re pirsî.
Piştî wê me gelek caran guftûgo derbarî melayê Cizîrî de kirin. Xanî digot:

- şairekî mezin û zana mîna rehmetiyê Cizîrî çawa dikare bibe meddahê qatilê birayê xwe? Çawa dikare jê re bibêje:

*Ê ji emrê tey mukrrem serkeşî kit şubhê şem`*
*Ber serê tîxê te û meqtûlê nûbarê te bî!!*
Ev ne şêweyê ehlê irfanê ye, ne karê sofî û xwedênasan e, ne jî daba şairekî aşiqe.
Herçendî min dixwest uzrê Cizîrî beyan bikim û bibêjim: mîr Şeref mecbûrê kuştina birayê xwe bûbû, wî ji bo aramiya dewleta xwe û ji bo mesleheta mîrnuşîniyê ew kuşt. Ji bo ku xwîna masûman zêde nerije xwîna birayê xwe rijand. Lê ew qayil nedibû û her digot:

- Itiraza min ne li mîre keko. Lê ez melayê Cizîrî sûcdar dibînim ku bûye meddahê wî û her jê re gotiye bila kesên muxalif kuştiyên te bin û bila keştiya te ji bayê muxalifan dûr be!! Merdê alim û zana nabe destbirakê zaliman. Ew ku nêzîkî wan dibe jî dixwaze şîret û pendan li wan bike nek bibe koleyê dergahê û xulamê dîwanê yan rikêbdar û meyterê wan.

Heta wê çaxê, min nedîtibû û ne jî bihîstibû ku kesekî itiraza Cizîrî kiriye, her kesî bi merqeda wî sond dixwar û pesnê şarezayî û ilm û zanîna wî dikir. Aşiqan qesîdeyên wî dikirin êzing ji tenûrên dilên xwe re û di civatan de qesîdeyên wî dibûn mûm û şemal û şevên feqe û melayan ronî dikirin. Min xwest hîn piştgirîya wî bikim. Ew fexra Cizîrê û temamê welatê Botan bû. Ew şevçiraxa şevên Kurdistanê bû. Min gote Xanî:

- Ehmed! Bi her halî ew şairekî me yê mezin û iftixara buhtiyan e.
- Erê Salih, ew mezin e û qesîdeyên wî di merteba qesîdeyên Hafiz û Camî de ne. Di kurmancan de jî kesî mîna wî tox û alaya kelamê mewzûn bilind nekiriye. Rehmetiyê Qutbê Exlatî jî weke wî nerêsaye. Ez vê inkar nakim. Şek û gumana min di şairîya wî de nîne lê dibêjim ku çawa şairekî mezin, meşreba wî irfan û tesewwuf û işqa ilahî be dikare çavên xwe ji sûc û xetayên mîrekî bigire!! Ne bes weha jî, lê bibe senaxwan û meddah û pesinkarê wî!!

***

Sibehekê ez rabûm, min pêjna Xanî li hucreyê nekir. Nivîna wî hîn germ bû min zanî bû ew ne ji zû de derketiye. Ez rabûm û min şopa wî ajot. Di serî de çûme ser merqeda melayê Cizîrî min ew li wir nedît. Paşê çûme ser tirba Mem û Zînê. Min dît ew li ber serê wan rûniştiye û diponije. Dema wî pêjna min kir, li pişt xwe zîvirî û bi dengekî nizmî bi janeke nepenî pêçayî got:

- tu zanî Salih! Ev jî şehîdên işqeke xwedayî bûn, ev jî mexdûrên mîrekî mîna Xan Şerefê te bûn?!! xebînetiya wan.

Pişt re kenîya, rûyê wî weke kulîlkekê geş bû û got:

- ku te pêjna min li hucreyê nekir were vir tê min bibînî. Ez êdî ji melayê Cizîrî xeyidî me, dê heta mehekê neçim serdana merqeda wî.

Ji wê rojê de ew û feqe Xelîlê Sêrtî bûne dost, her şev jê dixwest destana Memê Alan bibêje û bêdeng lê guhdarî dikir.

Rojekê gote min:

- eger vegerim Serhedan dê qisseta wan nezim bikim. Ew kuştiyên evîneke cellad bûn. Qurbanên mîrekî zalim bûn. Ez dê wan ji nûve vejînim û derdê dilê xwe jî bi behaneya wan bibêjim.

Ku sala wî li Cizîrê temam bû, karê xwe û vegera Bazîdê kir. Dîwana Cizîrî û menzûma Hikayeta Şêxê Senanî ya Feqiyê Teyran û defter û kitab û kaxez û cilên xwe dane ser hev û xwest hema biçe. Min bi ken gotê:

- Ma tu û Cizîrî li hev nayên? Were em herin xatir jê bixwazin.

Weke yekî nû li xwe hay bibe, got:

- wey! Cizîrî çiraxa şevên Kurdistanê û zeyta qendîla dilên aşiqa ye ez jê naxeyidim. tenê min gazin jê kirin. Xwezîya wî ew medhiye negotibana wekî din itiraza min li ser wî nîne. Ew hosta ye di fennê şiirê de. Alaya herî bilind di destê wî de li ba dibe heyran. Zenguyê wî li zenguyê Hafizê Şîrazî dikeve ne heddê mine jê bixeyidim.

Û em bi hev re çûna hizûra merqeda Cizîrî.

Ji wir em vegeriyan camiya medreseyê. Wî bi niyyeta oxireke vekirî çend rikat nimêj kirin û çû xatir ji mele Resûlê farqînî xwest û bi karwanê dê biçûya Mûşê re berê xwe da welatê Serhedan.

***

## Ez jî tême Serhedan

Ev panzdeh salin ez jî li Bazîdê me. Dema min ji Cizîrê berê xwe da Serhedan, hîn mîr Evdî li jiyanê bû û rehmetiyê Xanî Mem û Zîna xwe neqedandibû. Ew debîrê dîwana mîr û munşiyê name û fermanên wî bû. Ku dît min û zarokên xwe me koçî Bazîdê kiriye kêfa wî gelekî hat. Tê bîra min dema nimêja nîvroyê li camiya xwe xelas kir û silav da û piştî tesbîhan li pişt xwe zîvirî ez dîtim. Hema rabû û hat ez hemêz kirim. Di gel ku sal gelek derbasbûbûn jî wî ez di cih de naskirim û got:

- Mele Salih tu û welatê Serhedan?

Min gotê ku Cizîr nema Cizîra berê ye, qedrê ilim lê nemaye û min jî xwe li Bazîdê û şewq û şemala alimên wê girtiye. Kenîya, destê min bi dilovanî guvaşt û got:

- bazara ilim û iz`anê li her derê kesad e. Lê te baş kir tu hatî . Tu di dema xwe de hatî.

Ez şahidê nivîsîna Mem û Zînê bûm. Wî her sibe tiştê ku êvarê nivîsîye ji min re dixwend, pirsa der û dorên cizîrê, ava çem û tebîeta wê ji min dikir û digot:

- nema baş tê bîra min Cizîr çawabû, ez dixwazim behsa her deverê bikim lê nayê bîra min.

Êvarekê ez ji mal derketim û min xwe li hucreya wî girt. Çira melûl bû, kaxezên xwe yên ku nû li ser wan nivîsandibû qûm dikir û hibra wan zuwa dikir. Me hinekî behsa sala feqetiya li Cizîre kir û min pirsî:

- ma tê bîra te te dilê xwe ji melayê Cizîrî girt!! Vaye îro tu katibê Mîrza Beg bi xwe yî.

Ew ne li hêvîya pirseke weha bû lê dîsa jî kenîya. Kaxezên xwe dane rexekî, qûmdanka xwe serpoş kir û got:

- mele Salih ez û Mîrza beg nevîyên Qerexanê Pisyanî mîrê Bazîdê yê meşhûrin. Ez ku bûme katibê wî, katibê bavê wî mîr Mihemmed jî bûm. Katibîya min a ji wan re ne destbirakî ye û ne jî ku zulmê bikin dê çavên xwe bigrim. Ez şêwrmendê wanim neku koleyê dergahê me. A heta niha jî min qesîdeyek bi tenê di pesnê yekî ji wan de nenivîsiye. Ji bo xêra kurmancan herçî ji destê min tê dikim. Ku yek ji wan, mîna Xan Şerefê Buhtî, xwedê neke birayê xwe bikuje elbette dê bêdeng nemînim. Wacibê alima ye ku heqiyê bibêjin û li ber mîran rabin. Ku serê xwe tê de derbidin jî divê bêdeng nemînin.

Wî gelek hêvî ji Mîrza beg dikirin û digot ku eger ew li min guhdarî bike û bi ya min bike dê Bazîdê bikim medreseyeke mezin û bila suxte û feqe ji çar etrafên Kurdistanê werin lê bixwînin. Eger ew bi ya min bike dê bihêlim Bazîd jî kodika xwe li kodika Tebrîz û Esfehan û Stenbolê bixîne.

Wî dixwest li Bazîdê qeyseriyeke sehhafan ava bike û kitaban bide nesixkirin û bişîne wilayetên kurmancan û ji her deverê kitaban bîne Bazîdê. Wî digot ku xêra avakirina qeyseriyeke sehhafan li Bazîdê ji xêra avakirina camiyekê mezintir e.

Lê Mîrza beg bi ya wî nekir. Ne xwe ji romê qut kir û ne jî nezer da Xanî û xwestekên dilê wî. Wî jî di dîbaceyê de dilsarîya xwe beyan kir û bi tundî teeruzî wî bû. Dema xetta humayonî ya şerîf ji asitanê hat û Brahîmê pisyanî li şûna biraziyê wî Mîrza beg kirin hakimê Bazîdê, Xanî gelekî dilteng bû, û di meclisên xwe de digot:

- Ma min çend carî gote mîr li Romê ewle nebe? Ma min çend carî gote wî şopa bapîrê xwe Padşahê Serhedan mîr Mihemmed biajo û destên xwe bixe destên mîrekên kurmancan li Bedlîs û Cizîr û Sêrt û Hesenkêfê? Wî bi ya min nekir û we dît çi hate serê wî.

Êdî Xanî nema bû katib. Dilê wî ji mîr Brahîm re jî nedixwest. Nema ji hucreya xwe derdiket. Tenê dersên feqeyan digot û li pêşiya xelqê nimêj dikir. Nema nêzîkî dîwana mîran bû. Dilê wî şikestibû. Di malbata mîrên Bazîdê de êdî agirê xilaf û şiqaqê geş bûbû. Nema li hev dikirin û her yekî berê xwe dida mîrmîranê Wanê daku fermanê ji bo xwe bistîne. Berî çend salan, dema ku di meha remezanê de hinek ji merivên mîr Mihemedê kurê mîr Evdî girtin ser koşka wî û ew û katibê wî Silêman kuştin, Xanî pirr hêrs bû. Rabû di camîya xwe de di xutbeya cejna rojiyê de got:

- av hate bin doşeka mîrîtiyê jî. Hûn ibretê nagrin û dibin qatilên hev. Rahetiya xelqê ne derdê we ye. Hûn tenê bi deskîsiya paşayên romî kêrê didin stûyên hev. Mizgîna min li we be roja dewleta we diçe ava.

Xutbeya wî gelekî xelq sergerm kiribûn heta ku hindekan çûbûn ji mîr Evdilfetah re her tiştê ku Xanî di xutbeyê de gotibû neqil kiribûn. Mîr xwestibû Xanî razî bike lê heyhat! Bûbû qut û birr. Êdî nema Xanî pê li derîzanka meclisa mîr jî kir.

Xanî jî weke xelqên Bazîdê dixwest Mîrzayê kurê mîr Mihemmedê kuştî li dewsa bavê xwe rûne, lê romîyan tiştekî din dixwestin. Wan fermaneke sultanî derînan û Evdilfetah kirin hakimê Bazîdê.

Mîr Evdilfetah bi deh hezar Florî mîrîtî ji paşayê Wanê kirrîbû lê nikarîbû razîkirina Xanî bikirre. Xanî êdî eşkera di meclisên xwe de digot:

- Mîr Evdilfetah ne seza û layiq e. Şertên mîrîtiyê wiraset û ehliyyete û rizaya xelqê ye. Warisê heqîqî ne ew e, û ehliyyeta wî jî nîne. Ji xwe razîbûna xelqê jî bi dest nexistiye.

***

Vê dawiyê, berî wefata wî bi nêzîka mehekê min bihîst ku Xanî dê nameyekê ji mîr re binivîse. Ez çûme ba wî û min gotê:

- qurban çi hewce bi nameyan e!! here ba wî, welleh ew qedrê te dizane. Vê pira di navbera xwe û wî de ku herifîye dîsa ava bike.

Wî guh li min nekir. Hêrs bû û got:

- ez pira di navbera xwe û xwedayê xwe de ava dikim, ez naçime huzûra mîr. Mîrê ku Rom wî bikin mîr ne mîr e lê kole ye. Bendeyê paşayê Wanê ye ew. Xulam e xulam!! Na welleh xulamê xulaman e! Ez dizanim ev name bêkêr û bêhûde ye. Lê wacib e ez wê bişînim. Ku neşînim gunehkarim. Ku wî li ber nexim gunehkarim. Ew hakim e erê, lê ez jî alimim, ez dengê vê xelqê me ku mîr nebihîse wê bibe Fir`ewnekî nû. Alimê ku xwedayê xwe nas kiribe ji mîran natirse mele Salih.

Piştî wê, nexweş ket. Nexweşiya wî xerîb bû. Me nizanîbû çiye. Hekîmê Ermenî her digot: ev jehra Silêmanî dane wî. Jehreke ku bi rojan hêdî hêdî derbasî laşê wî bûye. Hekîmê fille digot ku ev jehr hindik hindik derbasî bedena wî bûye loma jî wî yek car û bi derbekê re nakuje.

Lê me kesî ji hekîmê Ermenî bawer nekir. Kî dê wî jehr bike!! Û çima? Kes dijminê wî nebû, eger hinekî dilê wî ji mîr û yê mîr ji wî sar bûbe jî lê heq nake ew were jehr kirin. Mirovekî di meqamê Xanî de nabe dijminê wî hebin. Eger dijminên wî hebin jî dê şahê Eceman û sultanê Romê bin.

***

## şeva dawî di jiyana Xanî de

Baraneke pirr xurt dibariya. Erd û ezman bûbûne yek. Û weke ku dê tofana Nûh eleyhisselam dîsa rabe xuşexuhsa avê dihat ku di gelî û newlan û zikakan re dibihurî. Ez û mele Ismaîl û hin maqûlên bajêr li ber serê Xanî bûn. piştî ku verîşandina wî sekinî. Devê xwe şûşt, sîwak kir û hinekî xilamş bû. Ji nişkê ve qêriya û got:

- Şengê bînin, bila zû Şengê were. Ez dê tiştekî jê re bibêjim.

Min û mele Ismaîl, me dizanîbû ku ew behsa Şengê keça Hecî Zuhdîyê bazirgan dike. Lê yên din behetîn û gotin: Subhanellah!! Seyda ji ser hişê xwe çûye. Qala kîjan şevê dike gelo?!

Heta wê kêlîkê jî rehmetî Şengê ji bîr nekiribû. Me digot êdî ew bûye peleke winda di deftera hişê wî de. Wî qet ji tu kesî re behsa wê evîna xwe ya berî sî çil salî nedikir. Min nizanîbû ku ew wî agirî di dilê xwe de kedî dike. Xwedî dike û hembêz dike û ji ber çavên reqîb û dijminan nebedî dike! Min nizanîbû ku ew wî qasî aşiqekî eynî weke perwaneyê bêdeng û his di şewqa mûma evînê de tê sotin. Çiqasî me bi şev razên dilan ji hev re mîna kitabekê sehîfe bi sehîfe diquliband jî, wî ji min re qala Şengê nedikir. Goya ku Şengê ariya agirekî di nava sê kuçikan de, xeyalê wî yê koçerane li pê xwe hêlabû û vemirîbû.

Lê berî ku wefat bike bi kêlîkekê bayê işqê hilat û ew agirê veşarî dîsa berbû. Perde ji ser wê dojeha ku di dilê wî de vêketî bû hilanî û meqama fenaya mutleq şanî me haziran kir.

Hîn ez di wan fikr û endîşe û mitalan de bûm, Selaheddînê sehhaf jî derî vekir û derbasî hundir bû. Bi derbasbûna Selaheddîn re pêlek bayê sar jî derbas bû û çiraxa li ber serê Xanî vêketîbû vemirand. Me dizanîbû ku Ta qasidê mirinê ye. Me dizanîbû ku ji seyda re hindik maye loma jî me vemirandina mûmê weke faleke reş û bêyomiyê dît. Mele Ismayîl rabû ku careke din wê geş bike lê Xanî bi işaretekê ji destê xwe nehişt û pê re nefesa wî qut bû. Rûyê wî zuwa bû û me got hindik maye teslîm bibe. Lê dîsa nefesa wî hate ber. Serê xwe hinekî rakir. Destê xwe da ser singa xwe û got:

- Ha çiraxa heqîqî lêre ye. Ne ba ne bahoz ne jî bapêç, neşin wê vekujin.

paşê çavên xwe dane ser hev û xilmaş bû. Em jî nema axivîn û me hey li xuşexuşa barana ku dibariya guhdarî kir.

Ji nişkê ve Xanî dîsa qêrîya. Rabû rûnişt û çavên xwe hawîr gerandin û pirsî:

- Ka Şengê?

***

Dema ku Xanî wisa qêrîya, hekîmê ermenî û kîsê xwe yê hekîmiyê jî derbasî hucreyê bûn. Kesên rûniştî ji ber rabûn û rêyek heta ber ber serê Xanî jê re vala kirin. Xanî jî hat ku xwe rast bike lê hekîmê Ermenî bi destê wî girt û got: Estexfirellah seyda!! Rûne ez dê îşevê nebza dilê te guhdar bikim.

Xuşexuşa baranê tev li dengê bayekî xemgîn dibû. Te digot ew şev li ser Xanî dinale. Em hemî mest û hezîn bûn. Xanî hêja sax bû te digot em di şîn û matema wî de ne.

Hekîmê ermenî destê çepê yê Xanî rakir, tilîya xwe ya mezin li ser rehekê danî û hinekî ma. Rûyê wî tirş bû. Tûrikên xwe derxistin û hinek Simmaq û Beybûna hişkkirî ji wan deranî û got:

- Aveke kelandî bînin ezê tiryaqekê bo cenabê seyda saz bikim.

Ku ava kelandî hat, wî ew simmaq û beybûn berdane nav û kevçiyek ji hingivê ku di qarûreyekê de bû tev li wê avşîleyê kir. Piştî bêhnekê pap û durdîya geyayan derxist û av da destê Xanîyê ku hêdî hêdî vexwar heta xuhdan bi enîya wî ket û got:

- hûn iznê bidin ez dê binivim.

Û kete xew.

Min qarûreya destava biçûk ya Xanî ku berî hekîm were amade kiribû, anî şanî wî kir. Hekîmê fille çend caran ew serobinî hev kir, li ber şewqa mûmekê ji mûmên ku hundir ronî dikirin bi hûrbînî lê nihêrî , bêyî ku tiştekî bibêje ew jî tavilê berda kîsikekî û huqqe û şûşe û dewa û dermanên xwe rakirin û ji min û mele Ismayîl re, ku em pê re heta ber derî çûbûn, got:

- seyda qewî nexweş e. Min berê jî gotibû ew hatiye jehrkirin. Jehra wî jî girane, ku ez ne şaş bim zîbeqa ferrar dayine wî û ev jehra ku xelq jê re dibêjin jehra silêmanî ji zû de ketiye bedena wî, xûna wî fesidandiye û veterisîna ji jana wê zor e. Halê wî pirr xirabe lê çare û şifa ji ba xwedê de ne.

Paşê li ber derî bi guveguva ba û baranê re bi ser guhên me de xwar bû û got:

- Hûn rastiyê dixwazin?! Ew di nefesên dawî de ye.

Wê şevê di her maleke bazîdê de jî sê caran mûm û chirax weke çiraxa ber serê Xanî vemirîn.

**Selaheddînê sehhaf**

## Min dît ku hibir dibare

Ku kî bîna hibra taze nas neke, ez nas dikim. Hîn ez zarokekî neh deh salî bûm di nav hibr û kaxez û şîrêz û ta û çermên ku pê kitêb qab dibin û têne dirûtin de dijîm.
Feqe û melayên edebdost li Bazîdê xwe li bîna hibrê ya ku ji dikana min difûriya digirtin. Ez û şagirtên xwe, me mehê sî çil nusxe kitêbên nadir û bêmisal nesix dikirin. Ji kitabên belaxet û beyana erebî, yên fiqh û hedîs û sîreta pêximber û ji destanên farisî û hikayetên meşhûr, min û şagirtên xwe bi sedan nusxe nivîsîne û li ser refikên dikana min ya ku li nêzîkî nalxaneya Selîmê nalbend e danîne.
Lê min çawa wê roja ku rehmetiyê Xanî tê de hate definandin bîna hibra ku dibariya nekir ez nizanim!!
Teymûrê gurcî ku xelqên me ji bo meyxurîya wî jê re dibêjin Teymûrê fasiq ji nişkê ve qêrîya û got:

- Wey bavo hibr dibare hibr.

Me jî hemûyan bêhemdî xwe berê xwe da jor. Çipikin reş weke ku xalên misk û enberê bin li hewa dixewinîn.
Ku bi ser destên me de diketin me bîn dikir, bi rastî jî bîna hibrê ji wan dihat.
Termê Xanî jî, ku min û mele Ismaîl û mele Ferîdê Mamzêdî û mîrza Sebrîyê Pîrexalî danîbû ser milên xwe, pirr sivik bû. Te digot me termê zarokekî şeş salî hilgirtiye ne yê kalemêrekî şêst salî.
Rûyê mîrza Sebrî ji wan kerametan tehl bûbû, ez nizanim dibe ku ji ber saw û tirsa mirinê be, lê goya ku zaferan di rûyê wî hatibû dayin, zer bûbû.
Ji xwe dema ku destê xwe ji bin çardarê dirêj kir û da kefenê rehmetî û dît ku zuwa ye, bi tirs serê xwe nêzîkî guhê mele Ferîd kir û bû pistepista wî.
Kefenê seyda yê berfînî him spî mabû him jî şil nebûbû. Te digot ew barana reş nabare û fenanî ku em di bin tavika gulanê de dimeşin.
Subanellah, roja ku ji dayika xwe rehmetiya Gulnîgara keça Qerexan begê Pisyanî re bûbû jî , dunya baran bû. Bavê minê rehmetî wisa neqil dikir û digot ku wê rojê dema ew di nava kitana spî de pêçan û birin hucreya bavê wî da ku mizgîniyê bidinê û ew jî di guhê kurê xwe de azan bide û navekî lê

bike, pêçeka wî şil nebûbû. Malî û xizmên mele Ilyasê bavê Xanî ecêb mabûn û ji wî re macera gotibûn. Mele Ilyasê ku kurê xwe xistibû hemêza xwe, di pencereyê re li tayên baranê seh kir û got:

- Di Quranê de baran bi maneya xêrê jî bi ya bêyomîyê jî heye. Yan kurê min dê şanekî wî yê mezin hebe yan jî dê belake mezin were serê wî.

Û navê Ehmed li wî danî.
***

**Bîna hibrê û ya rîxê**

Bavê min, ku bi navê sofî Mehdî yê sehhaf li temamê serhedan hatibû naskirin, ji biçûkaniya xwe de ji kitaban hez dikir. Wî pîşekarîya sehhafiyê ji kalkê min wergirtibû. Kalkê min di serdema sultan Muradxanê sêyem de bi leşkerê Osman paşayê hakimê Şêrwanê re berê xwe dabû Tebrîzê. Wan salan şahê kor Mihemed Xudabende kurê şah Tehmasp û bavê şah Ebbas li ser textê selteneta eceman bû.
Osman paşa bi deh hezaran siwar û peyade re welatê eceman dabû ber xwe û Daxistan û welatê Çerkezan û heta Tebrîzê û temamê welatê azerîyan wergirt. Li Tebrîzê kalkê min bi jineke azerî re zewicî û li cem bavê wê fêrî sehhafîyê bûbû.
Piştî bîst salan şah Ebbas hat û Tebrîz dîsa zeft kir û vegerande nav sînorê memleketa eceman û leşkerên wî mîna pêlên behrê heta Wanê hatin. Kalkê min jî pişta xwe da Tebrîzê, jina wî ya ku zarok nedianîn miribû. Tiştekî wî li wî bajarê ku li ber çokanê şahên ecemî û sultanên romî bûbû gogek û ji vî destî dikete wî destî nemabû. Ji bêgavî vegeriya Bazîdê û di sûka wê de dikaneke sehhafîyê vekir ku niha ez jî tê de sehhafim.
Kaxez jiyana bavê min bûn. Li mal ew û diya min êvaran radibûne yekûdu. Her û her diya min digot: xwedê ji te razî ma kar neman tu bikî ji bilî sehhafiyê!! Binêre ew Selîmê nalbend bûye Qarûnek ji nalkirina simên hespan. Ê me çima bextê me reş e.
Bîna bavê min pirr fereh bû, dikenîya û digot: hurmet em bi kaxezên spî re mijûlin, wê ji xwe bextê me reş be, ku bi nalên hesinî yên req û reş re mijûl bûbûna dê bextê me jî spî bûya.
Kurmê hezkirina kaxezan kete beden û xwîna min jî. Min destpêkê li malê alîkariya bavê xwe dikir û kaxezên spî disimandin da ku ew wan bi hev ve bidirû. Ew mucellidekî hosta bû û feqe û meleyên serhedan hemû bûbûn dostên wî. Di xeta nesxê de tu xettat nedigihiştin paniya wî. Ji xwe wî xameyên ji zilê jî saz dikirin û serê wan teraş dikir ku êdî ew xame biketina destê bêsewadekî jî dê xeta wî xweş bûbûya. Paşê ku hinekî mezin bûm, bi destê min digirt û ez bi xwe re dibirim dikanê û civata feqe û meleyên hevalê wî hazir dibûm.
Sala ku çû rehmetê, kurê min Mehdî, yê ku dê nehêlim bibe sehhaf, nû çêbûbû. Xalê Emer, Emerê bedlîsî yê nuqsan ku hevalekî bavê min bû nav lê kir û got:

- Inşellah him navê wî rake him jî şopa wî biajo.

Û ez li şûna bavê xwe di dikanê de rûniştim
***

Di dema kalkê min de û heta çend salên berî mirina bavê min bazara ilm û kitaban di rewacê de bû. Feqî ji her deverê diahtin Bazîdê, û ji Bazîdê jî diçûn her derê û li pey ilm û aliman digeriyan. Feqiyên Bazîdî yên ku hîn venegeriyane jî hene. Hin ji wan, bûye deh sal ku li welatê xerîbiyê ne û bi dewlên hişê xwe ji bîra ilm avê dikişînin û vedixun. Lê çi fayde, xwedê dizane ku vegerin dê kes nebe suxteyê wan û ewqase cehd û gera wan bertelef bibe û badihewa here.
Niha her kes bi ser mal û milkan de dikulibe. Her kes bûye aşiqê şewq û şemala diravan. Weke rehmetî di esera xwe ya hêja de gotîye ji timayîyê hemyanê peran bûye dildarê me hemîyan!!

Êdî bira nema li birayê xwe  dipirse.  De ka wê çima li kitaban bipirsin!! Wellahî yek caran heftiyek diçe û kesek nayê kitabekê li ba min cild nake. Kesek nabêje ka vê kitabê ji me re nesix bike!! Ji xwe ku ne çend feqe û suxte û mustefîdên li ba rehmetî bûna, min dê ji zû de deriyê vê dikanê bigirta. Niha jî vaye Xanî çû rehmetê. Bi xwedê ez dizanim ku çiraxa zanînê vemirî û dê tarîtî me kor bike. Ma ne dibêjin jiholêrabûna ilm bi çûna aliman e!
Jina min, ku êvarê vedigerim mal, pirsa wê ya pêşîn : Ka dexlê te îroj çend aqçe derketin!!
Ez jî bi ser de radibim û bi hêrs dibêjim:

- Wey malikwêran, ma ez diçim pîvazan difiroşim?  Ma ez keran nal dikim? Ev kitabin kitab!! Ne nîsk û nokin  ne jî ceh û genimin ku xelq bikevin rêzê û ez jî weqî bi weqî yan çewal bi çewal bifiroşim.

Ez nizanim çi hatiye serê xelqê!! Tê bîra min berê pirr baş bû!! hema di wextê bavê min de min bi destê xwe bi dehan kitab cild dikirin  û difirotin. Qet nebûya rojê yek dihat û  kaxez û zila ku ji bajarê Zencana welatê Eceman dihat û xame û qelemên herî baş pê saz dikirin, yan jî qûmdankek, yan murekkebdanek dikirî. Çawa bûya   qûtê malê derdiket. Lê niha!! Xwezî ez jî hema nalbendekî mîna Selîm bûma û şev û roj serê min li ber qûna mehîn û hesp û hêstiran bûya. Rojekê du rojan dê kepûya min fêrî  bîna rîxê  bibûya. Ma kî çi zane?  dibe ku bi min ji bîna hibrê pirr xweştir bibe. Xwedê çêke û hew.
***
 Ez ne ku ji Selîmê nalbend diqeherim, lê hema nizanim rizq çima wisa ye! Her roj bi dehan ker û hespên çê û neçê di ber min re diçin  nalxaneya wî. Hindik maye xelq bizinên xwe jî nal bikin. Ma ev hal e!
Ji wê nalkirinê Selîm qesr ava kirine, mal çêkiriye û sê jinên wî jî hene. Ji xwe çi karwan diçe Stenbolê malekî wî jî tê de heye. Ez dibêjim ew û Hecî Zuhdî şirîkin, yan na ma çi dihêle ku rojê sê caran wek ferza nimêjê hecî Zuhdî tev xulamên xwe di ber  min re biçe nik wî!! Ma ku mesele nalkirin bûya  her mehekê du mehan carek bes e.
Yek caran mele Ferîd tê ba min, saetekê li kitaban dinêre, ji xwe dixwîne jî.  Hema bibêje wî nîvê ilmê xwe û meletiya xwe ji vê dikana me biriye. Malavayo hingî destgirtî û çavteng e dil nahêle kitabekê bikirre!
Carekê bi lez hat û pirsî:

- hoste Selaheddîn, ma şerha Teftazanî li ba te tê dîtin?

 Ez keniyam û min gotê:

- Mele Ferîd, ne tenê şerha Teftazanî heye, eger tu bixwazî, dê ji te re haşiyeya Qazî Kestelî jî li ser wê şerhê peyda bikim.

Kitaba Teftazanî rakir. Hinekî sehîfeyên wê qulibandin. Vir de çû û wir de hat û min dît rûnişt. Qederê saetekê rûniştî ma û min jî kitaba di nav destê xwe de cild kir. Paşê rabû û kitab di şûna wê de danî û got:

- Ev Imamê Teftazanî eqîde baş fam kiriye. Kitaba Nesefî qenc şerih kiriye.

Û çû.
Carekê jî nû ji Erzerûmê vegeriyabû, weke birûskê xwe li dikanê qeliband û pirsî:

- Ma nusexeyeke Mem û Zînê li ba te heye?

 Min nû yek nesix kiribû û hîn bîna hibrê jê difûriya. Lê ku min ew derxist û da destê wî, bi rûyekî tehl û bêyî ku buhayê wê bipirse got:

- Niha pere li gel min nînin. Ezê çend rojên din bidim te. Dibe?

Lê piştî çend rojan hat û kitab li min vegerand û got:

- Kuro Selaheddîn vê kitabê bes nesix bike. Tiştin ji islamê der tê de hene ha!!

Û kitaba min li cihê wê vegerand.

Ji xwe şêx Seyfeddîn!! Deccal kurê deccalan. Qaşo şêx e, min nedît wî rojekê jî kitabek xistiye nav destên xwe. Carê diçe ba Selîmê nalbend û nalên kevn yên keran tîne. Bi xwedê karê wî bi wan nalan sihirbaziyê dike, mêr û jinan ji hev berdide û bi hev şêrîn dike. Yan na ma çi dike ji wan nalên zenggirtî!! Qey xwe pê nal nake.

***

Berî çend rojan, xalê Emer hate ba min. Min hîn ew wisa bêdil û melûl nedîtibû. Xemgîn, bêdeng, gopalê xwe li refikên kitaban dixist û digot:

- Kurê min! bi ya min bike here yan li Stenbolê sehhafiya xwe bike, yan jî here Tebrîzê, ku biçî Bexdayê yan Helebê hîn qenctir dibe. Li vî welatî û li nav me kurmancan qîmetê ilm û nalê kerekî piştkurmî weke hev e. Zemanê berê çû kurê min. Here Selaheddîn, ev karê delal li vî şehrî nan nade te. Tu û zarokên xwe dê ji birçîbûnan re bimirin. Ku tu vê jî nakî were em tev biçin Bedlîsê, çawa be bazara sehhafîyê li wê ewçende ne mînanî vêrê kesad e.

***

## Mirovê rûgirtî û Şêrîn û Xusrewa Nizamî

Kes nizane ev mirov ji ku hatiye Bazîdê û mêvanê kê ye, min ew berê nedîtibû. Berî wefata Xanî bi çendakî xuyabû. Ew di gel mîrza Sebrîyê Pîrexalî diçû û dihat. Wî ji her kesî re digot ev xizmekî min e. Carekê min dît va hatiye ba min. Ez şaş mam û min di dilê xwe de got: Muheqqeq vî rê şaş kiriye, û min jê pirsî: dikarim xizmeta te bikim!!

Dengê wî yê ji pişt rûpoşa wî dihat, tirseke nediyar berda hinavên min. kurmanciya wî jî ne ya serhedan bû, pirr ferq dikir. ma ku xizmê mîrza Sebrî bûya wê ne mîna wî xeber bida? Ew derbas bû û ji paşila xwe kitabek derxist, kitabeke xweşik bi qabeke çermîn û xeta Sulus. Ew destana Nizamîyê Gencewî (Şêrîn û Xusrew) bû. Ku min lê nihêrî kêfa min gelekî hat, ew bi xetek pirr ciwan û nazik hatibû nivîsaandin. Ez jî ji zû de lê digeriyam. Rehmetiyê Xanî jî çend carî pirsa wê kiribû. Nusxeya wî êdî nedihate xwendin. Hibra wê tev çûbû û pirr meraq dikir ku yeke nû bi dest bixe. Çend carî min wesyeta wê li karwanên ku diçûn Tebrîzê û dihatin kir, lê kesî ji min re neanî. Îca ku çavên min bi wê nusxeya xweşik ketin ez ji kêfan re dikira bifiriyama. Hema min ji destê wî girt û gotê:

- Buhayê wê çi ye!!

Dîsa bi wî dengê xwe yê ku tirseke nediyar dawerivandibû hinavên min, got:

- Li ba xwe deyne, eger kesek hat û kirrî, ezê buhayê wê ji te bistînim, hinek ji buhayê wê didime te jî.

Dema hat ku derkeve. Min jê re got:

- Heyran bibexşîne, lê te xwe mîna rêbirr û keleşan kiriye, ka rûyê te bibînim.

Dema ku rûpoş rakir devê min ji hev ma û zimanê min di devê min de hate mîxkirin. Ew insanekî hema bibêje bê rû bû. ji şopên birînan mirov nizanîbû ku ev berê rû bû.

***

Di pê du rojan re rehmetiyê Xanî jî hate ba min. berî nexweşiya wî bi rojekê du rojan bû. Hinekî li kitabên di refikan de nihêrî, zirezira kerekî ku dihate nalkirin hat. Çend keser hilanîn û got:

- Selaheddîn, şarê ku tê de nalên keran ji kitaban bêtir werin firotin, şarekî xezeba xwedê lê bûye. Insanên wê divê werin nalkirin ne kerên wê.

Ez bi gotina wî pirr xemgîn bûm. Min berê jî gilî û gazinên wî di Mem û Zînê de xwendibûn, lê hîn min ew wisa bi kerb nedîtibû. Min, da ku ber dilê wî bidim, rahişte kitaba ku wî kesê rûnuxamtî ji min re anîbû û da destê wî. Pê re rûyê Xanî yê zer geş bû û kêfxweşiyeke zarokane pê girt, cubbeyê xwe hilmişt û xwe da ser depekî di nîvê dikanê de û li qaba wê nihêrî.

Kerê ku dihate nalkirin, zirezira xwe nerawestand. Te digot qey Selîmê nalbend wan mîxên ku di simên wî de dikute, digihîne heta hestiyan. Lê êdî rehmetî nema guh da wê zirîna guhqelêş. Bi ser kitabê de xwar bû û qederekî bêdeng ma. Paşê rabû ser xwe û got:

- Selaheddîn, a ez li vê kitabê digerim. Ez ji camiyê vegerim dê werim wê ji ba te hildim.

Bi dengê azana esrê re, Xanî ji dikanê derket. Lê venegeriya. Ji bîr kir were Şêrîn û Xusrewê bibe û bi ser de bi wê êşa xedar ket û jê ranebû..

Piştî ku ew çû rehmetê dîsa ew mirovê bi rûpoş hat. Pirsa kitaba xwe kir min jî şanî wî kir û got va hîn li ba min e. Kêfa ku kir kêfeke ecêb bû. Kitab rakir û li ser hev got Elhemdulillah û ji dikanê bi lez derket.

***

## Jankêşiya Xanî

Êşa nenas û giran ku Xanîyê rehmetî dabû ber xwe em dost û mirîd û muhibbên wî hemî tirsandin. Çend rojan em li dora wî bûn û me dikir û nedikir me nizanîbû çi êş e. Wî pêşiyê got ku min serma xwariye. Lê ku çend roj tê re çûn kifş bû ku mesele ji sermaxwarinê girantir e. Wî her digot:

- Tehma madenan di devê min de ye. Weke ku hesinek yan zîvek yan sifir di bin zimanê min de be.

Êdî me çû hekîmê Ermenî Zuhrab anî ser. Wî ku çend pirs ji Xanî kirin û avdasa wî ya biçûk dît, got:

- ez texmîn dikim mesele jehrî ye ne serma ye!!

Me hemûyan bi çavên hevûdu de nihêrî. Kî wê wî jehr bike û çima? Edawet û dijmintiya wî bi kesî re nîne, erê ew û mîr van deman ne li hevin û mîr beriya demekê Mele Ferîd û Mîrza Sebrî şandibûn ba wî û hin gotinên ne di rê de ji devê wan bihîstibû. Lê ne mumkin e mîr di kuştina zatekî bi qedr û qîmet mîna Xanî de bifikire, mîr dîn nebûye qey!!

Xanî bi xwe jî ji hekîm re got:

- malava vê nebêje, kî dê min jehr bike?

Hekîmê ku hinek yansûn ji bo qolincan û madxelandinê rawestîne amade dikir, bi rûyekî dilovan lê vegerand û got:

- Ezbenî erê hekîmî yek caran teşxîsan ne rast dide, lê teşxîsa di jehrdayînê de her dem rast derdikeve. Vaye cenabê te dibêjî tehma madenekî di devê min de ye û dilê te dixele!! Ê kifşe seyda!

pişt re hekîmê ermenî Zuhrab, huqqeya xwe vekir û çend kîsikên biçûk ji hundirê wê derxistin û dane ber serê Xanî û bi dilovanîya xwe ya berê got:

- Em hêvî dikim derbas bibe. Ev hinek dermanin divê tu ewan her roj sibê piştî ji xew rabî û êvarê berî ku binivî, bixwî. Înşellah dê baştir bibî.

Lê her ku çû xirabtir bû. Êdî her şev civata me li odeya wî bû. Heta derengî şevê em diman û me suhbet dikir. Yek caran baş dibû, goya ku çiraxeke û don ketiyê. Radibû û yan kitabek dixwest û lê dinêrî yan jî henek dikirin û digot ku ew zû bi zû namire, divê destana kela Dimdimê biqedîne paşê bimire. Lê di pê re rûyê wî melûl dibû û dimiçiqî û digot:

- Mirin çawa be mêvane, em jî divê qedrê mêvanan zanibin. Gilî û gazinên wî nekin, rûyê xwe jê re tirş û tehl nekin, berê xwe jê neguherin. Hatiye û li deriyê me qesidiye, ma dibe em wî vegerînin!! Ji xwe mêvanê ku mirov wî dawetî ba xwe bike.

Ku didît rûyên me li ber germîya wan peyvên wî yên xemnak diçilmisîn, keser vedidan û digot:

- Min ya xwe got, li kurmancan û mîrên wan jî famkirin dimîne. Ez temenkî dî ji xwedê naxwazim û eger careke din jî werim dinê, dê dîsa wan gotinên xwe dubare bikim. Heta ew illeta şiqaq û temerrud û bêxwedîtî û mehrûmî û mehkûmîya wan hebe, dê eynî gotinan bibêjim.

Nefesa wî qut dibû.  Çavên xwe digirtin. Qurtek av ji tasa sifir ya ber serê xwe vedixwar û dîsa digot:

- Ne mîr û ne jî piranîya xelqên Bazîdê û kurmancên etrafan  guh dane  pendên min.
  Bi ya min bûya  dê niha li Bayzîdê …

û xwêdaneke mîna xunavîya sibehên payîzan bi enî û qirika wî diket. Helkehelka wî nedihisht xeberdana xwe temam bike. Bêdeng dima, ulq dihatinê û vedireşiya.
***

**Xanî di şeveke bi ba û baran de mir**

Şeva dawî ku rûhê Xanî tê de teslîmî rebbê xwe bû, ez li mal bûm. Min cildê kitabekê hazir dikir û kurê min Mehdî yê çar pênc salî li dora min diçû û dihat. Her carê dihate ber min û dipirsî:

- Bavo ev çi ye tu çê dikî??

Dilê minî ku ji sehhafîyê bêzar bûbû pê şewitî. Min  nedixwest  ez qala kitêban jê re bikim, min henek kir û got:

- Ev simê kerekî piştkurmî ye lawê min.

Û dengê derî hat.
Sofî Heyderê qersî bû, dengê wî weke agirê serê şemalekê diricifî. Dema min pirsî xêr e sofî Heyder çi heye? Bi kela girî re got :

- şêxê me Xanî. Sekeratan dike.

Hema min kitab ji destê xwe avêt û gotê:

- Tu here ez û hekîmê ermenî Zuhrab li pey te tên.

***
Li derve baraneke bêhûde dibariya. Bazîda bêdeng bi dengê wê baranê re mîna yekî ku fişefişa pozê wî be ji girî. Min heta xwe gihande mala  hekîmê ermenî devereke zuwa jî di min de nema bû..
Li ber derîyê hekîm ez gelekî nemam. Hema min bi lez û bi dengekî ji dengan dûr xeber dayê û bêdeng berê xwe da hucreya Xanî.
Çawa min derî vekir û derbas bûm, bayê sar ku li derve huvîniya wî bû mîna ku çiyayên derdorê binalin, berî min derbas bû û çiraxa li ber serê Xanî vemirand. Mele Isamîl hat ku careke din wê geş bike  lê Xanî nehişt û işaretî hêla çepê ya sînga xwe kir û got ku di dilê wî de çiraxeke vêketî heye.
Di gel wê jî mele Salihê Cizîrî rabû hinek don berda çiraxê û ew geş kir.
Piştî min bi kêlîkekê hekîmê ermenî jî hat. Kurkekî sivoreyan wergirtibû xwe û dewa û dermanên xwe jî anîbûn. Lê êdî dem buhurî bû û ew derman hemî bêhavil bûn.
Huvehuva bayê Bazîdê nerawestiya wê şevê. Çend caran çirax vemirî û me dîa giş dikir. Sofî Heyder rabû û çirax xiste kulikeke li ber serê Xanî û bi dengekî hêdî got:

- Ev ne nîşanên xêrê ne. Ev sê carin îşev çiraxa ber serê Şêx Ehmed  vedimire!!

Mele ismaîlê ku rû ji xemgînîyê tehl bûbû bi dengekî hêdî û bi hesretan pêçayî gotê:

- Wisa nebêje sofî Heyder. Xwedê teala çi kiriye betal nabe.

Nefesa Xanî jî êdî giran giran diçû û dihat. Çavên xwe vedikrin û bêdeng li rûyên me yek bi yek dinêrî. Dixwest tiştin bibêje. Di çavên wî de xeberdan kifş bûn lê nedişî.
huvehuva bayê hov qut nebû. Di hinavên me de jî bayê tirsê dikire huvînî. Ji nişkê ve Xanî rûnişt û bêyî ku berê xwe bide çu kesî  bi dengekî lawaz û quto quto ji haziran re got:

- Ma ..mîr …nameya.. min.. xwend.

Û serê wî bi rexekî bû.
Bi dengê la ilahe illellah re em hemî beziyane ber serê wî. Ew êdî temam bûbû.

## Selîmê nalbend

Berdestê min wê sibehê hat û bi helkehelk got:

- Apê Silo. Dibêjin Ehmedê Xanî miriye. Wa tirba wî dikolin.

Wey rehma xwedê bi baran bi ser de were, ew mirovekî qenc û çê bû. Ma ku ne çê bûya di roja înê de dimir!! Ji xwe ew sipartin roja yekê remezanê jî û ew tê de definandin. Lê ez ji bextê xwe yê reş defna wî hazir nebûm. Qantirek di nav destên min de bû û min ew nal dikir. Simên rebenê qantir bûbûn mîna textikekî riziyayî. Heta min mîxên nalê kevin hilkişandin û simên kurrisî xeritandin û ji

bo nalkirinê rast kirin, hal di min de nema. Min simbirr ji destê xwe danî, pêşmalka ji ber newqa xwe vekir û hatim ku herim nimêja cenaze hazir bibim. lê min di dilê xwe de got: de ka ez vî simî jî nal bikim! Min rabû ji wî berdestê xwe re got:

- Kuro niha ne vala me, were em vî qantirî nal bikin, paşê em diçin. Ma ku em cenazeya Xanî hazir nebin dê ya kê hazir bibin!!

Lê ez neçûm. Subhanellah wê rojê gelek hesp û ker ji gundan hatin ji bo nalkirinê. Baran jî dibariya û şilî û şepelî bû. min jî xwe ji bîr kir. Welleh min xwe ji bîr kir. Qeda xwedê bi wî qantirî bikeve erê welleh.

Mîratê ku karek dikeve ber destê yekî, xasma ku karekî mîna karê min be, ne mumkin e mirov wî nîvco bihêle. Ma dibe ku simek bi nal bibe û sê ji wan jî wisa bimînin. Na welleh nabe.

***

## Ez û pîşeyê nalbendiyê

Ez neh deh salî bûm, bavê min ez anîme nik xwe nalxaneyê û gote min:

- Kurê min Silo, tu têra xwe hînî xwendinê bûyî. Êdî şukur ji xwedê re vaye tu eyn û xeynan û sîn û şînan jî ji hev derdixînî.

Qantirekî ku diahte nalkirin, serê xwe bi tundî ji cuherê li erdê ji bo aramîya wî danîbûn derxist û çep û rast hejand û bû xingexinga rişme û zengilên pê ve. Ez veciniqîm û min xwe bi şûn de da. Bavê min kenîya û got:

- Ez jî wisa bûm kurê min. Netirse ezê te fêrî vê pîşeyê bikim û tu yê heta sax bî duayan bo min bikî.

Wî ji min re got ku rêya ilim rêyeke zirav û dirêj e û dawî jê re nîne, nan jî jê nayê. Wî digot ku sê ribê aliman parsekin û ribê mayî jî feqîrin ez jî naxwazim tu yan parsek yan xizan bî. Min jî bi ya wî kir û dev ji xwendinê berda. Êdî min pişta xwe da kaxezan û elif û bêyan û berê xwe da mîxan û nalên hesinî ku mîna elifên rast û nûn û dalên xwar û şikestî ne. Bi rastî jî heta roja îro duagoyê rehmetiyê bavê xwe yê nalbendim. Ne poşmanim ku di vê rêyê de meşiyam. Dê zarokên min hemû jî şopa min biajon.

Bavê min roja ku serê xwe tê de danî û çû diyarê rehmetê gote min ku were li ber serê min rûne. Bi xemgînî min li ber serê wî xwe da ser çogan û bi çavên wî de nihêrî. Ji min re gelek tişt gotin, lê yek ji wan gotinan heta vê gavê jî di serê min de bûye zengil û dike zingînî. Berî ku çavê wî werin ser hev, quto quto û bi zor û dengekî mîna nalînan got:

- Kurê min vê ji bîr neke. Nalbendê baş ew e yê ku nalan li gor siman saz dike, ne ku siman li gor nalan dibirre.

Bi wê gotina zêrîn re can jê kişiya.

Lê aaax kanîn rojên berê!! Min bi dehan hesp û qantir û ker weke ku bavê min wesiyet kiribû nal dikirin. Karwanên ku di Bazîdê re diçûn û dihatin Rewanê, Qersê û heta Stenbolê û Tebrîzê jî bazara nalkirinê germ kiribûn. Ji xwe hîn di dema berê de, li gor ku rehmetiyê bavê min digot, nalbendî karê herî baş bû li van welatan. Dema ku eskerên sultên dihat û li derdorên Bazîdê kon datanîn. Dibû daweta nalbendan. Vala nedibûn û bi hezaran aqçe diketin hemyanên wan. Sala ku xundkarê me rehmetiyê sultan Muradxan leşker kişande ser Rewanê, bi gotina bavê min wî sêsed û sêzde hesp û hêstir û mehînên çê bi nal kirin.

Lê çi heyf ku êdî nema leşker tên. Ji zû de ye sultanan û eskerên wan rêya xwe bi welatê me naxînin û naçin şerê qizilbaşan. Çi bextekî reş e lo! Ji xwe qizilbaş jî nayên, ma ev çi hal e? hema carekê bihatana û ordîgeha xwe li biniya çiyayên Bazîdê daniyana dê min têra pêncî salî hesp nal bikirana. De qey wê rojekê werin. Yan sultan yan şah kî be bil bibe, ewê xwedan hesp û xêl û esker be û nanekî baş dê di wan de hebe.

Dîsa jî elhemdullilah ez destê xwe pişt û miştê maç dikim û radibim û rûdinim duayan ji rehmetiyê bavê xwe re dikim ku wî ev rêya ronî li pêşiya min vekir.

***

Li bajêr gelek nalbend hene lê kesek mîna min ne bi nav û deng e. Her kesê ku ji heywanê xwe razî be û guh lê dike tê li ba min wî nal dike. Nalbend hene heywanan nal dikin lê çi nalkirin? Piştî du rojan mîx dipekin û ew nal bi beza pêşî re difirin û dibe şingîniya wan li ser rê ya. Nalên ku ez çêdikim xweşik û tebût û hêja ne û ez bi erzanî jî çêdikim. Mîrê me bi xwe her roja înê min dawetî koşka xwe dike da ku ez serî li kimêtê wî yê navdar Şahîn bixim. Ellah wekîl hespekî mîna wî ne di tewîleyên şahên eceman de ne jî di yên sultanên me de heye. Ku simeke wî datînim ser kaboka xwe dibêjim dunya hemû bûye ya min. Ew jî hogirî min bûye. Ku çav li min dikeve serê xwe dihejîne û ber bi min ve tê weke ku ez xwediyê wî bim.

ne tenê Bazîdê lê ji welatan jî siwarên hespan tên hespên xwe li ba min nal dikin. Carekê tacirekî ji Xinûsê hate Bazîdê û dostekî wî ew anî ba min. Min jê re hespa wî nal kir. Ê de hingî min baş çêkirin kêfa wî gelekî hat, hinek aqçe zêde jî dane min û got:

- Welle xalê Selîm tu dilê mirovan jî dibijînî nalkirinê. Mirov dixwaze xwe jî li ba te nal bike.

Hela tu hecî Zuhdîyê bazirgan û şêx Seyfeddîn û maqûlê bajêr berde, mîr bi zatê xwe yek caran hespên xwe bi meyterê xwe re rê dike ba min. Ku ne li Bazîdê bim, li hêvîya min dimîne heta vedigerim. Wisa dikare hespên xwe bi rojan bê nal bihêle lê tucarî teslîmî nalbendekî din nake.

Sed car elhemdulillah ku rizqê min ketiye simên heywanan. Ne mîna rebenê Selaheddîn ku bi roj pê de tu karî nake ji bilî kişkirina mêşên ku ji ba min diçin dikana wî. Welleh kenê min tê ku wisa difikirim. Carekê ez di ber dikana wî re çûme nimêja nîvro, min dît bi ser kitabekê de xwar bûye û sehîfeyên wê şîrêz dike. Min silav kirê û kenyiam û min got:

- Ha birazê!! Mêşên min têne ba te ne? Li qusûra min û wan nenêre ha.

Serê xwe rakir, bi rûyekî tirş û bêyî ku silava min vegerîne got:

- Bajarê ku mirovê wê nexwînin mêş tê de dibin mele.

De were li vê gotina çewt a dînan. Ma ne heqê xelqê ye ku nêzîkî wî nabin! Nizanim çi girr ji min girtiye!! Welleh hemî hesûdî ye.

Xelq berî ji min û şêweyê nalkirina min hez bikin ji suhbeta min û çîrokên min hez dikin. Heta ku heywana yekî nal dikim du sê mesel û çîrokan jê re dibêjim. Kêfa xelqê ji çîrokên min re tê. Ê ku hespa wî nalkirî be jî tê li ba min dimîne û guhdarîya qissetên min dike.

Ji xwe mîrê me!! Ku êvarên înan qawe tê danîn û civata wî ji bo şevbuhêrkê digere , min li hêla xwe ya rastê dide rûniştandin û dibêje:

- Ha Silo! De ka çavên vê şeva me bi hikayetên xwe kil bike.

***

## sê çîrokên nalbendan

**Nalbend û gundî**

Carekê gundiyek hate bajarekî. Wî kera xwe anîbû da ku nal bike. Nalbend nalek rakir û hat ku bi simê kerê ve mîx bike, gundîyê ji xwe razî got:

- Ka hela binêrim.

Û ew nala hesinî bi destê xwe tewand û bi payebûn got:

- Yeke din. Ev bi kêrî kera min nayê.

Nalbend naleke din anî, dîsa ê gundî ew di nav destê xwe de weke hevîrekî tewand û dîsa got:

- Ev jî ji kera minî delal re nab e.

Vê carê nalbendê bajarî kerribî û naleke stûr anî da destê xwediyê kerê. Gundî çend carî kir û nekir nikarîbû nalê bitewîne, mecbûr stûyê xwe xwar kir û got:

- A ev li gora kera min e.

Nalbendê ku ruhê wî heta ber devê wî hatibû, bêdeng simên wê kerê terişandin û mevred kirin û çar nalên stûr bi wan ve kutandin. Gundî jî ji navbenda xwe aqçeyek derxist û da destê nalbend. Nalbend jî aqçe di nav tiliyên xwe de firkandin û sûretê li ser mihand û gote ê gundî:

- Ev aqçeyê te dexel e.

Gundîyê behetî, rabû aqçeyekî din derxist û da destê wî. Ew jî wisa bû. û bi wî rengî nalbend çend aqçe bê sûret hiştin û heyfa xwe jê hilanî û gotê:

- Eger ji te re gotibin tu dikarî bi nalbendan bikenî ji bîr bike. Em nalbendin bavo heyran. Em dikarin kevjalan jî nal bikin.

**Malê helal**

Dibêjin nalbendek di zemanê Şahsiwarê pisyanî de li Bazîdê hebû pirr jîr bû. pereyên wî jî zehf bûn lê tu kesî nizanîbû ew wan di ku de vedişêre.

Wî ku heqê nalkirina xwe ji siwarekî yan kesekî din digirt, di kurtanekî kevnî kerê xwe de vedişart lê çavên tu kesî pê nediketin. Bi wî awayî û bi salan gelek pere di kurtanê kerê de kombûbûn. Rojekê ew ne li nalxaneyê bû û kurê xwe li şûna xwe danîbû. Koçerek hat û çav li wî kurtanî ket. Ji kurik re got:

- Ma tu vî kurtanî nafroşî!!

Kêfa lêwik hat û got erê çawa nafroşim. Bi çi ne bi çi? Dawiyê li hev kirin û ê gundî him kera xwe nal kir û him jî kurtanê tijî pere bi xwe re bir.

Çawa bavê wî hat dît ku kurtan ne li cihê xwe ye. Kuro ka kurtan! Wî bi kerb ji kurik pirsî.

Kurik jî di fikra wî de tiştekî baş kiriye, bi kêf gote bavê xwe:

- Wîîîî bavo! Min ji bîr kir bibêjim, ma ne min ew firot û em jê xelas bûn.

Bavê wî kire hawar û bi ser de qêrîya:

- Wey kerê ji keran, wey agir bi cilê te ketî qantirê bê nal! Ma ne divê ez te li dewsa keran nal bikim ha!! Te keda minî bi salan bertelef kir.

Û bi tepan bi serê xwe ket û hat ku kurê xwe bi simteraşê bikuje.

Lê çi bike, weke dibêjin tiştê çû nede dû! Wî çiqasî da dû jî, tiştek hasil nekir. Keda wî ya salan ku aqçe li ser aqçeyê datanî, hemî di kêlîkekê de û ji ber kerîtiya kurê wî badihewa çû.

Nalbendê reben ji bêgavî stûyê xwe xwar kir û vegeriya karê xwe. Û dîsa çend sal çûn heta rojekê ji rojan siwarek derbasî ba wî bû û piştî silavê gotê:

- Min berî çend salekî ev kurtan ji ba we kirî, ew yê kera ye, niha ez bûme xwedî hesp û haceta min pê nema ye, ma ez dikarim vegerînim?

Nalbend ji kêfan re firîya û hat ewê koçer hemêz kir û ramûsand û gotê:

- Wey malava çawa nikarî? Were ez kurê xwe li şûna vî kurtanî bidim te!

Ê koçer qeherî û got:

- Na bavo na, çî min û kurê te! Deh kurê min hene xwedê wan bihêle têra min û jiyê min hemûyî dikin. Zîneke hespan li ba te hebe li şûnê bide min.

Nalbend ji guhê xwe bawer nekir û bi lez rabû zîna hespa xwe anî û dayê û got:

- Malê helal naçe, malê helal naçe.

Wê şevê nalbend neket xew. Kurtanê wî li ber serê wî bû û pereyên xwe dihejmartin. Mîna zikrê sofîyan her digot:

- Malê helal nçe , malê helal naçe.

Û ji wê rojê de ew kurtan bû palgeha bin serê wî.

**Nalbend û Sadriazam**

Li Stenbolê, Stenbola qesr û serayên mezin sadriazemek hebû kêfa wî gelekî ji lîstika şetrencê re dihat. Ew zêde şareza bû û şev nediçû bêyî ku di qesra mezin de bi xundkar re bilîze. Şevê destek du dest bi sultanê mezin re dilîstin. Carekê sultan çûbû herba Mecerisatnê û ew ji bo tedbîra memleketê li şûna xwe hiştibû. Şevekê weke ku jê re bûbû kurm û adet dîsa xwest bilîze, lê kesek nebû. Hema qûlekî xwe şande ba nalbend û meyterê xwe û ew anî li ber xwe danî. Ewwil jê pirsî:

- Ma tu bi hespan dizanî!!

Meyterê reben ku nû ji xew rabûbû bi tirs got:

- Erê cenabê sadriazem ma ne ez nalbendê hespên cenabê te me!!
- Kuro ne hespên hesp! Ez çê li hespên şetrencê dikim, tu bi şetrencê dizanî?

Nalbendê ku piçekî zanîbû bilîsta gotê:

- Erê efendim dizanim.

Û dest pêkirin lîstin. Sadriazem mîna ku jê re bûye adet xwest yê himber wî bilîze, rabû ji wî re got:

- Padşahim kerem bikin hûn dest pê bikin.

Devê nalbendê reben çû pişt guhê wî û ji guhê xwe bawer nekir. Di dilê xwe de got: ev wezîr dîn bûye. yan jî henek û laqirdiyan dike.
Wî nema zanîbû çi bike û kîjan kevirî bileqîne. Hema peyadeyek da pêş û dîsa bêdeng, lê tirsiyayî ma. Wezîrê mezin jî peyadeyekî xwe danî pêşiya peyadeyê wî û li hêvîya wî me. Nalbendê kercilî ku êdî bala wî ne li ser lîstikê bû, bûbû xifşekî xezalan ku nema zanîbû çawa ji wê fetrakê derkeve. Wî qet di xewnan de jî nedîtibû ku solên sadrîazam li ber lingê wî rast dike. Rûmeta wî ya herî mezin ew bû simên hespan bixeritîne û wan nal bike. Îcar tew li himber wî li ser doşekên tijî perîkê quling û qazan rûne û şetrencê bilîze, bi ser de jî jê re Padşahim bête gotin!! Ew heyirî bû. Hema çavên wî di çarkoşeya belek ya bi hesp û fîl û ferzîn û peyadeyên ji dur û yaqûtên zîvkirî xemilandî de dinêrî û newêrîbû çavên xwe hilde jor û li rûyê sadrîazem binêre. Qederekî bêdeng ma. Dixwest kêlîkekê berî kêlîkekê Sedriazam şahê wî kiş bike û gotina Mat bibêje. Lê dîsa sadriazem bi stûxarî gotê:

- Padşahê min! ez xulam eger dilê cenabê we û lîstikê nîne ez rakim!!

Vê carê nalbendê tirsiyayî hinekî dilê xwe xurt kir û got:

- Ez….ez….ez xulam. Ez bendeyê we û sayis û nalbendê hespên cenabê we me. Ez xizmetkarê hespanim. Ez ne padşahim ezxulam. Ez axa bin nigê te û padşahim.

Îca sadriazam serê xwe rakir û kenîya û got:

- Ez jî dizanim, lê ji ber ku lîstika min tim bi padşah re ye, divê ez fêrî navê wî tenê bibim, divê tenê xitaba wî bi hurmet bikim. Bêedebiya di huzûra padşahan de buhayê wê serê mirovane ha!

## Bengînê dergevan

## Mîr û xebera mirina Xanî

Sibeha ku seydayê Xanî tê de çû rehmetê, xeber gihişte dîwanê. Yekî ku bîna baranê jê dihat li ber derî rawestiya û got:

- Xanî wefat kiriye.

Ez nizanim hêsir bûn yan jî çipikên baranê bûn li ser hinarkên rûyê wî diherikîn, lê ez dizanim ku bi qasî ew bi dilekî xemgîn rawestiya bû û xebera reş da min û çû, ez jî wisa xemgîn ji ber derî çûm û min berê xwe da koşka mîr.

Roja şemiyê yekê remezanê bû. Mîr hîn ji xew ranebûbû. Min û xulamê wî me hinekî suhbet kir. Me behsa Xanî û nexweşiya wî ya dirêj û xedar û nediyar kir, min jê re got ku bêguman mîr divê xeberdar bibe, ew dê biçe defna wî hazir bibe. Lê xulamê wî got ku îroj remezan e dê mîr di xew de bimîne. Min dubare gotê ku Xanî çûye rehmetê divê ez xeberê bigihînim cenabê wî. Lê xulamê wî razî nebû û got:

- Nabe Bengîn. Tu dergevanî divê ji min çêtir zanibî. Duhî cenabê mîr qewîtî li min kir û got ku çi bibe sibehê min ji xew ranekin. Ew heta sihoran payî ma bû, sihora xwe xwar, nimêja fecrê kir û raza. Wî got ku, heta Mîrmîranê Wanê bi xwe jî li ber derî be min şiyar nekin.

Lê ne mîrmîranê Wanê li ber deriyê mîr bû, mirina zatekî mezin mîna cenabê Xanî bû û bi ya min bûya diviyabû me xeber ne tenê bida mîr, lê diviyabû me xeber bida her der û berê. Ji Serhedan heta Wan û Hekarî û tixûbê welatê buhtiyan û beriya Mêrdînê jî.

Mîr dizanîbû Xanî nexweş e lê rojekê jî neçû serdana wî. Her çend rojekî bangî min dikir û dipirsî:

- Kuro Bengîno. Ka mele Ehmed çawa bû? hekîman çi gotin?

Lê ku min cewaba wî dida û digot ku ew baştir bûye yan xirabtir bûye, li min guhdarî nedikir. Weke ku ne wî ew pirs ji min pirsî be.

Wê sibehê jî ku çawa ji xew rabû, ji hêla enderûnê hat û çav li min ket, pirsî:

- Xêr e Bengîn! Rûyê te çima wisa tehl bûye? Tu mîna kewê ku bazek li ser serê wî hêlan bike xuya dikî. Çi heye?

Ez naçar bûm wê xebera reş bidimê. Sibe bû jî lê xeberek wisa nabe dereng û veşarî bimîne. Min bi milxwarî û dest li ser hev gotê:

- Mîrim bibexşîne. Herçendî xeberek reş be jî divê bibêjim. Xanî jiyê xwe da te.

Û min bi çavên wî de nihêrî. Ellah wekîl biriqîn. Lê biriqandineke mîna ku kulîlkên şahîyê tê de bibişkivin bû. Kêfa ku ji wan herdu çavên wî yên nîvgirtî mîna kewan firiya li ser şaxên xemgîniya min venişt. Paşê, mîna ku tê bigihîje hinek xemgînî ji xebereke wisa re divê, hinekî rûyê xwe qermiçand û got:

- Inna lillah we inna ileyhî raciûn. Bengîn here ji şêx Seyfeddîn re bibêje bila ew telqîna wî bixwîne. Û nimêja cenaze jî bila mele Isamîl li ser bike. Ez dizanim ev mele çiqasî ji hev dihesidin.

Gotina mîr bi vê cewabê temam nebûbû. Ez şêweyên mîrê xwe nas dikim. Ew hino hino dipeyive û li çavên mirovan nanihêre. Ji xwe çavên wî, dema ku xeber dide hema bibêje girtî ne. Îcar ez li hêvîya temamîya cewabê mam û hîn jî destên min bestî mabûn. Baranê jî hêdî hêdî didayê û ewr di ser hev re mîna qazên kuştî diqulibîn.

- Ha min ji bîr kir, bibêje wan bila wî di hewşa camiya wî de veşêrin.

Wisa got û pişta xwe da min û li enderûnê vegeriya. Xulamê wî jî awirek di min veda û da pey mîr û çû. Ez bi tenê di bin baranê de mam û fikirîm. Mîrê me ewçende ji Xanî ne aciz bû, lê mîrza Sebrî yê ku bi paşgoyîya xelqê li ba mîr cihê xwe xweş dikir, girrê ji Xanî weke jehrekê berda şûşa dilê mîrê me. Ev du sê mehin Mîrê me şevbuhêrkan bêyî mîrza Sebrî li dar naxîne. Ew bûye şêwirmendê wî û di her şolî de pê dişêwire. Hin şevan ku ez jî diçûme dîwanê min kenarên desmalka xeberdana wan bi dest dixist. Mîrza Sebrîyê kînewer her behsa Xanî û kitaba wî û xutbeyên wî yên camiyê dikir. Carekê dengê wî hate min digot:

- Mîrim! Tirsa min ewe ku Xanî xelqê li cenabê we bihêvoje. Ew li gelek civatan qala fermana humayonî ya ku tu li ser textê bav û kalan yê mîrnuşîniya Bazîdê danîye dike û dibêje ku ew fermaneke bi zêran hatiye kirrîn.

Min ku gotinên wisa di meclisa mîr de dibihîstin dixwest bigihînim Xanî, lê ditirsiyam ku ew yeka han bibe fesadî û ewanî û fitne jê peyda bibin. Min her xwe ker kir lê min dizanîbû ku dê dawî ne dawiyeke bi xêr be.

Ez di van fikran de, çipikên barana ku êdî weke rêwiyekî westiyayî giran giran dihate xwarê bi dîwarên koşka mîr de diherikîn û şopên weke çîveçîva çûkekî birîndar di destê şahînekî hêrsbûyî de xêz dikirin. tavilê min dît wa ye mîr ji odeya xwe derket û cilên wî yên nêçîrê lê ne. Bazê wî Şihab li ser zendê wî yê ku desbendeke spî lê pêçayî û ratib li newqê gerandî, tajîtolê wî jî li pê û tîrdank û kevan li milin. Ez behetîm, cenazeyê Xanî li erdê ye û mîr diçe nêçîrê?!

Dema çav li min ket got:

- Kuro Bengîno. Vaye nameya rehmetî ya ku te ji min re anîbû. Ez vala nebûm ku vê nameyê bixwînim. Niha jî ew çûye diyarê rehmetê, êdî nema hêjaye bixwînim. Wê bibe û teslîmî mele Ismaîl bike.

Û derket.

**Nameya Xanî ya ji bo mîr**

Berî wefata Xanî bi rojekê Mîr ez şandim ba Selîmê nalbend da ku were nalên hespê wî raçav bike. Wî karê xwe û nêçîrê dikir û me karê pêşwaziya remezanê dikir. Te digot bajar ji xelqê mîna dareke tuyan hatiye daweşandin. Kes li kolanan nema bû. Piştî ku min xwesteka mîr gihande Selîmê nalbend min berê xwe da camiya rehmetî. Dema ez gihame hucreya wî kesek li ba wî nebû. Tev derketibûn ku nimêja nîvro bikin. Çawa çav li min ket kêfa wî gelekî hat. Lê hêz û taqet tê de nema bû. Bi nalîn û dengekî xeniqî re gote min:

- Bengîn xwedê tu şandî.

Û ji ber serê xwe çend kaxezên pêçayî derxistin. Dirêjî min kirin û got:

- Van kaxezan bigihîne mîr. Zû bila kes nebîne ku min name ji mîr re rêkiriye.

Min destê wî ramûsandin. Name xiste paşila xwe û çawa ku pêjna civatê hat û hin derbasî hucreyê bûn, ez derketim.

# Şemsoyê qewwal

## Çi sibeh bû ew!

Wê sibeha han, min nediva ez ji malê derêm. Min qaweya xwe danî bû û qelûna xwe tijî tûtûn kiribû. Di pencereyê re min dikarîbû bi hêsanî tayên baranê bidîtana û dengê hin çipikên ku li kevîka pencereyê diketin bibihîstana.

Ku çawa min qurtek li qaweya xwe û mizek li qelûnê xist, jina min ji derve hat û bi tirs got: Şemso hela rabe seh bike dengê muezinekî tê dibêje nizanim kî miriye!

- Wî jinê ma ecêb e!! Rojê yek dimire. Şare û mezine

Min wisa gote jina xwe û qurt û mizên xwe dewam kirin. Lê dengê muezin bi bayê ku li derve dikire guveguv re her ku diçû nêzîktir dibû. Di pencereyê re jî tayên baranê êdî tarîtir, lê nermtir û

hûrtir dibûn. Qaweya min bi nêvî bûbû nebûbû, dengê qebe hat û min xebera reş weke wê barana reş guhkir:

- Cemaeta misilmanan! Şêx Ehmedê Xanî çûye rehmetê. Dê cenazeyê wî bibin camiya jor. Ji xêra nimêja cenaze mehrûm nemîniiiiiiiin.

Di gel ku min dizanîbû Xanî di rojên xwe yên dawî de bû jî, dîsa ez bi bihîstina xebera mirina wî re di erdê xwe de cemidîm!

Min çend hilmên sivik û li pey hev, li qelûna xwe ya darînî xistin û qaweya xwe nîvco hêla û hatim ku derkevim, jina min got:

- Kuro Şemo bi ku de!!
- Dê herim bi cenaze re bimeşim.
- Wî! Qey guhê te gemar girtine yan simîyane? Ma te nebihîst mêrik bangî cemaeta bisirmanan tenê dike!

Ez bi ser jina xwe de rabûm û min hindik mabû kulmistek di nav çavên wê de werbikira, lê destê min lê negeriya û min gotê:

- Hurmet ev Ehmedê Xanî ye ne kesekî din e, çi karê min bi banga mêrik ketiye!!

Û min kurkê xwe yê bi postê berxikan astarkirî avête ser herdu milên xwe û derketim.

***

**di cenaze de çi anîne serê min!**

Di binê wê barana payîzî de ez dimeşiyam. Di hişê min de jî baraneke spî dibariya. Baraneke ku ji ezmanê rûhê Xanî û dilê wî yê fereh û cefaxur dihate xwarê.

Roja şemiyê bû, roja ewwil ji rojiya misilmanan bû. xelq bi qeflan ber bi camiya bajêr ve diçûn ji bo limêja cenaze bikin. Ez jî ber bi camiyê ve çûm, lê nêzîka derî rastî Selaheddînê kitabfiroş hatim. Ku çav li min ket hêsir di çavên wî de biriqîn û got:

- Kirîv bi xwedê tu wefadarî.
- Ev Xaniye Xanî! Ne kesekî din e.

Hema min ew gotina ku ji jina xwe re kiribû, ji wî re jî got. Di rojên wisa de mirov tenê dikare gotinên cûtî dubare bike. Ma li ber mirinê, xasma mirina kesekî mîna Xanî, mirov dê çi qise bike?

Ez derbasî camiyê nebûm, lê min dît ku mele Ismaîl nimêja cenaze kir, li pişt xwe zîvirî û ji şêx Seyfeddînê Cubbereş re got:

- Telqînê tu yê bixwînî, mîr wisa xwestiye.

Çavê wî şêxê şaşxapîn biriqîn û destên xwe di ser riya xwe ya hinekirî re bir û mîna ku bawer nekiribe got:

- De kerem bikin cemaet.

Û kete pêşiya xelqê.

Li derve çavên wî yên mîna çavên roviyan birqonekî bi min ketin. Devê wî hinekî ji hev ma, lê zû bi ser xwe ve hat û got:

- Şemsoyê qewwal!! Hatina te ya ser tirbê ne caiz e.

Mele Ismaîl destê xwe avête şaşika xwe weke ku rast bike û lê vegrand:

- şêx Seyfeddîn ev meqam ne meqamê caiz û ne caiz e.

şêx Seyfeddînê Cubbereş riya xwe ya hinnekirî xiste nav qevda destê xwe yê rastê û got:

- Nabe nabe. Ha ji wî bi xwe bipirse ka dixwaze navê…

Ew di wê hedîsê de û hîn gotina wî roviyê Wanlî nîvco di devê wî de, ez dûr ketim û di bin baraneke ku zikreşîya Seyfeddînê serdestar nikaribû ji bîra min bibira de meşiyam.

Dilê min gelekî bi min şewitî. Ez tucarî wisa di jiyanna xwe de dilşikesî nebûbûm. Erê gelek caran hinan bêhemdî xwe tinazî bi me û dînê me û tawûsê melek dikirin û navên xirab lê dikirin, lê min

dizanîbû ku ew ji nezanî dikin. Hema wê rojê wî roviyê han nehişt ez bi cenazeyê Xanî re heta cihê defna wî biçim.
Xanî bi xwe ne yekî wisa bû. Haşa ku wisa bûya. Gelek şevan ez diçûme hucreya wî û min lê guhdarî dikir û wî jî li min. Yek caran jina min dipirsî:

- Ma tu li vî şêxê bisirmanan ewle dibî? Ma tu natirsî rojekê li ber te çêran bide Tawusê melek!! Yan jî gotinên ne di rê de bike.

Lê tucarî Xanî gotineke ne di rê de derheqê me û dînê me de nekir. Vajî wê, wî her qedrê min digirt û digot:

- çiqas rê hene, hemû digihên xwedê teala.
- kafir jî!!
- Gotinên kafir, yezîdî, misilman, nesranî, yehûdî di zahirê xwe de ji hev ferq û cuda ne lê di eslê xwe de yekin. Hemî nuqteyên li pê hev rêzkirî ne di dayireya wucûda zatê ilahî de. Xwedê bi hikmeta xwe gelek mezehb û dîn nazilî ser insanan kirine da ku çavnasî hev bibin. Eynî mîna rengrengîbûna kulîkan û her tebayî di erd û ezmanan de. Xwedê bi zatê xwe nod û neh navên wî hene!! Lê sûcê ku heye û hiştiye tefrîqa di nav benîadem de hebe, sûcê benîadem bi xwe ye.
- Yanî tu karê Iblîs pê tunne!!

Ku gotin dihate ser Tawusê melek dikeniya û diçû li ber çirayê disekinî û digot:

- binêre ev çirax e!! Serê wê agire, him ronahîyê dide, him jî dikare bisotîne. Ew di destê te de ye. Tu û iradeya di dilê te de. Îca Ezazîl jî ku di nava firişteyên xwedê de navê wî hingî ku perestiya xwedê dikir tawusê firişteyan bû, ew misal e. Ew di destê xwedê de bû, xwedê jî çi jê re irade kiribû, wisa bû. Misqalê zerreyekê nikaribû bêyî iradeya xwedê teserrufê bike. Îca çi heqê kê heye ku lanetan lê bibarîne!! Gunehê wî nîne nîne.

Kêfa min gelekî ji van hedîsên wî re dihat. Min ew tişt nizanîbûn, min nizanîbû ku ka di kitabên misilmanan de çawa behsa Tawusê melekan dikin, ya ku min dizanîbû ew bû ku dijmintiya wî ji roja roj de dikin û di qurana wan de ew dijminekî xwedê ye û serî li ber rakiriye û dê ew û kesên ku bi ya wî bikin bibin êzingên agirê cehnemê.
***

Hêdî hêdî darbesta ku li ser milên çar kesan bû, di pêşî de mele Ismaîl û Selaheddîn kitabfiroş, mîna gemiyekê ber bi jor de diçû. Min awirin xemgîn li termê Xanî yê bi kefenekî spî pêçayî xistin û bêhemdî min hêsir ji çavên min mîna xezaman weriyan. Ez neçûm lê dilê min nimêj li ser zatê wî yê nûranî kir.

# Mirovê rûgirtî

## Hikayeta tûpişkê û beqê

Dibêjin  ku tûpişkeke reş û jehrdar carekê xwest ji vî rexê çem here wî rêxê din  lê nikarîbû. Kir û nekir  rê û çare nedîtin. Heta carekê  çavên tûpişka jehrdar bi beqekê ketin ku di nava avê de sobayî dike.  Gelekî kêfa wê hat  û bangî beqê kir:

- Beqê ma tu nikarî min bigihînî wî rexê han!!
- Wey ev tuyî!! Ez çawa nikarim!  Lê ma kesên mîna te, kengî bûne dostên beqan?

- Niha dev ji dijmintiyên me yên kevin berde. Divê ez herim wî alî, çêlîkên min li wê derê ne.
- Ez te nabim!! Tu yê bi min vedî!
- Bi xwedê eger tu min li ser pişta xwe deynî ez bi te venadim. Çawa çêbû!! Ezê çawa bi te vedim? Ma ne dê tu min bigihînî wî alî, ger bi te vedim dê ez jî tu jî binav bibin. Ê te tu dikarî xwe xilas bikî lê ez!! Na na bi xwedayê me ez bi te venadim.

Beqê û tûpişkê gelekî ber hev dan. Dawiyê beqê sondên giran bi tûpişkê dane xwarin û soz jê standin ku pê venede û rabû beq hate ber kevîkê çem û tûpişk li pişta xwe siwar kir û da nava avê.
Di nîvê rê de, hîn qeraxa çem ya din dûr bû, tûpişkê ji nişkê ve derziya xwe rep kir û got:

- Beqê çiza min tê.
- Çiza çi!
- Çiza çiz. Çiza min, divê ez bi te vedim.
- Wey!! Ma te ji bîr kir me çawa li hev kiriye? Emê tev binav bibin ha!
- Ew bo min hîç e, çiza min tê û hew. Divê bi te vedim, çare tunne.

Beqê got eman zeman nabe, ka sondên te ka sozên te? Lê çare nebû. Tûpişka jehrdar teriya xwe ya ser bi derzî ya ku rep kiribû, xwar kir û derzî di pişta beqê de çikand û jehra xwe ya reş berda laşê wê. Tavilê beqa reben mir û tûpişk jî dawerivî binê avê û ew jî mir.
***
Ji ber ku tûpişk misala mine min li ba kîmyagerekî xasiyetên derman û daruyên jehrîn naskirin. Kimyagerekî Ereb ku ji derdora Bexdadê hatibû li ba paşayê Wanê dermandarî dikir, ez çavnasî her geya û dermanên ku bi têkelkirinê re dibin jehra mirovkuj kirim.
Wî razên kîmyageriyê hemî ji min re gotin. Deriyekî girtî nema û li pêş min venekir. Tenê raza ku dê bi kîjan awayî gecê û zîbeqa ferrar têkelî hev bikim negote min. ji kevin de kîmyager wê razê û raza ku madenan dike zêr nabêjin her kesî. Lê dawiya dawî û berî ku ez peyala zanîna xwe tijî bikim, wî kîmyagerê ereb sond bi tirba şêx Evdilqadirê Geylanî xwar ku mesela têkeliya zîbeqê û gecê derew e. Wî got ku bi tu rengî nabe zîbeq bi gecê re tev li hev bibe. Yê ku karibe vê yekê bike dê şerq û xerbê bixe destê xwe.

## Serjêkirina diya min

Bavê min ku bi navê Pirjînê Eleşgirî dihate nasîn, ez hîn neh deh salî bûm serê diya min li ber çavê min ji gewdê wê birrî. Xencer di destê wî de mîna gayekî dizûriya û digot:

- Hey rûspê te namûsa min di erdê da!

Min nizanîbû ka çi dibe û çima bavê min ewçende hêrs bûye? Ez di quncikê xanîyê me yê biçûk de bûm û min xwe xistibû pişt perdeyekê û li wan û şerê wan dinêrî. Min bawer nedikir bavê min wê diya min a xweşik û ciwan bikuje. Lê baweriya min jî bi serjêkirina diya min re serjê bû. Bavê min hîn di wê hêrsa xwe de û serê diya min di dest de, min bazda . Ez reviyam û reviyam û reviyam heta ku li min bû êvar û roj ji pişt çiyan de weke serekî jêkirî xuyabû.
Ji wê rojê de min û bavê xwe me nema hevdu dît. Ez bawerbûm dê wî ez jî bikuştima.
Ez ketim nav lepên hinek neşterçî û heşaşan li bajarekî ku sî çil fersengan dûrî gundê me bû. Bûme lawikê wan û her ku kêfa yekî ji wan bixwesta, xameya xwe di diwêta min da dikir û axînên şehweta xwe li ser pişta min dinivîsîn.
Ez xweşik bûm. Terlan û goştnerm û şayik bûm. Ji mêran ditirsiyam û min dixwest ew min biparêzin. Buhayê şikandina kûpê tirsa ku ez tê de veşartî û parastina min jî, ew bû ku mêr qelemên xwe di diwêta min da bikin û ayetên şehwetê binivîsin. Destpêkê pir zor bû lê pêre pêre diwêta min jî fêrî wan qelemên germ û hişk û rep bû û roja ku yekî ez nedabûma ber hemêza xwe û kel û coşa navlingê xwe bi min sar nekiriba, ez dixuriyam, dişewitîm, û min xwe li dewrêşên li ser rêyan digirt.

Dewrêşan derdê lawikên mîna min nas dikirin. Hema ku keys bi dest yekî ji wan diket, keşkûlê xwe diavête pişt kevirekî û ez didame pey xwe û dikişandim newalê. Ku li laşê min yê tazî û bêmû dinêrî tebarekellah digot û riya xwe ya dirêj dixiste devê xwe û gîsnê xwe dida nav zeviyê minî şayik û cot dikir. Ku bûme nêzîka çarde panzde salî êdî kêfa min jî dihat û ax û ofên şehwetên yên min û kesê ji pişt min ve tev li hev dibûn.
Ez bi wî şêweyî mezin bûm. Êdî min xwe ji xeleka wan neşterçiyên bajêr filitand û diçûm xanan. Xanên ku xewle bûn û dûrî bajaran bûn, cihê xulamperes û zinêkar û tacir û mela û feqî û her kesî bûn. Min di nêrîna pêşî de lawikhebîn nas dikirin. Awirên wan, şêweyê nihêrandina wan ku li pişt û kulêmekên lawikan temaşe dikirin û çavên wan dibiriqîn û girêz bi devê wan diket , her tiştî di wan de digot em lawçî ne.

## Yekem mêrê ku min ew kuşt

Havînekê berê min li Diyarbekrê bû. min çemê Muradê qut kiribû û êdî berê min ketibû deşta Mûşê. Şev ketibû erdê û xewa şêniyên bajarekî ketibû çavên min. Min dikir û nedikir ew xew ji ser çavên min nediçû. Erê xencera min di ber piştîna min de bû, lê rêbirr ne yek û ne du bûn. Diviya bû ez herim xwe vehesînim û hinekî razim. Çavên min bi agirekî ketin, nizanim wê şevê çi ez ber bi wî agirî ve kişandim? Ewqase tirsa rêbirr û çeteyan ya di dilê min de bû xwê û heliya. Wî agirî mîna mexnatîsekî ez ber bi xwe ve dikişandim.
Hasilî kelam ez gihame nêzîkî êgir. Min dît wa kavilê xanekê xuya dike. Lê kes li ber wî agirî nebû! Min çend ayet xwendin, min texmîn kir ku ev şanên cinn û dêwan e. Sawekê bi min girt û ez hatim ku ji wir derbas bibim lê xiştexiştek ji kavil hat û tavilê dengê insanekî hate min û got:

- Ew kiye? Tu cinnî tu insanî?

Ji dengê wî xuyabû ku tirsa wî ne kêmî ya min e, îcar tirsa min çû û min got:

- Ez jî weke te insanim, rêwîyekim.

Û min berê xwe da xana kavilî û agirê ku vedimirî li pê min ma.
Xan tarî bû. Min û wî mêrî me bi zorê rûyê hev li ber ronahiya agirê li ber mirinê û çend stêrikên ku li ezman diçirisîn, didît. Xewa ku ji tirsan re ji ser çavên min çûbû dîsa hat.
Bêyî ku ez bihêlim ew mirov pirsa esl û koka min bike, yan gund û eşîra min nas bike, min gotê:

- Ez ji kêmxewî têm ku ji qama xwe bikevim. Ez pirr westiyame qonaxa nîvrojekê meşiyame. Eger tu iznê bidî dê îşev li vir bihêwrim û razim!
- Wey xorto!! Çima iznê nedim. Xan kavil e û ne milkê min e. Xwedê kir tu hatî sebra min jî dê bi tenê nehatibûya.

Pişt re berê xwe da koşeyekê û pêlavên xwe ji nigê xwe kirin û xistin bin serê xwe. Qevdika xencera wî li ber ronahiya melûl şewq dida. Dilê min bijîya wî bêtir ji xencera wî. Ez jî çûm min xwe li ber dirêj kir û pêlava xwe ji xwe danî û serê xwe da ser.
Piştî qederê seetekê ez bi xwe hisiyam ku ew mêr destê xwe li bedena min pêçî bi pêçî dipelîne, min xwe ker kir. Êdî hêdî hêdî destê xwe di ser qûna min a girover re bir û anî. Dema dît ku deng ji min nayê, dest bi doxîna min kir û bi lez girêk vekir. Destê min ji pişt ve bêhemdî min li terrikê wî ketin. Weke singekî konê koçeran rep û germ bûbû. Agirê bijandina ganekê di bedena min de jî geriya. Ku min dît ew dixwaze hîn pê de biçe û şerwelê min deyne, min karê wî hêsan kir û şerwel ji xwe şemitand. Her tişt di tarî û bêdengîyê de bû. Ji xwe ku mirov nîvxewî be jî lezzeta ganê duqatî dibe, ê min jî çavên min girtî man û mêrikê ku min hîn baş rûyê wî nedîtibû ez ber bi xwe ve kişandim û bi şarezayîya kurbazekî singê xwe kuta..
Şevên bi wî rengî bêjimar bi min re derbas bûbûn. Lê min hîn mêrekî wisa tîgan nedîtibû. Hema ku karê xwe qedand, qulipî ser piştê û bû xurexura wî û kete xeweke giran.

Çavên min di şibakeyeke rojhilat re li hîva çarde ketin. Ji biçûkiya xwe de ez ji hîva li çarde ditirsiyam û min newêrîbû dirêj lê seh bikira. Diya min digot ku eger yek pirr li hîvê yan li neynikê temaşe bike dîn dibe.
Min şerwelê xwe kişande xwe, doxîna xwe girêda û rabûm ku di pencereyê re li derve binêrim. Çavên min bi sukumê wî mirovî ketin. Ku min baş bala xwe dayê, heta xwedê deng dabû min ez qêriyam.
***
Ew bavê min bû. Hinekî riha wî spîtir bûbû, lê rûyê wî mîna xwe mabû. Rûyekî girover û û pozekî qut û birûnî stûr.
Bi qêrîna min re ji xew çeng bû û destê xwe avête qevdika xencerê. Rabû ser piyan û ez li himberî xwe dîtim û bi dengekî lerizî pirsî:

- Tu kîyî?

Min jî destê xwe avête xencerê û pişta xwe da şibakê, di tava hîvê de min pirîskên mirinê yên ji çavên wî dipekiyan dîtin. Ew bû, ew bi xwe bû, bi bejn û bal û deng û qelafet û her tiştê xwe bavê min bû.
Ez nizanim çi bi min hat! Kêlîkekê bêdeng û lal bûm, paşê min gotê:

- Tu min nas nekî çêtire.
- Tu kîyî kuro nav û eşîra xwe hilde?

Wî vê carê bi dengekî ku zinar diqelaştin got û xencera xwe li ba kir.
Ez gavekê bi pêş de hatim û min got:

- Ez kurê te me, Yavuzim. Yavuzê te yê ku te diya wî li ber çavê wî kuşt. Kurê te yê ku te ew dîn kir û bi çolan xist, kurê te yê ku te…

wî nehişt ez xeberdana xwe temam bikim. Weke berazekî beriyê êrîş kir û hat û qêrîya:

- Hey kurê qehpê tu hîn li dinê yî! Ev deh salin ez li te digerim.

Û derbeke xencerê li rûyê min da. Min jî derbek veweşandê lê wî xwe bi şûn de kişand û derba min vala çû. Dîsa bi pêşde hat û çend derb li rûyê min dan, min jî hinek li qirika wî dan û êdî me hevdu da ber xenceran. Yek ji min û yek ji wî heta min ew sar kir. Lê tu hal di min de jî nema bû. Rûyê min parçe kiribû, devê min çirandibû û derba dawî jî di sînga min de lêxistibû lê ji ber ku bêhêz ketibû, derba wî pir kûr neçûbû. Birîna min ya sîngê sivik bû lê dîsa jî ji ser hişê xwe çûbûm û nîvkuştî li wê xana kavil avêtî mabûm.
***

## Usta Xelîlê Diyarbekrî

Dema ku hişê min hatin serê min, roj bi qasî bejna rimekê bilind bûbû. Serê min li ser kaboka yekî bû û rûyê min girêdayî bû. Min nikarîbû xeber bida. Bi wî mirovê ku serê min danîbû ser kaboka xwe re bi îmayê dipeyivîm. Ez ji hal ketibûm, bûyera ku bi şev hatibû serê min mîna xewnekê ji min ve xuya dikir. Min çavên xwe li termê bavê xwe yê kuştî gerandin lê min nedît. Mirovê ku serê min ji ser kaboka xwe nedanîbû ji pirsa awirên min yên mest û melûl fam kir. Bi dengekî dilovan gote min:

- Netirse kurik, ew mirovê han yê ku xwestibû te bikuje êdî mirîye. Karwaniyan ew veşartin. Tu jî ji mirinê filitîyî. Tu ji tirsan ji hişê xwe ketibûyî ne ji birînên kûr. Birînên te sivikin netirse.

Çiqas wê kêlîkê min dixwest bibêjim ku ew bavê min bû, kuta bû min û dixwest min jî mîna diya min bikuje, lê zimanê min nedigeriya. Çêja xwîna şil di devê min de bû, min dixwest tû bikim û bihavêjim lê devê min yê çiriyayî alî min nedikir. Dîsa wî mirovê bazirgan şorên di çavên min de fam kirin û got:

- xeber nede kurik. Her tişt dê pişt re were famkirin.

Ew mirovekî bazirgan bû. Bi karwanê Diyarbekrîyan re ji Rewanê dihat. Barê du qantiran ji qirmizê bi xwe re anîbû. Tûrekî tijî çortana ermeniyan jî di xurcikê wî de bû. Her gavê kirtikek dihavête devê xwe û dibû kirimkirima wî. Ew bazirganekî halxweş û dewlemend xuyabû lê paşê min nas kir ku ew xettatekî meşhûr e jî. Camî û medrese, kevirên serderiyên xanqah û hemam û qeyseriyan, menber û mihrabên Diyarbekrê hemû bi xetên wî xemilandî bûn. Jê re digotin Usta Xelîlê xettat. Malekî wî yê pirr hebû ku mirov texmîn dikir ew û Mîrmîranê Diyarbekrê şirîkê hevin.

Wê rojê xwedê ew mîna qasidê xelasê ji bo min şandibû. Dengê hinek hevalên wî yên bazirgan dikete guhê min û digotinê:

- usta Xelîl tu vî lawikî nas nakî, te ew derman kir û ji mirinê filitand, mala te ava be.
  De wî berde bila here nav eşîra xwe.

Lê wî guh li wan nekir. Ez jî ecêb mam û min di dilê xwe de dipirsî: gelo ev çi rehme ketiye dilê vê mirovî. Çima vîqasî guhdêriya min dike?

Dawî ez li ser pişta hespa xulamekî xwe siwarkirim û me berê xwe da Diyarbekrê.

Ez li ber destê wî fêrî xetên erebî bûm, rojê sê çar pel sermeşqên nivîsandinê didane ber min û digot:

- ha li van xetan binêre û weke wan qelemê bikêşe.

Ji wan sermeşqan bêtir kêfa min ji yên ku Yaqûtê Mustasimî nivîsîbûn re dihat. Ew ji xetê bêtir sihirbazî bû. Wisa ciwan û xweşik te digot ew xet bi dengin û bêyî ku yek wan bixwîne têne xwendin.

**Yaqûtê Mustasimî**:

Ew ji Amasyayê bû. Lê berê xwe dabû Bexdayê û di siya xelîfeyê wê Elmustasim de, weke kulîkeke ter hate avdan. Xelîfe gelekî ew diheband. Dîwarên koşka xwe bi kaxezên bi xetên Yaqût xemilandî xemilandibûn. Giraniya her Quranekê ku wî dinivîsî zêr û yaqût didanê. Wî di jiyana xwe de hezar quran nivîsîn. Destxetek nedişibihî ya din. Dibêjin dema ku Holako Bexdad zeft kir û kitêbên wê şewitandin û avêtin Dicle. Ferman kir ku tenê kitêbên bi destê Yaqût hatine nesixkirin bimînin.

Usta Xelîl digot:

Berî Teter werin, Yaqût di xewnê de dîtibû ku Dicle hibr diherike. Ji Xelîfe re xewna xwe gotibû. Xelîfe jî stêrnas û kesên ku tefsîra xewnan dizanin civandibûn û pirsa wê xewnê ji wan kiribû. Stêrnasekî ji xelîfe re gotibû: kitaban hemî veşêrin. Dijminek tê ku ji rijandina xwînê bêtir, ji şewitandina kitaban hez dike. Lê xelîfe guh lê nekiribû û gotibû: hibr ji xwînê ne buhatir e.

***

Hin bi hin ez fêrî xetan bûm. Min li pêçiyên usta Xelîl dinêrî ku çawa li xameya zil dipêçandin û bi evîndarî ew di devê diwêtê re dixiste nava hibra reş û bi haydarî derdixist bêyî ku qelemê li kenarên devê diwêtê bide û dest bi nivîsandinê dikir.

Kêfa min gelekî ji şiklê qelem û diwêtê re dihat û ez dîsa xuriyam. Ji qelema qalind ya zilê bêtir, min li bin zikê wî dinêrî û hêvî dikir ku ew bi xwe dest pê bike.

Piştî du sê mehan êdî birînên rûyê min hatin hev lê ciwanîya rûyê min, ji bilî çavan, hemî çûbû. Rûyê minê ku kurbazan şerê hev ji bo ciwanîya wî dikirin, weke nerîngehên li ser sûrê Diyarbekrê kelekortî bûbû û devê min weke dasekê xwar bûbû.

Êvarekê ez bi ser meşqên xwe de xwar bûbûm min dît vaye usta Xelîl hat û desmaleke kitanê spî di bin çengê wî de ye.

Bi hêdîka li ber min rûnişt, qelema zilê ya bi stûriya pêçiya mezin ji destê min kişand û bi wê desmalka kitanî rûyê min heta ber çavê min nuxumand. Di ronahiya mûman de min biriqandina çavên wî û revoyê hespên şehweta di wan de mîna meşqeke zelal xwendin. Ez ji awirên mirovan tê derdixim ka çendî dilbijokê lawanin. Ew ji awiran bêtir hîrehîra hespên fal û bedewin. Ji xwe kurbaz gelekin, yên bi jin û zarok jî di nav wan de hene lê hemû rûpoşên ji kitana tirs û şerm û durûtiyê dihavêjin ser dilbijokîya xwe ya ku rastiya wan e. Ên mîna min, ku navê me dikin qewmê

Lût, tenê dikarin di çavên mêran de hîrehîra kurbazîyê bibihîzin. Min jî wê şevê kurbazîya ustadê xwe ya di çavên wî de nivîsandîbû bi hesanî xwend û awirên xwe ji nav lingên wî nebirrîn.

- çavên te pirr xweşikin.

Usta Xelîl wisa got û destekî xwe avête ser stûyê min. Lerzeke xweş bedena min da ber pêlên xwe. Lê ez ji cihê xwe neleqîyam. Wî jî bêdengîya min fam kir û destê xwe di ser pişta min re bi guvaştineke nerm re daxiste heta qûna min û tê da weke ku di serê sêwîyekî bide.
***

Êdî her şev usta Xelîl baz dida ser min. Sebra min bêyî wî û ya wî jî nema bêyî min dihat. Ew nema diçû bazirganiyê jî. Xulamên xwe li dewsa xwe dişandin û ew li ba min dima. Bi roj li ber min rûdinişt û ilmê xeta erebî dida min. Qelem bi kêreke tûj dibirrî û di diwêtê da dikir û li ber min xetên sulus û nesx û kûfî û dîwanî û tugra xêz dikirin. Bi şev jî xêzên bijandina du bedenan dinivîsandin û em herdu mîna tugrayeke sultanî li ser hev diqulipîn û nema ji hev dihatin naskirin.
Bi wî awayî du sê mehên din çûn û dunya bû zivistan û çile. Êvareke sar û bi berf û bapêç bû dema Usta Xelîl û lawikekî deh duwazde salî derbasî hundir bûn. Ez li ber agirdankê rûniştî bûm û min guhdarîya bayê li derve dikir û li agirê agirdankê dinêrî û di ber re jî min kirtikên çortanê ermenî dikeritiandin. Dema çavên min li wî lawikî ketin, ez rabûme ser xwe û min pirsî:

- usta Xelîl ev kiye?
- Ev lawikekî romî ye Yavuz. Dê çendakî li ba me be, mîrmîranê Diyarbekrê teklîfa min û fêrkirina wî ya xetê kirîye. Navê wî jî Yavuz e ha!!

Berf û sermaya wê şevê, di hinavê min de bû agirekî ji yê agirdankê gurrtir. Min dizanîbû ku dê usta Xelîl wî di ser min re bigire û êdî dê ew lawikê romî yê ku goştê wî ji penêrê koçeran û berfa Qerejdaxê spîtir bû bibe hewiya min û yarê şevên wî yên wê çilleya sar û ez dê bibim weke jina pîr di malê de.
Min wê şevê girrê di xwe de veşart û dengê xwe nekir. Min dizanîbû ku rojên min û usta Xelîl hindik mane û di dilê xwe got:

- yan ez yan ev lawikê romî, yan jî serê we herduyan.

Êdî usta Xelîl nema nêzîkî min bû. Her ku min li neynikê dinêrî min dizanîbû ku rûyê minî kelekortî yê ku bîranîna wê şeva reş ya li wê xana kavil, bûye sebebê nefreta usta Xelîl ji min. şayikî û bêmûtîya min nema pere kirin, kêfa ku min dida Usta Xelîlê xettat û dihişt ew biqîre, nema mehderiya min kirin.
Êdî ew û wî lawikê romî bûn û ez jî bûbûm şekaleke qetiyayî ku ji bilî avêtina li ser tingan nema bi kêrî tiştekî dihatim. Ez çihrepîs û rûkirêt bûm, ji bilî qûn û xeta min tiştekî ciwan li ba min nebûn.
Rojekê bîna min gelekî teng bûbû. Ez weke awareyan bi zikakên Diyarbekrê ketibûm û heta ber bedenê çûbûm. Kirtkirta berfê di bin pêyên min de mîna dengê çortanê ku usta Xelîl her şev dida min dihat. Wî ew çortan dida min da ku tehma devê min hinekî şor bibe. Wî ji wê şorahîyê hez dikir û ku bayê şehwetê lê radibû serê min bi alî xwe de dizîvirand û zimanê xwe dixsite devê min û li zimanê minî şor dialand. Êdî dê ji kê re çortanê bixum? Ku min ev pirs ji xwe kir, çi çortanê di berîka min de bû, min hemî avête ser berfê û bi lez çûme mala usta Xelîl.
Çawa ez gihame ber derîyê nîvdadayî dengê ax û ofên wî ketin guhê min. Min bi kerb destê xwe avête qevdika xencerê û xwe li derî qeliband û bi ser wan de çûm. Usta Xelîl Yavuzê romî mîna keçikan li ser piştê kiribû û ketibû ser zikê wî. Êdî aqil di serê min de nema. Nizanim çawa ez gihame usta Xelîl û min ji pişt ve destekî xwe li newqa wî gerand û ew ji ser zikê kurik rakir. Terrikê bêbavo hîn rep bû. Min jî derba ewwil li terrikê wî xist û birrî. Zûrînîya fîlekî pê ket û xwe filitand û berê xwe da xencereke bi dîwêr ve hilawêstî. Lê min ew fersend li ber girt û ketim pêşiya wî û ne derbek ne du, lê derbin ku nedihatin jimartin mîna carên ku wî tê de bazdabû ser min, min di nîvê dilê wî de lêxistin.

Ez fitilîm ku kurikê romî jî bikujim lê çavên min pê neketin. Bûbû xwê û hiliya bû.
Wê şevê di nava berfê de, xencera min di ber min de , min berê xwe da bakur.
***

## Kê jehr daye Xanî ?

ji wê şevê de êdî serê mêrekî û serê pîvazekê li ba min weke hev bûn. ez ne qatil bûm, û ne jî min ji xwîna rijandî hez dikir. ê ku hibrê birijîne ser kaxetan û bi herfan re bijî nikare xwînê birijîne. Lê qedereke ku destê min tê de nebû ez ber bi qatilîyê ve ajotibûm. Min xwe gihande Mîrmîranan, beg û gizîran, paşan û wezîran, axa û mîran, dergevan û dizdar û debîran. Bi xêra xeta xwe ya ciwan hindik mabû bigihêm qesr û serayên Stenbolê jî. bi qasî ku xetên min ciwan bûn, tevdîrên min ji bo kuştina dijminan jî wisa bûn. Kê pere dabûya min, min dijminê wî bi tedbîrekê dikuşt. Hin bi jehrê hin bi xencerê hin jî bi kindir û werîsan û hin jî bi palgehên ku min li ser devê nêçîra xwe datanî heta nefesa dawî.
Niha jî her ku ez mêrekî dikujim, bavê xwe û usta Xelîl jî pê re dikujim. Lê ew roj bi wî serê jêkirî û xwîna diya min a ku dipijiqî ser perdeya ku min xwe di pişt de veşartibû, û ew şeva ku min tê de bavê xwe li xana kavilî da ber xenceran û wî jî rûyê min kirêt kir, û ew êvara ku min tê de usta Xelîl kuşt, nayên kuştin û ji ber çavên min naçin.
Lê, elhemdulillah, min Xanî nekuştiye.
Mîrza Sebrî hate Eleşgirê û ez dawetî kuştina Xanî kirim. Wî berê ez nas dikirim. Min û wî me tevdîra kuştina mîr Mihemmed û katibê wî Silêman berî du sê salan kiribû. Min texmîn dikir ku dê Bazîdî min nas bikin, loma jî vê carê bi rûpoş hatim. Kê ez didîtim jî Mîrza Sebrî digot ev xizmê min e. Ji bo ku xelq li rûpoşa min jî nemînin ecêbmayî digot: rebeno diranê wî diêşin, devê wî werimîye!
Wî dixwest ku ez Xanî bi jehrê bikujim. Min jî qarûreyek jehra silêmanî amade kir lê welleh ne ez bûm yê ku Xanî kuştiye.
Erê ez çûme ba wî û min zeyta çiraxa wî guherî. Erê min kitaba Şêrîn û Xusrew a Nizamî bi hibreke jehrînî nivîsî û li ba Selaheddînê sehhaf danî bi qesta ku çavên Xanî lê bikevin û bibe malê bixwîne û jehr roj bi roj têkelî xwîna wî bibe. Lê dîsa jî , elhemdullilah, ne min Xanî kuşt.
Dema ez û mîrza Sebrî û mele Ferîd ji ba Xanî derketin, min berê xwe da xaneke nêzîkî Bazîdê ku min li wir xew dikir. Min bala xwe dayê ku bi şaşîtî min zeyta ne jehrkirî berdaye şûşeya çiraxa ber serê Xanî.
Min sêzde zêr ji mîrza Sebrî pêşinde ji bo kuştina Xanî wergirtibûn, soza heft zêrên din jî da bû min. Tirsa min ew bû ku Xanî ji êşa xwe veterise û mîrza Sebrî ne tenê heft zêrên mayî nede min, lê wan sêzde zêran jî ji min bistîne. Xanî dê ji bo çi bihata kuştin? Min ev nizanîbû. Lê şeva ku em tê de çûne ba wî min dît ku mîrza Sebrî dibêje wî:

- tu duayan ji sultanê me re nakî, tu dev dihavêjî mîrê me, divê tu uzrê xwe ji mîr bixwazî û şalika poşmaniyê bihavêjî ser milên xwe .

û gelek xirecir çêbû. Wê şevê. Ez venaşêrim ku kêfa min ji Xanî re hat. Mirovekî nazik û delal bû. Aram bû û di cih de dikete dilê mirovan. Lê ji wê bêtir zêr di serê min de bûn. Ku kuştina yekî ji min tê xwestin, ez qet napirsim ji bo çi ye û qence yan na? Helbet dê sebebek hebe, lê ew sebeb çi be bi serê min neketiye. Kuştina xelîfe jî bixwazin ez dikim hema çingînî û biriqandina zêran hebe, her tişt hêsan e.
Ku bi zeyta jehrîn nebû ez li tedbîreke din geriyam, mîrza Sebrî gotibû ku divê ev şol bi xef be, bi dizî be û li ba xelqê neyê naskirin ku ew hatiye kuştin. Wî kuştina bi xencerê qebûl nedikir û digot:

- Awayê kuştina wî di kitaba wî bi xwe de ye, ma ne ew dibêje:

*Xesmê ku neşî bibî muqabil*
*Derman çi ye? Şerbeta helahil!!*

Min jî hişê xwe li ser biriqandina zêran sîqal kir û hibreke jehrkirî ji zîbeqa ferrar amade kir.
Li wê xana ku ez lê dimam, ya ku du sê fersengan li bakurî Bazîdê bû, tûrekî min hebû min navê wî kiribû Mirindank. Ew bi rengê xwe zer bû, lê min yekcaran navê wî dikir qeretûr ji ber ku jehr û amîrên kuştinê mîna xencerên serxwar û werîs û bistên zirav yên ku min pê dilê kesên ku mirina wan ji min dihate xwestin qul dikir hebûn. Di wî tûrî de diwêteke zîvîn tijî hibr hebû. Min ew ji melayekî hêla Melazgirê ku me hevdu li xaneke nêzîkî Xelatê naskiribû, dizîbû.
Li wir, li wê xana bakurî Bazîdê min dest bi nesixkirina Şêrîn û Xusrew kir. Min jehra silêmanî ku ji sîmav û hinek dermanên din terkîb dibe rijande nava hibrê û bi xeta xwe ya ciwan ew nivîsî. Carekê mele Ismaîl hate xanê. Mêvanek dê nizanim ji Qersê bihata nizanim ji ku, ew jî hatibû pêşwaziyê lê bike. Ku çav li min ket ez bi ser nivîsandinê de xwar bûme, hate tenişta min û pirsî:

- ev çi ye!

Min dengê xwe nekir, tûrê xwe rakir û rabûm çûme derve.
Cara din min ew di roja baranê de dît, roja ku tê de Xanî mir. Ez çûm ku xwe bidim bin darbestê û dema çav li min ket behetî, çavên wî bûne tas û bi tirsa berxekî çav li gur ketibe pirsî:

- min tu li ku dîtî?

Dîsa jî min bersiva wî neda û ez vekişiyam û dûr ketim. Wî du sê caran ez dîtibûm lê xuyaye nedihate bîra wî. Rûpoşa min jî bala wî nekişandibû.
Heftiyekê dirêj nekir min nusxe qedand û bire ba Selaheddînê sehhaf. Wî weke ku ez nedîtibim li min dinihêrî. Mesel çi bû ku xelqên Bazîdê bala xwe nedidane min? nizanim. Xwedê ew kor kiribûn û hayê wan ji min nebû. Dema ku min fam kir ez nayêm bîra wî min gotê ku ez tacirekî kitabên farisî me û di cih de nusxeya jehrîn derxist û şanî wî kir.
Ew sehhafekî şareza bû, ji bîna hibrê nas kir ku nû nesix bûye, dema ku serê xwe bi ser de xwar kir û çend beyt xwendin got:

- Ev çi hibr e!!

Min gotê ku ev hibreke nû ye, ne ya van welatn e, ew li bajarê Zencana eceman saz bûye. loma jî hinekî bîna wê ferq dike.
Min texmîn dikir ku Selaheddînê sehhaf wê kitabê bibîne, dê xeberê bide Xanî û Xanî jî dê xwe li ber negire bikirre. Ji bo pelan biqulibîne dê tilîya xwe ya şehadetê bi zimanê xwe şil bike û pelê li dû pelê biqulibîne. Min di binê her pelê de li hêla çepê, kelimeya ku sehîfeya din bi wê dest pê dike nivîsî bû. Eynî li cihê ku dê tilîya wî were ser. Îca ew kelime hema bibêje min ne bi murekkebê lê bi jehrê nivîsî bû. Ew, li gor ku min texmîn dikir, dê sed sehîfeyî tenê bixwîne. Di sehîfeya sed û yekê de û bi xwendina vê beytê re:
*Bi fermanî ki xwahed, xelqi ra kuşt*
*Bi desteş deh qelem, yanî deh enguşt*
Dê êdî jehra silêmanî karê xwe di bedena wî de bibîne û dê nema karibe rabe ser piyan û hêdî hêdî bimire.
Lê ne min ew kuşt.
Piştî ku min ew kitêba nesixkirî da Selaheddîn, ez poşman bûm. Min ji Xanî hez kir û dît ku ev mirov divê neyê kuştin. Tu carî kesekî wisa dilê min pê neşewitîye. Xanî kesekî ecêb esera wî di dilê min de hebû. Ez du sê caran meclisa wî hazir bûm. Gotinên wî qenc bûn û suhbeta wî xweş bû . Êdî agirê poşmaniyê yê ku di dilê min de vêketibû zora biriqandina zêran bir. Xanî nexweş ketibû û hekîman digotin ew jehr bûye. Hema yekser ez çûme dikana Selaheddîn û min li kitêbê pirsî! Ku got va hîn li ba min e û mumkin e Xanî were bibe!! Weke dînan li min hat. Min bi lez ew nusxe ji nav destê wî derxsit û bêyî ku tiştekî bibêjim derketim.
Min berê xwe da mîrza Sebrî û ew kitêb xiste hemêza wî û gotê:

- Bila ev jî yadigara min be li ba te.

***

Dema min bihîst Ehmedê Xanî miriye, ez li ba mîrza Sebrî bûm. Rastî bibêjim pêşî weke ku min ew kuştibe, ez pir êşiyam. Û hatim ku dakevim bajêr û li zikakan bang bidim û bibêjim:

xalqno werin min bikujin. Ez qatilê Seyda me.

Lê tavilê hate bîra min ku ya min tenê niyeta kuştinê bû. Min ne tenê kuştina Xanî ji serê xwe avêtibû, lê bi xêra wî û bereketa nûra di rûyê wî de ez ji xwînrijandinê tevî sar bûm û êdî destê min li şalûlekî nema digeriya.

Min ku gora wî kola jî, xwest hinekî gunehên xwe daweşînim û xêreke min hebe. Heta ji min hat min goreke qenc û fereh jê re kola. Ku min termê wî daxiste binî û ew bi hurmet û hêdî derbasî berqefê kir, min di guhê wî de got: seyda xwezî min zanibûya kê ruhê te yê delalî kişandiye. Welleh dê niha berî te ew di gorê de bûya!! .

Li wir dîsa bi ber guhê min ket ku Xanî hatiye jehrdayîn. Îca ez mîna ku ji darekê bikevim. Behetîm û fikirîm gelo kiye ew qatil. Piştî definandinê min rûpoşa xwe avête ser mîrza Sebrî û gotê:

- Bigre pê dilê xwe binixumîne.

Û bi wî rûyê kifş û devê xwar û şopên birînan min pişta xwe da Bazîda ku di bin baranek hûrik û reş mîna hibrê de xemgîntir dibû.

**Mîr**

## Şêrîn

Min ew perîya gurcî bi pênsed zêrî kirrîbû. Lê tenê awirek ji çavên wê yên mêşinî hêjayî hezar florî ye. Fistiqên Şîrazê jî ne mîna devê wê yê biçûk û xweşikin. Mijek ji lêva wê ya jorîn ji toyê bi hingiv re têkel jî xweştire. Kepû elamseke giranbuha û hinarkên rûyê wê baxçeyekî qerenfilane. Diran gewherên Sikenderî ne û enî sehîfeya pêşî ji quraneke ku hîn çu melayî ew nexwediye. Bisk û gêsû rîhan û binefşin, birû hîva yekşevî yan kevanê rustemîne û awir tîr û xedengên kemankeşekî dilpola ne. Bejin minare ye, take rîhan e, şiva bê tûk û kelem e, rimeke zirav e, elifa ku bi destê Behzadê neqqaş hatiye kişandin. Newqa wê ji ziravîyê çu kemer lê nayên bestin, hema ku xwe ditewîne ez destê xwe datînim ser dilê xwe ji tirsa şikestina wê newqa zirav.
Sala ku biraziyê min mîrê Bazîdê mîr Mihemmed û katibê xwe Silêman beg di serayê de hatin kuştin, min ew kirrî. Ew çarde salî bû û horiyeke destnedayî bû. Karxezaleke kovî bû min ew di mêrg û çîmenê hemêza xwe de kedî kir. Jinên min jê didexisîn û hîn jî jê didexisin. Ciwan, bejin zirav û dirêj, çav du golên xeternak û kûr, îcar ne jinên min lê eger Şêrîna Ferhadê kohşikîn jî çav lê biketa wê jê bidexisîya. Eger Şah Ebbas çav lê ketibûya dê ew li şûna Şahxezala ermenî kiribûya horiya xwe ya herî hezkirî. Yan jî ku di dema sultanê mezin Silêmanxan de li heremseraya wî bûya, wê Xurrem sultan bibûya yek ji cêrî û peristarên wê.
Di nav nivîna min de ew dibe gulokek ji agir û li ser berfa ruhê min digindire. Ji sepeta lêvên wê yên têrmeywe têr nabim. Ji singa wê ya mermerîn û hilû û ermûşîn û herdu hirmiyên li ser têr nabim. Ji bêhnkirina keziyên wê yên bi ser min de dibin sîwaneke ji misk û enberê têr nabim. Her ku gulpekê

ji kewsera wan herdu lêvan dinoşim tîtir dibim. Ew şêrîn e, şêrînçêj û şêrînbêj û şêrînrêj e û weke ku şairê dîwana min Buharî di qesîdeyeke xwe de dibêje:

*Şirîna mîr weke wê kes nedî hêj*
*Şekerrêj û şeker bêj û şeker çêj*

Şikarçî me ku diçim nêçîra qitikên li ser sînga wê veniştî ne, bi xwe dilê min dibe nêçîr û dibe pirtapirta wî di tora awirên wê yên mîna pencên baz û şahînan tûj.
Wê sibehê, wê sibeha ku xalîçeya ewran ya tarî li ser singa ezmanê Bazîdê hatibû raxistin û baran dibariya ez ji ber hemêza wê derketim. Şeva berî wê şeveke hingivîn ji şevên buhuşta xwedê bû ku min nedixwest bi dawî bibe. Li ser sînga wê heta sihoran mam û paşê ketim xew. Xeweke giran, xeweke şêrîn weke hingivê şikeftan bû.
Dilê min û çûna nêçîrê hebû. Min kar û barê xwe kirin, xulaman jî hespê min ê kimêt zîn kiribûn, ratib û tîr û kevan û tivinga min a ku diyariya paşayekî romî bû hazir kiribûn û em çûne koka çiyayê Gilîdaxê nêçîrê bikin.
**Şahîn**
Sala ku ez li ser textê mîrnuşînîyê rûniştim, xanekî ji xanatên Tebrîzê ew bi Hecî Zuhdî efendî yê tacir re bo min diyarî şandibû. Berê navê wî Şaper bû lê min navê Şahîn lê kir ji bo ku nêzîkî navê Şêrîna min a şêrîn be. Rengê wî sorekî tarî ye mîna kezeba xezaleke nûserjêkirî. Serê wî biçûk û guhên wî bel û sînga wî fereh û pişta wî pehn û herdu firnikên wî fereh û simên wî xurtin. Teriya wî ya reş weke şeveke çiksayî û bêhîv bi erdê re dixuşe û bijiya wî ya qetranî û hevrêşimîn weke çemekî ji miskê ye li ser stûyê wî diherike.
Min rikêba wî ji zêr û celewa wî ji zîv çêkir. Zîna wî ji çermê xezalan û qedîfeyekî zer û bi tayên zêr dirûtî ye. Ew pirr bi sebr û aram e û heta ku ez jê re nefîkînim naçe ser avê. Deh rojan tî mabe jî bê fîkandina min avê navexwe. Ez wî bi sed revoyên kihêl û necdî û hespên fal û seglawîyan nadim
Ku dibeze tu dibêjî ew avjenîyê dike yan difirre û hema hema simên wî bi erdê nabin. Çavên wî yên safî û reş weke du qedeh enber dibiriqînin û dengê hîrehîra wî awazên taveke buharî ne.
Hespekî erebî ye ku kalkên wî li ser qûma Hicazê ya pîroz didan cirîdan. Dibe ku bapîrekî wî hespê hezretê pêximber be jî! Ew gelekî bi fêhm û jîr e û siwarê xwe tucarî nade erdê.
Selîmê nalbend carekê hatibû axurê û Şahînê min nal dikir. Wî bi xwe got ku ew kimêtekî bedew e û hêjayî giranîya xwe zêr e. Ku li binê siman nihêrî got: ha binêre mîrim!! Vaye simên wî ne dûzin lê kortikî ne û ev jî nîşana hespên nijaddar e.
Selîmê nalbend her roja înê tê axurê û serî li kimêtê min dide. Bijiya wî şeh dike, teriya wî dihûne û diranên wî raçav dike. di ber re hikayetên xwe yên xweş dibêje.
Hikayetekê ji qûna yekê derdixe, du caran jî hikayetê dubare nake. Yanî ku êvarê li ber qawedanînê çend hikayetan dibêje, bi roj di ber nalkirina hespê min re hikayetin nû dibêje.
Înekê min pesnê çalakî û bezabûna Şahînê xwe dikir hema min dît bizmarê di nav diranên xwe de deranî û simteraş ji destê xwe danî û got:

- Mîrê min hûn dizanin çima ji hespê beza re dibêjin ku ew wek bayê ye?

Min gotê:

- Silo ! vê yekê ez ji te dipirsim.

Simê hespê min bi nazikî bilind kir û danî ser berdilka xwe ya sixtiyan û got:

- Roja ku xwedê teala xwest hespan bixuliqîne ji Cibraîl re got here ji min re bayê kurr bîne. Min divê ajelekî sivik û çalak mîna bayê biafirînim. Cibraîl dakete erdê û mistek ji wî bayî rakir û çû ber erşa xwedê. Xwedê ew bayê kurr tev li şîqîniya

birûskê kir û ji nav dûman û dengê bilind kimêtekî sorî xûnîn û bijîreş pekiya û hate ber destên xwedê teala û gotê: ya rebî sed hezar bar spas te bi qudreta xwe ez çê kirim, de min bike mehîna mîr û padişahn tenê. Û ji wê rojê de hespên kimêt bûne para mezinan û milyaketên xwedê bi xwe jî cirîda wan hazir dibin.

## Şihab

Bazê min e. şêx Seyfeddînê Cubbeşîn havînekê ew ji min re ji hêla Wanê anî bû. bi xêra vî bazê çavdûrbîn kîna waniyan ji dilê min weke refek zaxên reş firiyaye.
Lê çi baz e!! Hema bibêje nikilê wî xencereke koçeran e, pencên wî çengelin û singa wî ya fereh û deqdeqî mîn çermê pilingekî ye.
Çavên wî yên mezin û kildayî kûrbîn û tûjin, ku mişkek li ser erdê bilive û ew jî di nav ewran de be, ew dibîne.
Sê rojan mele Ferîd û mîrza Sebrî û Şêx Seyfeddînê cubbeşîn û şairê dîwana min Buharî ji wî re li navekî digeriyan. Roja sêyem bi şev herçar hatine dîwanê û her yekî ji wan navek hazir kiribû. Mele Ferîd got: min navê Rewan minasib dît. Mîrza Sebrî got: ê min dibêjim bila navê wî Bapêç be. Şêx Seyfeddîn navê Tîrezman ecibandibû û Buharî jî got: navê Basiwar baş e. min jî herçar nav qebûl nekirin. Divê navê wî navekî xweş bûya û li gora xurtbûn û perwaz û firîna wî bûya. Li gora Şêrîn û Şahînê min bûya jî.
Qaweçiyê min ku bi ser gumgumê qawê de xwar bûbû û perengên sor bi maşeyê tev didan got:

- eger mîr destûrê bide min, navekî qenc û layiq li ba min heye!!

Herçaran bi rûyekî xişimdar û tijî qerf û tinazî jî lê nihêrîn û devên wan ji hev man. Min jî dilê qaweçiyê xwe nehişt û gotê:

- ka tu jî kaba xwe bihavêje!

Qaweçî maşe ji destê xwe danî û got:

- Mîrê min. Şihab di erebî de ji stêrika ku dixurice re tê gotin. Min jî bala xwe daye vî bazê cenabê we ku bi ser şikara xwe de tê xwarê. Weke wan stêrika ye. Tu li dinêrî di kezeba ezmên de ye û hew te dît ji nişkê ve li erdê ye û pencên xwe di zengeloka nêçîrê de çikandine. Bazê cenabê we kezeba kewan disimîne çawa ku ew sitêrik kezeba şeytanên ku diçin guhdariya dengê melayiketan dikin, qul dikin.

Kêfa min ji wî navî re hat, min hema buxçikeke biçûk û tijî aqçe avêtin ber lingê qaweçî û gotê:

- Navê herî baş te got, bila ev buxçikok jî xelata te be.

***

## çi baran bû nehişt nêçîrê kuta bikim?

Wê sibeha yekê remezanê ku baran hûrik hûrik dibariya çûme nêçîrê. Ez li ser pişta Şahînê xwe bûm û Şihabê minî awirtîr li ser zenda minî bi desbendeke ji çermê gamêşanî ku ermûşekî Şîrazî yê spî lê gerandî bi aramî veniştî bû. Iskofa li ser herdu çavên wî ew bêdeng kiribû û paçebenda di lingan de ew bi zenda min ve girêda bû. xulam û pîşekar û qaweçîyê min jî li ser mehînên xwe bûn û li rex û pê min diçûn.
Her carê Şihabê min per û balên xwe vedigirtin mîna ku dixwaze bifire. Min dizanîbû ne rojeke baş e ji bo nêçîrê lê dîsa jî min şikarî hemî bi xwe re biribûn heta bi seg û tajîtolan û xwarin û vexwarinê. Min dixwest heta fitaran li wir bim û bihêlim hinekî bîna bazê xwe yê ku bûbû mehek nefiriyabû vekim. Bazê min ku li mal girêdayî dimîne bînteng dibe û dike firtefirt û hema çeng û balên xwe li hev dide û tê ku perîkên xwe hemûyan ji kerban re birûçikîne.
Esrê teng hîn roj neçûbû ava, bazê min sê kevok ji min re anîne xwarê û hê jî li ezmanê ewrgirtî hêlan dikir û çav li nêçîran bû. du kîvroşkên têrgoşt jî dane ber pencên xwe û li ber nigê min danîn. Kêfa min û bazê min bûbû yek lê baranê nehişt em kêfa xwe bibin serî. Carekê min bala xwe dayê

ku ermûşê li desbenda mina çermîn gerandî weke ku peşkên qetranê lê bikevin reş dibe. Çi bû nizanim lê wisa xuya dikir ku baraneke reş dibariya. Ji sibehê de dibariya min jî ji kêfa bazê xwe re hay jê nebû.

**Mele Isamîlê Bazîdî**

## Name

di nava wê xirecirê de, di nava wê xemgîniya ku ji baranê bêtir bi ser dilê me de dibariya, dergevanê mîr Bengînê Mamzêdî hate nêzîkî min û nameya ku Xanî ji mîr re nivîsî bû da destê min. wî xwest ku kesek wî nebîne û bi destekî lerizî û rûyekî kerribî name dirêjî min kir û bi çavin şil pişta xwe da min.
Xanî tu carî razên xwe ji min neveşartibûn, lê ew name!! Di wan rojên êşê de nivîsandibû, lê rojekî nehate ser zimanê wî ku ew nameyekê ji mîr re dinivîse. Min şopa hibrê li ser tiliyên wî didît, lê qet nedikete fikra min ku ew dinivîse. Min digot ev reşayî ya li ser tiliyên wî ji esera jehrê ne. Tenê dema ku ruh jê kişiya got:

- Ma mîr name xwend?

Vê dawiyê Teymûrê gurcî û mele Salih gotine min ku hayê wan ji nameyê hebû!! Eceb rehmetî çima ji min veşartibû??
Dema ku ew bi wê gotina (ma mîr name xwend) re teslîm bû , hinekên li ber serê wî behetîn. Ez dizanim wan di dilê xwe degotin: ma çima Xanî kelimeya şehadetê negot û behsa vê nameya ku hayê me jê nîne kir? Şêxekî di meqamê wî de divê ji zikrê xwedê teala pêve çu tişt nehatibûya ser zimanê wî!
Derdê min ne ew bû, lê min nizanîbû ka Xanî ji ber taya mirinê û zoriya ruhkişandinê gotinên xeyalî dibêje yan jî rast name hinartiye bo mîr?
Ku Bengînê dergevan name di wê rojê de nedabûya min, her ezê bi hesreta naskirina ka Xanî tê de çi nîvsiye mabûma.
***

## Ez û Xanî

Ew bi çar pênc salan ji min mezintir bû. Dema ew ji welatê Cizîrê vegeriyabû û icaze stendibû ez hîn muste´îd bûm. Li ber destê wî min nehwa erebî û metnê Îsagocî yê Ibn Umerê Ebherî bi şerha Şemseddînê Fenarî xwend û min jî alîkariya wî û farisî dikir.
Ez şahidê jiyna wî ya li Bazîde hemûyî bûm. Ji destpêka meletiyê, avakirina medreseyê û dersdana feqiyan, katibiya wî ya li ba mîrên berê û evîndariya wî ya bi şewat. Nivîsîna wî ya Mem û Zînê û hevrikiya wî ya bi mîr Evdilfettahê ku di roja definkirina wî de berê xwe da bû seyd û şikaran! Ez şahidê van hemûyan bûm.
Ji berî bîst salan de wî berê xwe dabû mîrên Bazîdê ku qeyseriyeke sehhafan di nav bajêr de ava bikin. Wî digot bila Bazîd bibe qibleya feqe û xwendekarên kurmancan. Û bila meaşekî ji bo her yekî xettat girê bidin da ku kitêban nesix bikin, lê mîrekî jî guh nedayê.
Carekê wî bi qiriktehlî gote min:

- mele ismaîl bala xwe bidê. Axur û xan û nalxane û dikanên koşkaran bi sedan eli bazîdê. Ma derketin aji dîn e ku qeyseriya sehhafan jî ava bibe? Ev mîrên me korin kor. Têra xwe zalimin û têra xwe cahilin jî.

Û bi keser kaxezên xwe bi hev ve şîrêz dikirin.
***
Ez û wî weke goşt û hestî, çira û don bûn. Me bêyî hev gav nediavêtin û qewlê me di her tiştî de yek bû. Ku wî nûbuhara biçûkan kuta kir ji min re got:

- mele Ismaîl de ka himmeta te, tu jî yekê bi farisî çê bike.

Min jî rabû Gulzar nezim kir û me ew herdu qamûsên menzûm di mereseya ku wî avakiribû de ji şagirdan re dixwendin.

## Xanîyê evîndar

Keça hecî Zuhdî, keçeke ciwan û rind bû. Spehî û çeleng bû. Xweşik û bi aqil bû. Cara ewwil ku Xanî ew li ber derê malê dît, bi heft dilan ew heband. Êvarê dema ez û wî bi tenê di hucreyê de man keserek kûr hilanî û got:

- Wey!! Ez dilketî me.

Min jî zanîbû ew dilketî ye, bi seetan dipûnijî û qesîdeyên Cizîrî bi dengê bilind dixwendin. Berê jî wî gotibû ku dîwana melayê Cizîrî qurana aşiqa ye. Êdî tebat û hedara wî nemabû, ava şetan disekinî lê ew na.

Piştî ku keça hecî Zuhdî çû ser nesîbê xwe, dilê Xanî bû sipind û agir pê ket. Darên hêviyan jî di herdu çavên wî de şikestin û hatin sûtandin.

Agirê hinavan bi hibra ku qesîde pê dinivîsîn vedimirand. Bi hêsrên ku bi ser sehîfeyên Mem û Zînê de dibarandin vedimirand. Tê bîra min her ku çend beyt jê dinivîsîn ji min re bi dengekî xeniqî dixwendin û pişt re kêlîkin dirêj bêdeng dima.

Wî şevekê ji şevên buharê ku min jê re got: de ka nîvê dînê xwe yê mayî bi zewacê temam bike! Weke dareke di payîzê de hejiya û got:

- Şengê dînê min hemû bû. Tucarî dê evîna xwe ya pak bi zewacekê nelewitînim.

Û heta mir jî wefadrê wî sozê xwe bû. Nezewicî .

## Mem û Zîn

Melayên serhedan ku kitêba Xanî xwendin engirîn. Hemûyan gotin ew tijî kufr û fisq û ficûr e. Hinan digot ku meazellah Xanî ciwanan li fahişeyê har dike û xelqê ji rêya şerîetê dûr dixe. Ji hemûyan bêtir şêx Seyfeddînê Cubbeşîn ku herfekê ji ilim nizane di civatên xwe de dev dihavête Xanî. Li ba mîr çend caran giliyê wî kiribû hetta xeber gihandibû paşayê Wanê jî û gotibû ku Ehmedê Xanî amiyan eleyhê dewleta eliyye dihêvoje.

Erê Xanî ne tenê amî lê mîr û mezinê kurmancan jî dihêvotin. Wî digot madem ku sultan bi hukmê xwedê nake, em ne mecbûrê taeta wî ne. Wî dixwest sultanê kurmancan bi xwe kurmanc be.

Melayekî melazgirî carekê li hêwana camiyê rabû ser piyan û hêrs bû û got:

- malava eskerê sultanê me şerê gawiran dike tu jî dibêjî kurmancan rabin şerê eskerê sultan bikin. Ma heqê xwedê ye wisa? Ma kitab û hedîs wisa dibêjin?

Xanî jî hêrs bû û bi dengekî tijî xişm û xezeb bi ser wî melayî de rabû û gotê:

- ji xwe ez jî dizanim ku eskerê sultan şerê firingan dike! Ew şer ne cihade mela! Şerekî ji bo extirme û talanê ye, ji bo cariye û xulaman û mal û zêran e. furset e ku niha kurmanc rabin.

***

Vê havînê Xanî ji hucreyê dernediket. Bi şev û roj dinivîsî û heta destê sibê payî dima. Gelek caran ku min berê xwe dida hucreyê, didît ku ew û Dostoyê Ormewî ne. Dosto dibêje ew jî dinivîse. Wî dest bi nivîsîna destana Dimdimê kiribû û hêvî dikir ku heta cejna qurbanê biqedîne. Sed sal di ser maceraya kelê re derbas bûbû lê wî dinivîsî mîna ku hîn dûman ji birc û sûrên kelê radibe. Ku min şevekê jê pirsî:

- çima wisa tu bi lez û bezî. Ma çi li pêşiya te heye?

Rahişte xamedankê û bêdeng lê seh kir. Dawî got:

- Eger Bazîd bibe xamedank û darên wê bibin xame têra min û şerha derdê di vî dilê min de nakin. Ma jiyê mirov çi ye mele Ismaîl!! Çend salin weke birûskê diçirisînin û diçin.

Û dest pê kir hikayeta req û perwaneyê ji min re got.

## Hikayeta req û perwaneyê

Dibêjin rojeke buharê reqeke pîr bi rê de diçû, çend salin ku bi rê de bû? Kesî nizanîbû. Dunya bûbû perçeyek ji buhuştê. Teyr û tilûran bi kêf perwaz dikirin. kulîlkan berra keskî li ser erdê ramediyayî neqişandibûn û çem û cobar bi her meqamî diherikîn. Li ser kulîkan perwane difirîyan. Firîna yekê ji wan jî pirr bi lez bû. Ji ser kulîlkekê diçû ser yeke din. Ji ser binefşeyan diçû nesrînan. Ji nesrînan xwe badida ser qerenfilan. Ji wir jî dizîvirî ser nefel û endekoyan. Her kêlîkekê li ser kulîlkekê bû. Reqa ku hêdî hêdî û mîna zarokekî ku nû dixuşe dimeşiya bala xwe da wê perwaneyê û li cihê xwe rawestiya û bangî wê kir û got:

- wa xwûşka perwane. Ev çi mesela te ye tu wisan dilezînî? Weke dînan li te hatiye? Yan tu bi cezbeyê ketî?

Perwaneya ku li ser nêrgizeke mest veniştî bû û şîleya şêrîn dimêt, rawestiya û perîkên xwe yên qeşeng û zîba li hewa vegirtî hiştin û gote reqê:

- Reqê! Reqa pîr. Xwedê tenê zane te çend sed sal buhurandine û dê hêjî çend sed salên din jî bijî! Ma leza te dê ji bo çi be! Ê min umrê min buhareke! Çend mehin dê bibim mêvana vê cîhana gewrik paşê bimirim. Ez dixwazim kêlîkeke min jî vala neçe. Erê raste. Ez bi cizbeyê ketime, cizbeya vê cîhana ciwan û ter û nazik, vê buhara rengîn û buhuştîn. Nikarim mîna te rojê bisipêrim rojê. Ev cizbeya jiyanêye reqê! De here reqê here bi rêya xwe de, te gelek ji dema min pirr hindik bir.

## Melûliya Xanî û jehra nenas

Vê dawî yê, Xanî zêde melûl û bêhêvî bûbû. Deng jê nedihat û ku xeber dida jî digot:

- çi hatiye serê kurmancan sûcê mîrên ku deriyên zihnên wan girtî ne. Ev mîrên ku bûne mar û jehrê berdidin bedena xelqê. Ev mîrên ku derdên wan dunya û civandina mal û zêran e û rojekê jî iltifatê bi ilim nakin. Ev mîrên ku êsîrên şehwetê ne. Ev mîrên ku darê zilm û zorê di destê wan de ye û pişta xelqê pê şikandine û li ber romê jî dstgirêdayî ne. Heyran welleh mîrên wisa ji heriyê jî saz dibin.

Min dizanîbû ku ziyaret û serdana mele Ferîd û mîrza Sebrîyê Pîrexalî û wî mirovê rûgirtî dilê Xanî şikandiye. Min kir û nekir ku ew bêje min wan çi jê re got, negote min. Heta di nexweşiya xwe de jî ku êdî me û wî jî zanîbû ku mirin li ber şipaneyê li hêviya wî ye, negot wan çi jê re gotiye. Şevekê piştî çûna hekîmê ermenî Zuhrab û belavbûna cemaetê, ez û wî tenê min. Min xuhdana bi eniya wî ketibû malişt û jê re got:

- mele Ehmed tu bi qedrê wê evîna xwe kî bêje min çi gotine te!!

Keser hilanîn, serê xwe ji ser palgehê rakir û rûnişt. Fitîla çiraya li ber serê xwe hinekî kişand ku ronî zêdetir bibe û got:

- niyeta mîr û kuştina min hebû, lê qesem bi zatê xwedê `ezze we cell ez vê fursetê nadim wî.

Wî got ku wan bêedebî jî kiribûn û de´wa devjêberdana dersdanê û xutbeyên cum´eyê lê kiribûn. Wan bi navê mîr gef dabûnê û jê re gotibûn : henneya nigê xwe bişo û were dîwana mîr!! Xanî jî gotibû wan ku mîr bixwaze dikare were hucreyê, ma çi ferqa hucreya min û dîwana mîr heye? Belkî hucre ji dîwanê paktir be, hema kesên necis û heram tê de nacivin!!

Îca jehrkirina ku hekîmê ermenî qalê dikir ji min re bû baweriyeke kûr. Min lihêf avête ser bedena wî û gotê:

- naxwe wan tu jehr kiriye! Êdî kifş bû.
- na na , ne ewin. Wan jehr nedaye min.
- de kiye?!
- Derdê me kurmancan û milxwariya wan bi xwe jehr e. kiryarên mîrên wan bi xwe jehra Silêmanî ye. Ev jehr bûye çil sal diwerive nav xwîna min mele Ismaîl.

Hinekî bêhna xwe berda. Li hawîrdora xwe li refikên kitêban bi awirin sist seh kir û bi melûlî got:

- Ha li van refikan û van kitêban seh bike!! Ma tu kitêbeke kurmancî tê de dibînî?

Paşê destê xwe dirêjî murekkebdankekê kir û got:

- ma hibr jî ne jehre!

Û çavên wî hatin ser hev û kete xeweke giran.

***

## Ne mumkine tiştekî wisa

Ku em ji definkirinê vegeriyan. Hîn em di meclisa şînê de bûn min xwest yekser nameya ku Xanî ji mîr re nivîsî bû bixwînim. Lê min ew nedît! Min kir û nekir ku bînim bîra xwe dergevanê mîr Bengînê Mamzêdî ew li ku daye min, lê bê mufa bû. Wê barana reş êdî vedabû û rojeke xemgîn dikete pişt çiyan. Min destûra cemaetê xwest û berê xwe da mal. Hespa xwe ya tewilandî ji axurê derxist û lê siwar bûm û di cih de çûme jor. Min hespa xwe mîna xortekî cengî û bengî bi zixtan dîn kir û berî ku roj di dergûşa rojava de binive gihame wir. Çavên min li çend kaxezan ketin bela wela bûbûn û ji şilbûnê giran bûbûn û bi erdê ve zeliqî bûn. hin ji wan bûbûn mîna hevîr û êdî tiştek di wan de nema bû. Li ser hin kaxezan jî şopa nigê matemîyan û simên hesp û qantiran hebû. Min ew kaxez yek bi yek û bi lez berhev kirin û dîsa li bayê bezê rişma hespa xwe dagerand û daketim jêr.
Wê êvarê, piştî ku ji meclisa şînê vegeriyame mal min li ber ronahiya çiraxekê ku Xanî ew diyarî min kiribû, kaxez vekirin û li ber agirdankê zuwa kirin. Dilê min hate hêran. Nameya Xanî ya ku wê baranê lêkiribû mihiyabû. Tenê her kaxezekê çend xêz jê mabûn. Hêsirên min bi ser wan xêzikên mayî de hatin xwarê. Xêzikin ku bi lez û engirîn hatibûn nivîsandin lê bi nazikîya ku bêhna tiliyên Xanî jê dihat. Li ber çavên min dibû xumam. Ji her kelimeyekê bêhna hesretên Xanî difûriya, ji her herfekê nalîneke wî dihat û di her xêzekê de kesereke wî bi hibrê û hêsrên min re diherikî.
Min çavên xwe yên şil bi kutkutandina çend caran re zuwa kirin û dîsa bermaya wê nameyê xwend. Dema ku gihiştim setrên dawî, mîna ku ejdehayek bi min vede ez çeng bûm û rabûme ser piyan û qêriyam:
- na , ne mumkine ! ne mumkineeeeeeeeeeeee.

# Mîrname

Krîto! Bêje bila jehrê bînin.
Sokrates

Bismillahirrehmanirrehîm
Huwe mewlay
We ilyehî unîb

Ji nexweş û jarê bi navê Ehmedê Xanî ji bo mîrê serhedan mîr Evdilfettahê Pisyanî.
Piştî hemd û selewatan, ku ji xwedê re û li ser fexrê kayinatan, ev e nameya min ku hêvî dikim tu wê bixwînî bi tedebbur û ji bo her kelime û herfekê tê de derê zihnê xwe vekî û nekî tekebbur.
Ey mîr:
Ji roja ku te mîrîtî bi çar hezar filorîyê zêr ji paşayê Wanê kirrî û fermaneke sultanî pê deranî, min dizanîbû ku tu ne layiqê textê mîrîtiya serhedanî.
…………………………………………………………………………………………………………………………………………………………………………………………….. Te bi çavên xwe dît ku mîr Mihemmed û katibê wî Silêman beg rehma xwedê li herduyan bitin, bi tedbîra romîyan hatîne kuştin û bi kuştina wan re dîwarên mîrîtiyê jî hatin kelaştin. Tu bûyê warisê milk û textan. Xwedê li ber te vekirin dergehêd siûd û bextan. Lê nebûyî warisê xwîna wan. Te qatilêd mîr Mihemmed berdayî hiştin û neketî pey wan.
Zulm û zora ku li xelqê dikî, pişta wan bi xûkî û bacan hatî şikandin…………………………………………lê dîsa jî ji xwedê natirsî, bi hezarêd zêran ji Paşayan re dişînî da ku her bimînî mîr………………………………………………………………………………………………………………………………….. Derdê te bûn mal û genc û zêr û zîwer……………………………..
Ey mîr:

……………………………………………hibr……………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
……………………………
……………………………ji wan hemûyan bêtir mîrza Sebrîyê…………………………………………….
……………………………xwestin ez xutbeya cumeyê bişemirînim!………navê sultanê ku tenê bi nav misilmane bibêjim.
Milxwariya li ber darê zora wan……………………...
……………………………Rûmî û Eceman ku em bûne çêleka wan ya xweşdoş……………
mirovekî rûgirtî jî bi wan re bû, ………………… û ………………….
ku gotin min Iblîs bê guneh bi nav kiriye!
Mele Ferîdê reben, ku ew jî li gel wan bû û şûrê wan dihejand û ji kevanê wan tîr dihavêtin………………….
û……………. Miiraca ku min di metnê Mem û………..de behsa wê kiriye kirin behane.
Ez dizanim ku ew çend xeberêd kurdewarî sebebê nerazîbûna……….rûmî ……..li Wanê û Xelatê, li Bedlîs û Mûşê û……………….Makuyê. Lê ne rast bû.
……………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
…………………………………. ji bo qewmê kurmancan ku bikim hawar, eynî şerîetê ye. Di xutbeyan de ku bibêjim gelî kurma……….eynî sunneta pêximberê ummetê ye, lê çi bibêjim ku…………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
……………………………………………xwîn…………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………
…………………………………………………

Ey mîr:
Zulm û sitema Romê nayête tehemmulê………………………………………Eceman jî kurmanc dane ber tîrêd…………………………………………em di nava wan de bûne berxê kêrê…………………………………………………..niha qeweta romê kêm dibe. Gawirêd ku gawirin jî bindestiya wan nema qebûl dikin û li ber wan şûr dikişînin, çi gazin ji me ye? …………………………………………………………………………………………………….
Ey m…
Eger te destek dabûya min û guhdariya min kiribûya, dê min Bazîd bikira bajarekî weke bajarêd Ereb û Ecem û Romiyan. Cihê ilm û edebê, cihê medrese û camyian û ……………………lê te bazê xwe bi baz Evdilqadirê Geylanî nedida, û Şihabê xwe bi Şêx Şihabê Suhrewerdî nedida, û Şêrîn………………………………………………………………………………………………..
Ey mîr:
Wesyeta min eve. Te di jiyana min de li min guhdarî nekir, omîd ew e ku paşî mirina min bi wesyeta min bikî……………………………………..heta tu dikarî dûrî romê be, li wan ewle nebe. Hindî ji wan dûr bî, ewçende nêzîkî xwedê yî……………………………………………………
Ey mîr:
Hekîmê ermenî Zuhrab her şev dihate serdana min……………………………………………. Wî dizanîbû ku jehra Silêmanî ketiye nav xwîna min û êdî necata min ne mumkin e.
………………………………………..Erê ez hatibûm jehrkirin. Jehreke ku çu tiryaq û dermanî nedişîn wê ji nav xwîna min derînin. Jehreke ji zîbeqê bû ku bi salane ……………………………….
Di nav ……………………………….. hêdî hêdî her ku min dinivîsî yan min kitabên xwe dixwendin û li wan vedigeriyam ew jehra di hibrê ……….. ………………………………………………………………Min dizanîbû ku ez dê nema karibim bêtir bijîm. Min ………………………………………… sê……………………ji…………………..hucreya……………………………………derketin ve…………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………….. Bila çu kes mirina min nexe stûyê kesekî din. Yê ku jehr daye min nas e…………………… Hibra min……………………………………………
…………………………………………………………………………………………………
……………………………………………jehr…………………………………………………
………………………………………………………………………………..

Niha dengê ezana nîvro tê guhê min. Ji minareya wê camyia ku min ava kiribû dengê muezin zelal û hêdî û xemgîn tê min. Taqet di min de nemaye êdî, neşim destê xwe zêde bilivînim. Xame ji nav tiliyên min dişemite û li ber çavên min dunya zer dibe. Bênahiya wan kêm …………………………. ……………………………………………………………………………………………………

………… kesên ku hatibûn serdana min tev çûne nimêjê. ………………………………………Jana jehrê êdî giran dibe. Bedena min tev de dijene…………………………………………………tiliyên min ditefizin û dibêjim nigê min nema bi min ve ne……………………………Bû sê car qelem ji destê min dikeve. S…………hel……….d…….Mirin li ber derîzanê ye, li ber doşeka min e, li ber serê min e û tu nehatî serdana min.

…………………………dê min negihîne yekê remezanê û wê hîva yekşevîn nebînim û ………………………..

………………………………………………………………………………………………………

……………………………………………Ez dizanim ku seetên min hindik mane…. Şukrê xwedê dikim ku min karîbû name bigi……………. dawiyê.

Xwedê min efû û mexfiret bike, te jî ………. Bike û ………………………………………………………………………………………………………

…………………………………………………………………

Wesselam.

Ehmedê …(Xanî) şeva înê 29ê Şe´bana 1119 ê Hicrî.

24 /11/ 1707ê romî.

Jan Dost

17.7.2007